**Abdullah Öcalan**

# MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK

**Pirtûka Yekemîn**

# ŞARISTANÎ

**Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske**

**Abdullah Öcalan**

# MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK

## Pirtûka Yekemîn

# ŞARISTANÎ

## Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske

**Weşanên Mezopotamyayê**

**MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK**

**Pirtûka Yekemîn**
# ŞARISTANÎ
**Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske**

**Werger**: Rêşad Sorgul
**Sererastkirin**: Luqman Guldivê

Weşanên Mezopotamyayê

**Dema Çapê**:Tebax 2009
**ISBN**: 978-3-941012-04-2

Herausberger:
Mezopotamien Verlag unt Vertriebs GmbH
Gladbacher Str. 407 B
41460 Neuss/Deutschland
Tel: +49 213 14069093
Fax: + 49 213 14029562
www.pirtuk.info

# NAVEROK

**Li ser wergerê** ........................................................................ 9

**Destpêk** ........................................................................................19

**Beşa Yekemîn**:

Li ser rêbaz û rejîma heqiqetê ..........................................................37

**Beşa Duyemîn**:

Çavkaniyên bingehîn ên şaristaniyê ..................................................91

**1-** Mirovatî çi deyndarê Kevana Toros-Zagrosane? ......................... 95

**2-** Pirsgirêkên belavbûnê yê çand û zimanê Aryen .........................103

**3-** Şîrovekirina rast a jiyan û pêşketina civakî ya

çavkaniya wê Hîlal A Bi Bereket e ...................................................115

**Beşa Sêyemîn:**

Civaka Şareza ya Bajêr ....................................................................137

-Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên Bi Maske-

**1-**Divê Em Civaka Sumeran Çawa Şîrove Bikin? ..........................141

**2-**Şîrovekirina Rast a Civaka Şareza ...............................................159

**3-**Pirsgirêka Belavbûnê ya Civaka Şareza .......................................187

**a-**Pirsgirêkên belavbûna şaristaniyên bi koka xwe

Sumerî û Misrî ne

**b-** Pêşketinên di çanda Çîn, Hind û Çermesoran de

**c-** Şaristaniya Greko-Romen û pirsgirêkên wê yên belavbûnê

**4-** Pirsgirêkên Civaka Şaristaniyê û Pirsgirêkên Berxwedanê.........239

## Li Ser Wergerê

Eger em ziman bi tenê weke amûrekî ji hevdu fêhmkirinê bibînin, em ê xwe bixapînin. Eger mirov zimanan weke hebûnên zindî û ruhber bi nav bike şaş nîne. Dîrokeke dûvdirêj a zimanan heye. Mirovatî çawa his û hestên xwe ango şahî û êşên xwe bi qêrîn gotine û ev kirine sembol û ew li dengan barkirine, wê wextê ziman êdî di malzaroka xwe de rûşên bûye, liviyaye, ruhpêketiye. Ji ber vê yekê, em dikarin kurtebirr bibêjin; ziman nasnameya çand û civakan e. Gotin ji his û hestên me, ji liv û lebatên me, ji êş, keser û şahiyên me diwelidin. Ji lewra ew bi ruh in, û nabe ku tenê weke amûrên li hevkirinê bêne dîtin. Her zimanek mirovek û çandek e.

Me behs kir ku ziman ji jiyana mirov diwelide. Eger em vê, weke rastiyekê qebûl bikin, em dikarin bibêjin ku jiyan diya zimanan e. Ango jiyan nebe ziman çênabe. Ji lewra di nava jiyan û ziman de têkiliyek heye ku bê wê nabe. Em wexta ku hûrûkûr bi dabaşê dakevin, em ê bibînin ku bi tevahî hêmanên jiyanekê li wî zimanê jê çêbûye barkirî ne. Di vê çarçoveyê de mirov ziman weke hîmê bingehîn ê çandê destnîşan bike, bawer dikim ku wê tespîteke şaş nebe.

Di van xal û xusûsan de ku me diyar kir, em niha bi kurtî dikarin behsa zimanê Kurdî bikin. Zimanê Kurdî li qadeke berfireh a bi çiya, banî, deşt, newal, gelî, çem, rûbar, dar, daristan û hwd. bi navê Kurdistanê tê axaftin. Ji çend zarava û gelek devokan pêk tê. Tevî binyad û rehên xwe yên kevnare rengê xwe yên ji hawîrdora xwe girtî jî heye. Havên û hevîrtirşê wî axa Kurdistanê ye ku li ser dilebite, û bi liv û lebata di vê malzarokê de dimeye. Bala xwe bidinê ziman çawa weke zarokê jiyanê ne. Li ber pêsîra wê aş dibin an jî bi tinebûna wê difetisin. Di vê çarçoveyê de em niha bi hêsayî dikarin bibêjin; malzaroka zimanê Kurdî Kurdistan e. Lê li vir pirseke me ya girîng ew e ka zarok ji pêsîra diya xwe bibe wê karibe bijî yan jî çawa bijî? Bi ya min, ev pirs ji bo Kurdan û zimanê Kurdî têra xwe girîng e. Belkî jî weke nasname bersivdana man û nemanê ye. Bi pirseke din jî em ê mebesta xwe hînê zelaltir bikin, gelo bedeneke bê can dikare qala zindîtî û jiyana xwe bike?

Kurdistan bedena canê zimanê Kurdî ye. Malzaroka wî ye. Can û hebûna xwe bi erdnîgariya Kurdistanê heye. Di dîrokê de pêşiyên Kurdan ji wan qewman in ku yekem car gund ava kirine. Hînê jî çanda gund a Kurdan xurt e. Dîsa jiyana Kurdan a koçêriyê hînê dewam dike. Jixwe navê Kurdan jî ji kur-tî hatiye ango kur-çiya, tî-yî çiya-yî. Dîroknas Kurdan weke 'qewmê çiyê' bi nav dikin. Jiyaneke Kurdan a bi hemdê xwe stewiyayî û rehberdayî heye. Şaxên wê yên xwe ji lema bingehîn berdidin ji navikê ve bi Kurdistanê ve girêdayî ne. Belkî mirov bibêje hînê navika wan nehatiye birrîn wê li cih be.

Bêguman ev mijareke berfireh e, û hewcedariya xwe bi çavdêriyeke xurt û lêkolîneke baş heye. Lê ez li vir li ser wergerê dixwazim çend gotinan bibêjim, ji bo wê jî min hewce dît ez qala çend xalên hîmî bikim ku karibim meram û mebesta xwe ya li ser wergerê bînim ziman. Kurd û Kurdistan îro di qonaxeke nû ya dîrokî de ne. Ji ber ku dinya jî ber bi qonaxeke nû ve diçe bi temamî her kes nikare tespîteke zelal bike. Rast e, li ser pirtûk têne nivîsandin û heta filmên paşerojê têra xwe têne çê-

kirin. Gelek ji wan mîna qiyamet rabe, senaryoyan diafirînin û pêşkêş dikin. Dinyaya roj bi roj şêniyên wê zêde dibin, pirsgirêkên wê yên mîna guloka ben li hev geriyayî, artêşên bê karan û sermeyadarên zêde tirtire yên li ser textê xwedayetiyê rûniştî cihê meraqê ye ka wê kengî xezeba xwe bibarînin, dawiyê li vê stêrkê bînin. Bêguman xezeba mirov ji ber lingê mirov radibe. Ji lewra jî çareserî jî wê li cem mirovî bi xwe bin. Li vê dinya me hewl da tabloya wê bi du gotinan destnîşan bikin qiyamet û mehşera Kurdan jî radibe. Lê her tim du dijber di zikhev de ne. Heye ku bi vê qiyametê re roja Kurdan jî hilê. Belkî hûn bipirsin; ka çima ez vê tabloya qiyametê xêz dikim. Ji ber ku Kurd ji pêsîra diya xwe têne kirin. Gundên Kurdan têne xirakirin, têne kuştin, têne talankirin, têne koçberkirin... dibin rêwiyên rêyên nediyar. Ji deverên her tiştê xwe jê girtibûn qut dibin. Mîna ku canê wan ji bedena wan derkeve, weke giyayê ji koka xwe qut bibe; lewra bi kurdî gotina pêşiyan e, her giya li ser koka xwe şîn tê. Gelo beden ê bi xeyalên bîranînên berê çend demên din karibe temenê xwe dirêj bike yan jî karibe bimîne. Li deverên diçinê, di nav çanda bajar de zû dihelin. Ji ber ku şêwazên jiyanê yên li wir ên wan nînin. Xewn û xeyalên wan her li gundên wan in. Bi wan radibin û bi wan rûdinên. Belkî li bendê ne ku ji xew şiyar bibin û bibêjin; mala xwedê ava ev xewnek bû. Lê mîna kesê mirî carnan serê wan li kevirê qebrê dikeve û fêhm dikin ku yên mirî ew bi xwe ne. Min dil nîne ku ez li vir tabloyeke reşbîn çêkim, lê ya rastî divê em nîşanî hev bidin ku çi bi serê me de hatiye. Naxwe em ê nikaribin birînên xwe yên kûr jî derman bikin. Bêguman bi van dabaşan hemûyan dixwazim balê bikişînim ser karê wergerê.

Werger karekî qada xwe gelekî berfireh e. Mirov dikare ji gelek aliyan ve bigire dest û li ser rawest e. Lê ez dixwazim li ser aliyekî têne rawest im ku divê xwendekarên vê pirtûkê bixwînin jî haya wan jê hebe. Ew jî pirsgirêka têgînan e. Ango em divê hinekî li ser termînolojiyê rawest in. Wexta mirov bi kurdî behsa jiyana xwe jiyana Kurdan bike zimanê Kurdî têra xwe xurt e. Lê

eger em behsa mijareke din a li dinyayê bikin, mînak weke bijîşkî, biyolojî, matematîk û heta felsefeyê di warê têgîhan de em ê li hin zehmetiyan rast bên. Ez nikarim bibêjim; ev qelsiya zimanê Kurdî ye, û dîsa ez nikarim bibêjim; gotin di Kurdî de nînin. Ji ber ku Kurd ji cihê xwe qutbûne an jî dibin û bi zimanê xwe nakevin nav jiyana nû ya li bajaran, zêdetir li pey serdestan diçin. Jiyana xwe li ser kokên xwe yên berê ava nakin. Ez naxwazim bibêjim hîç ava nakin, lê qelsiyeke mezin heye. Ji lewra min got can ji beden qut dibe. Eger em gotinên xwe yên di malzarokê de li cih bihêlin û li deverên nû bi çanda serdestan rabin, tehlûkeyeke mezin heye. Ango zingilên man û nemanê lê dixin. Em divê ji bîr nekin ku gotinên me şêwazê jiyana me îfade dikin û divê em biçin çi deverê wan jî bi xwe re bibin.

Ez dixwazim ji we re behsa rêbaza xwe ya wergerê û hin pirsgirêkên wê bikim. Min bi pirranî hevok bi hevok wergerand. Ji bo neheqî li orjînalê nebe, li kêm deveran bi qasî zanîna xwe min dev ji rêzik û pîvanan berda û min xwest a hevok tîne ziman were fêhmkirin. Lewma di warê gelek têgînên cîhanî de pirsgirêka me heye. Ne ku gotinên me tinene, gotin an jî têgînên me yên em giş weke hev li wan serwext bibin bi pirsgirêk in. Belkî jî rewşa Kurdan a parçeparçebûyî, polîtîkayên qirkirin û asîmîlasyonê, kêmbûna xwendin û nivîsandinê rê li pêşiya vê yekê digire. Ez dixwazim hin numûneyan bidim û bi vê yekê merama xwe raberî we bikim.

Beridandin: (evrim-evolution) Genim çil rojê xwe heye. Di van çil rojan de diberide û di dawiyê de jî diseride. Ez ji van qonaxên genim dibihurîne dibêjim şiklekî evolutionê ye. Ango ji vê mînakê jî mirov dikare bi ruhê kurdî di gotina de derxîne û wan li gorî rengên nû girtine bi kar bîne. Ji bo vê jî dixwazim mînakekê bidim. Kodikek heye bi pey traktoran vedikin û pê gubre an jî zibil li nava genim direşînin. Lê wexta ev hat herêma me kesî navê wê ne bi tirkî ne jî bi Rojavayî zanîbû. Yanî amûrekî bê nav bû. Gundiyên me li şikil û şibêtî wî nêrîn, bi derûniya xwe ya kurdî navek lê kirin. Ji ber ku gundiyan dîtin ew

amûrê gubreyê divirvirîne nava genim navê virvirkê lê kirin. Ez bi van mînakên ji we re pêşkêş dikim, dixwazim hindik be jî fikir û têgihiştina xwe ya li zimên ji we re pêşkêş bikim. Mînak bi mînak bawer dikim ku em ê hînê baştir ji hev fêhm bikin.

Milletparêzî: (Milliyetçilik) Tevî vê gotinê divê mirov behsa gotina neteweparêziyê (ulusçuluk) jî bike. Di vir de em dikarin li ser daçekên van gotinan jî rawestin. Milletparêzî weke milletgirî jî nivîsandina wê mumkîn e. Neteweparêziyê jî weke neteweperestiyê. Mirov nikare daçekên kurdî li gorî xwe rasterast û xweber bi kar bîne. Bêguman cihê wan hene. Ev yek hem rêzik û pîvanê xwe hene, hem jî li gorî ruhê ziman pêk tên. Lê têgînên em behsa wan dikin, li gorî têgihiştinên îdeolojîk jî maneyên wan û daçekên wan jî dikarin biguherin. Gotina millet bi xwe ji Rojhilata Naverast e. Rîş û rehên wê dînî ne. Kom an jî ummetên baweriyekê îfade dike. Di dîroka dînî de zêdetir ji kesên dînê Brahîm re digotin kesên ji milletê Brahîm. Ji lewra gotinek di cewherê xwe de ji qewm dûr e. Lê bi demê re weke kirasekî li qewmiyetê tê kirin. Her weha qewmî ya bi maneya etnîsîte jî bi demê re kirasê millet li xwe dike. Herçiqas van gotinan maneyên xwe yên hûr ji yên din hebin jî li derveyî maneya ferhengî di menaya têgînî de digihîjin hev. Gotina netewe ku ji gotina gel cihê ye, û temenê wê dirêj nîne îro li ber maneya milletparêziyê dixîne. Bêguman mirov wexta neteweparêzî û neteweperest dibêje, di awira pêşî de cihê xuya dikin. Lê di encamê de cihê herdu jî digihijinê yek e. Belkî li gorî qonaxên gel gihiştinê ev gotin dikarin xwe cihê û cuda bi maneyan bar bikin an jî bêne barkirin. Ji lewra jî me li gorî qonaxa îro daçekên van gotinan bi kar anîne. Dibe ku carnan hin daçek şaş li dawiya gotinê hatibin suwarkirin. Ew jî bi demê re cihê xwe digirin û guhê mirovan hînî wan dibin. Mînak, gotina 'temaşevan' ya rastî li gorî kurdî gotina rast 'temaşeker' e. Lê wer qewimî û cihê xwe girt.

Obje-sûbje-reduksiyon û her wekî din: min gelek têgînên bi latînî yan jî bi Ingilîzî bi kar anîn. Ne ku kurdiya wan tinebû. Çawa ku min berê jî gotibû hînê têgînên berçav ên Kurdan li

ser li hev kirî tinene. Ji lewra min jî di vê yekê de nelezand û têgînên latînî bi kar anîn.

Pîrektî: (karilik) li hin deverên Kurdan ev gotin bi maneya jinê jî tê bi karanîn. Lê di vir de me weke 'karilik' a tirkî bi kar anî. Gotina pêşiyan 'jin hene jinkok hene' hinekî vê îfade dike, lê dilê mirov bi temamî lê rûnanê. Ji ber ku gotina 'jinê' jiyanê û rastiya wê îfade dike mirov dikare wê weke heqîqet û pîrektiyê jî aliyê wê yê xirakirî qebûl bike. Jixwe îro jî gelek tiştên jin weke xisletên xwe qebûl dikin, em bi belgeyên dîrokî jî ji hev derdixin ku ew wesfên wê nînin. Ji lewra gotina pîrekê ji bo jinê me weke 'karilik' bi kar anî. Gotinek baştir li şûna wê bê hebe mirov dikare biguherîne.

Qûnde-qûnek: (oglan) Di zimanê Tirkî de ji kesê ji paş ve têkiliya cinsî datîne 'oglan' dibêjin. Kurd jî ji kesê wisa re 'qûnek-qûnde' dibêjin. Lê ji ber ku me ev gotin jî çor dîtin, me li deverekê tenê gotina 'kurikê qûnek-qûnde' bi kar anî û wekî din got; 'kurik'.

Kurtêl-kurtêlxurî: (rant) li ser sofreya xwarinê hûrikên nan ên dikevin erdê ji wan re kurtêl dibêjin. Berê li gundan kesê nedixebitî û li ser sofreyên xelkê zikê xwe têr dikir, jêre digotin; kurtêlxur. Kesên bi vî rengî xwêdanê narjînin û bi keda xelkê debara xwe dikin.

Pêşketin: (gelişme) ez vê gotinê şîrove dikim ji bo nîşan bidim ku şaş têgihiştina li zimanê din rê li ber çi vedike. Di zimanê tirkî de gotina 'gelîşme' hem weke 'pêşketin' hem jî weke 'bûyer' tê bi karanîn. Lê binêrin çawa derbasî kurdî bû. Mînak bi tirkî spîker dibêjin 'son gelişmeler ile karşinizdayiz' ango 'em bi bûyerên dawî qewimîne li pêşberî we ne' lê wexta tercumeyî kurdî dibe spîker dibêje; 'em bi pêşketinên dawî li pêşberî we ne' lê di vir de tiştekî pêşketiye tine. Li vir bûyerek qewimî ye. Bi navê pêşketinê di zimanê kurdî de paşketineke mezin.

Bihurandin: (aşmak) Ev gotin û têgîn di pirtûkê de gelekî tê bi karanîn û cihekî zêde digire. Min ev bi maneya li dawî hiştina tiştekî bi kar aniye. Ango tu ji tiştekî dibihurî, derbas dikî û li

pey xwe dihêlî. Bi vî awayî mirov dikare bibêje; gotin bi wergerê xurt dibin, manebarkirî dibin. Mînak di pirtûkê de gotinek tirkî heye 'îşlevsellîk' mirov dikare jêre 'fonksiyonel' jî bibêje; bi qasî min têderxist berdêla vê gotinê bi kurmancî kêrhatî ye. Bi vê maneya ku em gihiştinê, em dikarin bibêjin; bi fikreke hûrûkûr mirov dikare heqê gotinan di warê mane û têgînê de bide.

Şaristanî: (uygarlik), şareza (uygar) Di vê pirtûkê de ev herdu gotin cihekî gelekî girîng û berfireh digirin. Rêzdar Ocalan jî li ser van herdu têgînan radiweste, û bi awirekî îdeolojîk çav li wan didêre. Ew herdu gotinan di heman mane û çarçoveyê de digire dest û bi kar tîne. Ji ber ku di nava pirtûkê de herdu gotin hatine şîrovekirin li vir hewce nake em binirxînin. Lê divê neyê jibîrkirin ku ew di vê pirtûkê de bi şehîneke felsefîk û îdeolojîk têne wezinandin. Dîsa jî ez dixwazim rave bikim ku çima min ji bo 'uygar' gotina şareza hilbijart. Tê zanîn ku berdêla gotina 'uygar' 'medenî' ye. Ango kesê bajarî ye. Di vê pirtûkê de wexta behsa 'uygar' tê kirin, weke civak behsa uygar tê kirin ango civaka medenî. Lê li gorî vê pirtûkê têrê nake mirov 'civaka şareza' weke civakeke tenê ya bajêr bi nav bike. Ji ber ku rêzdar Ocalan vê civakê weke civakeke bajêr û di heman demê de xasûk destnîşan dike. Civaka behsa wê tê kirin li şar e, şaristanî ye. Dibe ku kesên şaristanî mirov wan weke şareza jî bi nav bike. Ez dizanim ez vê gotinê hinekî dişidînim û diguvêşim, lê ya herî li cih ev bû. Belkî hînê yek baştir were vedîtin, lê gavê ya li gorî naverokê li cih ev bû. Jixwe têgîn bi awayekî rûdinên û êdî kes li sîsika peyvê napirse. Divê neyê ji bîrkirin ku 'şareza' weke gotin ji gelek kesên çi li gund û çi jî li bajêr re tê bi karanîn. Lê di vê pirtûkê de şareza civakeke bajêr e.

Min hin gotinên ku weke Erebî an jî ji zimanên din ketine nava Kurdî têne qebûlkirin bi kar anîne. Çend gotinan ji wan numûne bidim û li ser wan jî fikra xwe bibêjim. Mînak Muqedesat-qedîm û wekî wan... Bêguman li şûna van têgîn û gotinan ên xwerû kurmancî hene, lê ez van têgîn û gotinan jî li derveyî Kurdî nabînim. Rast e, dibe ku ji zimanên din ketibin nava kurdî, lê

divê em ji bîr nekin ku gotinên bi salane di nava zimanê me de cih digirin, em nikarin wan li navmalê xerîb bihesibînin. Belkî ya rast ew e ku mirov karibe wan li cihê rast bi kar bîne. Jixwe ez bawer dikim ku min jî wisa kir. Carnan li gorî mijaran divê mirov gotinên kevin jî bi kar bîne. Ez yeqîn dikim ku wexta hûn bibêjin 'dîroka kevin' û 'tarîxa qedîm' wê ferqek hebe. Hûn ê di gotinan de bêhna dem û dewranan bikin. Hûn dikarin bibêjin 'çongên min şikestin' û hûn dikarin bibêjin 'qudûmên min şikestin', lê bawer nakim hûn heman tahmê ji herdu gotinan bikin. Jixwe hin gotin li gorî dabaşa xwe divê werin bikaranîn. Jixwe hin gotin dînî ne, hin gotin qanûnî ne, hin gotin bijîşkî ne, divê zêde wê bêhna xwe wenda nekin. Mînak hûn dikarin bibêjin 'roja qiyametê' bi heman maneyê hûn dikarin bibêjin 'roja rabûnê' jî lê bawer nakim ku heman tiştî bi bîra me bixîne, yan jî heman tahmê bide. Divê bi taybetî em gotinên Rojhilata Naverastî ne, û bi giştî jî yên ji zimanên din ketine zimanê me biparêzin. Ji ber ku wan li gorî cografya me rengê xwe girtine û êdî bi cihêtiyên xwe yên nû ji mala me ne. Ev nayê wê maneyê ku em kurdî bi qalibên xwerû pêş nexin û xurt nekin. Lê em ji bîr nekin ku kesek ji sê rojan zêdetir li malekê ma ew êdî mêvan nîne.

Di wexta wergerandinê de hinek biwêj û gotinên pêşiyan di pirtûkê de hebûn. Li gorî rêzik û pîvanên wergerê divê mirov wan bi zimanê tu werdigerînî wan binivsînî, lê ji ber ku nivîskar bi xwe li ser maneya hin gotinên bi zimanê nivîsandiye sekiniye tu jî neçarî wî bişopînî, biwêj û gotinên pêşiyan wergerînî. Mînak di pirtûka me de birêz Abdullah Ocalan gotina 'goz-gozlem' bi kar tîne û hewl dide têkiliya van bi çavê dil re çêbike. Yanî li dora çav diçe û tê. Ji lewra hin gotinên bi kar tîne di kurdî de bi awayekî din têne bikaranîn, lê wexta mirov wan gotinan bi kar bîne, wê wextê hûn ji mebest û merama wî dûrdikevin. Ji lewra min ziman jî li gorî meqsed û meramê bi kar anî.

Di warê îmlayê de jî çend nuqte hene divê ez destnîşan bikim. Min piştî bêhnokê 'û' bi kar anî. Her wisa di hevokekê de ji 'û'yekê zêdetir min 'û' bi kar anîn. Piştî her 'e' û 'in'ê min

bêhnok danî. Mînak: ‘Diyar e, mirov nexweş in, û derman tineye.’ Tevî van jî min ‘ku’ di hevokan de gelekî bi kar anî. Nexasim min bi sê awayên kêrhatî bi kar anî. Min di hin hevokan de ‘ku’ weke bêhnokê, di hinan de weke kevanê û li hin deveran jî ji bo bihevdanîna hevokan. Gelek nivîsên di nav kevanan de hatibûn bi karanîn jî bi qasî derfet û keysa min çêbû min ew di nav hevokan de bi cih kirin. Ji ber ku diyar bû, rêzdar Ocalan di dema nivîsandina xwe ya bi pênûsê de hin nuqteyên paşê li kêmasiya wan hayil bûye, bi nivîsên di nava kevanan de temam kiriye. Ji ber vê jî ya rast ew bû ku ev têbîniyên di nav kevanan de weke hevok bêne danîn. Di pirtûka bi tirkî de li dawiyê ferhengok hebû. Min hewce nedît bi heman awayî ferhengokê li dawiyê bi pirtûkê vekim. Ji lewra jî min li jêr hin têbînî danîn. Ya rastî di danîna wan de jî ez hinekî dudil bûm. Ji ber ku pirtûkê têra xwe giran dikin.

**Rêşad Sorgul**

# MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK Û PIRSGIRÊKÊN BIHURANDINA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST

## DESTPÊK

Wexta ku wan ez xistim girtîgeha Îmraliyê ya pêşî ez pêşwazîkirim di asta serokatiyê de nûnera Komîteya Pêşîgirtina Li Êşkencê CPTyê ya bi ser Konseya Ewrûpayê bû. Gotina wê pêşî kir wiha bû: 'Tu yê di vê girtîgehê de bimînî, em ê jî bi Konseya Ewrûpayê vir kontrol bikin û hewl bidin hin çareseriyan bibînin' Li ser navê dostaniyê bi îxaneteke di dîrokê de kêm hatiye dîtin di bin kontrola DYE-CIAyê de dewleta netewe ya Yewnan ez radest kirim û wexta têkiliyên berjewendîperest ên Yewnanistanê bi Tirkiyê re li vê yekê zêde bûn 'Di serdema Xwedayên bê maske û qralên tazî de' bi awayekî welê ez li zinarên Îmraliyê çarmîx kirim ku destana Prometheus[1] li ber ne tiştek bû. Mîna çarenûsa min be, ez mehkûm û neçar kirim.

[1]Prometheus gotineke Yewnanî ye. Tê maneya tolhildanê û rîşên vê gotinê ji tîsîsê tê û Tîtanek e. Mexlûqekî qenc, hestyar û bi aqil e. Ji despotî û ezezîtiya xwedayan bêzar e, nexasim jî ji Zeûs. Mirovan û mexlûqên mîna xwe li dinyayê zêde dike. Kurê Îapetos û Klymen e. Birayê Atlas, Menoîtîos û Epîmetheus e. Ew jî weke birayên xwe yên din li ber xwedayan radibe. Lê ew ji birayên xwe cuda zanist, afirênerî û şaristaniyê dide mirovan û bi vî awayî karîbûye sîstemê biguherîne.

Ji ber vê yekê, ji aliyê Zeûs ve li zincîrê hatiye xistin. Li ser vê jêre gotine Prometheus Desmotes ango Prometheusê li zincîrê hatiye xistin. Li çiyayê Qafê li zincîrê tê xistin. Her şev qertelekî ji aliyê xwedayan ve hatiye wezîfedarkirin tê cegera wî ya xwe nû dike dixwe. Mirovekî bi navê Herakles wî ji vê êşkenceya xwedayan rizgar dike. Prometheus jî dibeje; 'Ez heta Zeus ji textê wî neynim xwarê wê dawî li êşkenceyên min neyê.' Bi vî awayî rêya azadiyê nîşanî mirovatiyê dide.

Hevkêşeya rê li ber pêvajoya derketina min a ji Sûrî vekir, hînê balkêştir e. Têgihiştina ez ji Sûrî derxistim, ya rastî xwe dispêre şerê nakokiya di navbera payedana min a dostaniyê û siyaseta Kurd a Îsraîlê de ye. Nemaze Îsraîl piştî şerê Cîhanê yê Duyemîn di pirsgirêka Kurd de bi patrontiyê rabûye. Ji lewra di şexsê min de li çareseriya duyemîn a pirsgirêka Kurd nikarîbû xwe ragire. Li hemberî vê rewşê gelekî nazik bû. Ji sedî sed ev rewş li hesabê wê nedihat. Divê ez heqê wê nexwim; MOSSAD yekser nebe jî ji bo ez riya wê qebûl bikim ez vexwendim. Lê ji bo vê jî ez ne ji alî exlaqî ve û ne ji alî siyasî ve vekirî û amade bûm. Rêveberiya Ereb a Sûrî nexwest em ji têkiliyeke giranî taktîk bibihur in. Jixwe rêbertiya Hafiz Esed bi saya şerê hegomonîk ê DYE û Sowyetê peyda bûbû. Piştî ku Sowyet ji hevdu ket ji Sûrî nedihat ku ti têkiliyeke taktîk di vê qonaxa nazik de biparêze. Sûrî bi min re –bi PKKê re- tewazunek bi Tirkiyê re datanî. Mîna ku ji bo gefxwarina Komara Tirkî ya di salên 1958'an de li ser Sûrî û meyla wê ya zêde ji bo têkiliyan bi Îsraîlê re dixwest bersivekê bide. Ji bo têkiliyeke taktîk a demdirêj PKK weke amûrekî baş rê û derfet dida. Nedixwestin bibînin ku wê ev têkilî rê li ber polîtîkayeke duyemîn a Kurd veke. Bi tevahî hewldanên rêveberiyên Tirk nikarîbûn pêşî li vê yekê bigirin.

Ji vê bibîrxistina kurt jî tê fêhmkirin ku hêza rastî ya ez ji Sûrî derxistime Îsraîl e. Bêguman, rola hêza siyasî ya DYE'yê û zora eskerî ya Tirkiyê jî di vê de heye. Divê neyê ji bîrkirin ku Îsraîlê hînê ji salên 1950î ve bi Tirkiyê re peymanên veşartî mohr kirine û di sala 1996'an de jî bi navê 'antî-terorê' peymaneke din li vê zêde kiriye û bi vê yekê, hevgirtina dij-PKK a DYE-Îsraîl-Tirkî temam bûye.

Faktoreke din a girîng ku divê em li vê pêvajoyê zêde bikin ew e ku rêveberiyên PDK û YNKê yên bi DYE û Îsraîlê re di nava têkiliyê de bûn, bi rêveberî û Meclîsa Federe ya Kurd a di sala 1992'an de hat avakirin bi Komara Tirkiyê re li ser hîmê dij-PKKê hevkarî dikirin. Bêguman, di şert û mercên wê

demê de hukûmetên Komara Tirkiyê û Artêşa wê bi têgihiştineke taktîkî tevdigeriyan. Lê dîrokê jî meşeke xwe ya xweser heye. Têgihiştinên pirrcure bûyerên girîng diyar dikin. Ji mêj ve, aliyê Tirkiyê ku pê xapiyaye û îro jî herî zêde her kes lê hêrs dibe, egoîstî, tengî û yekalîtiya wê ye.

Di sala 1998'an de ji ber van faktorên dijber ên gihiştin hevdu, ez ji Sûrî derketim. Divê ez eşkere bibêjim; ez jî li xwe hayil bûbûm ku derketina min a ji Sûrî hewce dikir. Ez demeke zêde dirêj li wir mam. Lê belê balkêşiya pêşketina xeta polîtîk a ji bo Kurdistanê û helwesta min a dostaniyê ku min dixwest bigihînim asteke stratejîk, hema bêje min kiribûn êsîrê xwe. Rêveberiya Sûrî di asta herî jor de fikarên xwe yên ji ber vê yekê bi taybetî destnîşan kiribûn. Divê ez di vî warî de li xwe mikur bêm. Lê ez hînê jî li girîngiya dostaniya gelan di asta stratejîk de xwedî derdikevim û dibêjim; dev jê nayê berdan. Heman têgihiştinê ez birim Yewnanistanê. Bi dewleta Yewnan re nebûya jî di asta duyemîn de danîna dostaniyeke qedirbilind bi gelê Yewnan re bala min dikişand. Bi çanda wan a klasîk û dîroka wan a trajîk re danûstendin gelekî girîng bû. Jixwe erka dostaniyê ev yek li ser mirovî ferz dikir.

Rêyeke din a ku min karîbû pêde biçûma çiyayên Kurdistanê bûn. Dema ez zarok bûm navê,'Dînê Çolê, dînê Çiyê' jî li min kiribûn. Lê ji ber du sedeman min ev plan weke alternatîfa duyemîn dihişt. Li çiyê, li devera ez bimama wê bi her cureyê sîlehan bombe bikirana, zirareke mezin wê li heval û gelê me bibûya. Wexta min ji vî awirî li mijarê temaşe dikir, eşkere min didît ku tenê rê û rêbazên eskerî wê bikevin dewrê û bi tevahî rêya eskerî wê xwe li ser me ferz bikira. Ya din jî ew bû ku xeşîmî û bêperwerdebûna ciwantiyê bû. Ji sedî sed diviyabû min ew perwerde bikirana. Ji ber baweriya bi van her du pêdiviyan, min xwe ji rêya çiyê kir.

Xulase li Tirkiyê gelek derdorên fermî û nefermî digotin; 'Me ew di quncikê de asê kiriye, binêrin me çawa encam girt.' Îdîayên bi vî rengî ji rastiyê dûr bûn. Jixwe heman polîtîka

tengavkirinê gelekî li ser Îran û Iraqê dihat ceribandin. Encamdana van polîtîkayan bidin aliyekî, berevajî dibûn sedem ku bi çavkorî di nava mijar û çiravê de bist bibin, biçikin. Têkiliyên taktîkî yên bi Îran û Sûrî re ji niha ve nediyar in, wê bi xwe re çi encaman bînin. Mirov dikare bibêje polîtîkayeke welê ye, bi gelek encaman avis e. Kengî dualîteya DYE-YE-Îsraîl an jî Îran-Rûsya-Çînê zelal bibe, gelo hukûmetên komarê ji her encamê re amade ne?

Dersên min ji serhatiya xwe ya sê mehên di navbera Atîna-Moskow-Roma de girtine, bêguman dersên dîrokî ne. Têgîna modernîteya kapîtalîst ku hîmê parêznameya min e, di nava hezar û yek zirx û maskeyî de nas kir. Bi vê serhatiyê min ev têgîn nas kir. Eger ev serhatiya min nebûya, bihêlin min ev analîz û tehlîl bikirana, ez ê yan bûbûma milletperest û dewlet-neteweparêzekî çor an jî weke bi sedan mînakên xwe, heta bi yên dewlet jî avakirine, min ê weke tevgereke çepgir a klasîk çarenûsa xwe bi dawî bikira. Weke prensîbeke zanîna civakî ji sedî sed û vebirrî napeyivim û vê prensîbê her li ber çav digirim. Lê hiseke min a xurt heye ku dibêje; tu yê ti carî negihiştibûya hêza xwe ya analîzê ku tu niha gihiştiyê.

Ji bo min eşkere ye: modernîteya kapîtalîst hêza xwe ya esas ne ji pereyê xwe digire û ne jî ji sîlehên xwe; utopya sosyalîst a herî dawî û herî bi hêz jî di navê de, bi tevahî utopyayan bi rengan dixemilîne û ji sihêrbazê herî zîrek jêhatîtir hemûyan di nava lîberalîzma[2] xwe de difetisîne û ev yek hêza wê ya esasî ye. Heta baş neyê analîzkirin û jihevderxistin, ka çawa utopya hemû di nava lîberalîzma xwe de xeniqandine, bihêlin li ber rabûna kapîtalîzmê, ekola fikrê ya herî ji xwe razî jî wê jê neyê nebe xizmetkarê wê. Kesî bi qasî Marks kapîtal analîz nekiriye, kêm

[2]Lîberalîzm: Ji gotina liberty tê û maneya xwe azadî ye. Ji sedsala 19'an ve kapîtalîzmê ew li gorî xwe formule kir û bi kar anî. Piştî şoreşa Franseyê sê ekolên cihê derketin. Yek ji van şoreşger in, dixwazin şoreşê hînê pêşde bibin. Di nava van de sosyalîst û anarşîst jî hene. Yên sîstema berê diparêzin jî muhafezekar in. Lê yên bela xwe ji van herduyan jî vedikin Lîberal in. Piştî vê jî lîberalîzm weke ekolekê pêşket.

kes bi qasî Lenîn li ser dewlet û şoreşê ponijî ne. Lê îro eşkere bûye ku herçend xwe weke dijberê wê nîşan dabin jî rêûresma Marksîst-Lenînîst mane û materyalekî têra xwe diyarî kapîtalîzmê kiriye. Ji ber ku li ser bendewariyên îradeyên me yên ji koma têgihiştinên cihê yên dîrokî pêk tên, weke ku gelek caran hatiye dîtin, encam dane. Ez vê yekê weke têkiliyeke diyalektîk û çarenûsa ku mirov neçarî wê ye, destnîşan nakim. Berevajî, encama ez digihîjimê ew e ku mirov divê bêhtir serê xwe bi utopyayên azadiyê re biêşîne.

Eger civak û ferdê Lîberalîzmê ji rê derxistiye neyên analîzkirin û mirov wan nexîne mecraya wan a insanî, encam wê ji kansêra civakî wêdetir tiştekî din nebe. Ez ê vê yekê dûrûdirêj bînim ziman.

Ez dixwazim gotinê bînim vir: nûnera Konseya Ewrûpayê ya li Gîrteha Îmraliyê xêrhatina min kir, heta ez sîstema sêhrî ya li pişt vê xanimoka heftê salî yanî modernîteya kapîtalîst ji hev dernexînim, diyar e, ez ê çarenûsa xwe jî ji hev dernexînim. Pêvajo ji serî heta binî ji aliyê Îsraîl-DYE-YE û Rûsya Sowyetê ya ji hevketî hatiye afirandin. Rola hukûmetên Sûrî, Yewnanistan û Tirkiyê jî ji xizmetên burokratîk ên destên duyemîn zêdetir tiştekî din nîne.

Di pêvajoya jêpirsînê de min ji rayedarên Tirk –yên çar saziyên bingehîn; nûnerê Îstîxbarata Fermandariya Giştî, Teşkîlata Îstîxbarata Millî, Mudîriyeta Giştî ya Polêsan û Îstîxbarata Jenderme- re got; ti maneya wê nîne hûn bi girtina min kêfxweş dibin. Bi awayekî rezîl û bêbextiyeke Bedewiyên li çolan jî li xisletên xwe yên mirovane daneynin, bi têkiliyeke dostaniyê û bi komployeke nedîtî, ez avêtim balafirê û piçikîn ser min, ev yek di ti şêwazê şer ê egîdiyê de tine. Ev rastî bi xwe jî mînakeke baş e, û eşkere nîşan dide ku modernîteya kapîtalîst a DYE hegomonê wê ye, xwedî lîbaralîzmeke çawa ye. Sîstema di zordestî û îstîsmarê de sînornenas.

Di sîstema xwe ya têkoşînê de, ne ku min dewleta netew a Tirk nas nedikir. Ez bi serê xwe û bi halê xwe yê herî lawaz bi wêre-

kî li ber rabûm. Her kesê şahid e jî dizane ku min baş li ber xwe da û têkoşiyam. Di vê de tiştekî mirov jê loman bike tine. Ya li naverastê, fermaneke mirinê ji bo kurdîtiyê bû. Ez ê yan ji mirovatî û anora xwe negeriyama û li ber xwe bidaya, yan jî di nava koletiyeke reng û cinsê wê nediyar de wenda bibûma. Ez vê rastiyê guftûgo nakim. Ez ji vê jî hêrs nabim.

Xala bingehîn a ez jê hêrs dibim ew e ku min nikarîbû pêşî li ehmeqiya di warê fikir û îdeolojiyê de bigirim. Sîstemeke welê ye, qaşo nizanin wê mafê mirovan li ku bi cih bikin. Ew çend pesnê mafê mirovan didin nizanin wê li erdê an jî li ezmên bi cih bikin. Lê rastiya heyî jî di ti sîstema ruhberan de nîne. Komeke mirov ji cinsê xwe û mirovatiyê hemû re şer û mêtingeriyê heq dibîne. Qîma xwe bi vê jî nayne, ser û binerdê xwezayê jî di navê de hawîrdorê bi tevahî bi jehr dike û pêşkêşî mirovatiyê dike.

Civaka ez têde ji dayikbûm bi bandora çanda gundê neolîtîk barkirîbû. Di vê civakê de dostaniyeke pak û têkoşîneke nerezîl esas e. Ez jî bi van hisan mezin bûbûm. Lê belê li derveyî pêvajoyên şaristaniyan hemûyan û bi bandorên wê yên neyînî bi awayekî çor xerîb ketibûm. Mîna ku vê jî têrê nekiribe, modernîteya kapîtalîst bi rêûresmên muhafezekar re bûbû yek û li seriyê herî jor ê şovenîzmê bi milletparêziyeke etnîk bi dewleta netewe re dor li min hatibû girtin. Ev yek tehekumeke îdeolojîk bû ku çareserkirina wê gelekî zehmet bû. Wexta li vê yekê têgihiştina ‘zor zane devê tifinga mor zane’ zêde bû, beravêtin dibû navê din ê çarenûsê.

Derketina derveyî sînorên Komara Tirkiyê welê di encama berxwedaneke bi heybet de çênebû. Çend tehlîlên çepgirî li ser pirsgirêka neteweyî hebûn û mirovan bi awayekî dogmatîk ji wan bawer dikir. Ji bo karibin bijîn, em ji wan re li cihekî digeriyan. PKKya li Rojhilata Naverast ji valahiyên sîstemê encam girt û jixwe ji vê yekê zêdetir jî ne xwedî şensekî din bû. Lê dîsa jî divê mirov piçûk nebîne, wê karîbû weke dijberê sîstemê li Rojhilata Naverast hebûna xwe û pêşketina xwe dewam bike.

Ji bo karibe xwe mayînde bike di serî de çiya û berxwedana

çekdarî ji aliyê encaman ve gelekî girîng in. Ji bo Kurdan jî her diçû dihat wê maneyê ku êdî polîtîk dibûn. Ji hevkarên klasîk vediqetiyan û cara pêşî alternatîfeke azadiyê dihat fêhmkirin. Ne rejîmên despotîk ên ji serdama navîn a klasîk mabûn, ne jî dewletên netewe yên qaşo hemdem ên bi ser movikên wan ve bûne, ne li benda gavavêtinek welê bûn û ne jî karîbûn qebûl bikin. Ji ber vê, mirov fêhm dike ka çima Kurdên hevkar, hem jî dewletên netewe yên herêmê û hegemonên emperyalîst têgihiştina 'PKK rêxistineke terorîst e' ferz kirin. Kurdê azad, bi ferd û civaka xwe bi tevahî tiştên wan heta wê rojê ji berkiribûn xira kir. Îdeolojiya fetihkar a Îslamê û îdeolojiya milletparêz a lîberalîzmê ji zû ve kurdîtî ji deftera xwe derxistibûn û li derveyî dîrokê dihesibandin.

Ya rastî, li giravekê li girtîgeha yek kesî ya dixwazin di şexsê min de mehkûm bikin ev kurdîtiya azad e. Li Îmraliyê neh sal in, polîtîkayên rojane têne bicihanîn, sîstematîk in. Eger em van polîtîkayan tenê weke polîtîkayên li girtîgehên Tirk bibînin, ev yekê rê li ber xwexapandinên girîng veke. Di heman demê de ev yek wê bi xwe re hem ji bo Kurdan û hem jî ji bo Tirkan polîtîkayên tiştekî çareser nakin biafirîne û rê li ber şer veke.

Lê min ev jî fêhm kir, Tirkîtî ne dikare li ser navê xwe şer bike, ne jî aştiyê bike. Rola ku Modernîteya kapîtalîst dayê, jendermetî, notirvanî û gardiyantî ye, gelê Tirk jî di navê de ji bo ku tevahiya gelên Rojhilata Naverast li zor û mêtingeriya sîstemê veke.

Hem di nava Ewrûpayê de, hem jî ji derveyî wê, çandên Tirkiye û Anatoliyê bi sing ve girêdane ji bo wan gelekî girîng in. Polîtîkayên têne meşandin welê ji rêzê nînin. Polîtîka û stratejiyên behsa wan tê kirin gelekî hûrûkûr û bi firehî di binî re û bi hev re dimeşînin. Çi NATO û çi jî têkiliyên Yekîtiya Ewrûpayê, mirov dikare herduyan di vê çarçoveyê de baştir fêhm bike.

Dabaşên heta vir min hewl da behsa wan bikim jî têra xwe nîşan didin eger ez hûrûkûr li modernîteya kapîtalîst serwext nebim, ez ê nikaribim bi awayekî manedar xwe biparêzim. Eş-

kere ye, parastina xwe bispêre stûnên huqûqê yên hişk wê zêde manedar nebe. Helwesteke stratejîk û polîtîk a seresere wê nikaribe nîşan bide ka çima ser pêvajoya 'Jinûvedadgehkirinê' tê girtin. Têgihiştina jinûvedadgehkirinê ji bo çareseriya kurdîtiyeke azad zelal bike girîng e. Li dijî dadgeriya Tirk a ji bo temaşeyê pêngava min a bi navê 'Komara Demokratîk', parêznameyên min ên berfireh ên di doza DMME'yê de yên bi navê'Ji Dewleta Rahib a Sumer ber bi Şaristaniya Demokratîk ve' û 'Parastina Gelekî' di cewherê xwe de hewl didan ku dadgerî û demokrasiyeke rastî bidin fêhmkirin. Armanca van parêznameyên min jî ew e ku ez 'modîrneteya kapîtalîst veguherînim pirsgirêkekê û wê li dûv xwe bihêlim', hem sîstema siyasî ya demokratîkbûyînê, hem jî bi maneyeke dewlemend têkiliya wê ya bi alternatîfa çareseriyê destnîşan bikim. Ji lewra jî ev yek careke din taybetmendiya parêznameyên min ên temamker û yekpare radixe ber çavan.

Min gotibû; li Îmraliyê dadgehkirina min a pêşî lîstikek bû. Ya rastî, şert û mercên mirov xwe biparasta tinebûn. Her tişt berê hûrûkûr hatibû pîlankirin. Roja wê biryar bihata dayîn, ji taybetmendiyên dadgerê hatibû neqandin bigirin heta ji kîjan deverê ye, kesên tevlî rûniştina dozê bûn, dem û çapemenî, şêwazê bikaranîna dozê ji aliyê çapemeniyê ve her tişt hatibû pîlankirin. Di vê mijarê de bi DYE û YE'yê re li hev kiribûn. Ya li hemberî vê rewşê para min jî diket ew nebû ku ez weke parêzvanekî huqûqî yê sexte xwe biparêzim. Jixwe li naverastê huqûq tinebû. Ev rastî ji bo YE'yê jî her wisa bû. Bi tevahî mesele ew bû ku di çarçoveya pirsgirêka Kurd a bingehîn de ez ê çawa bihatama bikaranîn. Diviyabû her tiştî xizmeta vê armancê bikira. Jixwe di pêvajoya Kenyayê de ji serî heta dawiyê huqûqa YE'yê hat binpêkirin. Tevî vê, sîstema huqûqê ya Kenyayê û Tirk jî hatibû binpêkirin. Mijara darvekirinê timî di rojevê de girtin, sedema vê jî encamên polîtîk ên dozê bûn. Goya ez tirsiyabûm. Ji lewra timî saxgirtina min bi kêr dihat. Li hemberî rewşên bi vî rengî ya diviyabû min bikira jî ew bû ku diviyabû

ez bi kêra pêvajoya polîtîk bihatama. Ji lewra jî peyamên polîtîk ên parêznameyan girîng bûn. Her weha yek ji wezîfeyên min ew bû ku min bersivên bi kok bidaya wan mijaran ku rê li ber xapandinê vekiribûn. Min hewl da vê bikim. Di vê pêvajoyê de têgihiştina di parêznameyên min hemûyan de serdest ev têgihiştin bû. Tenê li ser vî esasî mumkin bû ez nebim destikê lîstikê û bi kêra têkoşîna azadiyê bêm.

Divê ez eşkere bibêjim; ez li bendê bûm ku DMME'yê biryarekê bide û bibêje bûyera girtinê ne huqûqî ye. Bi vî awayî belkî îmkanê dadgehkirineke adil çêbibûya. Ev hukm pir eşkere bi neheqî nehat dayîn. Ya dima û neçar bigota ew bû ku dadgehkirin bi awayekî adil pêk nehatiye. Jixwe her tişt eşkere û li ber çavan dihat kirin. Piştî bendewariyeke demdirêj a jinûvedadgehkirinê, Konseya Ewrûpayê bi awayekî yekalî bi hukûmeta Tirk re hevdîtinên dûvdirêj kirin û ji alî xwe ve di berdêla tawizên girîng de, bi temamî sosreteke huqûqî û ji dehan xalan ve bi huqûqê re çep ket nava hewldanan; qaşo dosya ji alî Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê ya 11. û ya Stenbolê ya 13. ku dadgehên şûna Dadgeha Ewlekariya Dewletê girtine, mîna berê li ser dosyayê hukmê xwe dan. Li ser vî esasî bi Komîteya Wezîran a Yekîtiya Ewrûpayê re li hev kirin û dosya ji nû ve li DMME'yê vegerandin. Hînê jî çav li rêya helwestên DMME'yê ne. Bi rastî jî mirov meraq dike ka wê helwesta wê li hemberî biryara xwe ya dadgehkirina adil çi be. Di vê pêvajoya jinûvedadgehkirinê de min xwe amade dikir parastina xwe ya huqûqî bikim, lê bi vî awayî hewldanên me pûç kirin. Ji lewra dadgehkirina huqûqî ji şikil û xwenîşandanê wêdetir nebû tiştekî din.

Yek ji xusûsên din ên vê pêvajoyê divê bê fêhmkirin ew e ku DYE-YE-Komara Tirkiyê di mijara PKKê, şexsê min û bi giştî pirsgirêka Kurd de zêde didin û distînin û hewl didin li hevdu bikin. Dewleta Tirk di berdêla tawizên mezin ên ekonomîk de pirsgirêka Kurd a li Tirkiyê tesfiye dike û ji bo pêkhatina dewleta Federe ya Kurd li Iraqê jî di helwesta xwe ya bi şert de bi israr e. Her roja diçe baş eşkere dibe ku di vê mijarê de têra xwe

hevdîtin pêk tên. Jixwe bi DYEyê re li ser van mijaran eşkere tawizdan û lihevkirin. Wer xuya ye, girtina min, ragirtina min a li bin înfaza bêdadgeh, tesfiyekirina pirsgirêka Kurd li Tirkiyê û îlankirina PKKê weke ‘rêxistineke terorîst’ ji van lihevkirinên girîng in. IMF û Krîterên Kopenhagê yên YE’yê kirasekî qirêj bû li van li hevkirinan kiribûn.

Divê ez eşkere bibêjim ku ez ji saziyên YE’yê li benda helwestên ev çend qirêj û bi guman nebûm. Van rastiyan, min di warê mafê mirovan û normên demokratîk ên YE’yê de ber bi lêpirsîneke hûrûkûr ve bir. Ez wexta li ser mijaran ponijîm, ez gihiştim wê encamê ku pirsgirêkan reh berdane, lewma jî ji bo rakirina wan jî helwestên bi kok û bi hêz hewce dikin. Bêguman YE di mijara mafê mirovan û demokrasiyê de li qonaxeke pêş e. Ji vî alî ve deriyê hêviyê yê cîhana me ye. Lê belê moderniteya kapîtalîst a di hîmê wê de weke zincîrekê xwe li wê badaye û ji bo bigihîje qonaxên hînê pêş mirov reşbîn dike.

Şoreşgerên Rûs difikirîn ku serketina şoreşên xwe herî kêm bi beşekî şoreşên Ewrûpayê garantî bikin. Lê tê zanîn ku ev bendewariyên wan bi cih nehatin. Berevajî dij-şoreşa lîberal a Ewrûpayê Rûsya û tevahiya sîstema pêşengiya wê dikir di nava xwe de mehand. Mirov heman tiştî dikare ji bo şoreşên demokratîk ên roja me ya îro jî bibêje. Ji bo bendewariya ji Ewrûpayê rê li ber heman encamê veneke, rêya maqûl ew e ku di serdema sermaya global a herî pêşketî de mirov li demokratîkbûyana global bigere. Mafê mirovan, demokrasî û azadiyên Ewrûpayê tenê dibe ku di bin vê paradîgmayê de bi kêr bên û manedar bibin.

Van sedemên ku me hewl da rave bikin, me hewcedar dikin ku em hûrûkûr û di çarçoveya kategoriyên bingehîn de sedemên ‘dadgehkirineke adil’ çima nebûye û nehatiye xwestin, analîz bikin. Di çarçoveya rastiya xweparastina xwe de girîng dibînim, dîsa dakevim çavkaniyên bingehîn ên berê li ser xusûsên wan ên sereke rawestiyabûm. Tevî ku zêde hêsankirin (reductionism)[3] dikare bibe sedema mirov di têgihiştinê de zê-

[3]Reductionism – Reduksiyon : (indirgemecilik) şêweyekî hêsankirinê ye. Bi rêzik û pîvanên tiştekî cihê tiştekî din dipîve.

neçar e, van fikaran li ber çav bigire. Jixwe beşên sereke yên em dixwazin analîz bikin di zik xwe de yekpare ne, lewma fikarên me yên der barê rêbaza hêsankirinê de kêm dike.

Piştî destpêkê mijara ez dixwazim pêşî bigirim dest û li ser rawestim Rêbaz û Rejîma Heqîqetê ye. Weke tê zanîn rêbaz rêya lêkolîn-lêgerînê ya wer hatiye hînbûne. Ev rêbazên di dîrokê û roja me ya îro de hatine ceribandin û hînbûn girîng e ku mirov bi nav bike. Ji ber ku wê rêya me rohnî bikin.

Têgihiştinên li rêbazparêziyê aliyê xwe yên erênî û bi tehlûke hene. Eger em sedemên vê rave bikin ev yek wê analîza me hêsan bike. Rêbaz bi nexweşî nebe jî her tim rêyeke mirov bişopîne hewce dike.

Ya em bi rejîma Heqîqetê dixwazin bibêjin ew e ku ‘Em çawa herî baş dikarin xwe bigihînin maneya jiyanê.’ ‘Rastî, heqîqetê’ hiş û fikra mirov zêde bi xwe lebikandine. Gelo heqîqet çi ye, mirov çawa xwe dikare bigihînê yan jî mirov çawa nikare xwe bigihînê. Divê mirov li bersiva pirsê bigere. Ji bo her lêkolînerekî ciddî ev yek ji wan xusûsên sereke ye divê bê çareserkirin. Têgînên ‘objektivite[4]’ û ‘sûbjektivite[5]’ tevî hin teoriyên sereke mîna ku zêhniyet û cîhana xeyalê ya tevahiya mirovatiyê êsîr kirine. Em ê hewl bidin wan deşîfre bikin.

Di beşê ‘Pêşketina Civakî de cihêkirineke Manedar a Mekan û Zaman’ de em ê hewl bidin rave bikin ku pirsgirêkên avakirina kategoriyên civakî yên bingehîn ji zeman û mekan qut nabin mirov bigire dest. Ji ber ku hem şikilgirtinên civakan, hem jî xisletên wan ên esasî yan bi awayekî zuha weke ‘bûyerên dîrokî’ têne dîtin, yan jî weke ku di van mijaran de hîç prensîbeke mekan nebe bi awayekî mucered vegotin, têgihiştina me ya civakî bi temamî aloz dikin, dixin xizmeta berjewendiyên xwe yên herî rezîl, di encamê de bi navê ‘rastiyê’ rê li ber demago-

---

[4]Objektîvîte:Bi giştî hebûna berçav ji kirdeyê serbixwe qebûl dike. Bêyî his û pêşhukman li hebûnê dinêre.

[5]Sûbjektîvîte: Hebûnê bi giştî li gorî kirdeyê qîmetê didiyê. Ji ber vê yekê jî dikare hebûn li gorî kirdeyan biguhere û qîmetê bibîne.

jî û retorîka derewkar a civakê vedike. Wexta mirov rastiyên civakî ava bike û mirov bi tevahî aliyên zeman û mekan ên cewherî esas bigire, ji bo jiyana mirov manedar bibe îmkan wê zêde bibin. Mirovê karibe fêhm bike ku gelek têgîn û teorî beredayî, xapandin, spekulasyona xapiyayî û gotinên klîşeyî yên mezin in. Em ê hewl bidin, şaristaniya roja me ya îro –mebest a sereke ye- pêşketina wê bi awayekî berçav ji aliyê dîrokî û mekanî ve bi xalên sereke bi nav bikin.

Di beşê 'Serdema Xwedayên Bê Maske û Qralên Tazî' de ez ê hewl bidim rave bikim ka kapîtalîzm çawa weke awayekî hilberînê derketiye holê û di nava civakê de rê li ber kanserbûyînê vekiriye. Bi qasî ku ji derve xuya dike eşkere ye, lê ya rastî kapîtalîzm, bi zanist û desthilatdariya bi xwe ve girêdayî û ava kirî; her kesî bi her kesî re dide şerkirin. Ev şer bi rêbaza zanistiyê, bi têgîn û teoriyan tê birêvebirin, di qada zêhnî de veguheriye çerxeke mirov xwe nikare ji serweriya wê azad bike. Em hewl didin vî rûyê rastî yê Kapîtalîzmê lê eşkere bikin. Em ê hewl bidin vî rûyê wê yê rastî eşkere bikin. Jixwe sîstemeke welê ye; Marksîzm, anarşîzm, şerên rizgariya neteweyî û heta ekolên mîna sosyal demokrasiyê û bi tevahî ekolên li dijî wê şer dikin, bi hostekariyeke dahiyane kiriye ku bi awayekî bikevin xizmeta wê û bi kêra wê werin. Di destpêkê de civakan hemûyan metabûyîn û destguhertina nirx weke tiştekî rezîl didîtin, lê çawa çêbû ku ev bûn Xwedayên nû yên hikum li civakê bikin? Ya kevin çawa kirasên rengereng li xwe kir, li kelhe û qesran bû xwedî jiyaneke cihê û çawa çêbû ku hejmareke kêm qral pirr zêdebûn û bi awayekî tazî û eşkere ji tebaayên xwe ferq nehatin kirin? Tevî ku sîstemeke gelekî zanistparêz, desthilatdar û dewletdar e, çima bi hawîrdor pêkhatina xwe ya navxweyî rê dide em vediguherin civakên ku bi nexweşî û mirinan tine dibin? Em ê hewl bidin pirsên bi vî rengî ji sirrên wan bikin û bersivên wan bidin. Ji aliyê aborî, avahiyên civakî û saziyên siyasî dabeşkirina wê ya şiklên dewleta netewe hene. Ev dabeşkirin çavkaniya xwe ji têgihiştin û teoriyên zanistê digire. Rolên rastî yên van

dabeşkirinan jiyanê çawa manedar an jî bêmane dikin yek ji wan xusûsan e ku em ê lê hûrbikolin. Bi vê yekê, rola lîberalîzmê ya weke ferdperestî û milletperestiyê dînekî fermî ye, wê baştir were fêhmkirin. Kapîtalîzm di avahiyên derve û hundir ên civakan de timî rewşeke şer çêdike, bi vî awayî mirov dikare nîşan bide ka çawa jiyan timî tengezar, bi streseke krîz û kaos e.

Di beşê 'Serdema Bi Utopyayên Azadiyê Jinûve Jiyan' de wê lê hûrbêkolîn ka çawa mirov ji jiyana bi krîz û kaos a modernîteya kapîtalîst dikare bigihîje şêwazên jiyanê yên utopyayên azad. Ji bo dîsa xwe bigihîne îfadeyên jiyana avzûnkirî û utopîk ên ji jiyana modern a kapîtalîst hatine qewirandin ku di bin serweriya avahiyên maddî de ne, divê mirov ji nû ve xwe ji alî rûhî û zêhnî ve bikin yekpare. Mirov ê xwe çawa bigihîne vê yekê, ev yekê hûrûkûr bê lêkolîn. Li ser hîmê yekparebûna vê maneyê, em ê behs bikin ka mirov çawa dikare ber bi gerdûna jêre 'jiyana azad' tê gotin bazkên xwe veke û bifire. Qalibên jiyana modern a kapîtalîst ku mane qewitandine, reva ji mirinê îfade dike, lê binêrin, bi rastî çawa dualîteya mirin û jiyanê bêmane kirine, ya pîroz xirakirine, jiyan bi tevahî ji aliyê wê yê sêhrî, avzûnkirî, bi heybet û helbestwarî qut kirine û serdema mirineke ebedî û mehşerî ava kirine, di vî beşî de wê rastiya vê yekê jî bê nîşandan. Herçend sembolîk be jî bi têgînên mîna postmodernîzmê baş neyê fêhmkirin jî bi îfadeyên bi serhevkirî yên jiyana azad a utopîk a alternatîf em ê hewl bidin weke rewşa cejneke gerdûnî bi mane bikin. Dema ev nêzîkatî û helwesta behsa wê tê kirin weke gelek caran tê gotin ji şêweyê hilberîn û civakekê wêdetir bi van şêweyên cihê were binavkirin, mirov nikare ji nav derkeve û têgîn û teorî tevlîhev dibin, li şûna van wê mumkîn bibe jiyana civakan a manedar a kêlî û rojane pêk bê, wê resmê vê bê nîşan dan û li ber çavan bê raxistin.

Di Serdema Kapîtalîzmê de Rojhilata Naverast wê di nava xweseriya xwe de bê ravekirin. Kapîtalîzmê bi du şerên cîhanê nikarîbû Rojhilata Naverast bixîne, gelo sedemên bingehîn ên Rojhilata Naverast li ser piyan girtin çi ne? Gelo Rojhilata Na-

verast çima herêma herî zêde bi pirsgirêk a cîhanê ye û mirov nikare ji navê derkeve? Di roja me ya îro de weke zeman û qada bingehîn li Rojhilata Naverast şerê cîhanê yê sêyemîn diqewime, gelo di vî şerî de çi îhtimal hene? Divê em berxwedana Rojhilata Naverast li hemberî moderniteya kapîtalîst çawa manedar bikin? Ev qada ku dergûşa şaristaniyê ye, berevajî îro bûye goristana wê, heye ku bibe qada serdema utopyayên[6] jiyana azad? Ev qada ku muqedesatên xwe li heriyê gerandine, jiyana xwe xistiye bin piyan, heye ku karibe ji nû ve muqedesatên xwe çêke, şêweyên jiyana azad, bi muzîk, helbestwarî, avzûnkirî û manebarkirî ava bike? Ji bo vê jî gelo wê karibe qalibên zanistî û maddî yên moderniteya kapîtalîst û pûtên wê bişkîne û ji bo şêweyên rêveberiya demokratîk a derfetên jiyaneke azad dide, wê karibe komên hilberîner ê bi hawîrdorê re bûne yek û meclîsên zanyarî yên manebarkirî pêk bîne? Li bersiva pirsên welê yên sereke wê bê gerîn.

Kapîtalîzma li Rojhilata Naverast, bi rûyekî din ê xuya dike Xirîstiyantî û Mûsewîtiyê mane lê bar kirine, Îslamê jî di bin tesîra wan de şerê behsa wî tê kirin weke 'mehşerê-qiyametê' bi nav dike, di vî şerê Armageddonê[7] de rola Kurdan jî wê di beşekî din de bê ravekirin. Ji Kurdan re mirov dikare bibêje; gelekî nebûye gel. Ji ber ku gelekî din ê bi qasî Kurdan ji nirxên xwe direve, ji nirxên xwe bizdiyayî û tê cihêkirin nayê dîtin. Mirov nikare bibêje; Kurd gelekî pirr bê hêz in, û qabîliyeta wan a şerkirinê tineye. Cografya wan a stratejîk û karekterê wan ê antropolîjîk[8] dihêle ku ew karibin dijwar şer bikin û bi ser bikevin. Potansiyela cesaretê ya jin û ciwanên Kurdan zêde ye. Lê belê bi qasî ku ji siya xwe jî bitirsin ew bizdone-

[6]Utopya: Xeyal e. Mirov ji bo civakekê li gorî xisletên wê yên xwezayî bihûne û ava bike difikire. Herçiqas bi cihanîna utopyayan bê îmkan xuya bike jî di warê civakî de bûyerên qewimîne bi saya utopyayê ne.

[7]Armegedon bi Ibrî maneya wê 'girê Megiddo' ye. Ev gir li Filistînê ye û li gorî Incîlê şerê dawî yê di navbera qenc û xirab de wê li ser vî girî pêk were.

[8]Antropolîjî : Zanista reh, kok, beridandin û biyolojiya mirov lêdikole. Her weha aliyê mirov ê civakî û çandî jî lêkolîn dike.

kî kirine. DYE'yê li Rojhilata Naverast wê vê komê weke hevgirtiyê xwe yê bingehîn ê nû hilbijêre. Îsraîl projeyeke xwe ya pir cihê ya Kurd heye.

Ev gelê ku Îslamê kiriye were înkarkirin û jibîrkirin, tevî avahiyên terîqetan hemûyan wê di şerê Armageddonê de bi giranî li cem Xirîstiyan û Mûsewiyan cih bigire. Jixwe Elewî û Êzîdî tevî laîkên mezhebên din ên ku li cem xizanên xwe maneya wan nemaye, piraniya vê komê pêk tînin. Hejmareke pirr kêm ji tebeqeya jor, serekên kom û terîqetên Îslamî yên hemdem û kevneşopiyê wê bi lez dev ji rolên xwe yên hevkariya bi Ereb, Ecem û Tirkan re berdin, li metrepolên emperyalîstan li efendiyên xwe yên nû bigerin. Kesên behsa wan tê kirin, ji wan kom û kesan in, bi hêsayî têne tesfiyekirin.

Lê belê wê bibe kêmasiyeke mezin, mirov rola Kurdan di kaos û şerê nû yê li Rojhilata Naverast de tenê weke hevkariyê bibîne. Piraniya Kurdan ku ji bo felsefeya 'Jiyana Azad' tî ne, ji bo tîna wan bişkîne wê li benda pêşengên xwe yên manedar bin. Ev piraniya em behsa wê dikin, dikare qalibên jiyana serdema navîn ên wî ji zû ve diqedînin biterikîne û wê zêde guh nede qalibên dewletoka netew a jêre tê pêşkêşkirin ku modernîteya kapîtalîst wê wî pê bi hêz bihesibîne. Şêweyê Rêveberiya Konfederalîzma Demokratîk ji bo xwe gîhandina îdealên wekhevî û azadiyê herî zêde şensê dide, her weha hem ji aliyê cografî û dîrokî, hem jî ji aliyê xisletên karekterîstîk ji bo Kurdan şêwazê polîtîk a herî li cih e. Di vê çarçoveyê de Koma Civakên Kurdistanê KCK, hem ji bo pirsgirêkên ji ber dewleta netewe ya hişk xwe li çar aliyê wê badane xilas bike, hem jî bi pêkhatina dewletokeke netewe ya nû nekeve nava derdên nû, divê bi roleke derfetan ji çareseriyê re çêke rabe. Di şerê dewletên netewe de ku ji ber modernîteya kapîtalîst li ser mozaîka gelên Rojhilata Naverast tê ferzkirin, komên bi koka xwe Ewrûpî yên nikarin mafê xwe yên mirovan û demokratîk bijîn, etnîsîte, mezheb û dîn hemû, civakên bi koka xwe Qefkasî, Cihû, Rûm, Ermenî, Kurd, Tirk, Îranî û Ereb hemû yên têne îm-

hakirin, qirkirin, ji ber zorê û mêtingeriyê utopyayên wan yên ji bo jiyana azad têne tinekirin, ji bo bigihîjin muqedesatên xwe, destketiyên xwe yên maddî û îfadeya wan jiyana azad, forma bingehîn Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Naverast e, modela pêşeng a forma wê jî KCK ye.

Şerê cîhanê yê sêyemîn ê modernîteya kapîtalîst, di nava mekan û zemanê Rojhilata Naverast de ji seriyê herî erênî heta seriyê din ê neyînî bi gelek bûyerên biqewimin avis e. Di vî şerî de însiyatîfa komên manebarkirî û hewldanên wan wê encamê diyar bike. PKK tenê yek ji wan komên manebarkirî ye, timî xwe pêşde dibe, xwediyê îdeala jiyana azad e, û bi îdîaya pêşengiyê radibe.

Tê fêhmkirin ku di şertên modernîteya kapîtalîst de ne ji bo min, ne jî ji bo gelê me yê bi pêşengiya wî hatim erkdarkirin, ne jî ji bo gelek kesayet û komên gelên din wê dadgehkirineke adil nebe. Di beşa encamê de ez ê li ser vê xusûsê rawestim; ya rastî, bi vê parêznameyê ez ê hewl bidim vê xusûsê bidim fêhmkirin û îspatkirin. Em kengî li utopyayên xwe yên azadiyê baş xwedî derketin, li her deverê me komên dad û berxwedanê yê manedar li dijî desthilatdarî û îstîsmara li her derê ava kirin, ha wê demê em dikarin sîstema timî li derve û hundirê civakê bi şer debara xwe dike li dawiyê bihêlin û jê bibuhurin. Naxwe ji bilî vê, bi tevahî rê û çareserî ji bo jiyanê mîna singê golikê ye ku tim li heman cihî li dora xwe dizîvire. Di rewşeke welê de hema bêjin hedef û encam nîne, emrê mirov ê tewş biçe.

Ez vê parêznameyê li Girava Îmraliyê di nav tecrîdkirineke mutleq de dinivîsim. Derfetên min ên lêkolîn û lêgerîna têne zanîn nînin, her wisa ev rêyek e ku min tercîh nekiriye û nakim. Pêşengên mirovatiyê ku yek bi kêra yê din hatiye ji bo min çavkaniyên sereke bûn û hewce nabînim berhem û navên wan li vir rêz bikim. Têkoşerên fikir û çalakiyê –ji bo jiyana azad- nabe ku bi hejmaran bêne îfadekirin. Ji vî alî ve jî ez li dijî pêkhatina zanista modernîteyê me. Ti deng û îradeya jiya-

na azad bi qasî di nav tecrîdê de wê adil û alîgirê azadiyê nebe. Bi vê baweriyê, vê parêznameya xwe diyarî wan kesan dikim ku zanîbûn û wê bizanin bi dostî û hevaltî bimeşin.

# ŞARISTANÎ
## -Serdema Xwedayên Bi Maske û Qralên Li Piştperdeyê-

### Beşa Yekemîn:
### LI SER RÊBAZÊ Û REJÎMA HEQÎQETÊ

Rêbaz weke têgîn rê, hînbûyîn û nêzîkbûnên hestyarî û aqlane ne ku dikin mirov bi awayekî herî kurtebirr bigihîje armancên xwe û encamê. Kengî zelal bû ku wê kîjan rê te kurtebirr bigihîne hedefa herî rast, wê wextê rêbaz hatiye dîtin. Aliyê rêbazê yê erênî ew e ku hatiye ceribandin û serketina wê ya di warê encamdanê de ye. Ji ber ku dûrûdirêj hatiye ceribandin û paşê diyar dibe, rêwiyên wê yên pê eleqedar dest jê bernadin. Têkiliya murîd-murşîdan tîne hişê mirov.

Di kûrahiya dîrokê de rêbaza pêşî ya em lê rast tên û em hewl didin maneyê bidinê, nêzîkbûna mîtolojîk[9] a ji bo tevahiya bûyer û têgihiştinan e. Bi maneya teng mîtolojî jî rêbazek e; rêbaza eşkerekirina heqîqetê ye. Li pişt mîtolojiyê têgihiştina li gerdûnekê heye. Di mîtolojiyê de xweza bi ruh û ruhberan tijî ye.

---

[9]Mîtolojî: Ji gotina Yewnanî mythos'ê tê. Tê maneya çîrok û çîvanokan. Mîtolojî zanista dîroka mîtan lêdikole û şîrove dike. Mîtolojî çar şaxên xwe hene. Şaxê wê yê afirandina xwedayan lêdikole Teogonî ye, şaxê wê yê afirandina gerdûnê lêdikole Kozmogonî, şaxê wê yê afirandina mirov lêdikole Antropogonî, şaxê wê yê paşeroja xweda, gerdûn û mirovan lêdikole jî Eskatolojî ye.

Herçiqas di roja me ya îro de ev yek weke baweriyeke zarokane were dîtin jî wexta mirov asta zanistê ya gihiştiyê li ber çav bigire ya rastî mirovê bibîne ku ev rêbaz bi qasî tê gotin şaş nîne. Têgihiştinên rêbazê yên mirî, bêruh û mehrûmê dînamîzmê, ji mîtolojiyê bêhtir ji maneyê bêpar in.

Têkiliya helwesta mîtolojîk bi jiyanê re ji sedî sed hawîrdorparêz e, ji qederê dûr e, determînîst[10] nîne û zêdetir deriyê wê li azadiyê vekiriye. Ev têgihiştina jiyanê ya bi xwezayîbûnê re li hev dike, komên mirovan heta serdema dînên mezin rengîn û bi coş kiriye. Destan, çîvanok û mîtolojiyên bi pîroziyan barkirî, bi taybetî zêhniyeta bingehîn a jiyana serdema neolîtîk e. Çîvanok bi objektîvîteyê re li hev nake, ev nayê wê maneyê ku wê şîroveyên manedar der barê naveroka wê de neyên kirin. Li ser mîtolojiyan mirov dikare şîroveyên gelekî giranbuha bike. Bêyî van şîroveyan dîrokê pirr kêm were fêhmkirin. Ji bo mirov karibe komên mirovan ên demeke xwe ya dirêj bi çîvanokan bihurandine fêhm bike, weke rêbaza bingehîn mîtolojî xwedî cihekî girîng e ku dest jê nayê berdan. Rêbazên zanistî yên weke dijberê rêbaza mîtolojîk roja me ya îro derdikevin meydanê, bi delîl hatiye piştrastkirin ku piraniya wan bi xwe ji mîtolojiyê pêve ne ti tiştekî din in.

Dogmayên dînên yekxwedahebîn, rêbaza zanistî ya dewama wan e ku îdîa dike bi qanûnên mutleq dixebite, rêbaza mîtolojîk têra xwe piçûk xistine û divê îtîbara maneyên mîtolojîk paşve bê dayîn. Mîtolojî xizmên utopyayan in, û şêwazekî zêhnî û maneyê ne ku mirov nikare jê bigere. Bê mîtolojî (destan, çîvanok) û bê utopya hiştina zêhnê mirov dişibe tî hiştina bedena mirov. Baş tê fêhmkirin ku zêhnê mirov ê tevahiya zêhnê ruhberan e, nabe ku ev çarçoveya dewlemend a zêhnê mirov tenê bi zêhni-

[10]Determînîzm: Ekoleke felsefî ye ku bawer dike gerdûn li derveyî îradeya mirov çêbûye. Li gorî vê fikrê qanûnên xwezayê bi xwe hene û ev qanûn berçav û sabit in. Bûyerên di xwezayê de jî encama van qanûnan e. Ji lewra di navbera sedem û encaman de têkiliyeke ji hev nabe heye. Di xweza û civakê de çi tiştê diqewime bê sedem nîne. Ji lewra têkildarî zeman-mekan heman sedem her heman encaman diafirînin.

yeteke analîtîk a matematîk were ravekirin. Ev bi jiyanê re li hev nake. Çawa ku zêhnê bi mîlyonan ruhberî matematîkê nas nake, nabe ku zêhnê mirov ê tevahiya zêhnê ruhberan e, bi matematîkê were sînordarkirin. Jixwe wexta matematîk cara pêşî hat dîtin ku vedîtineke şaristaniya Sumeran e, weke rola wê ya esasî di hesabdariya berhemê zêde de hatiye bikaranîn. Roja me ya îro mentiqê mirov hema bêjin bûye mîna mekîneyeke hesêb. Baş e, zêhnê bi mîlyonan ruhberî, heta tevgerên pirtikên jêr atoman, mezinahiyên bi pîvanên astronomîk nayên hesibandin, em ê bi çi û çawa fêhm bikin? Eşkere ye, hêza matematîkê têra van gerdûnên mîkro û makro nake. Qet nebe divê em deriyên xwe li rêbazên nû yên maneyê vekirî bihêlin da ku em yekser xwe bi dogmayan nefetisînin.

Nabe ku mirov hisên zindî piçûk bibîne. Li ser navê jiyanê çi heye di HISAN de veşartî ye. Mirov nikare bibêje; ev hisên makro û mîkro ji gerdûnan serbixwe ne. Ya hînê nêzî têgihiştinê ew e ku mirov bibêje; cîhana van his û pêjnan taybetiyeke bingehîn a gerdûnê ye. Ji ber vê, rêbaza mîtolojîk ji bo serwextbûna li gerdûnê ewqas jî bê qîmet nîne. Dibe ku herî kêm bi qasî rêbaza zanistî ji bo em li gerdûnê serwext bibin, bi kêr bê.

Ji têgihiştina mîtolojîk derbasbûna têgihiştina dînî ya dogmatîk qonaxeke mezin e. Têkîliyeke xurt di navbera vê derbasbûnê û dagirkirina qada zêhnî ji aliyê veguherîna civakî ya xwe disipêre hiyerarşî û çînîbûnê de heye. Pêdiviya hikumdar û mêtinkaran bi dogmayên neyêne guftûgokirin heye. Nirxên tabû yên pîroz in, gotinên Xwedê ne, û nabe mirov destê xwe bide wan, li dogmayan tê barkirin. Têkiliya vê bi desthilatdarî û mêtingeriyê wan heye, têkiliya vê bi berjewendiyên wan ên çînî û hiyarerşîk heye. Bi van dogmayan desthilatdarî û mêtingeriya xwe, berjewendiyên xwe yên çînî û hiyarerşîk veşartine û rewa kirine. Di têgihiştinekê de çiqas hikmekî hişk hebe, li wir ew çend zordarî û mêtingerî veşartiye.

Helwest û nêzîkatiyên dînî di dîroka mirovatiyê de piştî dema mîtolojîk pêvajoya herî demdirêj e. Mirov dikare vê demê

bi dîroka nivîsê bide destpêkirin. Yan jî pirr hindikî beriya wê, piştî wê. Ya divê em fêhm bikin ew e ka çima ev çend hewcedarî bi helwesta dînî hatiye dîtin. Eşkere ye, ev helwest rêbazek e. Li gorî nêzîkatiya dînî, ya esas di armanca jiyanê û rêya gihiştina rastiyê de ew e, mirov li gorî GOTINÊN weke yên îlahên ji xweza û civakê wêdetir (mezintir) qebûlkirî tên nîşan dan, tevbigere. Kengî ji van gotinan derket; hînê li heyatê be tê berbendkirin, her cure koletî rewa dibe, piştî mirinê jî dibe cihennemî. Em li ber wê qonaxê ne ku êdî xwedayên bi maske têne afirandin. Êdî mirov bi hêsayî têderdixe ku ev xweda di heman demê de ew despot û şef e, fermanan dide û civakê dikoje. Pirr zêde bi maskekirina van xwedayan, têkiliya wê ji nêz ve bi xapandina têgihiştina mirov ve heye. Jixwe wexta despot pêşî derketin ser dika dîrokê jî xwe weke qral-xweda bi nav kirin ku vê xusûsê jî baş rave dike. Paşê weke gelek caran di dîrokê de hatiye dîtin gotinên xwe kirin qanûn û weke heqîqetên mutleq pêşkêş kirin. Herçend mêtingerî û zordarî xurt bû, rêbaza dogmatîk a dînî jî kirin rêya sereke ya mirovî; ya rastî, weke rastiyeke civakê hat avakirin. Di bin hikmê van despotên bi maskeya xweda de jiyan li mirovan hat herimandin û bi vê rêbazê ji bo koletiya demdirêj serî li mirovan hat tewandin.

Zêhnê mirovan hînî rêbaza dînî bûye. Ev jî nuqteyeke girîng e. Ji ber ku bi rêûresmên hişk ên hezar salan li komên mirovan serî tewandin û ev koletî jî rewa kirin. Têgihiştina baweriya bi qederê jî bi kok û zexm kirin. Şerên hov û mêtingeriyên mezin bi saya vê rêbazê mumkîn bûne: li gorî gotina pîroz û fermana Xwedê jiyan! Bêguman ev rêbaz derfet û îmkanên baş dide kesên di asta rêveberiyê de ne. Bi vê, diyalektîka[11] kerî û şivan ha-

[11]Diyalektîk: Prensîb û rêbazeke fikrî ye ku çavkaniya xwe xweza ye. Çavkaniya xwe rêzik û pîvanên xwezayê ye. Xwezayê û tiştên xwezayê pêk tînin; têkilî û bandorên wan bi hev re û li hev dikin, pêvajoyên encam û veguherîna wan bi awayekî yekpare tîne ziman. Li gorî diyalektîkê her tişt timî di nava tevgerê de ye. Bi vî awayî diyalektîk hem rewşa xwezayê û hem jî şêweyekî fikrê yê yekpare îfade dike.

tiye danîn. Koletî weke qonaxeke pêşketinê ya diviyabû biqewime hatiye pêşkêşkirin û heta ji wê jî wêdetir bi têgihiştina civaka naguhere rastiya xwezayî li ser vî hîmî hatiye cemidandin. Li aliyekî têgihiştina civak û xwezayeke cangiran, li aliyê din têgihiştina xwedayê hikim dike û rêve dibe, bi eşqeke her tiştî diafirîne û gelekî çalak e. Bi vî awayî têkiliyeke diyalektîkî bi zorê hatiye danîn. Eger em bibêjin; vê têgihiştin û rêbazê serdema Destpêk û Navîn rêve biriye, wê gotina me neyê wê maneyê ku me mesele zêde mezin kiriye.

Aliyê rêbaza dogmatîk ê mirov jê fikaran bike ew e ku li şûna têgihiştina xwezaya zindî ya xwe bi xwe diberide, rêyeke sekan a bi fermanên ji derve yê fermandarê mezin li ser mirovatiyê ferz kiriye. Encama vê ya girîng li ser civakê ew e ku heman pêkhatinên cangiran û rêveberiya ji derve bi destê şivên pirr xwezayî nîşan daye. Ev rêbaz gelekî kevn e û di serdema navîn de gihiştiye di asta herî jor a ultra-subjektivizmê. Ji lewra cîhana objektîv hema bêje tine hatiye hesibandin û nayê fêhmkirin hatiye qebûlkirin. Dinya bûye xaneke demborî ya heyatê, îdealên ebedî û baqî jî weke şêwazê jiyana esas hatine qebûlkirin. Kî gelekî bi dogma û klîşeyan baş zanibe ew alim hatiye qebûlkirin û li mertebeya herî jor rûniştiye. Di dîrokê de ev rêya fikrê ya di karektera antî-mîtolojîk de, ji bo jiyanê gem bike û weke girtiyekî mehkûm bike, bûye xwedî roleke sereke.

Aliyê baş ê rêbaza dînî ew e ku di nav civakê de exlaq gelekî pêşde biriye. Di vê qonaxê de li bin navê vê rêbazê fikra qencî û xirabiyê pirr baş ji hev hatin kirin û weke hikmên mutleq hatin ferzkirin. Xusûsa vê rêbazê tê derxistiye ew e; zêhnê mirov qayişokî û nerm e, yanî bi hêsayî dikare şikil bigire. Mirov bi vê zêhniyetê ji alema heywanan a di bin xwe re cihê bûye û ev yek jî hîmê pêşketina exlaqî ye.

Bêyî exlaq mirov ne dikare bibe civak, ne jî dikare were rêvebirin. Di rêbazê de exlaq ji bo civakê rastiyeke rêveberiyê û pêkhatinek e, dest jê nabe. Bêyî ku mirov naveroka exlaq a pozîtîf û negatîf guftûgo bike, divê pêşketinên di vî warî de weke têgi-

hiştin an jî hiseke civakî ya mirov nikare jê bigere qebûl bike. Bêguman exlaq têgihiştineke metafizîk e, lê ev xusûs exlaq bêqîmet û bê kêr nake. Eger mirov bibêje; exlaqê metafizîk ji yê serdema mîtolojîk çêtir e, bawer nakim ku em zêdegaviyê dikin. Nabe ku mirov civakê bê exlaq bifikire, belkî jî civaka bê exlaq weke dînozorên ji ber xwarin û gîha neslê wan qediya ye, belkî jî mirovê bê exlaq ew kes e, dawiyê li neslê xwe tîne yan jî hawîrdora cîhanê ya jiyan lê dibe diherimîne û dike ku jiyan lê nebe. Her du jî li heman bênderê ne, di encamê de mirov nikare hebûna nifşê xwe dewam bike. Jixwe di roja me ya îro de ji ber hilweşîna mezin a exlaq e ku pirsgirêkên hawîrdor û jîngehê gihiştine ber felaketê.

Ne tenê di dînên mezin de rêbaza dogmatîk[12] di fikra Yewnan a klasîk de giraniya xwe heye. Di vê fikrê de cihê rêbaza diyalektîk û nêzîkatiyên objektîv gelekî bi sînor in. Rêbazên serdest di vê fikrê de îdealîzma Arîsto û Eflatûn e. Ew di serdema navîn de ji bo rêbaza dînî ya dogmatîk bûne palpişt û spartekên xurt. Eflatûn weke fîlozofê herî mezin ê îdealîzmê hatiye qebûlkirin û heta afirînerê wê ye yan jî wisa hatiye pejirandin û ev yek bûye sedem bi çavê pêxemberan lê were nêrîn. Ji lewra fîlozofê herî nêzî pêxemberiyê ye.

Helwestên pêxemberên her sê dînên mezin baş hatine stabîlîzekirin û nêzî damezrandina rêbaza dogmatîk in. Di her sê dînan de jî hêmanên damezrîneriya exlaqê metafizîk bi giranî hene. Li cem Bûda, Zerdeşt, Konfuçyûs û Sokrates exlaq derdikeve asta herî bilind. Bi taybetî jî Zerdeşt weke felsefeya bingehîn qencî û xirabî bi dualîteya tarî û rohniyê wekhev girtiye. Ev zanayên di dîrokê de cihê wan giranbuhaye, di şexsê wan de mirovatiyê di qada exlaq de qonaxeke mezin bihurandiye.

Ji bo kapîtalîzm bibe sîstema dinyayê, têgihiştina li ‘rêbaza zanistî’ roleke girîng lîstiye. Roger, Francis Bacon û Descartes pêşengiya têgihiştina vê rêbaza nû kirine û bi hosteyî ferqa di

[12]Dogma: Di warê îdeolojî-polîtîk de ji hukim an jî rêze hukmên hişk ên nayên rexnekirin û pêşdebirin re tê gotin.

navbera obje û sûbje de tê diyarkirin. Di rêbaza dogmatîk a serdema navîn de cihê obje û sûbjeyê zêde nînin. Weke siyekê xuya dikin û têne bikaranîn.

Ewrûpaya Rojava ya bi ronesansê rabû ser piyan, bi reforma di Xirîstiyantiyê de û bi şoreşa rohnîbûnê ya felsefî rûyekî nû da obje û sûbjeyê, û bi vî awayî rêyeke nû vekir. Subjetîvîteya mirov û obejktîvîteya dinyayê du hêmanên bingehîn in, li serê quncik û goşeyê rûniştine. Rêbaza dogmatîk a gotina xwedê esas digire bi exlaq re qîmeta xwe wenda dike. Ya rastî, li şûna xwedayên berê yên bi maske û qralên li piştperdeyê, serdema xwedayên bê maske û qralên tazî destpê dike. Mêtingeriya kapîtalîstîk di vî şêwazî de xwediyê rola sereke ya tehrîkê ye. Îstîsmara bi navê karê, ji her alî ve hewce dibîne ku têgihiştin û fêhmkirina civakê biguhere. Sedema esasî ya di bin 'rêbaza zanistî' ya nû de ev hewcedarî û mecbûriyet e. Mirovatî û xweza bi îstîsmareke mezin re rûbirû hatine hiştin. Ev îstîsmara civakê wê bi hêsayî ji aliyê wijdanê (exlaq) wê ve neyê qebûlkirin, lê kengî karibe guhertineke mezin a zêhnî pêk bîne, hingî wê karibe xwe ji nû ve ava bike. Ha ji bo vê yekê weke rêya rast a bingehîn barekî mezin dikeve ser milê 'rêbazê'. Tê zanîn, ji bo guhertineke bi kok û ji dil Descartes ketiye nexweşiyeke mezin a şik û gumanê, ji her tiştî guman kiriye û di encamê de xwe avêtiye wî hikmê xwe yê meşhûr û gotiye: 'Ez difikirim, wê wextê ez heme.' Baş tê zanîn ku Bacon'î ji bo 'objektîvîzmê' pirr bi nazenînî tevgeriyane. Yên yekemîn; rê li ferd vekirine ku serbixwe bifikire, yên duyemîn jî derî li ferd vekirine ku çawa bixwaze bikaribe 'objeyê' bi kar bîne.

Di rêbaza zanistî de hewce dike ku mirov têgîna 'objektivizmê' ji nû ve û hûrûkûr şîrove bike. Ji bilî fikra analîtîk bedena mirov jî di navê de xweza hemû (zindî û ne zindî) weke obje tê binavkirin, ji bo kapîtalîzm karibe xweza û civakê bimije û hikim lê bike, vê rola bingehîn bi cih tîne. Eger mirov obje û sûbjeyê hûrûkûr ji hev neke û negihîne rewabûneke mezin, der barê serdema nû de wê veguherîna zêhnî çênebe.

Sûbje hêmanê herî rewa yê fikra analîtîk e, obje jî hêmanekî 'maddî' ye, her cure spekulasyon dikare li ser were kirin. Bi gotineke din 'objektîvîteyê' temsîl dike. Li ser vê cihêkirina ji hev a têgînan şerên mezin kirine. Şerê dêrê û zanistê divê mirov tenê weke xwe li hev rakişandina ji bo 'rastiyê' nebîne. Di bin vî şerî de têkoşînên mezin ên civakî hene; bi awayekî din mirov dikare bibêje, civaka berê ya bi exlaq barkirî û civaka kapîtalîst a tazî ya dixwaze kirasê exlaqê ji xwe bike, xwe li hevdu radikişînin. Mesele bi tenê xwe li hev rakişandina dêrê û zanistê jî nîne. Em hînê bi giştî civakê bigirin dest em ê bibînin; wijdanê civakê tevahiya dîrokê xwedî sîstemekê bû ku îstîsmar qedexe dikir, lanet dikir û guneh dihesiband. Li aliyê din projeya civakî ya nû ya kaptîtalîzmê ya ti qedexe, guneh û lanetê nas nake, dixwaze civakê heta dawiyê li mêtingerî û tehakumê veke. 'Helwesta objektîv' têgîna kilît a vê projeyê ye. Ev herdu sîstem pev diçin.

Fikra analîtîk bi têgihiştina 'objektîvîzmê' ti 'nirx' tineye nexe bin operasyonê. Ne tenê keda mirov, dikare bi tevahî xwezaya zindî û nezindî bixe tesarufa xwe û bike milkê xwe. Dikare bixe ber lêkolîn û lêgerînê û li ser her cure mêtingeriyê weke heq nîşan bide. Ji bilî sûbjeyên neqane, dikare her tiştî mekanîk bigire dest û bi awayekî bêrehm îstîsmar bike û hukim lê bike. Civaka dewlet-netewe-welatî-ferd weke objeya bingehîn li dijî civak û xwezayê bi rêxistin hatiye kirin 'vedîtinên nû ne' û xwedî wê qudretê ne, her dînîtiyê bikin; komên mirovan qir bikin û hawîrdorê bikin ku jiyan lê nebe. Levîathanê[13] berê mîna ku har bûye. Hema bêje ti obje nîne hukim lê neke û parçe neke. Divê baş were fêhmkirin ku nêzîkatiya objektîvîst a rêbaza zanistî weke têgîneke bêguneh were naskirin wê rê li ber felaketan, ji rê derketinan û heta komkujiyên

[13]Levîethan: Di mîtolojiya Fenîkeyan de navê cinawirekî xirabiyê temsîl dike. Di Tewrat û Incîlê de jî navê cinawirekî ye ku ji deryayê derdikeve. Li gorî Tewratê (Eşaya 27:1) Yehova di dema afirandina dinyayê de pişta vî cinawirî daye erdê. Di lîteratura siyasî de cara pêşî Thomas Hobes vê têgînê bi kar tîne û vî navî li pirtûka xwe ya di sala 1651'ê de nivîsandiye dike.

bêrehm ên mîna engezîsyonên ji serdema navîn mayî veke. Bi taybetî divê were destnîşankirin ku nêzîkatiya objektîv têgîneke zanistî ya bêguneh nîne.

Eger 'rêbaza zanistî' weke amûrekî mezin ê cihêbûna çînî neyê fêhmkirin wê bêkêrî û îflasa sosyolojiyê ya di roja me ya îro de jî neyê ravekirin. Ez divê eşkere bibêjim ku min demekê 'sosyalîzma zanistî' weke zanista civakî ya bi îdîa didît, lê di îflaskirina wê de 'rêbaza zanistî' ya 'objektîv' xwedî roleke diyarker bû.

Sosyalîzma zanistî û şaxên wê hemû piştî avakirina sîstemên civakî û pêkanînên wan ên demdirêj ji hundir ve ji hev ketin, hilweşiyan an jî yekser ji kapîtalîzma dewletê ber bi kapîtalîzma taybet ve veguherîn, ev yek ji ber 'rêbaza zanistî' û têgihiştina wê ya 'objektîvîzmê' pêk dihat. Ez niha qîma xwe pê tînim ku bibêjim; kengî cihê van mijaran hat, ez ê bi firehî wan rave bikim. Naxwe ji niyeta durist a kesên bi baweriyeke mezin beşdarî têkoşîna sosyalîzmê bûn û hewldan, guman nayê kirin.

Pêkhatinên zanistî hemû yên roleke sereke didin cihêkirina obje-sûbje'yê gelekî ji serxwebûna xwe hez dikin. Ewqasî dilê wan bi serxwebûna wan ve ye, îdîa dikin ku di ser her cure nirxên civakî de tevdigerin. Belkî jî li ser navê zanistê ji rê derketina mezin di van îdîayan de veşartiye. Belkî jî ti carî nehatiye dîtin ku zanist bi qasî serdema kapîtalîst serdemeke din ev çend bi sîstema serdest re bûye yek. Cîhana zanistê bi naverok û heta rêbaza xwe, hem hêza avakirinê ya sîstemê ye, hem jî hêza parastin û rewakirina wê ye. Rêbaza zanistê ya serdema kapîtalîzmê û zanistên li ser vî hîmî çêbûne, hem hêza danûstendina sîstemê ji bo karê ne, hem jî ew hêz e; di xelekên derve û hundir ê civakê de rê li ber zêdebûna şêniyan, bêkarî, birçîbûn, êş, krîz û şeran vedike. Ji lewra tê gotin 'ZANIST HÊZ E' û ev yek bi gewîtî[14] hatiye gotin.

Belkî bê gotin; ma di vê de çi xirabî heye. Sîstema xwe bi zirxê bêgunehî û rewabûnê nuxumandiye, bi hêsayî dikare

---

[14] Gewî: Ji xwe razî, hinekî qurre û pozbilind.

van gotinan bîne ziman û ev yek jî bi awayekî pirr xwezayî têne îfadekirin.

Eger di roja me ya îro de modernîteya kapîtalîst di parametreyên[15] xwe hemûyan de nîşan dide ku wê nikaribe dewam bike, di vê yekê de para 'rêbaza zanistî' gelekî heye. Ji lewra gelekî girîng e ku wexta mirov sîstemê rexne bike divê mirov li rêbaza wê ya xwe dispêrê û 'disîplîna zanistî' ya derketiye holê bike. Rexneya sosyalîst jî di navê de qelsiya bingehîn a sîstema rexneyan hemûyan ew bû ku wexta rêbaza sîstemê ya xwe pê ava kiribû û dewam dike, rexne kirin heman rêbaz bi kar anîn. Jixwe rastiyeke civakî ya bi vê rêbazê hatiye avakirin heye, bi heman rêbazê çiqas were rexnekirin jî mirovê nikaribe xwe ji heman encamê rizgar bike. Baş tê zanîn, yên di rêyên berê de hatine xêzkirin dimeşin wê neçar bigihîjin wan gund û bajarên rê diçin wan, naxwe wê negihîjin devereke din. Sosyalîzma zanistî jî di navê de ya hatiye serê dijberên sîstemê jî ev e.

Di nirxandina xwe de ez pirr hasas û bi nazenînî tevdigerim ku obje û sûbjeyê li ser hîmê karektera civakî û çînî ji hev bikim. Ji ber ku ev herdu têgînên bêguneh xuya dikin, ji bo modernîteya dewamkirina wê nabe, sedemên ontolojîk[16] in. Ti têkiliya van têgînan, weke tê zenkirin, bi destketiyên zanistî re nîne yan jî îzafî ne û di vî warî bêguneh nînin. Herî kêm bi qasî rêbaza dogmatîk a serdema navîn xwediyê têgihiştina di cihê xwe de çikiyayî ya xweza û sûbjeyê ye. Ji bo serwextbûna li jiyanê bi awayekî eşkere cihêkirina obje û sûbjeyê, dike ku jiyana mirov ji serdema navîn paşketîtir û lawaztir be û bi maddiyatê bifetisîne. Jiyana mirov a ku rêbaza dogmatîk ew bê nefes û ji azadiyê bê par hiştiye, modernîteya kapîtalîst jî

[15]Parametre: Di girtina dest a bûzyer an jî pêşketinekê de her yek ji têkilî an jî pîvanên diyarker.

[16]Ontolojî: Zanista hebûnê. Felsefe û disîplîneke fikrî ye. Weke felsefeya pêşî jî tê destnîşankirin. Carnan weke teolojiyê û carnan jî weke metafizîkê tê dîtin.

bi cihêkirina ojbe-sûbje parçeparçe dike. Di qadên jiyanê hemûyan de derz û qelşên kûr têne vekirin. Bi 'disîplînên zanistî' şaneyên yekparebûnê jî têne parçekirin. Jiyana civakî jî yekpare bi zeman û mekan ve ye û jê nabe. Bi parçekirina vê disîplînê nirxekî mezin hatiye wendakirin. Di roja me ya îro de bi qasî 'tengavbûna jiyanê' trajediyeke jiyanê ya ji spartekên xwe yên cewherî, mekanî û zemanî hatiye kirin tineye. Em bi qeder û çarenûsa herî xirab re rûbirû ne. Nêzîkatiya li kansêrbûyîna civakî helwesteke alegorîk[17] nîne, li dijî sîstemê şîroveya herî manedar e, ji bo jiyanê.

Ev mijarek e, divê mirov hûrûkûr li ser rawest e. Bêguman di çarçoveya parêznameyekê de tenê mirov dikare bi sînor li ser rawest e. Bi rexneyeke dijber, ez rêbazeke nû pêşniyar nakim. Ev nayê wê maneyê ku ez bêrêbazbûnê jî pêşniyar dikim. Ne tenê di jiyana mirov de, di jiyana xwezayê ya zindî û nezindiyan hemûyan de qanûn, rêbaz û rêyên bi wan ve girêdayî hene û haya min ji van xusûsan heye. Ez qîmetekê didim rê û rêbazê. Lê di têgihiştina qanûn û rêbazan de her tim cewherekî determînîstîk heye, ji lewra bi girîngî û bi hosteyî divê bibêjim; mayîndebûn û israra di vê yekê de dibe ku rê li ber înkara azadî û pêşketinê veke. Ez nafikirim gerdûnên bê rêbaz û qanûn hebin. Ez her weha ji mekanîzma bingehîn a Descartes bawer nakim ku gerdûnê bi tenê weke nîzameke matematîkî digire dest. Gumanên min ên kûr hene ku mentiqê qanûn û matematîkê bi nexweşî ne. Ez zêhniyeta rahibên sumeran ên matematîk û qanûn vedîtin û zêhniyeta zanistî ya roja me ya îro gelekî dişibînim hevdu. Ez yeqîn dikim ku herdu jî heman şaristaniyê temsîl dikin.

Dijbertiya rêbazê nayê wê maneyê ku mirov wê înkar dike, di heman demê de nayê wê maneyê mirov li rêbazeke alternatîf digere. Divê were gotin ; hêja ye ku mirov li şîroveyên alternatîf ên ji bo jiyaneke azad îmkanan didin, vekirî be. Eger

---

[17] Alegorîk: Ji bo dîmenek, jiyanek an jî tevgerek hînê baştir were fêhmkirin, nîşandana wan bi awayên berçav.

armanc xwe gihandina maneya jiyanê be, divê rêbaz jî navbêynkariya wê bike. Dewleta mezin û hilberîna îndustriyal a mezin bi serê xwe ji bexteweriyê zêdetir ji mirovatiyê re şer û hilweşîn anîne. Dema hilberîn û hêz dibin yek, mirov ji maneyê bêhtir dûr dixin. Kesên mal û milk daneserhev li hemberî jiyanê her tim bûne ji wan kesên sereke yên bê hurmet tevgeriyane. Civak her tim bi guman nêzîkî daneserhevê û maldaran bûye. Ji bo mirov ji pirsgirêka rêbazê rizgar bibe yan jî vê pirsgirêkê li dawî bihêle û derbas bike; divê mirov karibe xwe li şaristanî û serdema têde rakişîne û pêre bikeve nava hesabpirsîn û dayînê. Di demên cihê yên dîrokê de em li mînakên balkêş ên di vî warî de rast tên. Mirov heta kapîtalîzmê û disîplînên zanistî û rêbazên wê yên mohra xwe li qalib û saziyên wê yên hemdem xistine radîkal rexne neke û li ser vî hîmî ji bo zanista mirov nêzîktirî jiyana azad dike, ji bo avakirina nû zendûbenda banede, gera li rêyekê hewldaneke tewş e. Niyeta min nîne ku ez bi kêra dualîteya modernîte-postmodernîteyê bêm. Di vê mijarê de tevî ku hurmeta min ji gelek nêzîkatiyan re heye jî di wê baweriyê de me ku hînê ji cewherê pirsgirêkê gelekî dûr in. Tê qebûlkirin ku postmodernîte kirasê nû ye, modernîte pê hebûna xwe dewam dike.

Ez neçar im ku şîroveya xwe bi têgîna REJÎMA HEQÎQETÊ pêşkêş bikim. Ez bi vê, ji rêbazeke alternatîf wêdetir, li rêyekê digerim ku pê karibim ji nava pirsgirêkên mirov bi wan xapiyane û ji nirxên azadiyê dûr hatine xistin, derkevim. Bêguman di civaka mirov de her tim lêgerîna li heqîqetê hebû. Ji mîtolojiyan heta dînan ji felsefeyan heta gelek zanistên roja me ya îro gelek alternatîf ji bo bibin bersiva vê lêgerînê derketine holê. Jiyan li derveyî van alternatîfan nayê fikirîn, lê di heman demê de di vê mijarê de îroniyeke[18] nayê înkarkirin heye, ew jî ew e ku guloka pirsgirêkan jî ji van alternatîfan çêbûye. Yanî ne bêyî wan dibe, ne jî bi wan dibe. Rastiyeke welê dualî heye. Lê modernîteya me ya îro cihêtiyeke xwe ya nedîtî heye. Modernîte gihiştiye wan sînoran ku êdî ni-

[18]Îronî: Bi tinazî rexnekirin. Li derveyî wêjeyê ji karanîna wê re îztîhza tê gotin.

kare dewam bike. Em dikarin yekser pirsgirêkên wê yên mehşereke rastî tînin hişê mirov weha rêz bikin; şêniyên cîhanê bi lez zêde dibin, dewlemendiyên sererd û binerd diqedin, hawîrdor tê talankirin, derza li civakê ketiye bi lez mezin dibe, têkiliyên exlaqî ji hev dikevin, jiyan ji zeman û mekan qut dibe, jiyan ji avzûnkarî û helbestwarîbûna xwe dibe, streseke[19] mezin, gidîşa çekên nukleer ên karin cîhanê wergerînin çolekê û cureyên şeran ku xwe li bunyeya civakê hemûyî gerandine û dawî li wan nayê. Gihiştina vê qonaxê bi xwe jî nîşan dide ku rejîmên me yên heqîqetê îflas kirine. Min navê ez tabloyeke bê hêvî û reşbîn çêkim. Lê em nikarin li hemberî jiyana ji destê me diçe bêdeng bimînin û neqîrin. Em bê hêvî nebin, rondikên xwe nebarînin. Lê ji bo vê jî çare divê.

Gelo lêgerîna me ya li heqîqetê hewldaneke tewş bû, naxwe em di serdema hêzên tariyê re derbas dibin? Çewtiyên mezin kengî û li ku hatin kirin; kengî ketinê û di ku de asê man?

Ji xwe bawer ez dikarim bibêjim; modenîteya kapîtalîst bi giranî hêza xwe ji avakirina civakên çewt girtiye. Bêguman nabe mirov înkar bike ku li dijî van çewtiyan gelekî têkoşînên mezin hatine meşandin. Sîstemên serketî hatin nîşandan jî ya bi serê wan hatiye li holê ye. Hingî gelo weke ku sîstem îdîa dike ya ku em têde dijîn, dinyaya dawî û ebedî ye? Gelo dinyayeke din mumkîn nîne? Haya min ji min heye ku ez jî pirsên rojane têne pirsîn dubare dikim. Belê, ji çewtiyên rêbazê yên di gelek xalan de tên kirin heta bi şaşiyên di disîplînên zanistê de, ji şîroveyên desthilatdarî û aboriyê heta bi têgihiştina hukim li estetîkê dike û sazîbûyînê, ez dikarim rûyê rastî yê gelek diyardeyan raxînim ber çavan. Divê ev yek piçûk neyê dîtin. Di vê çarçoveyê de ez xwe xwediyê wê hêzê dibînim ku bikevim nava ceribandinekê. Ez vê jî weke wezîfe û deynekî xwe yê li hemberî nirxên azadiyê qebûl dikim.

Ji bo ketina nava mijarê, ez dikarim weke hevoka destpêkê bibêjim; dabeşbûn û cihêbûna du qalibên bingehîn ên hukim li fikra mirov kirine obje-sûbje, îdealîst-materyalîst, diyalektîk-metafizîk, felsefî-zanistî, mîtolojîk-dînî mane qelskirine û berevajî

[19]Stres: Pêsîrtengî-pêxîrtengî.

kirine. Hûrûkûrbûna di van dualîteyan de yek ji çewtiya bingehîn a rêbazê ye ku rê li ber modernîteya kapîtalîst vekiriye. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de pêşketin an jî pêşdebirina fikir û baweriyan ji aliyê îstîsmarkaran ve hatiye destekkirin û di dewamkirina sîstemên wan de rista rewakirinê bi cih anîne û di kapîtalîzmê de gihiştine asta herî jor. Şîrovekirina van dualîteyan weke dîrokeke neberçav jî ya rastî bi kêra van sîstemên mêtinger û îqtîdarên li ser kar hatiye. Eger bi van dualîteyan serî li zêhniyeta mirovatiyê nehatiba gerandin wê di dîrokê de ti nîzama îstîsmar û îqtîdarê ev çend bi tesîr nebûna. Şerê zêhniyetê yê li dora van dualîteyan tê meşandin, mîna şehwetê hînê zêdetir rê li ber xwesteka desthilatdarî û mêtingeriyê vedike. Şopger û şopbirrên heqîqetê, çiqas di van dualîteyan de serketîbûn, ewçend jî li cem desthlatdar û mêtingeran bûne xwedî paye û cihekî berz. Ji lewra gotina ‘Heqîqet desthilatdarî ye, desthilatdarî heqîqet e’ gelekî cih dîtiye û hatiye piştrastkirin. Rejîma heqîqetê ya li vir behsa wê tê kirin, hevgirtiyê herî baş ê rejîma îstîsmara siyasî ye. Encama vê hevgirtinê bêhtir zordarî û îstîsmar e. Di encama vê de jî jiyana azad û manedar ji dest diçe.

Hingî karê me yê pêşî yê ciddî divê em weke rêbaz bi cih bînin ew e ku em dev ji vê rejîma heqîqetê berdin. Ya rastî divê mirov helwesteke negatîf nîşan bide: divê mirov ji her alî ve negatîf nêzî rejîma heqîqetê ya sîstemê bibe! Ez behsa helwest û beredanîneke hişk û çor nakim. Ez dibêjim; divê mirov wê çareser bike. Ne tenê li dijî tevn û torên desthilatdaran, li dijî kulmoza mêtingeran jî helwest divê. Kengî van kulmozan li her deverê li hemberî xwe berxwedaneke manedar dîtin û ji bo avakirina koman xebat hatin meşandin, hingê sîstemê ji dûvikê xwe ve hatibe zevtkirin û êdî wê dest pê bike ji hev bikeve. Bi tevahî civak bi zêhniyetê têne avakirin û berhemê wê ne. Weke tê gotin; dest û ling civakê ava nakin. Eger wisa bûya dinya li pêşiya me wê pirr cihê bûna. Bi tevahî bûyerên girîng ên dîrokê, pêşketin û pêkhatin weke berhemên îrade û zêhniyetên bi bandor derketin holê. Yek ji çewtiyên mezin ên rêba-

za Marksîst ew bû; bêyî ku şoreşê di qadên zêhnî de xurt bike, li bendê ma proleterya rojane di bin nîrê zordestî û îstîsmarê de civaka nû ava bike. Marksîstan nedît ku proleter kole ye ku ji nû ve hatiye keşifkirin. Ew jî bi gotina beredayî ya weke 'karkerê azad' xapiyane. Tevî kêmasiyên din encama vê jî tê zanîn.

Naxwe tevî destketiyên zanistî yên mirovatiyê ku divê em maneyê bidin wan, zêhniyeta me divê çawa be?

Ji bo em bersiveke zelal bidin vê pirsê divê em objektîvîte û sûbjektîvîteyê hûrûkûr deşîfre bikin. Ji ber ku herdu zêhniyet jî di encamê de li heman bênderê ne.

Ya yekemîn, objektîvîte weke ku gelek caran tê îdîakirin, îfadeya qanûnên civak û xwezayê nîne. Eger mirov hay jê hebe û hûrûkûr li ser biponije, mirov ê bibîne qanûna objektîvîteyê ji biwêja berê 'gotina Xwedê' tê û şêwazê wê yê modern îfade dike. Di vê objektîvîteyê de her tim deng di ser civak û xwezayê re holan didin. Eger em hinekî din mijarê veçirînin û ji hev bijenînin, em ê fêhm bikin ku ev deng ji ber serdestiya îstîsmarkar û zordar tê. Zêhnê objektîv û pergala dengan dibihîse, eleqeya wan ji nêz ve bi sîstemên şaristaniyê re heye. Ji aliyê van sîsteman ve hatine terbiyekirin û guh aşînayî wan kirine. Ji objeyan agahiyên nû bêne girtin jî ev yekser bi ser hin deverên sîstemê ve dibin. Her cara tiştekî nû tê dîtin, xwediyên sîstema teknîk wan berê yan jî paşê bi hezaran ben û qeydî bi sîstemê ve girê didin. Eger di berevajiyê wê de israr were kirin; weke gelek mînakên di dîrokê de hatine dîtin; ji Adem heta Brahîm, ji Manî[20] heta Hellac-i Mansûr[21], ji Saint Pa-

[20]Manî: Di salên 215 P.Z. de ji dayik bûye. Xwestiye dine Zerdeştiyê reforme bike, bi Xirîstiyantî û Bûdîzmê re têkel bike û sentezekê çêke. Fîlozefekî di dema Sasaniyan de jiyaye. Xwestiye dînekî gerdûnî çêke. Ji lewra xwe jî weke xeleka dawî ya pêxemberan bi nav kiriye. Rahibên Zerdeştî li ber van fikrên wî radibin û kirin ku Şahpûrê Sasanî Manî biavêje zindanê. Tevî êşkenceyan hemûyan jî Manî ji ber ku ji ya xwe nehat xwarê di sala 276'an de hat darvekirin.

[21]Hellac-i Mansûr: Di sala 848'an de li bajarê Îranê Tûrê ji dayik bûye û di sala 922'an de li Bexdayê çermê wî gurane û darve kirine. Di cîhana Îslamê de yek ji tesewifên mezin e. Bi gotina xwe ya 'Ena el-Heq' navdar e.

ul heta Giordano Brûno wê li xezeba xwedayên sîstemê rast bên. Ji ber ku objektîvîte nêzî rastî û edaletê ye, dibe ku bi hezaran dijminê wê çêbibin. Eger objektîvîte bi rastî fêhmkirin û çavê dil be, tiştekî pirr giranbuha ye; wexta bi nirxa jiyana azad ve girê bide mirov digihîne zanatiyeke rastî. Lê ji bo vê jî divê mirov têkoşeriya fikrê ya mîna Hellac-ê Mansûr û Brûno li ber çav bigire.

Di çarçoveya qanûnên zanistî de divê mirov bi hosteyî zanibe du encaman ji objektîvîteyê bigire. Berxwedan û hewldaneke mezin jêre divê, ji bo ku mirov bizanibe kîjan encama rastiyê û ya din jî encama sîstema hakim a li ser kar e. Şêwazê fikra objektîv ku zêdetir encama fikra analîtîk e, eger bi şêwazê fikra hisî ya kêliyan a çavkaniya wê mejiyê hisî ye, neyê girêdan, di dîrokê de wê rola dînozorên duyemîn bilîze. Cinawirê bombeya atomê çêkir, versiyona nû ya Levîathanê berê ye ku bi fikra analîtîk a moderníteya kapîtalîst hatiye teçhîzkirin. Tabloya neyênî ya em behsa wê dikin, berpirsiyarê wê ev versiyona nû ye. Em kengî xwedayê bê maske yê bi şiklê dewleta netewe lêbikolin, em ê ji nêz ve baş bibînin ka fikra analîtîk a objektîv dikare çi bike.

Sûbjektîvîzma li alî dijber ê objektîvîzmê cih digire di wê îdîayê de ye ku mirov dikare bi guhdarîkirina li xwe û spekulasyonên bê obje bigihîje rastiyê. Ev, şêweyekî Eflatûnî ye. Wexta bi serê xwe bimîne, weke objektîvîzmê aliyê wê yê di fikrê de sabit û dixape derdikeve holê, ango rastî bi qasî ku têderxistin û tê hiskirin rastî ye. Bi aliyekî xwe yê din dikare xwe bigihîne fikra mewcûdiyetê[22] (existentialism). Qebûl dike ku mirov xwe bi xwe afirandî ye. Tevî ku li ser navê wê gelek ekolên[23] fikrê ava bûne jî ji bo ku di nava sîstemê de cih bigire weke objektivizmê paşve nemaye. Ji ber ku di têgihiştina li civak û xwezayê de ketiye 'sûbjektivizmê' (înkarkirina objeyê) dibe hêzeke xurt ji bo

---

[22]Mewcûdiyet : (existentialism) Ekoleke felsefeyê ye. Bawer dike ku mirov xwe bi destê xwe diafirîne.

[23]Ekol: Gotineke bi koka xwe Fransî ye. Bi maneya doktrîn, teyara fikrî, pêla hizirîn, dibistan û sîstemê tê.

mirov ber bi ferdperestiyê ve bibe. Têgihiştina ferdê modernîteyê dike egoîst têkiliya xwe ji nêz ve bi sûbjektîvîzmê re heye. Ji ber ku ev yek li şûna 'ez' a rast ber bi ezeziyê ve dibe, weke motîvasyona bingehîn a diçe civaka 'bi tenê dixwe' tê dîtin.

Sûbjektîvîzm ji fikra teqinî a 'çiqas ezîtî ewqas heqîqet' jî berpirsiyar e. Sîstema kapîtalîst gelek fikrên xwe ji vî şêwazê fikrê girtiye. Ev şêwazê fikrê di serî de edebiyat di qada hunerê de jî hatiye nîşandan û bi afirandina cîhana ferazî (imaginary) bi encam bûye. Bi rêya hunerê îndustriyê bi tevahî civak kir bin bandora xwe û meşrûiyeta sîstem hewcedarî wê ye qat bi qat bi cih tîne. Civak kêlî bi kêlî di bin bombebarana ferazî de tê ragirtin û dihêle ku qabîliyeta xwe ya fikirînê wenda bike.

Heqîqet dadikeve asta cîhaneke sîmulasyonê[24]. Maneya ferqa di navbera kopî û esil de namîne.

Aliyê erênî yê sûbjektîvîteyê li xwe guhdarîkirin, zêdetir bi fikra hisî ve girêdayî û têkildar e. Di xweguhdarîkirinê de keşifkirina bi têderxistin û hiskirinê aliyekî xurt e.

Di zanyariya Rojhilata Naverast û Tesewifê de hewldanek hatiye dîtin ku bi rêbaza li xwe guhdarîkirinê yekparebûna civak û xwezayê bê danîn. Bi vê jî gelek qonax hatine derbaskirin. Hînê jî mirov dikare weke çavkaniyeke xurt bike ku bi kêr bê. Li hemberî objektîvîzma Rojava, sûbjektîvîzma Rojhilat di warê exlaqî de bi nêzîkbûna xwe ya civak û xwezayê xwedî roleke li pêş e. Objektîvîzm û Sûbjektîvîzm jî timî ketine nava wê nexweşiyê ku xwe weke dengê Xwedê nîşan dane. Ji vî alî ve herdu digihîjin hevdu. Nêzîkbûnên xweda, xweza û civakê yên eqlê mirov tênagihin û hundirîn in, nikarin xwe rizgar bikin û dikevin xizmeta qralên tazî û li piştperdeyê yên di rewşa xwedayên bi maske û bê maske yên sîtemê de ne.

Roja me ya îro, ya rastî di modernîteya kapîtalîst de objektîvîzm bi saziyên dibistan û zanîngehan ên pozîtîvîst (têgihiştina zanistê ya ku xwe tenê disipêre rastiyên maddî û fizîkî) ; subjek-

[24]Sîmulasyon: Di dinya feraziye de çêkirina tiştekî mîna yê esil. Lihevçêkirî.

tîvîzm jî bi her şêwaz saziyên xwe yên ruhaniyet û dîndariyê bi awayekî zexm û qehîm cihê xwe girtine û ji du aliyan ve sîstemê rewa dikin. Ji rêbazeke heqîqetê, ji rejîmekê zêdetir bi dondankiya sîstemê radibin. Weke sazî û kadroyên rewakirina desthilatdarî û îstîsmarê, bi qasî saziyên mêtingerî û zora eşkere bi kêr tên. Careke din hêzên sîstemê yên bi gotinên ‘desthilatdarî heqîqet e’, û ‘zanist hêz e’ bûne yek li pêşberî me ne. Navê lîstika di sêgoşeya sermaye-zanist-siyasetê de ku em dikarin weke ‘şîrketê‘ bi nav bikin, gera li heqîqetê ye. Li derveyî vê lîstikê her gera li heqîqetê ya dijminê sîstemê ye, yan tê tinekirin, yan jî dikişînin nava xwe û hewl didin wê bihelînin. Mane gelekî zêde ji dest çûye û li hemberî vê rewşê, şaristaniya maddî di qonaxa xwe ya pêşketî de dor li me girtiye. Ji xeleka hêza sermaye-zanist-polîtîk mirov çawa dikare xwe rizgar bike? Ji Nietzsche heta Michel Foucault fîlozofên azadiyê li bersiva vê pirsê geriyane û ev pirs ji wan pirsan nîne mirov karibe bersiva wê bide. Fîlozofên em behsa wan dikin, li hemberî modernîteyê hukim dane ku ‘civak hatiye xesandin’ û ‘mirov miriye’ ji lewra divê mirov van fîlozofan fêhm bike. Gelek nexweşî hene van hukmên fîlozofan piştrast dikin; kampên mirinê, bombeya atomê, şerên qirkirina etnîk, talankirina hawîrdorê, bêkariya girseyî, zêde zêde tengavbûna jiyanê, pirrbûna kansêrê û nexweşiyên mîna AIDSê. Ji lewra jî gera li heqîqeta dijber jî gelekî hewce dibe.

Divê ez careke din destnîşan bikim ku ekolên sosyalîzma zanistî, sosyal-demokrasî û rizgariya neteweyî ku saziyên mezin ên muxalif têne qebûlkirin, ji zû ve weke mezhebên modernîteyê cihê xwe diyarkirine û rola xwe rabûne. Mirov fêhm dike ku gelek lêgerînên kirasguhertî yên postmodern dibistanên fikrê yên modernîst in.

Sîstem dema digihîjin herî serî êdî destpê dikin serberjêr diçin û ji hev dikevin. Salên 1970î pêvajoya serberjêrçûyîna modernîteya kapîtalîst îfade dike. Di vê demê de di warê rêbazê de ji pêş çav dikeve û parçebûyîn dikeve rojevê. Fikra ekolojîk, ekolên femînîst, tevgerên etnîk-çandî bi vê pêvajoyê re eleqedar dike-

vin dewrê. Parçebûna rêbaza zanistî, hişt ku hebûna dinyayên din û nirxa şîroveya azad derkevin holê. Mirov dikare vê pêvajoyê weke dema kaotîk jî bi nav bike û pirr girîng e ku mirov vê demê bi têgihiştineke dewlemend qebûl bike û dîsa wê weke berxwedana komên xwedî zêhniyetên cihê yên li gorî rastiya xwe li dijî kulmozên desthilatdariyê radibin bibîne.

Dema dîrokî di warê hûnandina rêbazên cihê yên nû û heqîqetan de berdar e, bi vê tespîtê mirov dikare bibêje; îhtîmala ku civak di asta koman de ji nû ve were avakirin zêdetir e. Ji wezîfeyên rojane yên pratîk in ku utopyayên azadî û wekheviyê bi awayekî berçav di nava civakê de bêne avakirin. Ya li vir hewce dike nirxê riya mirov daye ber xwe û hêza îradeya (vîna) azadiyê ye. Em behsa wê demê dikin ku eşqa heqîqetê nêzî jiyana azad dibe. Gotina me ev e: HEQÎQET EŞQ E, EŞQ JIYANA AZAD E!

Wê wextê, hem weke rêbaz û hem jî rejîma heqîqetê em bi eşq bi pey jiyana azad nekevin, em ne karin xwe bigihîhin zanîna hewcedariya me pê heye, ne jî em dikarin pêşengên nû û dinya xwe ya civakî ava bikin. Di çarçoveya van tesewirên xwe de em ji nêz ve li mijara zanîn û pêşengiyê binêrin.

Em bi redkirina yên beriya Bacon û Descartes dest bi lêkolîn û lêgerîna xwe bikin. Piştî ku me dualîteyên obje-sûbje û ruhbeden red kirin, ji her aliyî ve li cih e ku mirov weke destpêk insên bixe bingeha dabaşê. Em ne behsa dinyayeke mirov di navendê de û ne jî behsa nêzîkatiyeke humanîst dikin. Em behsa rastiyên ku di mirov de gihiştine hev dikin.

**1-** Weke kevirê bingehîn ê maddeyê atom, hem di warê hejmarê û hem jî di warê rêzbûnê de bi awayê herî dewlemend heye û gihiştiye hev.

**2-** Mirov di cîhana biyolojîk de ji heywan û nebatan hemûyan zêdetir xwedî awantaja temsîliyetê ye.

**3-** Şêweyên herî pêşketî yên jiyana civakî ava kirine.

**4-** Cîhaneke zêhnî ya gelek nerm û azad temsîl dike.

**5-** Dikare metafizîk bijî.

Ev xislet û taybetmendiyên em behsa wan dikin; mirov dikare di zikhev de û yekpare heman demê li cem însên bibîne. Di vî warî de çavkaniyeke nedîtî ye. Bi awayekî yekpare fêhmkirina vê çavkaniyê di heman demê de fêhmkirina gerdûna pêkhatî ya tê zanîn e. Bi kêmanî xwedî wê qîmetê ye ku ji bo fêhmkirinê destpêkeke rast e.

Pêşî, weke kevirên atom jê pêkhatî têkiliyên zindî yên di navbera atoman û nava atomê de herî baş di mirov de têne teşxîskirin. Bi awayekî din, mumkîn e, mirov weke maddeyeke rêzbûyî ya difikire were tesewirkirin. Bêguman, bi vê tesewirê em mirov bi tevahî ji maddeyê pêkhatî nahesibînin û maddeyê jî ji hisa zindîtiyê bêpar nabînin. Madde li gorî xwe xwedî hisa zindîtiyê ye, mirov jî ji kombûna vê maddeyê wêdetir xwedî maneyekê ye. Bêguman bi vî awayî manedayîn hewldaneke dijwar e. Divê mirov di vê têgihiştinê de li çavkaniya metafizîkê bigere. Ji bo têgihiştinê em bi şêwazekî nerm û qayişokî yê bê sînor diponijin, heye ku ev yek ji dualîteya madde-maneyê bibuhure. Belkî jî armanca her tiştê zindî û ne zindî bihurandina ji vê dualîteyê be. Armanca maddeyê ew e ku bi mane bibe, armanca maneyê jî ew e ku ji maddeyê bibuhure. Heye ku hilma herî mirî ya eşqê mirov di vê dualîteyê de bibîne. Belkî jî dualîteya 'dehfdan-kişandin' bi xwe veguherîbe madde-maneyê. Wexta tê gotin di bingeha gerdûnê de eşq heye belkî jî mebest jê ev dualîte be. Mîna ku ev eşq di mirov de li ser hîmê herî bi hêz rûniştî be.

Ez dixwazim vê bibêjim: Li gorî min lêkolîna maddeya di mirov de rêbaza herî nêzî rastiyê ye. Wer xuya ye; li laboratûwarên modernîteyê yên bi awayekî dijwar hatine îzolekirin, mumkîn nîne mirov xwe li ser maddeyê bigihîne şîroveyeke nêzî rastiyê. Jixwe di fizîka kûantûm de têkiliya di navbera 'ya çav li ser' û 'çavdêr' de qet rê nade pîvanê. Çavdêr dikare maddeyê biguherîne, ya çav li ser jî di şert û mercên laboratûwarê de dikare xwe ji çavdêr vedize, rizgar bike. Wê wextê fêhmkirineke rast tenê bi çavdêrî û çavê hundirîn mumkîn dibe. Jixwe ji mirov çêtir labo-

ratûwar nabe. Bi vê rêbazê Demokrîtos[25] karîbû atomê keşif bike û rêbaza rast jî pirr ji mêj ve destnîşankiribû. Em nabêjin laboratûwar bê kêr e, em dibêjin; cihên prensîbên bingehîn di çavdêriya hundirîn û xweguhdarîkirinê de ye.

Em dikarin prensîba xwe hînê zêdetir xurt bikin. Bi tevahî qanûnên fizîk û kîmyayê mumkîn e, di mirov de nêzî bêqisûrê bê dîtin. Ti laboratûwara kîmya û fizîkê bi qasî di ya mirov de xwedî tevneke bi kapasîte nîne. Agahiyên fizîk û kîmyayê yên herî zêde nêzî rastiyê mirov dikare xwe di însên de bigihînê. Maneçêkirina ji têkiliya madde-enerjiyê dîsa bi şêweyeke dewlemend di mirov de heye. Ew derfet heye mirov xwe di mejiyê însên de bigihîne yekîtiya madde-enerjî-fikrê. Gelo ev yekîtiya di mirov de taybetiyeke gerdûnê ye? Tespîta me dikare me ber bi pirseke wisa mezin ve bibe.

Tê fêhmkirin ku di esasgirtina mirov de prensîba me ya yekemîn heta dawiyê xwedî potansiyela têgihiştinê ye. Ji lewra em dikarin weke prensîbeke rejîmê ya tekûz ji bo rêyeke bi esas a agahîgirtinê û çawatiya heqîqetekê bifikirin.

Ya duyemîn, em dikarin dualîteyên zindî û nezindî bi mînakên dewlemend di mirov de bibînin. Di nav zindîtiyên darî çav de ya mirov xwediyê taybetiyên herî pêşketî ye. Pêşketina zindîtiyê di mirov de derketiye asta herî jor. Bi vê re beşê maddeyê jî bi pêşketina zindîtiyê di zikhev de û pêre gihiştiye asteke pêşketî. Bi serûberiya di maddeya mejî de û pêşketina di zindîtiya wî de hînê jî tijî sirr e. Zanist der barê mejî de xwedî agahiyên gelekî bi sînor in. Di mejî de têkiliyên di navbera qabîliyeta maddeyê ya nîzamî û zindîtiya qabîliyeta fikra mucered de bi dest xistiye, hînê jî weke pirsgirêkeke mezin a keşfê li pêşiya me radiwest e. Em wexta behsa dewlemendiya mînakan dikin em behsa vî organê muhteşem dikin. Her weha di serî de dil, organên din ên bedenê bi serê xwe mûcîze ne. Ez he-

[25]Demokrîtos: Berî Zayînê di salên 460-370 de jiyaye. Materyalîstê herî mezin ê serdema antîk e. Li gorî wî rastî tenê atom û valahî ye. Li gorî wî ruh jî weke her tiştî ji atoman pêk tê. Bi tevahî xweza ji atoman pêk tê.

ma yekser vê bibêjim; organên mirov ew çend kompleks in, nabe ku mirov ji lêkolînên tibbî re bihêle. Bi yekîtiya tevahiya zanistan hêja ye, lêkolînên hînê baştir bêne kirin. Dualîteya ruh-beden a mirov di qada psîkolojî û tibbê de hiştin cehaleteke mezin e, û heta bi qasî qetlê gunehekî mezin e.

Di mînaka mirov de çavdêriya em li ser têkiliya zindî-nezindî bikin, divê mijarê bi hinek feraziyan rave bikin. Beriya her tiştî divê em qabîliyeta zindîtiyê weke potansiyelê di maddeyê de qebûl bikin. Eger ev qabiliyet nebûya, tevna maddî ya di mirov de wê bi zindîtiya fikir û his a ku jê gelekî pêşketîtir e, nikarîbûya hevalbendiye bike. Eger wisa be, em çawa dikarin bi têgihiştineke xurttir di maddeyê de xwe bigihînin potansiyela zindîtiyê? Bersiva yekemîn, divê dualîteya 'dehfdan-kişandin' li serê têgîna zindîtiya potansiyel bê danîn. Ev prensîba xweser a di gerdûnê de tê dîtin, dibe ku manedar be, mirov wê weke potansiyela zindîtiyê şîrove bike. Ya duyemîn jî bi vê prensîbê ve girêdayî karektera pêlê ya bi perçikan ve em dikarin nîşan bidin. Em dikarin li vê dualîte û prensîba di gerdûnê de hebûn-valatiyê zêde bikin. Mirov nikare li hebûneke bê valatî, valatiyeke bê hebûn bifikire. Eger em zorê bidin sînorên fikra xwe, ya rastî wexta mirov ji dualîteya hebûn-valatiyê bibuhure wê herdu jî ji holê rabin. Em dikarin çi navî li pêkhatina nû bikin? Ha ev jî pirsa duyemîn a mezin e. Hinek weke hînbûne dikarin yekser bersiv bidin û bibêjin; 'xwedê' ye. Lê eger em di vê mijarê de nelezînin dibe ku em bigihîjin fikrên manedartir. Belkî jî em ê karibin bigihîjin maneya sirra jiyanê û bersiva wê.

Weke tê zanîn ji bo dehfdan û kişandinê karekterê pêlê yê perçik hewce dike. Karektera perçik a di her teyisandina pêlekê de heye, sedema hejmara leza di saniyê de 300.000 km ye. Jixwe têgihiştina 'kunên reş' yên rohniyê dadiqurtînin jî rewşa esrarengîn zêdetir giran dikin. Piştî ku hêza lezê ya tîrêjê hat daqurtandin rastiya mirov bigihîjiyê çi ye? Yek ji pirsên zor jî ev e. Eger em ji kunên reş re giravên enerjiya xam bibêjin, em ê ji enerjiya diteyise re çi bibêjin? Gelo gerdûn ji kuneke reş a ji du-

alîteya madde-kun pêk tê? Gelo di vê rewşê de madde ew e ku ya ne madde ye xwe nîşan dide û dike bê dîtin? Eger wisa be, gelo em nikarin vê gerdûna xwe dide dîtin, weke zindiyeke mezin bibînin? Gelo di jiyanê de dualîte hemû vê dualîteya gerdûnê bi bîr dixînin? Mînak hezkirin-nefret, qencî-xirabî, xweşikî-krêtî, rast-çewt dibe ku ev xwe nîşandana vê gerdûnê bin? Mirov dikare pirsan bêserûbin bike. Lê eger em bi pirsên zanista em pêre dilebikin û nas dikin mijûl bibin, dibe ku hînê zêdetir me hîn bikin û bi kêr bên.

Bi delîlan piştrast bûye madde enerjiya şidiyayî ya ketiye serhev e. Hevkêşeya navdar a Einstein tê zanîn. Tê gotin di navbera mirovê mirî û mirovê zindî de ferqa giraniya enerjiyê ya 18 gram heye. Gelo di rewşeke welê de zindîtî dibe sîstemeke taybet a herikîna enerjiyê? Wexta ev enerjî derdikeve û vala dibe, gelo hebûna xwe diparêze? Hingî gelo ruhparêziya di baweriya anîmîzmê de nayê piştrastkirin yan jî qet nebe nayê wê maneyê ku divê ev bawerî li ber çavan were girtin? Gelo ma nabe ku mirov têgihiştina dibêje; 'gerdûn tijî ruh in' yan jî peyva Hegel[26] a 'mejiyê gerdûnê' (Geist) weke 'enerjî ruhê maddeyê yê zindîtiyê ye' binirxîne û weke têgihiştin, hiskirin û şîroveyeke ciddî li ber çav bigire?

Em dikarin pirsên bi vî rengî hînê zêdetir bikin. Ya girîng ew e, em ê têkiliya zindî û nezindîtiyê, ne bi dogmatîzma metafizîk a serdema navîn şîrove bikin, ne jî bi cihêkirina obje-sûbje, ruh-beden a modernîteya kapîtalîst nêzî heqîqetê bibin. Ne prensîba hêza afirîner a ji derve can dide, ne jî dualîteya madde-ruh a ji mêj ve di gerdûnê de heye dikarin têgihiştina me ya dewlemend a jiyanê rave bikin. Pirsên me kirin û mînakên me dan, nîşan didin û rave dikin ka em çiqasî li ser dewlemendiya di mirov de biponijin, em ê hêza xwe ya çavdêrî û lêkolînê xurt bikin, zindî

[26]Hegel: (George Vilhelm Friedrich 1770-1831) Bi giştî îdealîzm û bi taybetî jî nûnerekî mezin ê îdealîzma Elman e. Li gorî vê yekê, piştî Kant fîlozofê herî mezin ê îdealîzma Elman e. Di dîroka felsefeyê de cihê girîng ê Hegel ew e ku yekem car rêbaza diyalektîkê weke sîstemekê bi rêkûpêk kiriye.

û zindîtî jî di navê de şensa me wê hebe em bûyeran hemûyan (bûyerên mucîzewî jî di navê de) fêhm bikin.

Divê mirov bawer bike ku di gerdûnê de prensîbeke edalet û dadê heye. Ti pêkhatin bêyî şertên xwe û ravekirina xwe dernakeve holê. Xweza, di pêkanîn û çêkirinê de ji dîtina me wêdetir bi edalet e. Ji qabîliyetên me yên çavdêriyê yên şaşkirî û berevajîkirî divê mirov civaka şaristaniyê berpirsiyar bibîne, belkî bi vê tespîtê şîroveya me li cih be. Çêbûna mirov jî pêşketineke adil e ku pêk hatiye. Mirov dikare bibêje; bi tevahî nîzama gerdûnî, cîhana biyolojîk û pêkhatinên civakî di xizmeta hebûna mirov de ne. Ma ji vê mezintir edalet dibe? Eger dewlet û hiyarerşiya mezin a di civakê de ev rastî berevajîkiribin û ser van rastiyan girtibin, divê mirov weke berpirsiyarê vê jî dîsa van hêzên mirov ên berevajîkar bibîne. Hingî jî mirovên li pey edaletê diçin wê bi xwe wezîfedar bin. Ji bo edaletê yê/ya her cure mane û çalakiyê bike dîsa mirov e. Bêguman mirovên bibêjin 'ez li edaletê digerim' ew kes in ku divê daxwazkar bin, pêdiviyan bi awayekî manedar, çalak, rêxistinkirî û bi dewamî bi cih bînin.

Di cîhana biyolojîk de nirxandina pirr texlîdî û qonaxên beridandinê di nav perspektîfa me ya sereke de mumkîn xuya dike û hêsan dibe. Mirov bi saya derbasbûyîna di navbera molekulên zindî û nezindî de, dikare fêhm bike ka çawa nebat ber bi heywanbûnê ve beridîne. Zanist di van mijaran de têra xwe pêşde çûye. Tevî kêmasiyan û pirsên bêbersiv mane, em gihiştine dewlemendiyeke mezin a maneyê. Gerdûna nebatan bi serê xwe mûcîzeyek e. Ji kevzeke seretayî ber bi dareke mêweyan a nedîtî, ji mêrgan ber bi gulên bi stirî beridîn hêza qabîliyeta zindîtiyê nîşan dide. Jixwe delalbûna gulê û di asta xweşikbûna wê de bi stiriyan xweparastina wê, ji kesê herî korfêhm re jî dikare hinek tiştan bibêje. Aliyê herî balkêş ê beridandinê ew e ku qonaxa paşî qonaxa pêşî di xwe de dihewîne û weke parçe û endamekî dewlemendiyê diparêze. Nebata herî dawî û paşî wekî ku xulaseya tevahiya nebatan be, bi rola 'dayikê' radibe û hebûna xwe dewam dike. Weke ku tê zenkirin, di beridandinê de (Dogmatîz-

ma Darwînîzmê) zindî hevdu tine nakin, dewlemend dikin, zêde dikin û hebûna xwe dewam dikin. Ji texlîdekî gelek texlîd, ji kevza seretayî ber bi cûrbecûriyeke bêserûbinî pêşketinek heye. Divê mirov pirrtexlîdî û cûrbecûriyê weke ziman û jiyana nebatan fêhm bike. Ew jî xwedî malbat, xizm û heta carinan xwedî dijmin in. Ji lewra her texlîd û cins weke prensîb xwedî pergaleke parastinê ye. Hema bêjin; ti hebûn ji parastinê bêpar nîne.

Taybetmendiyeke din a ku divê mirov çavdêrî wê be jî zêdebûna bi cins û bê cins e. Zêdebûna bê cins yek ji şêwazên zêde kevin ê zêdebûnê îfade dike, zêdebûna bi cins jî bi cotbûnê zêdebûna texlîda cinsên cihêwaz îfade dike. Nêrtî û mêtiya di yek endamê komekê de ji qonaxên derbasbûnê heta îro mane. Ji bo pirrbûn û cihêwazbûna texlîdan divê cinsiyet di komên cihê de temsîla xwe bibînin. Mêtî û nêrtî bi komên cihê ji hev nebin, nikarin xwe bigihînin curbecuriyê. Li vir em harîqayeke xwezayê re rûbirû ne. Zewacên xizman weke dewama vê nêrtî û mêtiya di komê de cih digirin. Di cotbûna van zewacan de em pirrî caran dibînin cins xwe li hev radikişînin, texlîdên bi felç derdikevin holê û ev yek jî weke encameke vê beridandin[27] û tekamulê ye. Cihêbûna cins weke nêr û mê, di tevahiya gerdûnê de weke pîvaneke pêşketinê li ser hîmê nakokiyeke erênî, bi cihêbûnê (em jêre dikarin bibêjin diyalektîka pozîtîf jî) pêşketina xwe dewam dike. Pirr eşkere ye ku israra 'weke xwe mayînê' înkara pêşketinê ye. Baş tê fêhmkirin ku her gera li heqîqetê ya mutleq (fikra metafizîk) ku bi prensîba 'her weke xwe ye' radibe, jê nayê gerdûnê şîrove bike.

Pirsgirêke din a divê em balê bikişînin ser jî ew e, ka çima gerdûn dixwaze pêş bikeve? Bi awayekî rasttir, gelo taybetiya pêşketinê ya gerdûnê bi xwe delîlê zindîtiya wê nîne? Tiştekî qabîliyeta xwe ya zindîtiyê tinebe, ma dikare pêş bikeve? Cîhana biyolojîk bersivdana vê pirsê hêsan dike. Ji bo pêşketina biyolojîk pirseke din a girîng der barê îstîsnabûna 'dinya' me de ye. Bi qa-

[27]Beridandin: (evrim) evolution. Di pêşgotinê de ev gotin hatiye ravekirin.

sî ku em dizanin û haya me jê heye, tê gotin, di gerdûnê de stêrkeke zindîtî lê hebe, nehatiye dîtin. Ev nêzîkatî bi xwe gelekî bi pirs e. Berê pêşî divê em bi bîr bixin ku ji bo tespîtkirina tevahiya stêrkan, kapasîteya mirov gelekî bi sînor e. Pêşî (kelmêş) çiqasî karibe dinyayê şîrove bike, mirov jî gerdûnê ewqasî dikare (belkî) şîrove bike. Gotina 'mirov dikare her tiştî zanibe' îdîayeke fikra metafizîkê ya ji wesweseya wê ye. Ev, helwestek e, dişibe afirandina xwedê.

Ji bo mirov pêkhatina di gerdûnê de qewimiye rave bike, bi hejmaran anîna wê ya ziman û di nava hejmaran de fetisandina wê zêde bi kêr nayê û wê rave nake. Jixwe ji bo serwextbûna li hikmetên dinyayê, hînê em li destpêkê ne. Ji niha ve diyar jî nîne serwextbûn û têgihiştin ê me rastî çi bîne. Pirrî caran tê gotin 'Her zindiyek gerdûnek xwe heye' pêwîst e, mirov vê têgihiştinê piştguh neke. Dîsa mirov pêre gerdûnên din jî bifikire, dibe ku hin aliyên din rave bike. Eger em mînakeke weha bidin, em ê baştir karibin qala mebesta xwe bikin: di bedena mirov de her şaneya zindî li gorî xwe hebûnek e, û heta di şaneyên mejî de fikir çêdibe. Ma hucre û şaneyên bi vê xisletê dikarin bibêjin, bi qasî ku em difikirin, gerdûn heye? Li aliyekî din, ev şane haya wan ji mirov û gerdûna mezin a li dewrûbera mirov nîne. Lê ev rewşa em behsa wê dikin, hebûna mirov û gerdûnên mîkro-makro ji holê ranake. Gelo nabe ku em mirov jî weke şaneyekê di vê gerdûna makro de qebûl bikin? Eger em bi hêsayî wêribin vê bikin, em dikarin ji aliyê cuda ve hukim li hebûna gerdûnan bikin. Mebesta me ji gerdûnên bi hev re ew e; eger her gerdûn girêdayî qonaxekê (sefheyekê) û pîvana pêlekê be, eger wisa tê şîrovekirin, hingî mumkîn e ku bi qasî neyê jimartin gerdûn hebin. Sîstema pêlê ya mirov jî zaye bi tenê yek ji van qonaxan e.

Bi van vegotinan mebesta me spekulasyon nînin. Em dixwazin ji fikra teng xwe xilas bikin. Em dixwazin ji xefika berevajîkirina bawerî û zanînê ya nîzama dewletê û hiyarerşiyê rizgar bibin. Pirraniya nexweşiyên rêbazê berhemên wan in. Dîsa van

mekanîzmayên dewlet û hiyarerşiyê ku weke mekîneya derewan û çeloxwarîkirinê dixebitin, gelek fikrên rast jî tine kirine.

Cîhana heywanan bi serê xwe sîstemek e. Di destpêkê de cinsê ku şaneya hevbeş a heywan û nebatan temsîl dike, derketiye holê. Jixwe bi çavdêriyeke baldarî wê bê dîtin ku bêyî cîhana nebatan wê derbasbûna cîhana heywanan nebe. Jiyana nebatî şertê pêş ê jiyana heywanan e. Ya girîngtir jî hebûneke pêşketî ya nebatan şertê hebûneke pêşketî ya heywanan e. Zindîtiya potansiyel di cîhana heywanan de rê vedike li hisên pêşketî yên weke dîtin, bihîstin, êş, xwestek, hêrs û hezkirinê. Ji ber ku timî li pey xwarinê baz dide, hewce dike ku mirov birçîbûnê ji nêz ve hûrûkûr lêbikole. Bi hêsayî mirov dikare têkiliya bêparbûna ji enerjiyê bi birçîbûnê re deyne. Careke din têkiliya di navbera zindîtî û enerjiyê de derdikeve pêşiya me. Bi dawîhatina li birçîbûnê re ya ku diqewime ew e; enerjiya hewcedarî pê heye rezerv bûye û hatiye hilgirtin.

Pêdiviya bi têkiliya cinsî jî hewce ye, ji nêz ve were lêkolîn. Ev pêdiviya xwe dijwar û bi arezû dide hiskirin, fonksiyonek e, dewamkirina jiyanê îfade dike. Zêdebûn û kombûna enerjiyê di pêkhatina têkiliya cinsî de dîsa têkiliya wê ya bi jiyanê re têne bîra mirovan. Lê divê mirov têkiliyên cinsî weke yekane sedema bi tenê ya ji bo dewamkirina jiyanê nefikire. Belkî jî yek ji rastiya pêşneketî ya ji bo dewamkirina jiyanê rêya bi têkiliya cinsî ye. Bi vê riyê, mirov tenê li gorî hejmarê jiyana xwe dewam dike.

Curbicurî û beridandin di jiyanê de rê li ber dewlemendiyê vedikin. Wekî din, têkiliya cinsî ne tenê xwesteka jiyanê û dewamkirina wê ye, tirsa ji mirinê, ya rastî mirinê bi xwe di nava xwe de hildigire. Her têkiliya cinsî hinekî jî mirin e. Hin heywan hene piştî têkiliya cinsî yekser dimirin. Wê wextê mirov dikare bibêje; zêde girêdana bi têkiliya cinsî ve pêkhatina mirinê û rewşa jiyanê ya herî paşketî bi bîr dixe. Bi tenê mirov bikeve ber destê têkiliya cinsî, ev rêya mirinê xurt dike. Têkiliya cinsî çendîn wergere hisên hezkirin û xweşikbûnê,

çendîn bê jiyan, ew çend mirov nêzî bê miriniyê dibe. Di berhemên hunerî de hisa bê miriniyê encama vê yekê ye. Zêdebûna bi rêya cinsî, em dikarin weke şêwazekî parastinê şîrove bikin. Tu çendîn zêde bibî, tu dikarî his bikî ku tu heyî, tu yê dewam bikî û xwe biparêzî.

Em ê di civaka insên de hînê ji nêz ve li mijara têkiliya cinsî û zêdebûnê binêrin. Çewtiyeke gelekî mezin e ku mirov zewqa di çalakiya cinsî de weke 'eşqê' bi nav bike. Berevajî, zewqa girêdayî têkiliya cinsî înkara eşqê ye. Modernîteya kapîtalîst seksualîte weke kansêrekê mezin kiriye û ev yek jî bi navê eşqê kuştina civakê ye. Eşqa rastî, ew heyecan e, ji zimanê pêkhatina gerdûnê tê hiskirin. Gotina mewlana ya dibêje; 'Di vê alemê de çi heye eşq e, jê pêve tev qal û qîl e' dibe ku bibe şîroveyeke heqîqî ya eşqê. Kengî mirov karîbû ji zewqa têkiliya cinsî bihurî wê karibe behsa eşqê bike, ya rastî girêdayî dualî pêşketina asta azadiyê ya di exlaqê mirov de ye. Di warê maddî de, têkiliya şehweta cinsî bi bêtevgerî û jidestdana azadiyê re heye. Ya rast ew e ku ne tenê têkiliya di navbera jin û mêr de eşqa di navbera hêmanên tevahiya gerdûnê de divê mirov bi ahenga pêkhatinê ya eşqê ve girê bide.

Pêşketina his û hestan bi serê xwe mûcîze ye. Mînak divê em dîtinê çawa şîrove bikin? Ji sedî sed diyar e ku dîtin yek ji hêmanê herî pêşketî yê zindîtiyê ye. Dîsa eşkere ye ku bêyî rohniyê mirov nikare bibîne. Dîtin şêwazekî fikrê ye. Di serî de seksualîte, girîng e ku mirov bi tevahî taybetmendiyên zindîtiyê weke awayekî fikrê bibîne. Zindîtî bi xwe qabîliyeteke têgihiştin û hînbûnê ye. Di vê çarçoveyê de gotina Descartes a 'Ez difikirim, wê wextê ez heme' li cih e. Eger em hînê bi giştî bînin ziman: em dikarin bibêjin, tevgera gerdûnê ya bi pîvan û rêzikan, hînbûn e. Rêzik û pîvan hînbûnê bi bîr dixînin. Lê dîsa jî hînbûna bi çavan pêşketineke muhteşem e. Ev gotin têne fêhmkirin: 'Xwedê ji bo xwe bibîne gerdûn afirand.' Hukmê Hegel ê ji bo hay ji xwe hebûnê 'Geist' dibe madde têkildarî dîtinê ye. Dibe ku dîtin yek ji armancên pêkhatinê be.

Zewq û hisên êşê xwe weke zindîtiya havyan didin hiskirin. Herdu his jî hayjêbûna ji jiyanê bi bîr dixînin. Herçiqas bi zewq bibe ewqasî haya xwe ji jiyanê dibe, jiyanê qebûl dike; dîsa çiqasî êşê bikişîne ewçend haya xwe ji jiyanê dibe, lê derdê jiyanê nayê kişandin û dewamkirin. Herdu jî ji bo hînbûnê du dibistanên baş in. Zewq û êş ji bo hînbûnê gelekî giranbuha ne. Zewq mirov baş hîn dike, lê dikare rê li ber her dînîtiyê veke. Dîsa êş mirov baş hîn dike, ji lewra jî pirr bi hêz dike ku mirov qedir û qîmetê bide jiyanê. Dawiya zewqê nêzî êşkişandinê ye, lê di dawiya êşê de şensê jiyaneke bi zewq gelekî zêde ye. Jiyan ji bo cihêtiyên di navbera xwe de nîşan bidin, xwe pirr bi zewq û bi pirr êşkişandinê hîn dikin û datînin holê.

Ji ber ku têkiliya di navbera jiyan û mirinê de têra xwe xwedî karektereke metafizîk e, ya rast ew e ku mirov vê yekê di mijara civaka insên de bigire dest û li ser raweste. Di dabaşa heywanan de yek ji xusûsên divê mirov li ser raweste mijara goştxwarinê ye. Cîhana heywanan bi tevahî xwe bi nebatan xwedî dike û wisa jiyana xwe dewam dike. Goştxwarin hewcedarî û pêdiviyeke nebenabe nîne. Lê komeke mezin a goştxwiran heye. Divê em van çawa rave bikin? Pirr zêdebûn gefan li jiyanê dixwe û ev xusûs dikare bibe hêmanek ji bo em mijarê ji hev derxînin. Bi têkiliya cinsî zêdebûn rêyeke dewama cinsan misoger dike, lê wexta ev zêdebûn sînorê xwe derbas bike, dikare derfet û îmkanên jiyanê tine bike. Mînak bi lez zêdebûna mişkan dikare nebatan tine bike. Heywanên mîna pez û dewaran jî dikarin qira nebatan bînin. Her weha di cîhana çivîkan de zêdebûneke bê tewazun heye. Di rewşeke welê de jî mar, şêr û baz li ser kar in, ev jî bi armanca tinekirinê nîne, ji bo cîhana heywanan hebûna xwe dewam bike weke mecbûriyetekê derdikeve holê. Heye ku bi tehlûke be, mirov vê dabeşbûna rolan a di xwezayê de bê edaletî bibîne. Lê di vir de wezneke nazik heye. Kengî ev wezin hat xirakirin û naverast tijî mar, şêr û baz bibin, hingî li dawiyê wê kêm heywan bimînin. Xwe bi serûberkirina sîstemên xwezayî tiştekî gelekî balkêş e.

Em ê li ser zêdebûna bi têkiliya cinsî, girîngiya bi serûberkirina wê di civaka mirov de, cihê wê di dewamkirina jiyanê de û têkiliya wê bi exlaq, bi awayekî berfireh binirxînin. Eger em mirov weke hêmanê bingehîn ê mijara xwe destnîşan bikin û ji nû ve li têkiliya wî ya bi cîhana biyolojîk re vegerin, em ê karibin bibînin ku bi tevahî xisletên jiyanê di mirov de xulase hene. Bi tevahî xislet û taybetmendiyên jiyanê yên em ji heywan û nebatan dizanin, em dikarin li cem mirov bibînin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku mirov hem armanca pêşketina cîhana heywan û nebata ne, hem jî warisê wan e. Ruhberekî di ser mirov re belkî mirov weke feraziyekê bifikire. Jixwe di mirov de qabîliyeta mezin a fikrê belkî jî dike ku pêkhatineke nû, hewce neke. Qabîliyeta fikir û hînbûnê ku xisleteke bingehîn a zindiyan e, weke pêşketineke mejî li asta herî jor e. Xwenaskirina gerdûnê bi mirov dibe. Ayeta di Pirtûka Pîroz de dibêje; 'Ji bo bême naskirin min insan afirand' belkî jî bi vê maneyê ye.

Bêguman mirov ketina serhev a zindîtiya heywan û nebatan hemûyan e, berevajiyê wê ne rast e; ango hûn bi tevahî heywan û nebatan bidin serhev nakin mirovek. Di vir de hewce dike ku em mirov weke cîhaneke cihê bigirin dest û li ser rawestin. Mebesta me ew nîne ku em bi têgihiştina gerdûnê ya 'navend-mirov' rabin. Ez qala panteizmê (yekîtiya xwezaxweda) jî nakim. Ez hewce dibînim ku ferqa mirov weke cinsekî xweser rave bikim. Mirov ewçend girîng e ku hewce ye bi awayekî cihê were nirxandin.

Ya sêyemîn, wê wextê girîng e ku em bibêjin; mirov di civakeke xweser de xwe pêkaniye û ji bo rejîm û lêgerîna heqîqetê rêbazeke manedar e, û hêja ye, em wî weke cins bikin mijara xwe.

Qutbûna mirov ji 'prîmatan' di warê qonaxên pêşketinê yên cinsan de ji bo mijara me girîng nîne. Bêguman hem di cîhana heywanan û hem jî di cîhana nebatan de gelek mînakên bihevrebûnê yên dişibin kom û civakan hene. Gelek cure û texlîd, heta kom hene, neçar in li gorî xwezaya xwe bi hev re bijîn.

Dar bê daristan, masî bê col nabin. Lê civaka mirov jî weke wî xwedî xislet û taybetmendiyên cihêwaz e. Belkî jî civak bi xwe mirovê herî payeberz û bilind e. Yan jî civak ew organîzasyon e ku mirovê jor û bilind afirandiye, wê biafirîne. Eger em mirov ji nava civakê biavêjin nava daristanê, ew ê nikaribe xwe ji prîmatbûnê xilas bike. Wexta em çend mirovên din wekî wî/wê bidin cem, ya dest pê bike, wê pêvajoyeke mîna li cem prîmatan destpê bike. Heman tişt ji bo cîhana heywanan nabe. Ev rewş bi xwe jî nîşan dide ku qîmeta civaka mirov gelekî cihê ye. Rola avakirina mirov a civakê û avakirina civakê ya mirov jî bûyereke bêhemta ye.

Bêguman mirov nebe, civak jî nabe. Lê mirov eger civakê bi tenê ji koma mirovan bihesibîne şaşiyeke girîng e. Civaka bê insan ji prîmatan wêdetir nikare bibe tiştek. Civaka bi insan dibe xwedî hêzeke mezin. Xwe digihîne hêzeke mezin a fikrê. Belkî jî biryara mirovekî (teqandina bombeyên nukleerî) wê karibe dinyayê hemûyî wergerîne çolekê. Ev insan dikare derkeve ezmanan. Dikare vedîtin û keşfên bê sînor bike. Em ji bo hêza civatbûnê nîşan bidin van mînakan didin. Herçend avakirina civakê mijara 'sosyolojiyê' be jî ya em dixwazin ji hev derxînin û analîz bikin tiştekî din e. Avakirina rejîma heqîqetê û xwegihandina zanînê, wer xuya ye; bê civak nabe. Her tiştê li cem ferdekî diqewime divê civakî be. Em li vir tenê behsa heywan û nebatan, û heta qala ew mirov ê warisekî gerdûna kîmyewî û fizîkî ye, nakin. Em behsa wî mirovê ku bi civakê çêdibe dikin.

Modernîteya kapîtalîst jî di navê de, sîstemên şaristaniyê hemûyan mirov ji dîrok û civakê qut girtin dest û lêkolan. Ya rastî, pêkhatin û fikir, û her çi tiştê der barê mirov de ji dîrok û civakê qut, weke berhema ferdên jor-civakê hatin destnîşankirin. Ji vir jî qralên tazî û li piştperdeyê, xwedayên bi maske û bê maske hatin vedîtin. Jixwe wexta em têgihiştina xwe ya der barê civakê de hûrûkûr bikin, em ê karibin van xweda û qralan hemûyan analîz bikin, û nîşan bidin ku ji kîjan fikrê tên, fikra wan ji kîjan pêkhatinên civakî derketiye, û bi taybe-

tî jî em ê destnîşan bikin ka çavkaniya wan çawa sîstemên civakê yên zordarî û mêtingeriyê ne.

Yek ji pirsgirêka bingehîn a rêbazê ye ku têkiliya civak-mirov manedar nîşan bide. Bacon û Descartes ku xwe gelekî zanistî dihesibînin, wexta pirsgirêkên xwe yên rêbazê guftûgo dikin, wer xuya dike ku haya wan ji civaka di navê de ne nîne. Em îro baş dizanin ku civaka ew ketine bin tesîra wê, sîstema dinyayê ya bi navê kapîtalîzmê ava kiriye. Li ser navê vê civakê îro welatên mîna Hollanda û Ingilîstanê hene. Rêbazên ava kirine, ji wan fikrên civakê ne, derî heta ser piştê (heta dawî) li kapîtalîzmê vedikin.

Wê wextê, eger em civaka mirov weke kategoriyeke bingehîn bigirin dest, em dikarin çi lêbikolin?

**a-** Civak pêkhatineke bi xisletên xwe mirov ji heywên vediqetîne ye. Me ev xusûs têra xwe rave kir.

**b-** Çawa ku civak ji aliyê mirovan tê avakirin, civak jî ferdên mirovan ava dike, çê dike. Di vir de xusûsa bingehîn a divê were fêhmkirin ew e ku civak an jî kom bi destê mirov, bi qabîliyeta wî hatine avakirin. Civak pêkhatineke jor-mirov nîne. Ji ber ku bi kûrahî di bîr û hafizeya mirov de cih girtine, Herçend ji totem heta xwedê weke nasnameyekê xwe nîşan bidin jî di encamê de eşkere ew bi destê mirov hatine hûnandin. Eger insan tine be, civakeke totem û xweda dewam bike tine.

**c-** Civak ji aliyê dîrok û mekan ve bi sînor in. Bi gotineke din, dema civak têne avakirin zemanekî wan û şertên wan ên cografîk hene. Avakirina civakan ji dîrok û cografyayê qut tineye. Utopyayên civakan bê zeman û di her şertî de xeyalên tewş in.

Mijara dîrokê, ji bo zindiyan bi giştî, ji bo mirovan bi taybetî zemanê ew pêve ne, îfade dike. Di serî de demsal gelek dem û dewran di pêkhatina cinsan de zarûrî ne. Jixwe ti pêkhatin tineye, dema xwe nebe. Tê fêhmkirin ku têgîna 'ebed-ezel' jî bi taybetî tenê ji bo 'guhertinê' ye. Ango ya naguhere û ya tenê bê zeman e, guhertin bi xwe ye. Têkiliya dîroka bi civakê hînê zêde û dem kin e. Ji bo gerdûnê behsa mîlyaran salan tê kirin, lê ji bo

civakan wexta behsa hezaran salan hat kirin, belkî têgîna demeke dirêj were bi karanîn. Demên zêde ji bo zeman têne bi karanîn, roj, meh, sal û sedsal in. Mekanê civakan jî bêtir têkiliya xwe bi hebûna heywan û nebatan re heye. Li herêma qutban û ekvatorê civak îstîsnaî hene. Dewlemendiya heywan û nebatan li herêmekê dikare ji bo civakan jî zemînekî baş çêke.

Gelek dînan û ekolên fikrê yên di nava rêûresma dewlet û hîyarerşiyê de avabûn, sîstemeke ji mekan û dîroka civakî qut, hewldan weke çarenûsekê li ser zêhnê mirov ferz bikin. Çawa ku tê îdîakirin; hin qehremanan dîrok ava kirine, hin şîretkarên dînî û fikran jî sîstemên dîn û fikrê yên ji civakê qut ava kirine. Fikra kapîtalîst gelekî cih dide zanistê, lê tevî vê jî nemaze der barê civakê de fikra xwe dispêre ferd bi taybetî esas digire. Kîjan sîstema fikrê ya felsefî û dînî rê li ber çêbûn û şikilgirtina civakê vekiriye timî di tariyê de tê hiştin. Têra xwe îspat bûye; çawa ku zeman û mekanê civakê ferd ava dike, bi taybetî ferdên bi formasyonekê rabûne jî di şikildana siberojê de roleke avakirinê bi cih tînin. Ji lewra jî pirsgirêkên rêbazê û têgihiştina li heqîqetê, hêmanên dîrokî û mekanî weke şertên sereke ferz dikin.

**d-** Yek ji xusûsên girîng jî ew e ku rastiyên civakî di karekterê avabûnê de ne. Pirrî caran mirov pê dixapin ku saziyên civakî û pêkhatinên wan rastiyên xwezayî dibînin. Rejîmên rewakirinê yên sîstemên civakî xwe weke wê hîç neguherin û pîroz in, pêşkêş dikin. Pirr bi rêkûpêk weaz dikin ku xwediyê saziyên xwedayî ne, û wer hatine wezîfedarkirin. Di modernîteya kapîtalîst û civakê de gotina dawî tê gotin, saziyên lîberal îdîa dikin ku alternatîfa wan nîne, û heta hewl didin enjekte bikin ku ‘dawiya dîrokê’ ye. Tim û tim behsa destûrên bingehîn û rejîmên siyasî yên naguherin û nayên guhertin dikin. Herhal em dikarin bi dîrokçeyeke kin bibînin ku ev pêkhatinên naguherin û nahejin, temenê wan bi tevahî sedsalek jî nîne. Di vir de ya girîng ew e ku mirov bibîne çawa bi gotinên siyasî û îdeolojîk rojane fikir û îradeya mirov girê didin. Kulmozên îstîsmar û desthilatdariyê

gelekî hewcedariya xwe bi vê retorîka siyasî û îdeolojîk heye. Bêyî retorîkeke xurt a îdeolojîk û siyasî rêvebirina civakên îro gelekî zehmet e. Ji ber vê yekê, organên medyayê gelekî pêşdebirine û xurt kirine. Dîsa pirraniya saziyên fikr û zanistê bi kulmozên îstîsmar û desthilatdariyê ve hatine girêdan.

Em çiqasî karibin fêhm bikin ku rastiyên civakî ew rastî ne ku tim û tim hatine avakirin, em ê ewqasî jî karibin hukim bikin ku ji nû ve avakirin û xirakirina wan hewcedariyek e. Rastiyên civakî yên naguherin û nayên xirakirin nînin. Jixwe xirakirin û dejenerekirina saziyên zordar û mêtinger yek ji şertê jiyana azad e ku jê nayê gerîn. Em wexta dibêjin; rastiya civakî, mebesta me bi tevahî sazîyên maddî û îdeolojîk ên civakê ne. Ji ziman heta dîn, ji mîtolojiyê heta zanistê, ji ekonomiyê heta siyasetê, ji huqûqê heta hunerê, ji exlaq heta felsefeyê di qadên civakê hemûyan de rastiyên civakî timî di şert û mercên munasib ên zeman û mekan de têne avakirin, xirakirin, restorekirin û yên nû têne pêkanîn.

**e-** Girîng e ku mirov bi awayekî sûbjektîf li têkiliya ferd û civakê nenêre. Ferdên di nav dîrokê de şikil girtine, beşdarî tevahiya qadên civakî dibin yên ku zimanekî xwe yê diyar û rêûresmên xwe hene û me ew qadên behskirî jimartibûn. Ne weke ku ew dixwazin û li gorî dilê xwe beşdar dibin, li gorî rêûresm û saziyên civakê berê û bi nazenînî amade kirine beşdar dibin. Ji civakîbûna ferd re hewldaneke mezin a hînbûnê divê. Ango kengî ferd çanda rabirdûyê ya civakê dawerivand hinavê xwe, wê demê dikare bibe endam û mensûbê wê. Ji bo mirov bibe civakî, timî hewcedarî bi hewldanekê heye. Her çalakiya civakî di heman demê de çalakiyeke civakbûnê ye. Ji lewra ferd, ne ku weke dixwazin, li gorî civak dixwaze ava dibin û nikarin xwe ji vê yekê xilas bikin. Ji ber ku civakên li mêtingerî û zordariyê vekirî bêguman civakên hîyarerşîk û çînî ne, daxwaza azadî û berxwedanê ya ferd jî wê her hebe. Ferd wê civakîbûnên bi koletiyê têne avakirin ti carî bi riza xwe qebûl neke. Dîsa wê qebûl neke ku bi civakên mêtinger, biyanî û cu-

da re bibe yek û wê li dijî asîmîlasyonê jî li ber xwe bide. Lê dîsa jî wê hewl bidin ferd di nava çerxên saziyên perwerdê û zordariyê yên civakê de bihelînin û heta tine bikin. Çerxên civakî wê mîna aş, bihêrin û li gorî xwe ji ar û hevîr amûran çêkin. Çi nakokiyên navbera saziyan, çi jî mirovê li ber xwe dide wê her tim di nav civakê de li gorî mêzînan li hev bikin û cihekî bigirin. Ne hêza civakê ya mutleq a helandinê heye, ne jî ferd şensê xwe heye bi tevahî ji civakê qut bibe.

Xulase, mirov dikare civakê bi helwesteke nêzî rastiyê li ser mînaka insan bi xebatekê, bi rêbaz û rejîmên heqîqetê bigire dest û bigihîje encamên manedar.

Ya çaremîn, zêhnê mirov gelekî di asteke nerm û qayişokî de ye, ev yek jî dike ku xebatên me manedar bibin. Mirov xwezaya zêhnê insên nas neke, îdeayên heqîqet û rêbazê tewş in.

Dema me hewlda zêhniyeta mirov nas bikin, me timî behsa dualîbûna wî kir. Di mejiyê mirov de lob a rastê beşê pêşketî yê fikra hisî ye û di warê beridandinê de kevintir e, lob a çep a mejî jî li gorî fikra analîtîk e, û timî li pêşketinê vekiriye, ji ber vê xisleta xwe gelekî nerm û qayişokî ye. Di cîhana heywanan de his û fikir nêzî asteke wekhev in. His bi refleksên bi şert û bê şert bersiva tiştên hîn dibin didin, ango pêdiviya wan bi cih tînin. Ev reaksiyonên di nava kêliyan de rûdidin. Heman reaksiyon li cem mirov jî hene. Mînak beden yekser bersiva agir dide. Ji bo vê hewcedarî bi fikra analîtîk nîne. Lê ji bo derketina girê Everestê hewcedarî bi analîzkirina sedan şert û mercî heye. Kengî jî bi tevahî şert û merc hatin analîzkirin, paşê biryara ketina ser rê tê dayîn. Di fikra hisî de para pêxapandinê nayê pirsîn. Xwestek û ajoyên hundirîn çawa reaksiyon nîşan bidin, welê tevdigere. Fikra analîtîk dikare bi salan biajo. Rêbaz, xebat û gera me ya li heqîqetê neçare xwe bispêre vê fikrê. Nîzama xebatê ya zêhnê me neyê naskirin, agahî û zanîna me der barê rêbaza rast û heqîqetê de wê xweber û sererast bin. Wê wextê berê pêşî divê em zêhnê bi xwe baş nas bikin.

Xisleta yekemîn a zêhnê me ew e ku gelekî nerm û qayişokî

ye. Em dikarin bibêjin, ji bilî zêhnê me bi tevahî tiştên di gerdûnê de çêbûne di warê hilbijartina azad de şensê xwe pirr bi sînor in. Mirov mumkîn e ku qadên azadiyê bi neqebên teng bifikire. Em nizanin di pêkhatinên gerdûna makro û perçikên jêr-atoman de hilbijartina azad çawa diqewime. Lê belê em dikarin li curbicuriya gerdûna heyî binêrin û vê yekê bi encama cîhana perçikan, bi tevgera nerm a di gerdûna makro de û bi qabîliyeta hilbijartina azad a mumkîn dibe, fêhm bikin. Di mejiyê mirov de jî ev neqeba nerm û qayişokî ya bi hêsayî ditewe gelekî fireh bûye. Herî kêm em di warê potansiyelê de xwedî asteke tevgerê ya azad a bê sînor in. Bêguman em ji bîr nakin ku ev potansiyel tenê bi civakbûnê re wê çalak bibe.

Xisleta duyemîn a zêhnê me ew e ku nermbûna zêhniyeta me bi qasî ku li têgihiştinên rast vekiriye, li têgihiştinên şaş jî vekiriye. Li ser hîmê vê xislet û taybetmendiyê, di tevna his, zext û nermbûnê de her kêlî dibe ku ji rê derkeve. Ji ber vê bi mekanîzmayên êşkence û zextê yên armanca wan nêçîra hisane polîtîkayên gêzerê[28] esas têne girtin û ev yek jî bi xapandin û kirinên çewt re têne meşandin. Nîzamên hiyarerşî û dewletê yên bi hezarên salan e, li ser zêhna mirov zordestiya xwe danîne, bandorên gelekî mezin lê kirine, hema bêje zêhniyeteke li gorî xwe ava kirine. Yek ji xisleta zêhnê ew e ku pirrî caran bi xelatdayînê dibe nêçîr. Li hemberî vê, zêhnê me xwedî xisleta berxwedanê ye, ji bo dîtina rêya rast û xwe gihandina heqîqetên mezin jî taybetmendiyên bêhemta nîşan dide. Di van wesfên mirovên mezin de rola zêhna wan a serbixwe diyarker e. Hilbijartinên azad herî zêde kengî zêhn serbixwe dibin pêk tên. Di navbera têgihiştinên dewlemend û serxwebûnê de têkiliyeke nêz heye. Ji serxwebûna zêhnê mebest ew e ku hînê zêdetir dikare bi pîvanên adil tevbigere.

Me got, di binê têkiliya edalet û rastiyê de pergala gerdûnî heye. Wê wextê mirov dikare bibêje; zêhnê karibe adil bibe, li go-

[28]Polîtîka Gêzerê: Polîtîkayeke pişopişoyê ye. Li aliyekî hişk dike, li aliyekî nerm dike.

rî pergala gerdûnê ew zêhn e ku şensê hilbijartina azad bi dest xistiye. Ji bo vê jî dîroka azadiyan weke hêzeke mezin a perwerdekar (dîroka civakî) zêhnê me perwerde dike û ji hilbijartinên azad re amade dike. Nêzîkatiyên psîkoanalîtîk hewl didin kûrahiya zêhnê me bipîvin ku her diçe zêde dibe. Psîkoanalîzm weke qadeke nû ya zanînê her diçe girîngiya wê zêde dibe. Lê belê psîkoanalîzm bi serê xwe ji bo gihiştina agahiya rast û kêrhatî têrê nake, ji ber ku ferdê/ferdî serbixwe digire dest. Ango tu mirov ji civakê qut bigirî dest ev yek wê rê li ber agahîgirtineke ne tekûz û kêm veke. Ji bo vê kêmasiyê temam bike vê gavê sosyopsîkolojî jî diyar e rola jê tê xwestin nalîze. Ma sosyolojî hîmê wê rast hatiye danîn ku sosyopsîkolojî encamên rast bide. Bi psîkolojiyê em dikarin zêhnên mirovan baş nas bikin. Em dikarin mirov weke super-heywan bi psîkolojiyê nas bikin. Lê belê em Ji bo naskirina mirov weke heywanekî civakî, hînê em li serê meselê ne.

Em têdigihên, eger bêyî ku em pêkhatina zêhnê xwe baş nas bikin sîstema rêbaz û zanînê bisewirînin, encamên serketî jî êdî xweber û tesadûfî ne. Lê em zêhnê xwe rast û bi kûrahî nas bikin û bigihînin pozîsyona azad-hilbijartinê (azadiya civakî), ji bo têgihiştineke rast, rejîma zanînê û rêbaza me wê bersivê bidin. Di van şertan de xebatên me yên li gorî rêbazê tevî agahiyên rast ên gihiştine hev, wê îhtîmala ku em bibin ferdên azad û civakeke azad mezintir bikin.

Ya pêncemîn, xisleta mirov a di karektera metafizîk de ji alî sîstematîka agahî û rêbazê ve mînakeke bê hemta ye. Rêbaz û zanista xwegihandina agahiyê (epîstemolojî) kengî xisletên mirov ên metafizîk hatin analîzkirin dikarin hînê bi kêr bên. Ji bo avakirin û afirandina metafizîkê serwextbûna li mirov dibe mijareke girîng a lêkolînê. Yek ji pirsgirêkên civakî ya herî kêm hatiye analîzkirin ew e ku em negihiştine wê astê; em mirovê metafizîk nas bikin. Mirov çawa dibe metafizîk? Sedema vê kîjan pêdivî û hewcedarî ye? Aliyên wê yên erênî û neyênî çi ne? Bê metafizîk jiyan dibe? Taybetmendiyên sereke yên metafizîkê

çi ne? Gelo metafizîk bi tenê di qada fikir û dînî de ye? Têkiliya di navbera metafizîk û civakê de çi ye? Weke tê zanîn û bawerkirin, gelo metafizîk dijberê diyalektê ye, mirov dikare bi wê bi sînor bike? Em dikarin pirsan di vî warî de zêde bikin.

Madem mirov sûbjeya bingehîn a zanîna me ye, hingî divê em ji wesfên bingehîn ê vê sûbjeyê, fikra metafizîk û saziyên wê nas bikin; naxwe wê îdîa me ya xwegihandina agahiya têrûtijî ji vê çavkaniyê kêm bimîne. Em behsa qadekê dikin ku çi sosyolojiyê, çi jî psîkolojiyê ji xwe re hîç nekirine derd û pirsgirêk. Di serî de qada dînî, gelek ekolên fikrî weke metafizîk hatine qebûlkirin, û vê yekê kiriye mirov nikaribe ji nava pirsgirêka metafizîkê derkeve. Metafizîk yek ji xisletên sereke yên mirovê civakî ye, û di hîmê nêzîkbûna me ya pirsgirêka metafizîkê de jî ev taybetmendiya wî heye. Metafizîk avakirineke civakî ye ku mirovê civakî nikare jê bigere. Eger em mirov ji metafizîkê bikin, em ê wî/wê yan weke heywanekî super (Ev têgîna Nietzche ji bo Elmanan bi kar aniye di dema Elmanya –Nazî- de hatiye îspatkirin) yan jî weke wergerînin kompûturekê. Mirovatiyek e ku gihiştibe vê astê, gelo çiqas şensê wê heye weke mirov bijî?

Em niha binêrin ka mirovê metafizîk çi ye.

**a-** Exlaq xisleteke mirovê metafizîk e.

**b-** Dîn xisleteke girîng a metafizîkê ye.

**c-** Tevî şaxên xwe hemiyan huner dikare tenê weke metafizîkê bê binavkirin.

**d-** Mirov civaka sazîbûyî, û heta civakê bi tevahî weke metafizîkê bi nav bike, li cih e. Bi gelek xisletên din ku em karin rêz bikin, gelo mirov çima û çawa dibe metafizîk?

**Yekemîn,** kapasîteya fikrê ya mirov e. Weke gerdûna hay ji xwe bûyî mirov, ji bo dehşeta (hem ji alî êşê, hem jî ji alî bextewerî) ketiye navê bidebirîne, neçar maye xwe weke hebûnek di serfizîkê re ava bike. Jixwe wekî din nikarîbû ji heqê bextewerî û êşên fizîkî derekta. Ji bo mirov karibe xwe li hemberî şeran, mirin, şehwet, xwestek, delalî û wekî din ragire sazî û fikra metafizîk hewcedariyên welê ne, dest ji wan nabin. Hewcedari-

yên behsa wan tê kirin jî ji bo pêk werin; xwedê tine be, xwedê tê vedîtin, hûner tê çêkirin, agahî û zanîn tê pêşdebirin.

Ji aliyekî din ve, mirov metafizîkê weke ji fizîkê wêdetir bifikire, ne hewce dike bê mehkûmkirin û ne jî pesnê wê bê dayîn. Ya rastî, hebûnek e, herî zêde zorê dide sînorên metafizîkê, mirov e. Mirov ji fizîkê wêdetir metafizîkê dijî û sedema vê yekê jî ji karektera wî ya ontolojîk e. Ti maneya xwe jî nîne ku mirov tenê weke fizîk mayînê biparêze. Ya rastî, tenê weke fizîk mayîn wê rê li ber bi navkirina 'mirovê mekanîk' veke. Ev, ji alî Descartes ve ji zû ve bi têgîna weke 'ruh' hatibû binavkirin ku ravekirineke wê ya zanistî tinebû, û bi vê xwestibû xwe ji vê pirsgirêkê xilas bike.

**Ya duyemîn,** civak bêyî exlaq dewam nakin. Ji bo vê jî hewcedarî bi metafizîkê heye.

Civak tenê bi hukmekî azadane dikare bi exlaq were bi rêkûpêkkirin. Sovyeta Rûsyayê û Firewnên Misrê tevî rasyonelîteya xwe hemûyî jî hilweşiyan. Em dikarin vê jî bi mehrûmbûna wan a ji exlaq rave bikin. Rasyonalîte bi serê xwe nikare civakê dewam bike. Belkî karibe civakê bike mîna robotan, yan jî heywanekî pêşketî, lê nikare mîna insan biparêze. Em hinek taybetmendiyên exlaq bijmêrin: xweragirtina li êşê û bi cihanîna hewcedariya wê, bi sînorkirina zewq, xwestek û şehwetê, zêdebûna mirovan ne fizîkî bi pîvanên civakê ve girê dide; li gorî tercîha guhdan û guhnedana rêûresman û dîn biryarê dide. Mînak; têkiliya cinsî ya mirov pê zêde dibin bi pîvanan girê daye û ev li cem mirovan hewcedariyeke pêwîst e. Em zêdebûna şêniyan kontrol nekin civak dewam nake. Ev mijar bi xwe jî pêdiviyeke zêde bi exlaqê metafizîkê nîşan dide.

**Ya sêyemîn,** mirov bi hunerê xwe cîhaneke xwe ya xas bi xwe diafirîne. Civak tenê bi afirîneriyên di qadên bingehîn ên weke deng, resim, mîmarî û wekî din de xwe dewam dike. Ma mirov li civakeke bê muzîk, edebiyat û mîmarî dikare bifikire? Afirîneriyên di van qadan hemûyan de têne maneya metafizîkê. Bi van afirîneriyan civak dewam dike û bêyî wan civak nikare de-

wam bike. Huner bi têgihiştineke metafizîk hatiye hûnandin û hewcedariya insan a estetîzmê tedarik dike. Mirov çawa dikare bi exlaq qencî û xirabiyê ji hev bike û maneyê bidiyê, bi hukmê xweşik û nexweşik jî maneyê dide tevgera hunerî.

**Ya çaremîn,** qada rêveberiya polîtîk jî bi gelek hukmên metafizîk tijî ne. Qada polîtîk bi xwe pirr bi xurtî ji avabûnên metafizîk pêk tê. Em nikarin polîtîkayê bi qanûnên fizîkî rave bikin. Jixwe rêveberiya bi qanûnên fizîkî yên zêde robotî ye; bi dirûvekî din 'rêveberiya keriyan' a faşîzmê ye. Eger em bibêjin; di qada polîtîk de maneya tevgera azad heye, wê wextê em careke din karektera metafizîk a mirovê polîtîk destnîşan dikin. Gotina Arîsto ya dibêje; 'Mirov heywanekî polîtîk e' zêdetir vê rastiyê bi bîra mirov dixe.

**Ya pêncemîn,** bi taybetî divê em bibêjin; qadên mîna huqûq, felsefe, dîn û heta qada zanistî (scientism) bi metafizîkê barkirî ne. Em dizanin di civaka dîrokî de ev qad bi tevahî ji aliyê çend û çawatiyê bi berhemên metafizîk tijî ne, û barkirî ne.

Piştî ku me di jiyana ferd û civakê de giraniya metafizîkê tespît kir, em niha dikarin ji bo nêzîkatiyên hînê manedar gav ber bi pêş ve biavêjin.

**1-** Nêzîkatiyên metafizîk di dîroka pêşketina xwe de xwe yan bi tevahî mezin kirine û weke heqîqeta bingehîn nîşan dane, yan jî ji aliyê dijberên xwe ve hatine rexnekirin û bi tevahî weke qadeke qelp û dekûdolabekê hatine dîtin, weke gotin û têgihiştinên mirovan dixapînin û rastiya wan nînin, hatine hesibandin. Di herdu nêzîkatiyan de mirov dikare îdîa bike ku yan haya wan ji têgihştinên civaka dîrokî nînin yan jî mijar zêde mezinkirine û nepixandine. Xusûsa herdu têgihiştin jî haya wan jê nebûye ew e ku metafizîk ji kîjan xislet û hewcedariya civakî peyda bûye. Beşê metafizîkê mezin û bilind dike, têkiliya bi cîhana fizîkî re daye aliyekî, mîna ku bêserûbinî azad be, xapiyaye. Kesên di vî beşî de têkiliya fikir û ruh bi cîhana maddî re yan înkar kirine yan jî berevajî kirine ku di nîzamên ser xwedayî re gelek caran insan rakirine payeya xwedê, di cîhana fikrê de bist bûne û zêde

mezinkirine. Bêguman bûyerên em behsa wan dikin, bandora nîzama dewlet û hîyarerşiyê li ser wan zêde ye.

Beşê girîngiya metafizîkê înkar dike jî, cîhana materyalîst, şaristaniya maddî di van demên dawî de rasyonalîte[29] û pozîvîtîzm kiriye ala xwe û êrîş dike, dibêje: her tiştê bêhna metafizîkê jê tê nexweşî ye, amûrên xapandinê ne, divê bi tevahî bêne redkirin. Lê paşê pê hat hisîn ku bi taybetî pozîtîvîzm û rasyonalîteya modernîteya kapîtalîst xwediyê wê ye, rê li ber têgihiştina jiyanê ya 'keriyê faşîst', 'mirovê robot-mekanîk' û 'sîmulasyonê' û her wisa tinekirina hawîrdorê û hilweşandina civaka dîrokî vekir. Pirr zêde girêdana bi qanûnên fizîkê, hilweşandina civakê û jihevdeketina wê bi xwe re tîne. Bi vî awayî jî îspat dibe ku 'zanist' metafizîka herî xirab e. Eger maneyeke jiyana civakî hebe! Divê ez bi girîngî bibêjim; têgihiştina 'zanistî' meteryalîzma herî seresere ye, pisporekî baş ê perwerdekirî yê îstîsmar û desthildaran e, ango bi zanebûn an jî bi nezanî di wê rewşê de ye ku xwe herî zêde dixapîne û şêwazekî bermahiyê metafizîkê temsîl dike.

**2-** Yên li herdu aliyan cih nagirin û mirov dikare wan weke 'nîhîlîst' jî bi nav bike, dibêjin ew neçar nînin li herdu aliyan cih bigirin, alîgirî an jî dijberiya metafizîkê hewce nake û îdîa dikin ku mirov dikare tam serbixwe bijî. Ev tof û komika bê zirar xuya dike û wer disekine, divê mirov bibêje ku ya rastî, komika herî bi tehlûke ye. Qet nebe herdu aliyê din îdealên xwe yên mezin hene. Haya wan ji buha û nirxên temsîl dikin heye. Di şikildana civak û ji nû ve avakirina ferd de xwedî gotin in. Lê komika tam serbixwe, tevî ku di nava civakê de û bi nirxên wê dijî, bi helwesteke nîhîlîst (înkarwarî) bawer dike ku wê bi jiyaneke ne ji wir karibe bijî. Ew beş e ku herî zêde nêzî metafizîkvanên 'zanistî' ne. Modernîteya kapîtalîst hejmara vî beşî zêde dike. Ev beş ji hêmanên civakê yên têkçûyî, jihevdeketî û avêtine valatiyê pêk tên. Di heman demê de mirov dikare bibêje ku ev beş herî zêde nêzî heywantiyê ye. Holîganên fûtbolê herî zêde nêzî

[29] Rasyonalîte: Aqliye.

vî beşî ne, û mînakeke wan nîşan didin. Komên mîna wan bi lez zêde dibin. Bi van mînakan mirov dikare îspat bike ku modernîteya kapîtalîst kansêrê çawa weke şewbê belav dike. Herdu helwestên dîrokî yên der barê metafizîkê de di encamê de di têgihiştina zanistî ya pozitivîst a moderníeteyê de dibin yek. Dînê wan metafizîka kirasê xwe guhertî pozitivîzm e, xwedayê wan jî dewleta netewe ye. Xwedayê maskeya xwe derxistî, bi şiklê dewleta netewe di civakên modern hemûyan de bi remz û rîtuelên berfireh tê pîrozkirin.

**3-** Ez difikirim ku mirov dikare bibe xwedî helwesteke hînê bi tewazun û ev yek jî hem hewce ye, hem jî mumkîn e. Ya rastî, divê mirov metafizîkê weke şiklekî avakirina civakê bizanibe û di polîtîka, huner, exlaq û fikrê de metafizîkeke nêzî 'qencî, delalî, azadî û rastiyê' bibîne û pêşxistina tiştekî wisa jî weke wezîfeyeke bingehîn qebûl dikim. Mirov ne bi tevahî qebûl bike, ne jî bi tevahî red bike û ne jî mirov bikeve nav fikrên beredayî yên serxwebûna tam; divê mirov weke di dîroka civakî de timî hatiye dîtin gera li 'xweşikî, delalî, qencî, azadî û rastiyê' dewam bike ku ev cewherê 'jiyana bi fazîlet û feraset' e. Ez bawer dikim ku di civakê de ya jiyanê manedar dike, hunerê vê jiyana bi fazîlet e.

Bêguman em mehkûmê metafizîkan nînin. Lê em nikarin ji dîtin û pêşxistina 'qenctir, delaltir, azadtir û rastir' bigerin. Çawa ku çarenûsa me nîne, em bibin mehkûmê xirabî, krêtî, koletî û çewtiyê, her wisa şêwazê jiyaneke rast, azad, delal û qenc jî ne bê îmkan e. Weke alternatîfa herî xirab, em mehkûmê jiyana 'nîhîlîst' nînin ku bê berpirsiyarî û bêgavî (di serî de modernîteya kapîtalîst bi tevahî pergalên dewletdar û hiyarerşîk) rê li ber vedikin. Pevçûn û pevketina di vî warî de bi qasî dîrokê, ji demên destpêkê yên avakirina civakê dewam dikin. Di roja me ya îro de aliyê vê mijarê yê xweser ew e ku di dema jihevdeketina sîstemeke weke modernîteya kapîtalîst de diqewime; ev jî ji bo gera li qencî, delalî, azadî û rastiyê helwestên nû yên çalakî û fikrên xweser ên têkoşînê ferz dikin û hewcedariya ji nû ve avaki-

rina civakê nîşan dide. Ji bo vê jî hewcedarî bi xebat û hewldanên bi xwestek ên di asta eşqê de hene, her wisa gera li rêyên herî zanistî yên nû (rêbaz û rejîma heqîqetê) jî hene.

Ji bo bihurandina ji modernîteya kapîtalîzmê, ji bo pêşdebirin û belavkirina modernîteya demokratîk, argumanên (amûrên îspatkirinê) heta vir min hewl da rave bikim, divê ji bo bersivdana pirsgirêkan mirov wan weke amûr û alav bi kar bîne. Bi qasî ku mirov rêbaz û rejîmên agahiyê yên rê li ber modernîteya fermî vedikin rexne bike, divê di heman demê de mirov sîstemên rêbaz û agahiyê (rêya heqîqetê) yên postmodernîteyê ku dikarin rê li demên nû vekin, rohnî bike. Amûr û alavên me ji bo vê ne. Me weke pirsgirêkeke kilît rave kir ka divê em çima û çawa li ser mirov biponijin. Hê jî gelekî girîng e ku ferd-civak rast bêne bi navkirin û fêhmkirin. Di vî warî de hewldanên sosyolojî, sosyopsîkolojî û antropolojiyê ji ber ku ji aliyê modernîteyê ve gelekî hatine berevajîkirin û ketina tora agahî-îqtîdarê bi xêrûber nînin. Hewldanên ferdî yên giranbuha jî bê rêxistin û bêrêkûpêk in. Di van mijaran de di serî de Dibistana Frankfûrtê, Fernand Braudel, hînê beriya wî Nietzche, piştî wî Michel Foucault, Wallerstein, gelek kesên di asta ekolê de nêzîkatiyên giranbuha nîşan dane, lê tevî vê jî rejîmên rêbaza nû û agahiyê yên demê (em dixwazin jihevdeketina modernîteyê û postmodernîteya nû weke modernîteya demokratîk bi nav bikin) hînê ji wan re gelek maye bibin sîstem. Hewldan gelek û giranbuha ne, lê parçeparçe û belawela ne. Weke Wallerstein bi xwe jî mikur tê, sedema bingehîn a vê rewşê bi jehrkirina bi destê sîstema kapîtalîst e. Ji ber tengavkirina modernîteyê fena ku di nav lepên wê de biperpite, diqirqil e.

Mînak gotinên Nietzsche ên weke 'modernîteyê civak kiriye fena pîrekan, xesandiye û kiriye nola moriyan' girîng in. Mîna ku pêncî sal pêşiya xwe dîtibe, gotina ji bo Elmanan bi kar anî ya weke 'zerikê super heywan' kerîbûyîna faşîst îfade dike. Dibêje; modernbûyîn, dewleta netewe dûrnêz wê keriyên faşîst biafirîne û wexta ji bo Japonan jî mînaka 'neteweya morî' aniye

ziman dibêje wê civakên morî bikevin dewrê, eşkere ye, bi vî awayê fikreke xurt (Zerdeşt wisa ferman kir) tîne ziman. Fena ku pêxemberê serdema kapîtalîst be.

Max Weber jî wexta modernîteyê bi têgihiştina 'civakê digre nav qefesa hesinî' tespîteke girîng dike. Wexta rasyonelîteyê jî weke sedema wendakirina sêhra dinyayê dihesibîne, karektera maddî ya şaristaniyê destnîşan dike.

Fernand Braudel, zanistên civakî yên ji dîrok û mekan qut gelekî hişk rexne kirine. Behsên ji zeman û mekan qut jî weke 'komên bûyerên tewş' bi nav dike û bi vî awayî alîkariyên gelekî girîng bi pirsgirêka rêbazê re dike. Braudel hin têgînên girîng kirin malê dîrokê ku zêhnê mirov vedikin. Ew jî ev in: 'dema kin→bûyerên dîrokî', 'dema konjekturel→dema dewranî ya krîzê' û 'dema dirêj→dema pêkhatinê'.[30]

Rexneya modernîte û rohnîbûnê ya Dibistana Frankfûrtê di wê astê de ye ku dikare rê li metodên nû veke. Adorno[31] şaristaniya modernîteyê ya rê li ber 'kampên komkirinê' vekir, weke 'di tariyê de dawîlêhatina serdemekê' bi nav kir û ev nirxandineke xurt e. Nemaze gotina wî ya 'jiyaneke şaş, rast nayê jiyîn' pirr navdar e. Wexta li vê mikur tê ku modernîte ji alî rêbaz û agahiyê şaş hatiye avakirin, wer xuya dike ku gihiştiye serwextbûneke mezin. Rexneyên wî yên ji bo rasyonalîte û rohnîbûnê jî zêhnê mirov vedikin.

Michel Foucault di modernîteyê de li mirina xwedayê li ezma-

---

[30]Fernand Braudel dîrokzanekî navdar ê fransewî ye ku mohra xwe li zanista dîrokê ya sedsala bîstan daye. Wî li dijî fikra dîrokê ya xwe dispêre bûyeran (histoire événementielle) fikra dîrokê ya tevgerên demên dirêj parast. Li gorî Braudel bi bûyerên dîrokî tenê dîrok nayê fêmkirin. Bi kurtasî Braudel dibêje ti bûyera dîrokî xweber çê nebûye, dewama pêvajoyên dem dirêj e; ango bi dîroka dema nêz re dîrokeke dirêj û kevin jî hêdî hêdî dimeşe.

[31]Adorno: Navê wî yê rastî Theodor Ludwig Wiesengrund e. Di 11'ê Îlona 1903'an de li bajarê Elmanyayê Frankfûrtê ji dayik bûye. Ji aliyê bavê ve Cihû ye. Bi ciwanî bi felsefeyê re eleqedar bûye. Li Dibistana Frankfûrtê ango Enstîtuta Lêkolînê ya Civakî xebitiye û nivîsandî ye. Di sala 1969'an de li Swîsreyê bi krîza dil wefat kiriye.

nan mirina mirov jî zêde dike. Ya rastî ev tespît têra xwe mirov hîn dike. Nemaze tespîta wî ya dibêje; desthilatdariya modern ji bo hundir û derveyî civakê tê maneya şerekî dewamî, bi rastî tespîteke xurt e ku baş nehatiye bikaranîn. Desthilatdarî-agahî-nexweşxane-girtîxane-timarxane-xwendinxane-ordûxane-karxane-kerxane, ev rêzetêgîn, bi qasî ku bi kêra rêbazan tên ji bo sîstemeke azad a agahiyan jî were danîn, yekser jî nebe bi heman awayî bi kêr tên. Michel Foucault ji ber ku zû mir analîza xwe ya der barê desthilatdarî-şer-azadiyê de temam nekir. Di vê xebata xwe de dibêje; di hundir û derveyî civakê de her tim rewşeke şer heye. Bi vê tespîtê mîna dixwaze bîne ziman; modernîte mirov dikuje. Ji vir mirov dikare encameke weha derxîne; azadî şêweyekî jiyanê yê civakî ye ku bi ser ketiye jiyaneke civakî li derveyî şer ava bike. Eger wisa be, mirov heta qanûna karê û artêşên nîzamî yên hedef û çavkaniya wan mîlîtarîzm û îndustriyalîzm e ku bi tevahî amûrên hilweşandinê diafirînin, ji hukim nexe, û li şûna wan xweparastina civakî û ekolojiya wê daneyne, azadî pêk nayê.

Wallerstein di têgihiştina li sîstema kapîtalîst a dinyayê de bi îdîa ye. Ji sedsala 16. heta roja me ya îro fotografekî bê qusûr ê sîstema modern digire. Lê çi di nirxandina sîstemê (ew jî mîna Marks qonaxa kapîtalîzmê îcbarî qebûl dike û bi awayekî erênî dihesibîne) û çi jî dijberî û gavavêtinê de tam zelal nîne. Wexta vê di şerbeta sîstema bûrjûvaziyê de dadike mîna ku li xwe mikur bê xuya dike. Wallerstein bi hostatiyeke mezin tîne ziman ku di serî de Sovyeta Rûsyayê, sîstema sosyalîst bihêle ji modernîteya kapîtalîst bibuhure hêz daye wê, jihevdeketina wan jî ne ku lîberalîzma kapîtalîzmê bi hêz bike wê wan qels bixîne. Wallerstein bi van gotinên xwe têzeke girîng tîne ziman. Lê belê heman qabîliyetê di warê jihevdeketina sîstemê û gavavêtinên nû de nikare nîşan bide. Ji bo pêsîrtengiya modernîte (kapîtalîzm) ji alî avahî û pêkhatinê ji salên 1970'yî ketiyê, belkî bi awayekî mafdar nikarîbû bi pêşbîniyeke misoger bîne ziman ka wê kengî û çawa bi dawî bibe. Lê pirr girîng e

ku dibêje; her destwerdana piçûk û manedar dikare rê li ber encamên mezin veke. Em dibînin ku ji determînîzma hişk gelekî dûr ketiye. Em dikarin bibêjin; der barê sîstema agahî û rêbazê de hosteyekî xurt ê nirxandinê ye.

Bêguman mirov dikare di vê mijarê de navê gelek rewşenbîrên din jî zikir bike. Analîzên Murray Bookchin der barê ekolojiyê de, pêşniyar û rexneyên Feyerabend li mentiq û rêbazê, li mirov rê vedikin. Li cem van rewşenbîran hemûyan aliyê kêm ew e ku nikarîne bihevrebûna zanîn-çalakiyê bi hostayî bigirin dest. Di vê de, bêguman hêza mezin a bi xwe girêdanê ya modernîteya kapîtalîst xwediyê roleke girîng e. Tevî ku ekola Marksîst îddîa dikir ku rexneya herî dijwar û zanistî li kapîtalîzmê girtiye jî lê bi awayekî îronîk di mijara zanîn-desthilatdariyê de nekarî nehêle nebe amûrekî kêrhatî yê ber destê sîstemê, ango nekarî xwe rizgar bike ji bo nebe bazkê çep ê lîberalîzmê. Ezmûna sedûpêncî salî têra xwe vê yekê îspat dike.

Em dikarin sedema vê ya sereke, rêbaza wê û tevahiya zanîna wê ya ketiye ser hev weha rave bikin: ew bi 'reduksiyonîzma ekonomîk' ve ye, ango li navenda wê 'reduksiyonîzma ekonomîk' heye. 'Sosyalîzma Zanistî', karekterê civakê yê metafizîk û dîrokê ciddî negirt, rastiya desthilatdariyê daxist asta komîteya hukûmetê û roleke bi sêhr da analîza ekonomîk-polîtîk, lewma neçar bû bibe versiyoneke nû ya pozîtîvîzmê. Tevî ku Emile Durheim û Max Weber di destpêkê de rola damezrîner dane sosyolojiyê jî, di mijara rêbaz û epîstemolojiyê (teoriya zanîn-agahiyê) de nikarîn ji rola ekola çepgir a lîberalîzmê bibihurin. Careke din, eşkere derdikeve holê; ya girîng û diyarker niyet nînin, kulmozên hêzê yên entegrasyonê û sîstemên asîmîlekar in ku hukim li civakê dikin. Tevî ku ekonomî hêzeke girîng e, bi desthilatdarî û hêzên din ên metafizîk re ji aliyê civakî-dîrokî rast neyê analîzkirin, sîstema modernîteya kapîtalîst li dawiyê nayê hiştin (jixwe weke qonaxeke pêş rewakirin û hewcedariya bi wê destnîşankirin), û ji bo vê, pêşniyarkirina rêyên çareseriyê û bi cihanîna wan bi çalakiyan ji pozîtîvîzmê wêdetir encamekê na-

de. Teorîk-pratîka heyî vê rastiyê têra xwe îspat dike.

Ekolên anarşîst yên weke rexneyeke radîkal a moderníteya kapîtalîst derketin holê di warê rêbaz û teoriya zanînê de hoste ne. Mîna Marksîstan behsa pêşketîbûna kapîtalîzmê nakin. Ji reduksiyonîzma ekonomîk wêdetir karîbûn ji gelek aliyên din li civakê temaşe bikin. Rola 'zarokên asî' yên sîstemê bi hostayî rabûn. Tevî niyetên wan yên baş, ev ekol di encamê de li dijî gunehkariya sîstemê bi rik û înad weke terîqetên dijber man û nikarîbûn xwe ji vê rola bi sînor xilas bikin. Tiştên min ji bo Marksîzmê gotin ji bo van ekolan jî dibêjim: divê sîstemê û pirsgirêkên bihurandina wê rast bi nav bikin û divê hêza zanîn-çalakî û rêbaza modernîteya demokratîk baş bi kar bînin. Ev, ji wan xusûsên bingehîn in ku ji wan dûr mane.

Em dikarin heman nirxandinan ji bo pratîk û teoriyên tevgerên çandî, femînîst û ekolojîk jî bikin. Ev tevger dişibin çêlkewên ji qefesa hesinî ya modernîteyê rizgarbûne. Em timî fikaran dikin ka wê kengî û li kîjan deverê bibin nêçîra modernîteyê. Lê dîsa jî mirov wan weke tevgerên hêviyê bibîne girîng e. Kengî alternatîfa sereke pêşket dibe ku gelekî kêrhatîbin. Ekolên sosyal-demokrat û tevgerên rizgariya neteweyî pirr zû bi sîstema modern re bûne yek û her bûn hêza wê ya dimeşîne. Serketî bûne du mezhebên bi hêz ên ekola sereke lîberalîzmê.

Berî ku ez bigihîjim encamê, dixwazim bi kurtî nêzîkatiya xwe ya antî-oryantalîst[32] jî bînim ziman ku bawer dikim wê bi kêrî mijarê bê. Ez wexta li hemberî modernîteyê li xwe guhdarî dikim, ez ferq dikim ku ez di nava nakokiyeke mezin de dimînim. Ez du sedemê vê yekê tavilê dikarim bibêjim. Ya yekemîn, bandora çanda klasîk a Rojhilata Naverast e. Nakokî ango pirsgirêkên bi kok ên vê çandê bi modernîteya kapîtalîst re hene. Beriya her tiştî ev çand pêşî cih dide civakê û di vê de gelekî radîkal e. Ferdiyet di civakê de bi hêsanî rastî eleqeyê nayê; girê-

---

[32]Oryantalîzm: (Zanista Şerqî) Bi çavê Rojava nêrîna li Rojhilat e. Li gorî vê nêrînê Rojhilat navenda dewlemendî û îhtîşamê ye, lê kesland e, û li rêvebirinê vekiriye.

dana bi civakê ji bo qebûlkirina şexsiyetê pîvaneke bingehîn e. Girêdana bi civakê her tim bilind û giranbuha hatiye dîtin. Di vê de bandora dîn û rêûresman xurt e. Kesek ji civatê qut bibe piçûk tê dîtin û tinazê xwe pê dikin. Kesê koma xwe jî diguherîne bi çavekî baş lê nanêrin. Lê wexta xwe bi cihekî baştir girê bide ev yek jî tê teqdîrkirin. Li qatê dewletê û hiyarerşiyê cihgirtin tiştekî wisa ye ku mirov dilê xwe dibijînînê. Di vê têgihiştinê de çanda dewlet û rêûresma hiyarerşiyê ya li Rojhilata Naverast bi tesîr e. Ji ber van xisletan gişan, bi hêsayî xwe radestî çandên derve û nemaze çanda modern nake. Ya rastî di nava wan de bi zehmetî asîmîle dibe.

Ji lewra çanda 'ommetê' ya rêûresmeke xurt e, li şûna ekola herî xurt a roja me ya îro dewleta netewe tê tercîhkirin û divê mirov li vê matmayî nemîne. Ji ber ku dewleta netewe berhemê modernîzma kapîtalîst e; xerîb e. Di cewherê xwe de herdu milletperestî ne, lê dema bi îslamtiya siyasî û milletperestiya dewleta netewe bêne qiyaskirin, wê bi giranî milletperestiya Îslamî ya ku xwecih e, were tercîhkirin. Li gelek qadan di şêwazê jiyanê de bi modernîteyê re lihevnekirin dewam dike. Ji bilî Rojhilata Naverast ti çandeke din li ber modernîteya kapîtalîst ranebûye. Eger rabe jî nikare xwe ji daqurtandinê û helandinê rizgar bike. Ev qiyasa bi serê xwe jî têra îspatkirina mayîndebûna pêkhatina çanda civakî û dîrokî dike.

Sedema duyemîn, tevî ku min eleqeyeke mezin nîşanî pêkhatina fikra Rojava dida jî ez demeke dirêj bi nexweşiya herdu ekolên wê jî neketim. Min di lêkolîn û lêgerînên xwe yên heqîqetê de, pirr bi kok û bi rêbaz nebe jî haya min ji zanistzanîn-agahiya serhevde ya rê li ber modernîteyê vekir hebû; min serdestiya wê ya pirr dîq didît. Ez pirr dereng nemam, min nerazîbûna xwe ya ji çanda Rojhilata Naverast nîşanî vê çanda modern jî da. Pirr dereng be jî haya min jê çêbû ku ji dezgeha heman şaristaniyê derketibûn. Min bi hostayî dît ku herdu çand jî çavkaniya xwe avahiyên dewlet û hiyarerşiya herî kêm pênc hezar salî ne. Ji lewra jî ez netirsiyam û min

xwe jê paşve neda ji bo ez aliyên hevpar ên herdu çandan di parzûnkê rexneyan de dawerivînim.

Di van rexneyan de mirov dikare bi hêsayî bibîne ku ferdiyetperestî civakê mîna mişkekî dikeritîne. Zehmet nîne ku em tespît bikin; lîberalîzma kapîtalîzmê ji azadiya ferd wêdetir hunerê keritandina civakê ye ku çavkaniya xwe jî ji rêûresma çanda bazirganiyê digire. Çanda bazirganiyê jî yek ji wan xusûsan e, mirov dikare rave bike; sê dînên mezin ên yekxwedayî yên Rojhilata Naverast jî di navê de çanda bazirganiyê têkiliya xwe bi gelek rêûresmên qedîm re heye. Civak kolektîvîteyeke mirov e. Guherîna metayê û metabûyîna di bingehê bazirganiyê de di rizandin û jihevdexistina civakan de rola sereke lîstiye. Zêhniyeta bazirganiyê rêûresmeke gelekî xurt a Rojhilata Naverast e. Di civakê de vedîtina xwedayan û pîrozkirina wan, wergerandina hunera rêvebirina dewletê ya dekûdolabê, derew û durîtiya di nav exlaq de hatin bicihkirin û heta gelek sembol, nasname, ziman û organên bi guman di avahiya civakê de ji ber çanda bazirganiyê cih girtin. Ya Ewrûpa Rojava li vê zêde kirî ew bû ku ev sîstem ji Rojhilata Naverast girt, bi rêya Ronesans, Reform û Rohnîbûnê ew kir sîstema civaka serdest. Di civakên li Rojhilata Naverast de bi çavekî baş li bazirgan û saziyên wî nayê nêrîn û di dereceya yekemîn de qîmet û ehemiyetê nabîne. Berevajî timî bi guman lê tê nêrîn. Ya modernîteya kapîtalîst têde bi serket ew bû ku sîstema metayê kir taca serê civakê, bi tevahî zanist, dîn û huner kir xizmeta vê civaka nû. Yên li Rojhilata Naverast bê şexsiyet û di dereceya duyemîn de, li Ewrûpayê bûn bijarte, neqane û yekemîn.

Li Rojhilata Naverast a îro, rexnekirina modernîteya Ewrûpayê, û heta dijderketina wê bi şîddeta Îslamî ya radîkal bûye mode. Lê li gorî min, ji Edward Seîd heta Hîzbûllahê ev nêzîkatî û rêxistinên çalakger ku bûne dijminê modernîte û antî-oryantalîstiyê, weke rêûresma Marksîst pêkhatinên nava modernîteyê ne, di encamê de nikarin xwe ji xizmeteke bê rûmet a ji modernîteyê re rizgar bikin. Derketina wan bi xwe jî bi saya modernîteyê

ye, çi bi ser bikevin çi jî bi ser nekevin, mîna kûçikê birçî yê notirvanan li ber deriyê modernîteyê parsekiyê dikin, dîsa mîna kûçikekî li gorî xwezaya xwe modernîteyê diparêzin. Bi tenê rih û kincên rêûresmê li xwe dikin. Ruh û bedena wan bi bermahiyên paşverû yên modernîteyê barkirî ne.

Ez yeqîn dikim ku min binê şêwaza xwe ya nirxandina agahî û rêbaza rexneyê bi xetên stûr xêz kir. Bi kêmanî, min zanist û rêbaza rê li ber modernîteya kapîtalîst vedike bi sînor be jî rohnî û zelal kir. Em ji rastiya wê zêde ne piştrast bin jî li şûna dema 'kaosê' ya ji avahiya modernîteyê peyda dibe, şensê me heye ku 'ji bo gavavêtinên di warê azadî û demokrasiyê de şêwazê xwe yê rêbaz û zanistê pêş bixin.' Ji bo em vegotin û ravekirina xwe hêsan bikin, em ê xulase mijara xwe xal bi xal rêz bikin:

**1-** Divê têkiliya têgihiştina (paradîgma) rêbaz û zanistê ya hîmên wê Roger, Francis Bacon û Descartes danîn, bi kapîtalîzmê re baş bê dîtin û li ser vî esasî bê rexnekirin.

**2-** Objektîvîte û sûbjektîvîte zêde ji hev hatine cihêkirin û bi vî awayî cihêbûna behsa wê tê kirin li ser gelek dualîteyên din jî hatiye nîşandan. Bi vê yekê; bi ferdiyetê (sûbje) civak (obje) li her cure îstîsmarê hatiye vekirin.

**3-** Bi vê têgihiştina rêbaz û zanistê cihêkirina civakê weke bûrjûva û proleter gelekî xwezayî hatiye dîtin û bi vê yekê, rê hatiye lê vekirin ku proleter weke obje were bikaranîn.

**4-** Modernîteya kapîtalîst bi gotina xwe ya 'zanist hêz e' têkiliya zanist û desthilatdariyê hûnaye û hîmê wê daniye. Bi vê, pirr zû yekîtiya zanist û desthilatdariyê çêkiriye û ew kiriye sîleha bingehîn a sîstemê.

**5-** Kengî aliyên dîn û metafizîkê yên xurafe (beredayî) û di fikrê de sabit û asêbûyî derketin, modernîteya kapîtalîst şêwazê zanistê yê pozîtîvîst kir veguherand dînekî nû û bi navê têkoşîna li dijî dîn û metafizîkê dînê xwe ava û serdest kir.

**6-** Lîberalîzm (azadîxwazî) kir îdeolojiya xwe ya fermî û ew kir amûrekî herî xurt ê lihevkirinê. Li aliyekî din jî îdeolojiyên

dijber hemû bi ser xwe ve kirin û lîberalîzm weke sîleheke asîmîlasyonê bi kar anî û fena 'dest û zêhnekî nayê dîtin' hegomonya xwe ya îdeolojîk bi xurtî pêk anî.

**7-** Bi fermîkirina lîberalîzm û pozîtîvîzmê re, gelek ekolên îdeolojîk û dibistanên fikrê ji pêş çavên xwe xistine, piçûk xistine, nameze heta dijber (muxalif) bi ser xwe ve kirin di vê hewldana xwe de bi israr bû.

**8-** Felsefe û exlaq ji pêş çav xistiye; bi vî awayî kiriye ku şensê dijberên sîstemê di warê perspektîf û helwestdanînê de (tercîha azad=exlaq) kêm kiriye.

**9-** Bi disîplînekirineke zêde yekparebûn û hêza maneyê ya zanistê parçe kiriye; fîl bi mûyên wî, daristan jî bi daran rave kiriye. Zanisteke zêde parçekirî hem bi hêsayî bi desthilatdariyê ve tê girêdan, hem jî dibe teknolojî û rê li ber qadeke mezin a karê vedike. Ji ber ku êdî armanca zanistê keşifkirina maneya esasî ya jiyanê nîne, armanc bi destxistina pereyan e. Ji xeta zanist-zana ber bi xeta zanist-hêz-pere ve gav hatiye avêtin. Zanist-desthilatdarî-sermaye hevgirtina nû ya pîroz a modernîteyê ye.

**10-** Şaristaniyê (şaristaniya bajêr a tebeqî) jin kirin jinkok, kirin pîrek (koleya herî pêşketî), di modernîzma kapîtalîst de jî mêr (bi saya welatîbûnê) hat xesandin û ew kirin pîrek. Bi vî awayî kirin ku civakê bi tevahî mîna pîrekê (li gorî Hîtler civak mîna pîrekê ye) bi rê ve bibin. Civak kirin mîna mihîna suwarbûnê û bermaliya dewlet-neteweyê.

**11-** Di moderniteyê de desthilatdarî hem di nava civakê de hem jî di nava civakan de şerekî dewamî îfade dike. Gotina Hobbes a ji bo civaka beriya kapîtalîzmê aniye ziman 'her kes bi her kesî re timî di nava şer de ye' ya rastî vê gotinê bi hosteyî di bin moderniteya kapîtalîst de cih girtiye. Qirkirin di vî şerî de asta herî jor îfade dikin.

**12-** Ji ber ku di sîstema moderniteya kapîtalîst de pêvajoya berfirehbûnê ya navend-hawîrdorê temam nebûye, ekolojî gihiştiye astekê ranake, bê karî, xizanî û kêmbûna heqdestê, burokrasiya gihiştiye wê astê ku derve daqurtîne, hedimandina civaka

xwedayî, beşê herî kurtêlxur ê sermayê yê ji hilberînê qut ê fînansa global hegemonîk bûye û li hemberî van bûyeran hemûyan piraniya civakê û li her qadê tevnên berxwedanê yên pêşdikevin, rê li ber krîzeke avabûn û strukturel vedikin.

**13-** Di demên krîzên pêwendîdarî avabûn û strukturel de pêvajoyên hem şoreş û dij-şoreşê, hem jî pêngavên demokratîk-azadî tevî darbeyên totalîter-faşîst dikarin di zikhev de biqewimin. Yên sîstemên rêbaz û zanistê bi hosteyî pêşde bibin û bixin bingehê çalakiyên xwe, herî zêde ew ê bibin xwediyê şensê avakirina sîstema nû ya civakê.

**14-** Tevgerên demokratîk, ekolojîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz (adil) di demên krîzên strukturel û neqeba kaosê de bi pêngavên destpêkê yên piçûk ên hosteyane dikarin di demên kurt de paşeroja dirêj diyar bikin.

Ji bo vê jî:

**1-** Divê sosyolojî di çarçoveya dîrokî û mekanî de weke rêberê çalakiyan bê dîtin;

**2-** Modernîteya kapîtalîst êdî avabûna wê ya bi kansêr di gelek qadan de xwe dide der, li gorî vê rastiyê, bi çardeh xalên me hewl da bi nav bikin, divê li dijî wê bê derketin û çareseriyên li dijî sîstemê bêne dîtin;

**3-** Divê dualîteyên çor hemû (di serî de îdealîzm-materyalîzm, diyalektîk-metafizîk, lîberalîzm-sosyalîzm, deîzm[33]-ateîzm[34] û her wekî din) yên xwe dispêrin cihêkariya îdeolojîk a sûbjektîvîzm-objektîvîzmê li dawiyê bêne hiştin û manedartiya (hunerê şîroveyê) bi tevahî destketiyên zanistî dixe hîmê xwe esas bigire;

**4-** Metafizîkeke mirov a girêdayî qencî, delalî, azadî û rastiyê hem divê di rêbaza rexneyî de, hem jî di pêngavên avakirina nû

---

[33]Deîzm: Li ber her cure baweriya bi rêya dêrê heye radibe. Lê ew jî bawer dike ku her kes bi hatina dinê re xwedî baweriyeke dînî ye. Li gorî deîstan xwedê carekê gerdûn afirandiye û paşê jî têkilî ti karûbarê dinyayê nabe. Deîzm xwe dispêre têgîna 'dînê xwezayî' û bawer dike mirov bi bîr û hişê xwe radibe û hêza xwe ji hundirê xwe digire.

[34]Ateîzm: Xwedanenasî.

de ti carî neyê kêmkirin;

**5-** Divê gotina siyaseta demokratîk esas bê dîtin;

**6-** Divê li qadên krîz û desthilatdarî hebe li dora gotina siyaseta demokratîk bi hezaran organîzasyonên civaka sivîl (li gorî pêdiviya bi wan ji sisê heta organîzasyonên bi hezaran kes têde cih bigire) bêne pêkanîn;

**7-** Divê civaka neteweyî ya nû were avakirin weke neteweya demokratîk bê sazkirin; neteweya demokratîk dikare li derveyî dewleta netewe û li kêleka wî yan jî di zikhev de hebe;

**8-** Şêwazê rêveberiya siyasî ya neteweya demokratîk dikare bi awayekî xwecihî, neteweyî, herêmî û li ser hîmê konfederalîzma demokratîk a dinyewî pêşde bibe (neteweyên cihê dikarin xwe weke neteweyekî demokratîk bi rêxistin bikin. Di nav heman neteweyî de dewleta netewe û neteweyê demokratîk dikarin xwe bi rêxistin bikin. Konfederalîzmên herêmî yên demokratîk û Konfederalîzma Neteweyên Demokratîk ên Dinyayê dikarin li gorî Neteweyên Yekbûyî ya niha hewce bin û di çareserkirina pirsgirêkên dinyewî û herêmî-neteweyî de bi tesîr bin.);

**9-** Li hemberî îndustriyalîzmê ya ji modernîteyê maye û yek ji şaxê wê yê xurt e, (Modernîte sê şaxên wê hene: a- hilberîna kapîtalîst, b- îndustriyalîzm, c- dewleta netewe) divê civaka demokratîk ekonomî û teknîkê ekolojîk bike;

**10-** Divê parastina civakê ji aliyê milîsên gel ve bê bicihanîn;

**11-** Li şûna nîzamê mêrane yê bingehê xwe dewlet û hiyarerşiya bi hêz e, divê sîstemên nû yên malbatan ên xwe dispêrin wekhevî û azadiya kûr a ji koletiya kûr a jinê rizgarbûne bêne avakirin.

Em dikarin fikra xwe ya paradîgmatîk hînê bi gelek xalan berfirehtir bikin, lê ez yeqîn dikim ku xalên me pêşkêş kirin têrê dikin. Em baş dizanin, di demên modernîteya kapîtalîst de heman demê ji bo utopyayên azadî û wekheviyê qiyamet hatin rakirin. Ji bo van utopyayan bi cih bînin gelan pirr hewl da û li ber xwe dan. Mîna deryayê xwîn herikî. Êşkence li bê hejmar kesan hat kirin û êş hatin kişandin. Em van hemûyan bîla heq çûyî nahe-

sibînin. Berevajî, hewldana me ya ji bo çareserkirina van pirsgirêkan, şîroveya me ya rast a dîrokê wê pêşiya me rohnî bike û kengî em utopyayên xwe bi jiyana xwe re bikin yek, em ê karibin gav biavêjin jiyana bi eşqê hatiye hûnandin, ev bi tevahî ji bo vê ne. Ji ber ku ji gavavêtina jiyanên bi hêvî, bi hêz û bi utopya re hewldanên gelekî zehmet divên.

Em di wê rewşê de nînin ku hedê xwe nizanibin û sîstematîka rêbaz û zanistê ji nû ve ji xwe bidin destpêkirin. Lê di tevahiya mijaran de ku min hewl da behs bikim, min hewl da dest nîşan bikim ku hin tişt çewt û şaş dimeşin û di esasê xwe de ev yek paradigmayî ye. Ez bi girîngeyeke mezin diyar dikim ku divê şîrove û hewldanên min ên bicihanînê weke ji binî ve avakirina sîstemeke nû neyên dîtin, ne jî yên ez rexne dikim bi tevahî weke redkirinê (înkarwarî, nîhîlîstî) bêne dîtin. Axir, girîng e ku mirov moderníteya kapîtalîst a rê li ber gelek trajedî û serhatiyên bi mîlyonan kesên mîna min vekiriye, rexne bike. Jixwe di demekê de ku herêm û gel ê ez mensûbê wan im (Kurd û Rojhilata Naverast) di pêvajoyeke trajîk a bêrehm a dîrokê re derbas dibin, bi awayekî hêja şîrovekirina van faktorên ji vê rewşê berpirsiyar, bi kêmanî şertê rewşenbîriyê ye. Tevî vê, eger ez weke serê rêxistiniyeke pirr bi tesîr û berfireh têm mehkemekirin, hingî normal e ku erka min a sereke, di çarçoveya van mijarên destnîşankirî de ji pirs û bersivan pêk were. Eger li cih û zemanekî zordestî, îstîsmar, helandin û asêmayîn kûr be û jiyan di rewşeke welê bê rûmet de ji mirinê xirabtir be, wer xuya ye li wir ji bilî nêzîkatiya paradîgmayeke bi reh û kok çareya me nîne. Ji vir û pêve em ê derbasî vê nêzîkatiyê bibin.

## Beşa Duyemîn:
## ÇAVKANIYÊN BINGEHÎN ÊN ŞARISTANIYÊ

Em ê di vî beşî de sedemên rê li ber şaristaniya me ya îro vekirine ji aliyê cografî û dîrokî ve hewl bidin şîrove bikin. Em êdî baş dizanin ku ji bo mirov civakekê baş nas bike divê mirov şertên cografî û dîrokî yê wê civakê baş nas bike.

Ji dema mirov ji prîmatiyê veqetiya û gihişt heta şoreşa cotkariyê, dîrok niha bi tevahî heta heft milyon salan dûr diçe. Cih Rojhilatê Efrîka xeta Rîf e. Çi bermahiyên arkelojîk, çi jî hebûneke zêde cinsên nêzî insên li herêmê aniha vê tezê piştrast dikin. Bi temamî nayê zanîn, gelo qutbûn bi rêya mûtasyonê (bi pêşketineke ji nişka ve), yan jî bi beridînê re çêbûye, jixwe ev yek ji bo mijara me jî girîng nîne. Ji bo cinsê em behsa wî dikin, sîstema qirikê rê dide karibin gelek dengan derxînin, meznahiya mejî avantaj e. Rîf a Rojhilatê Efrîka hem çol û daristan, hem jî xwedî gol in ku ev jî ji bo ewlehiya cinsê em behsa wî-wê dikin stratejîk e. Nemaze wextê timî ber bi golê ve reviyane, çûne, heye ku pûrt û pirça xwe wenda kirine û li şûnê bûne xwediyê mûyên îro bi mirov ve hene. Rewşa bahewayê jî ji bo vê yekê li cih e. Avantajeke din a Rîfê ew e ku wexta gelî û perav bêne şopan-

din rêyeke xwezayî ye ku xwe digihîne Torosan. Ev rê herdu parzemînan (Asya û Efrîka) digihîne hev û ji hev dike. Tê texmînkirin ku yên li Rîfê weke klanan bi mîlyonan sal mane. Mirov dikare bibêje; timî bi nava Efrîka ve koç kirine. Gelek agahî hene; nîşan didin ku belavbûna vî cinsî ya dinyayê esas li ser xeta bakurê Rîfê pêk hatiye. Tê texmînkirin ku heta bi homo sapiens (mirovê difikire) gelek cins û texlîd bi heman rêyê belav bûne. Li deverên din ên dinyayê heta niha şopên cinsê bişibe mirov nehatine dîtin. Cinsên heta niha hatine keşifkirin bi koka xwe ji Rojhilatê Efrîkayê ne.

Li deverên cihê yên dinyayê gelek fosîlên temenê wan herî kêm mîlyon sal in, hatine dîtin. Tê qebûlkirin ku bi tevahî cins, beriya serdema çaremîn a qeşayî li dinyayê belav bûne.

Li gorî feraziye û îhtîmalan di tevahiya vê dema dirêj de cinsên mirov weke klanên ji bîst-sîh kesî tevgeriyane, debara xwe bi nêçîr û berhevkirina pel û pincaran kirine. Di çêbûna dest û lingan de van herdu çalakiyan roleke grîng bi cih anîne û ev fikir bi giştî tê qebûlkirin. Bermahiyên fosîlan jî nîşan didin ku di şikeftan de, li giravan û di stargehên li ser daran de li cihên ewle mane. Hînê malbat û milkiyet çênebûye. Mirov dikare bibêje ku di vê demê de klan bi xwe malbat e. Tê texmînkirin ku karîbûne bi zimanê îşaretan (zimanê deng û beden) li hev bikin, û deng gihandine asta sembolan. Em niha baştir fêhm dikin ku ji bo ziman xwe bigihîne asta sembolan pêvajoyeke dirêj a pratîk hewce dike.

Li gorî lêkolînan, li derdora sedûpêncî-dused hezar salan berê cinsê sapîens nêzî zimanê sembolan bûye. Heman lêkolîn nîşan didin ku li şûna zimanê îşaretan cara pêşî dayika zimanên modern, zimanê dengan ê xwe gihandiye dengên sembol jî li gorî texmînan berî pêncî hezar salan li ser heman xeta Rîfê di bakur re li dinyayê belav bûye. Lihevkirina bi zimanê sembolan avantajeke mezin e. Mirov dikare bifikire ku komên baş li hev dikin û tevdigerin serdest bûne. Dibe ku sedema bi lez qirbûna cinsên din girêdayî vê rewşê be. Dem di heman demê de serdema Qe-

şayê ya Çaremîn e (pleîstosen). Yek ji texmînan dîsa ew e ku di wê demê de cinsê Neanderthal zêdetir e, lê herdu bûyer li hev rast tên û dibe ku dawî li cinsê Neanderthaler tîne. Efendiyê nû yê dinyayê bi tevahiya heybeta xwe li ser dikê ye: Homo Sapiens, Sapiens = mirovê difikire û dipeyive. Em di destpêkê de cihêbûna nijad û ziman nabînin. Lê em dikarin texmîn bikin ku weke komên mezin tevgeriyane, bi plan nêçîr kirine, şikeft weke mal û perestgeh bi kar anîne, jinan pel û pincar berhevkirine û mêr jî di nêçîrê de pispor bûne. Li gorî hin berhemên arkeolojîk îspat dikin ku cinsê dipeyive li ser hîmê me behskirî têra xwe pêş dikeve. Xet û resmên li herêma navbera Franse û Spanyayê, û resmên li şikeftên Colemergê hatine dîtin ji vê demê mane. Herdu herêm jî ji bo koçberiyên ji Efrîkayê li cihekî baş in. Ev qad li cihekî wisa ne, xwe gihandina wan di ser Rojhilat û Rojavayê Derya Spî re mumkîn e. Ev yek bi teoriya giştî ya koçberiyê û belavbûna li dinyayê re li hev dike.

# 1- MIROVATÎ ÇI DEYNDARÊ KEVANA TOROS-ZAGROS E?

Di derketina Rîfa ji Rojhilatê Efrîkayê de gelek arguman hene ku me difikirînin, deriyê sereke yê li ber kombûne û ji vê navendê li dinyayê belavbûne kevana Toros-Zagrosan e. **Ya yekemîn,** ev kevan dawiya rêya xwezayî ya ji Rîfê ye. Ref bi ref tên vê derê. Çi Sehreya Mezin û çi jî çola Erebistanê mîna ji rojhilat û rojava ve deriyên xwe girtine, ji lewra peravên Suveyş û Rojhilatê Derya Spî bi awayekî xwezayî dibin rêyên pê belav bibin. Peravên Başûrê Derya Spî jî di ser Tengava Cebelîtariqê re ber bi Spanya û Ewrûpayê ve rêyeke duyemîn teşkîl dike. Li gorî rewş û şertên cografî bi qasî Rojhilatê Derya Spî bi xêrûber nîne. Astengiyên ciddî û pirsgirêkên mezin ên qût û xwarinê hene. Rêya herî îdeal ji peravên Rojhilatê Derya Spî pêve di Hîlala Bi Bereket re derbas dibin ku ji kevana rêzeçiyayên Toros-Zagrosan re Hîlala Bi Bereket an jî Hîlala Zêrîn tê gotin. Şertên vê derê ewqas li cih in, mumkîn nîne cinsê mirov nebe civak û pêş nekeve.

Ji vir em dikarin xusûsa **duyemîn** derxînin: ji bo mirovan rewşa xweş ya av û bahewayê, erdên bi xêrûber, nebat, fêkî û darên

mêwan, hebûna gelek nêçîran, şikeftên ewle û stargehên qenc, hebûna gelek rûbar û çeman, paşê di bîra mirovan de têgîna 'cennetê' çêkirin. Herêmên çol ên nêzî van deveran wexta li ber hev hatin girtin, tê fêhmkirin, çima di bîra mirov de rê li ber dualîteya cennet-cehennemê vekiriye û weke yek ji têgînên bingehîn cih girtiye. Piştî Rîfa Rojhilatê Efrîkayê mirov vê qadê dikare weke qada duyemîn a herî zêde lê cinsê insên kom bûye, bihesibîne. Eger em vê deverê di dîroka mirovatiyê de ji aliyê pêşketina şaristaniyê weke devera 'kurkketinê' bi nav bikin wê zêde nebe gotinek ne di hedê xwe de ye. Her weha weke devera çîrok û çîvanokên destanwarî yên mirovatiyê lê hatin nivîsandin an jî ya rastî lê dest pê kirin çêbûn jî mirov dikare pîroz bike. Şoreşên mezin ên piştre çêbibin jî wê berhemên vê destana pîroz bin.

**Ya sêyemîn,** li derdora sedûpêncî hezar sal berê kombûna li vê qadê li ser hîmê zimanê îşaretan pêş ketiye. Ji zimanekî paşvemayî yê mîna îşaretan gavavêtina ber bi zimanê sembolan, potansiyeleke mezin a pêşketinê ye. Li herêmeke berfireh pêkhatina komên mirovan ên xwedî ziman rê li ber civakbûnê, starê û qûtpeydakirinê vedike. Belkî jî di dîrokê de şoreşa herî mezin a nav lê nehatiye kirin û hînê keşfa wê nehatiye kirin, ev e. Belkî li cih be ku em ji vê şoreşa mezin re bibêjin; 'ŞOREŞA ZIMAN'. Ji ber ku ti şoreşê bi qasî vê şoreşê li ser vê cografyayê rê li ber civakbûnê venekiriye. Her roj têgîneke pîroz (heywanên nêçîrê û nebatên nû yên tên keşifkirin) tê çêkirin, pergaleke nêzî ya malbatê tê avakirin (cara pêşî avakirina stargehan) û her çar demsal bi hemdê xwe li ser vê cografyayê xwe nîşan didin. Wexta ev pêvajo hemû bi têgîn dibin; zimanê hevpar ên civakên berfireh çêdibe û pêre cara pêşî 'NASNAME' ya civakan ji hev cihê dike, pêk tê.

Mixabin, çi rewşeke xembar e, li van deveran ku cara pêşî etnîsîte çêbûn, îro qirkirineke hov a nasnameyan heye. Ya em jêre dibêjin; 'pêşketina mezin a civakî' di vê pêvajoyê de bi têgîn û bûyerên dewlemend pêk tê, ya rastî tê avakirin. Bi pêşketina têgînan re, rê li ber pêşketina fikrê jî vedibe. Îhtîmaleke mezin e,

mirovên bi têgînan li hev dikin û pê digihîjin hev, êdî nabe weke klanan bimînin û ji bo civakbûneke hînê jor dikevin nava dînamîzmeke mezin. Ez wer bawer dikim ku ev qad yek ji qadên bingehîn e, divê hem ji aliyê antropolojî û hem jî ji aliyê serdemên berî dîrokê ve, were lêkolîn. Dîroknas û arkeologê mezin Gordon Childe[35] bi awayekî xurt û mafdar bi hisên xwe herhal têderxistiye ku di pirtûka xwe de ya berhema wî ya girîng e, û têde bûyerên wê demê li vê cografyayê qewimîne nivîsîne, navê 'DI DÎROKÊ DE ÇI QEWIMÎ' lê kiriye. Xusûseke din heye ku divê ez bi taybetî bibêjim; bi rêbazên arkeolojîk bi tenê raboriya herêmê nayê rohnîkirin û analîzkirin: kengî ji biyolojiyê heta fîlolojiyê, ji cografyayê heta sosyolojiyê, ji antroplojiyê heta teolojiyê disiplînên gelek zanistan gihiştin hev, hingî mirov dikare dîroka serdema pêşî bi awayekî berfireh rohnî bike. Di vir de em tenê balê dikişînin ser û banga wezîfeyê li pêwendîdaran dikin.

Li gorî zanista jeolojiyê berî bîst hezar salan serdema qeşayî ya çaremîn bi dawî dibe. Zanistên din jî bi agahiyên xwe vê yekê wexta destek dikin, ev tespît nêzî rastiyê ye. Îspat bûye ku berî deh hezar salan baran û hêşînî li Erebistan û Çola Mezin hînê zêdetir bûn. Ev rewşa têr derfet û îmkanan dide, bi dema destpêkirina şivaniyê re li hev rast tê. Tevî vê yekê, pêşketineke din a mezin; ji zimanên destpêkêyê Efrîkayê pêşketîtir koma zimanên semîtîk xwe nîşan dide. Çanda semîtîk di cewherê xwe de 'çanda şivantiyê ye'. Mînak şivantî ewçend bi qîmet bûye, çandeke mezin a ketiye serhev der barê mih, bizin, deve û heywanên din de hebûna xwe hînê dewam dike. Li ser vî hîmî em dibînin etnîsîte pêk tê û nasnameyên cihê çêdibin. Hebûna çandeke xurt a etnîsîteyê (eşîr) di wê astê de ye ku vê çavdêriya me îspat bike. Di gelek gotinên şaristaniya Sumer û Misrê de bandora vê çandê tê dîtin. Li derdora şeş hezar sal berê, bi rewşa av û

---

[35]Gordon Childe: Arkeolog e. Di 14'ê Nîsana 1892'an de li bajarê Avusturalyayê Sydneyê tê dinê. Nêrîna Marksîst a li arkeolojiyê bi wî dest pê kiriye. Xebatên xwe yên li Mezopotamya û Iraqê bi berhema xwe ya bi navê 'Di dîrokê de çi qewimî' weşand. Child di 19'ê Cotmeha 1959'an de wefat kir.

bahewayê ya baş ve girêdayî, çanda Semîtîk ji Sehra Mezin heta Rojhilatê Erebistanê, ji Bakur jî heta zeviyên ji bo cotkirinê bi xêrûber, wisa şop hiştine, mohra xwe li dîrokê xistine. Qada çanda semîtîk weke dewam û qonaxeke çanda Rîfa Rojhilatê Efrîkayê pêşketiye. Ev nifşê di vê qonaxê de paşê wê bi dînên yekxwedayî xweseriya xwe pêk bîne.

Lê belê bi taybetî divê ez bibêjim, ev çand li şûna ku di pêkhatina şaristaniya Misr û Sumer de diyarker be, li ser qada herdu şaristaniyan bi navê Aramît û Apîrû (mirovên gemarî û tozgirtî yên ji Rojava û Rojhilat hatine) di dîrokê de wê weke yekemîn qebîleyên dagirker bêne qebûlkirin. Semîtîk di şeveqavêtina dîrokê de pêkhatineke gelekî girîng in, mîna ku bi dengên lingê xwe erd hejandibin û hatibin. Li Bakur ji erdên bi xêrûber nebihurîne, sedema vê jî dibe ku pêşketina çandeke ji ya wan xurttir be. Em dikarin ji vê çandê re bibêjin; gav bi gav ketina nav çanda zevî û cotkariyê, her wisa belkî jî li cih be ku em vê çandê weke 'çanda zeviyan' jî bi nav bikin. Jixwe di dîrokê de ji vê pêşketina dîrokî re 'Aryen' dibêjin. Bi maneya kesên xwedî zevî û xwedî erd (Arî li ser van erdan xwediyê çanda yekemîn in, û di kurdî de bi maneya 'ax, cih û zevî' tê bi kar anîn) mirov dikare bi nav bike. Aryeniyên ku bakurê Semîtîkan, kevana Toros-Zagrosan weke qadeke sereke cara pêşî li cotkariyê vekirin, mirov dikare wan weke afirînerên cotkariyê bi nav bike.

Di vê pêşketinê de, av, ba, hewa, erdên bi bereket, texlîdên heywanan û nebatên cûrbecûr rol lîstine. Li deverên Semîtîkan cotkarî li wahayên[36] teng bi hebûna xurme û çend cureyên din pêk dihat, lê li aliyê din ê kevanê zevî ji bo çandiniyê gelekî baş bûn. Li vir zeytûn, bindeq, çilo, hevrist, rez, qût û zad baş digihiştin. Dîsa gelek heywanên tên kedîkirin di serî de mîna mihên kovî, bizin, dewar, beraz, kûçik û pisîk li deverê kom bi kom digerin. Li banî û zozanên çiyê daristanên mezin hene. Çar demsal bi temamî têne dîtin. Baran mîna ku bi rêkûpêk av bide dibare. Kevî û devên gelek çem û rûbaran ji bo avakirinê xweş bûn.

[36]Waha: Li çolan avzêya dora wê hêşîn. Li çolistanê girava hêşîn.

Di nav van şert û mercan hemûyan de êdî ‘dema şeveqavêtina dîrokê’ bûyerek e ku divê biqewime.

Li gorî tespîtên jeolojî û serdema destpêkê, li deverê beriya panzdeh hezar salan qeşayê xwe vekişandiye çiyan. Tê texmînkirin ku tevahiya sedhezaran salî cinsê mirov li vê deverê kom bûye. Piştî şoreşa ziman a li deverê û xweferzkirina çanda Semîtîk li herêmê demeke kin serdema mezolîtîk[37] pêk tê û paşê derbasî serdema neolîtîk dibe. Şikeftên li Colemergê gelek îşaretên serdema mezolîtîk û serdema piştî wê dide me. Di vê mijarê de kevirên hatine verotin têra xwe delîlan pêşkêşî me dikin. Em dibînin li herêmê gavên mezin bi serdema neolîtîkê re hatine avêtin. Gelek delîl hene ku beriya duwanzdeh hezar salan çanda neolîtîk li vir dest pê kiriye. Ev serdema ku em dikarin weke Şoreşa Gund, Zevî û Cotkariyê jî bi nav bikin, çi ji alî mirovatiyê û çi jî ji aliyê şaristaniyê ve (dîroka nivîskî) weke şertekî pêş xuya dike. Bi serê xwe Serdemeke Çandê ya mezin e. Girîngiya vê çandê bi qasî were zanîn nehatiye dîtin û di dîrokê de cihê heq kiriye nedîtiye. Ji lewra mirov çiqas li ser vê çandê rawest e, li cih e. Wexta Gordon Childe dibêje; girîngiya vê çandê ji çarsed salên dawî yên çanda Ewrûpaya Rojava kêmtir nîne, hînê zêdetir nêzî rastiyê ye. Di vê serdemê de ewçend îcad û vedîtin hene ku bi jimartinê naqedin. Cotkarî, pîşesazî, çûnûhatin, star, huner, rêveberî, dîn û bi tevahî pêşketinên li deverê di asta şoreşê de ne. Di her warî de bi hezaran rastiyên nû hatine keşifkirin û nav li wan hatine kirin.

Bi vî awayî ji zimanê Semîtîk berfirehtir û heta di ser xizna teng a zimanê şivantiya Semîtîk re ‘Koma Zimanê Aryen’ bi gewde bû. Mîna ku hafize û bîra mirovatiyê ya wenda nebe, hîmê wê hat danîn. Ev koma zimên bi çand ji Hindistanê heta peravên Ewrûpayê belav bû ku ev yek jî careke din analîza me ya di vî warî de piştrast dike. Weke tê bawerkirin, koka koma zimanê Aryen ji Ewrûpa, Hindistan û herêma (Bakurê Derya Reş, kepirên Rûsya, zozanên Îranê) di navbera herduyan re derbas dibe, nîne. Koka wê li devera kakil a Kevana Bi Bere-

[37]Mezolotîk: Serdema navîn a kevir, B.Z. li derdora 15 hezar-10 hezarî.

ket e (Hîlala Bi Bereket). Hem analîza gotinê (Aryen) ya etîmolojîk, hem jî têkiliya rengê gotinên bingehîn ên etnîk ên di nava tevahiya komên ziman ên Hind-Ewrûpa de têne bikaranîn vê rastiyê piştrast dikin. Ya hînê girîngtir ew e ku devera em behsa wê dikin ji bo çandê herêma kakil û dendikê ye, ji lewra bi awayekî pirr xwezayî pêkhatina ziman û gotinan jî divê li vir çêbibe. Avahiyên çandî yên etnîk ên hînê hene û delîlên dîrokî yên din vê rastiyê bi zêdeyî îspat dikin.

Wê wextê fêhmkirina hebûna nifşê duyemîn ê çand û ziman, dîrok û belavbûna wê, çi ji aliyê pêşketina civakî û çi jî ji aliyê qonaxa şaristaniyê (bi bajar) ya gihiştiyê, xwedî cihekî dîrokî ye. Em dikarin bibêjin ku tebeqeyên din ên berê bi tevahî di nava van herdu komên çand û ziman ên sereke de heliyane. Tenê wexta heman serdema qeşayî bi dawî bû, piştî wê li keviyên başûrê Sibîryayê (Yaqûtîstan û hwd.) koma çand û zimanekî sêyemîn çêbû. Ev çanda ku neh hezar sal berî niha ber bi başûr ve belav bû, heye ku welatê wê yê esasî Çîn be. Mirov dikare bibêje; ji vê çanda ku seriyê wê yê başûr digihîje heta Fîniyan di serî de Tirk, Moxol, Tatar, Koreyî, Viyetnamî û Japonî weke nifşê sêyemîn ê Bakur çêbûn. Li parzemîna Emerîkayê çanda bi koka xwe ya Çermesoran jî di ser Tengava Beringê re di encama belavbûna heman demê de pêk hatiye û di vî warî de em xwedî delîlên xurt ên arkeolojîk, etîmolojîk û etnolojîk in. Em Eskîmoyan jî dikarin bixin nava vê komê. Gelek çandên Efrîkayê yên hînê hene, tevî ku xisletên xwe yên hezaran salî diparêzin jî tesîrên xurt ên koma Semîtîk li ser wan hene. Nemaze yên di nav koma zimanê Sahilî de cih digirin welê ne. Di nava kûrahiya daristan, çiya û çolan de jî mumkîn e mirov li klanên weke berî mîlyonan salan dijîn rast bê.

Li gorî vê tabloyê, di serî de li bakurê navîn ê başûrê dinya me, berî niha bi şeş hezar salan, sê komên ziman û çandê yên bingehîn ji bo destpêka şaristaniyê çêbûne. Pirr normal e ku çandên behsa wan têne kirin gelek caran bidin û bistînin. Bi bandora dîrok û cografyayê xwediyê xisletên cihêwaz in ku ev yek îro jî bi hêsayî tê dîtin.

Ji aliyê mijara me ve yek ji xusûsên girîng ew e ku dema em çavkaniyên şaristaniya Hind-Ewrûpayê lêdikolin, divê em çavkaniya dayik e, rast teşxîs bikin. Zanista dîrokê, çanda kakil a di bin bandora zeman-mekan de pêşî li ber çav digire û li ser radiwest e. Em îro baş dizanin ku çanda kapîtalîst jî belavbûneke xwe ya dijwar a kakilî heye. Têgihiştinên li dîrokê yên xewn û xeyalî yên çavkaniyên xwe tinene, derbên xedar li serwextbûna me didin. Kesên nikaribin têgihiştina xwe ya dîrokê bigihînin şîroveyeke gelekî girîng wê nikaribin şîroveya xwe ya îro manedar bikin. Mumkîn nîne mirov civakeke bê dîrok bi temamî fêhm bike û lê serwext bibe.

Min di parêznameya xwe ya berê ya bi navê 'Parêznameya Mirovê Azad' de çavkaniyên şaristaniyan nirxandibûn, li ser wê hin rexne li min hatibûn kirin ku ez reduksiyonîst nêzî şaristaniya Sumeran a li ser tejaneya Firat-Dîcleyê bûme. Ez ê van rexneyan jî li ber çav bigirim û dibêjim; ez di rewşeke reduksiyonîst de nînim, lê divê ez bibêjim ku ez girîngiyê didim çavkaniya dayik e. Eger mirov dîrokê bişibîne çemekî sereke yê rola dayikê dilîze û rûbarokên têne bi ser ve dibin, çandeke sereke yanî dayik heye û şaxên jê diçin hene, bi mebesta balê bikişînim ser vê rastiyê, ez fikrên xwe weke pêşnûmeyekê diyar dikim. Ya rastî balê dikişînim. Çawa ku îro şaristaniya serdest yanî modernîteya kapîtalîst xwe dispêre koka şaristaniya Hind-Ewrûpayê, çanda Hind-Ewrûpayê jî xwe dispêre çanda çavkanî ya Aryen û şaxên wê yên Sumer û Misrê.

Eger em di şaristaniya mirovatiyê de pirsgirêka çemê sereke yanî dayik û şaxên wê rast analîz nekin, em roja me ya îro jî nikarin rast bi nav bikin. Şaxên (rûbarok) ji çemê sereke yanî dayik diçin, xurt diherikin, lê hin ji wan di nîvê rê de zuha dibin û dimiçiqin. Her weha çavkaniya çemê sereke jî xwedî maneyeke diyarker e. Eger em dixwazin pêşketina civakî ji aliyê dîrokî û cografî ve bi temamî fêhm bikin, divê em gerekên rêbazê di çareserkirina pirsgirêkan de biceribînin.

## 2- PIRSGIRÊKÊN BELAVBÛNA ÇAND Û ZIMANÊ ARYEN

Nêzîkatiyên şaristanî û çandan di dîrokê de weke bingeh dibînin kêm in. Yên heyî jî xwedî nêrînên cihê ne. Em hewl didin pirsgirêkên li vir çareser bikin, li ser hîmê çand û şaristaniyê çareser nakin. Em neçar in, zeman û mekanê şaristanî û çandê di pêşketina civakê de bi qasî diyarkerî û kêrhatina wê bigirin dest û li ser rawestin. Naxwe dîroka li ber destê me (ku pirranî weha ye) wê ji 'komeke bûyeran' zêdetir ti maneya wê tinebe. Ji ber vê taybetmendiyê, zanista dîrokê hîn nake, mirov ji hînbûnê digire. Hema bêje dîrok ji gidîş û lodeke dîn, xanedan, qral, şer, qewm û hejmareke rastiyên weke wan pêk tê; pêşketina civakî hîn nake, ji bo pêşiyê li hînbûna wê bigire piştperde dike. Ev hewldanên îdeolojîk in, zêhn û hafizayê ji desthilatdar û îstîsmarkaran re amade dikin. Şêwazên vegotinê yên bi vî awayî amûrên propagandayê yên ji gelekî berê de mayî ne ku li ser hîmê îdeolojîk di rewakirina desthilatdar û îstîsmarkaran de têra xwe diyarker in.

Girêdayî daxuyaniya me ya der barê sîstema agahî-zanîn û rêbazê de em hinekî din bi analîza xwe dakevin. Rexneyeke din a der barê koma çand-zimanê Aryen de ew e ku bi sedema Hîtler jî ev têgîn bi kar aniye, heye ku bêhna 'nijadperestiyê' jê bê. Ji van kesan re dixwazim vê bibêjim: di navê partiya Hîtler de gotina 'sosyalîzm' jî hebû. Eger wisa be, ma divê em bibêjin; bêhna nijadperestiyê jê tê, wê biterikînin? Jixwe faşîzmê pirr bi awayekî serketî gelek têgînên cihê yên zanistî û îdelojîk bi kar anine, ango di hewldanên 'demagojîk' de têra xwe serketiye. Ji ber ku wisa ye, herhal nabe ku em dev ji zanist û îdeolojiyê berdin. Hîç nayê bîra me ku em milletgiriya li ser koka çand-zimanê Aryen bikin, berevajî divê ez bi serbilindî û anor bibêjim ku yek ji wan kesên ku li dijî milletgiriyê şîroveyên manedar kirine, ez im. Eger em bixwazin hovîtiya îro li Iraqê fêhm bikin, divê pêşî em qebûl bikin zanista me ya sosyolojî û dîrokê îflas kiriye. Piştre mafê me yê rexnekirin û pêşniyarkirina sosyolojî-dîrokî nû çêdibe. Jixwe ji bo ev trajediya mirovatiyê ji holê rabe, piçûk be jî em jî karekî kêrhatî bikin. Ev mijara ku min di parêznameya xwe ya bi navê 'Parêznameya Mirovê Azad' de rave kiribû, li vir careke din divê bi xetên sereke bînim ziman:

**a-** Em dibêjin; koma ziman-çanda Aryen çi di warê ziman de, çi jî di avakirina binesaziyeke bi kok a çandî de hîmekî girîng daniye û ev yek jî bi şertên dîrokî û cografî ve girêdayî ye. Salên navbera 10.000-4000î B.Z., 'dema dirêj' a bi cihbûn û bi sazîbûna vê çandê û vî zimanî îfade dike. Li nêzî vê demê her cure kûzikvanî, ji bo ajotina zeviyan bi karanîna nîr û heywan, tekelik, tevn, destar, huner û dîn bi sazî bûye. Lîsteyeke dûvdirêj a berhemên heywên û nebatan di zêdebûna şêniyan de xwe îspat dike. Ji kevirên baş hatine verotin û seqakirin tenê bivir, kêr, aş, tekerik, mîmarî, hunerên din û berhemên dînî nayên çêkirin; di dema kalkolîtîk[38] de ji kevirên madenê berhemên hînê baş û qenc têne çêkirinê. Em îro jî li gelek mînakên van berheman rast tên. Ji navenda erdkolanê ya Bradostiyan a li keviyên Zagrosan

[38]Kalkalotîk: Dema dîrokê ya bi xebitandina sifrê (paxirê) dest pê kiriye.

heta navendên erdkolanê yên li nêzî Qota Berçem (Çayonu) û herî dawî jî li Ûrfayê (Gobeklîtepe) yanzdeh hezar sal berî niha mînakên kevirên baş hatine verotin, şehkirin û niqirandin mîmariya dînî û xaniyên mezin hatin çêkirin û her weha gelek amûrên ji kevirên madenan hatine dîtin.

Xelkê herêmê îro jî van amûrên çandê û koma gotinên van amûran îfade dikin, bi kar tînin, ev jî nasnameya devera kakil an jî dendik rohnî dike. Di zimanê Ewrûpî de îro jî bi dehan peyvên têne bikaranîn meseleya çavkaniyê zelal dike. Mirov hin ji van gotinan dikare weha rêz bike: Geo-cih, erd, jin, roj, bra, mur-mirin, sol, neo-nû, ga, gran-gram, meş, xweda-guda-gudea û her wekî din. Ji koma gelên otantîk (gelên xwecîh ên herî kevin) yên herî têne naskirin Kurd, Fars, Afgan, Belûcî hînê jî van gotinên kok ên me jimartin bi kar tînin û ev yek jî nîşan dide ku koma çand-ziman a Arî ji çavkaniya Ewrûpa û Hindê nîne, ya me gotî berevajiyê vê yekê îspat dikin. Ev çanda ku em behsa wê dikin û em dikarin kokên wê bibin 12 hezar sal berê, kokên wê yên dîrokî di metnên nivîskî yên Sumeran de û di gelek navendên arkelojiyê yên li herêmê de têne dîtin. Di dema vê çandê de Ewrûpa li 'serdema kevir a kevin' bû, Hindistan jî li dema 'Pîgmeyan'[39] bû. Em bi hêsayî dikarin nîşan bidin ku çand-zimanê Aryen di vê 'dema dirêj' ya dîroka mirovatiyê de bi tevahî argumanên mirovatî îro dijî ji nêvî zêdetir û ne kêmtir çêkir û bi cih kir. Ji bilî hin navendên arkeolojiyê yên me weke mînak diyar kirin, hînê bi hezaran jî di binê erdê de radiwestin. Her weha komên gelan ên otantîk[40] ku îro jî hebûna xwe dewam dikin, jixwe her yek ji wan navendeke arkeolojiyê ya zindî ye. Em van gelan di dîrokê de weke nasname şeş hezar sal berê hebûna wan (kengî ji alî etnîkî ve cihê dibin) dibînin. Ez divê careke din bînim ziman ku navenda vê çanda kakil (Kevana Bi Bereket) di her warî de bi mane neyê îfadekirin, wê zanista dîrokê bibe xwediyê kêmasiyên mezin.

[39]Pîgme: Endamekî koma bi rehê xwe Efrîkî ku bi giştî bejna wan li derdora 150 cm e.

[40]Otantîk: Tiştên resen û orjîn in. Li gorî rastiyê ye, li ser koka xwe ye.

**b-** Em ji sedî sed cihê çand û zimanê Semîtîk weke rûbarokeke diherike ser çemê mezin nikarin piştguh bikin. Ji aliyê dîrokî ve, vî çand-zimanî xwe di heman demê de cihê kir, ji dewlemendiya wî guman nayê kirin. Ji aliyê çanda şivanî û eşîretê ve belkî jî hîn zêde dewlemend e. Belkî bi vî aliyê xwe ji koma çand-ziman a Aryen pêşketîtir be. Di metnên Sumeran de mirov şopan di vî warî de dibîne. Di van metnan de weke du bend şivan û cotkar ên di nav pevçûn û reqabetê de ne, bi zimanekî destanwarî behsa wan tê kirin. Çiqas dişibe Iraqa îro! Di ziman û çanda wan de vegotina destanwarî serdest e. Ji ber xisletên yeknesak ên çolê mîna hev in, pêkhatina xwedayê ezmên 'El, Ellah' li vê demê rast tê. Heye ku weke nasnameya civaka eşîran a harîqûlade ku cara pêşî xwe bi awayekî cihê nîşan da, mîna ezmanan têgîna 'El, Ellah' hat bilindkirin û gihişt pîrozbûnê. Durkheim têgîna xwedê weke 'nasnameya civakî' şîrove dike û mirov dikare vê şîroveyê ji bo mînaka 'El, Ellah' jî weke delîlekî destekdar ê bi hêz diyar bike. Wer xuya ye, di çanda Semîtîk de sazî û têgînên 'Şêx, Seyyîd' pirr zû bi gewde bûne. Di dema şaristaniyê de ev werdigerin saziyên 'pêxember û emîran'.

Tevî ku şaristaniya Firewnên Misrê di qada Semîtîk de cih digire, mirov nabîne ku bi kêra çanda Semîtîk hatine. B.Z. bi 4000 salan, em ti nîşaneyên maddî, têgîn û saziyan nabînin ku çanda şivantiyê rê li ber çandeke welê mezin a bajarvaniyê vekiriye. Jixwe belgeyên Misrê jî vê çandê ji xwe re gelekî xerîb dibînin. Zimanê herdu çandan jî naşibin hevdu. Çanda Semîtîk di qonaxa berê pêşî de B.Z. li derdora 2500 salan bi nasnameyên Aqad, Babîl, Asûr, Kenan û Îsraîlê di dîroka nivîskî de cih digire. Nasnameya Ereb piştre B.Z. li derdora salên 500î weke nav xuya dike. Sumeran navên weke Aramî, Aramît û Apîrû li wan kirin.

Pirr şîroveyên xurt hene ku dibêjin; Fenîke, Filistîn û heta Îraîl piştre di nava çand û zimanê Semîtîk de (mîna çanda Firewnên Misrê) heliyane. Ji deryayê ve dest pê dikin û bi çanda Aryen re di nav hev de ne. Belge hene ku piştrast dikin,

wan di nava pêlên koçberiyê yên Semîtîk de rengên xwe yên xwezayî yê destpêkê ji dest dane.

Semîtîkan gelek caran pêl bi pêl êrîş birine ser qada çand û zimanê Aryen an jî koçî devera wan kirine. Çavkaniyên Sumeran, gelek tespîtên arkeolojîk û bermahiyên otantîk ên hînê hene di vî warî de têra xwe belge û delîlan pêşkêş dikin. Vê êrîş û mêtingeriyê mirov dikare bibe heta B.Z. bi 5000 salan, nemaze li gorî rêzê Aqad, Babîl, Asûr, Aramî û Ereban li Mezopotamya Jor şopê mêtingeriya xwe hiştine. Ereb bi Îslamiyetê re bi xwe re asîmîlasyoneke dijwar dibin deverê. Îslambûn û Erebbûn di zikhev de dimeşe. Li dijî vê dagirkerî, mêtingerî û asîmîlasyonê ziman û çanda Aryen gelekî xurt li ber xwe daye, car caran bi êrîşan bersiv daye, dagir kiriye, û heta carinan karîbûye yên hember bike mêtingeh û asîmîle bike. Di vî warî de ji dîrokê mînakên mirov bide û têne zanîn hene, damezrînerên pêşî yên şaristaniya Sumeran, pêşiyên şaristaniya Misrê, Hîksos û Îbranî ji wan in. Pêşiyên destpêkê yên Sumeran, wexta çanda kakil a Aryen li Mezopotamya Jor di serdema Til Xelef de (B.Z. 6000-4000) ku dema wê ya herî pêşketiye, bi koçkirina Mezopotamya Jêrîn bi xwe re dibin û wê wer pêş dixin, derdixin qonaxa herî jor. Ev şîroveya herî nêzî rastî û qebûlê ye. Baş tê zanîn ku bandora zimanê Aqad, Babîl û Asûran piştre li ser ziman û çanda Sumeran bûye.

Divê mirov Sumeran ji komên koçkirî wêdetir weke belavbûna çanda serdema Til Xelef bi nav bike, ev yek ê ji bo şîrovekirineke rast a dîrokê hînê zêdetir bi kêr bê. Heye ku hin koman ji devera çanda Aryen koç kiribin. Lê faktora bingehîn a bi bandor, belavbûna çanda herî bi hêz e ku wê demê di serdema xwe ya herî bi hêz de ye. Carnan tê îdîakirin ku bandora Asya Navîn û Qefkasan bûye, ev îdîayeke tewş e. Ji ber ku di serdema damezrandina Sumeran de (B.Z. 5000) ev deverên behsa wan tê kirin hînê di serdema kevir a kevin de ne, û çanda Aryenî hînê nû nas dikin. Jixwe ji aliyê naverok û şêweyê ve di wê astê de nînin ku bandorê li çanda Sumer bikin. Ji ber ku çanda Sumer ji ya wan

gelekî pêşketîtir e, û ji aliyê naverok û şêweyê ve ji wan xurtir e. Her weha hêza wan nîne û ewqas ne pêşketî ne, nifşê çand-zimanê Aryen bibihurin. Bêguman rast nîne ku mirov çandan safî bifikire, ji ber ku ketina wan a navhevdu her tim mumkîn e, dibe ku hin koman ji Asya Navîn û Qefkasan koçî nav nifşên Sumeran kiribin, çawa ku îro gelek kes diçin DYE û Ewrûpayê, wê demê jî hin koman xwe li Kevana Bi Bereket girtibin. Ji gelek deverên dinyayê ji gelek qadan komên çandê yên cihêwaz û xizan îro berê xwe didin Ewrûpayê û li wir bi cih dibin. Çawa ku çanda îro ya Ewrûpayê li her devera dinyayê belav dibe, çand û zimanê Aryen jî nemaze di warê sazîbûn û zêdebûna şêniyan de bi taybetî piştî dema Til Xelef B.Z. 6000-4000î derfet û îmkanê belavbûnê dide. Koçkirina nava wan jî em dikarin bişibînin koçên xizanan ên ber bi nava Ewrûpayê.

**c-** Girîng e ku mirov newala Nîlê weke devereke girîng a çandê rast şîrove bike. Li vê newalê pêşketina çanda cotkariyê û gihiştina wê ya şaristaniya Firewnên Misrê, dike ku ji çand û zimanê Semîtîk re xerîb bimîne. Jixwe wer xuya ye ku naveroka çanda Semîtîk di wê qabîliyetê de nîne. Rengê zimanê Misrê bi tenê cihêwaziya xwe ji zimanê Semîtîk nîşan dide. Ji ber ku di navê de faktorên Semîtîk nînin. Hînê li başûr çandên li Sûdan, li Etiyopya û deverên din ên Efrîkayê di wê hêzê de nînin ku serdema kevir a kevin derbas bikin. Ji lewra ji aliyê teorîk ve mumkîn xuya nake ku ew rê li ber çanda Misrê vekin, ya rastî wisa jî nayê fikirîn. Dîsa ji aliyê teorîk ve kes nafikire ku komên ji qebîleyên Efrîka koç kirine li newala Nîlê rê li ber pêşketinê vekiribin. Ji ber ku ji bo vê, hewcedariya wan bi amûr û berhemên şoreşa cotkariyê hene. Em ti şop û nîşaneyan nabînin ku nebateke çandiniyê ya li Kevana Bi Bereket li newala Nîlê xweber şîn hatibe. Di warê heywanan de jî em ji bilî kera Misrê ti tiştê din nabînin.

Li gorî feraziyeyên teorîk çanda Aryen a li gelemperiya dinyayê belav bûye, mirov difikirîne ku di heman demê de şaxekî wê xwe gihandibe vê deverê. Divê neyê jibîrkirin ku Rîfa Rojhilatê Efrîkayê nêzî Newala Nîlê ye û çawa ku mirovan ji başûr ber bi

bakur ve koç kiriye, ji bakur jî ber bi başûr ve koçkirina mirovan mumkîn e. Çandên bi hêz timî bi van rêyên kevin tesîrên xwe belavkirine. Şaristaniya Misrê li salên 4000î B.Z. rast tê, çawa ku pêngava li Kevana Bi Bereket rê li ber çanda Sumer vekir, heye ku ber bi salên 5000î B.Z. bi aliyê vê deverê ve jî belav bûbe. Naverok, şêwe, derfetên çûnûhatinê rê didin vê yekê. Jixwe li ser heman rêyê di serê salên 2000 B.Z. de Hîksos, piştre di salên 1700 B.Z. de Îbraniyan (bi qasî ku dîroka nivîskî tespît dike) li Misrê koloniyên xwe çêkirin û heta asta rêveberiyê bilind bûn ku ev mînak jî fikra me piştrast dike. Herçend hêza belavbûnê ya çanda devera Aryen qels bibe jî çûna deverên Semîtîk a vê çandê wê paşê jî dewam bike.

**d-** Piştî ku çanda Aryen li Kevana Bi Bereket bi ser ket û saziyeke xurt çêkir, di belavbûna ber bi Îran, Afganistan, Pakistan û Hindistana îro de gelekî bi tesîr bû. Em careke din dubare bikin ku ya koçî van deveran dike ji mirovan wêdetir çand e, ango ne yên fizîkî bandorên çandî ne. Em tesîrên pêşî yên koçberiya çandê li zozanên Îranê 7000 sal B.Z. dibînin, li Hindistanê jî li derdora 4000 sal B.Z. destpêkiriye bi tesîr bûye. Li zozanên Turkmenistanê jî ev tesîr li salên 5000î B.Z. xuya dike. Mirov difikire ku çandên berê yên kevin kokên xwe Efrîkî ne, û di serdema kevir a kevin de hînê çikiyayî mane. Bermahiyên çandî û rengên fizîkî yên hin koman (bi taybetî li Hindistanê) vê tezê xurt dikin. Delîlên pratîk û teorîk ên ku mîna li Misr û Sumerê hebûna pêşketina çandeke berhema pêşketina xwecihî ye, piştrast dikin nînin.

Herçend hin rexne vî şêwazê fikrê reduksiyonîst bihesibînin jî divê ez bi taybetî bi bîr bixim ku di dîrokê de şoreşên çandî gelekî kêm çêdibin û pirr bi zehmetî pêk tên. Em li çanda Ewrûpa bifikirin. Mînaka wê li ti deverê nîne. Mirov fikreke bi heman rengî ji bo çanda li Kevana Bi Bereket a li gorî dema wê pêşkêş bike, têra xwe fikreke afirîner e. Ji komên li ber îmhakirinê û di nava tebîetên xwe yên hezar salan de asê mayî, mirov nikare şoreşa çandî hêvî bike û mirov nikare wê hêjayî wan bibîne, ev yek

ji aliyê fikir û bermahiyên çandê ve jî destekê nabîne û nayê qebûlkirin. Belavbûneke çandî ber bi rojhilat ve salên 3000 B.Z. li rojavayê Îranê li herêma Elamê xuya dike. Navenda wê Sûs e. Zêdetir dişibe mêtingeheke Sumeran û fena xwe gihandibe şaristaniyeke bajêr. Ji sedî sed bandora Sumeran e. Hînê li rojhilat li Pakistana îro li kêleka çemê Pêncavê (Pençab) damezrîna bajarê Harappa û Mohanjadaro jî li salên 2500 B.Z. rast tên. Eşkere ye, ev avahî li ser şopên Sumeran e. Nabe ku mirov bi toeriyên beravêtî van çandan weke avahiyên orjînal ên çandên din bihesibîne. Ji ber heman sedemên têne zanîn em wisa nafikirin. Tebeqeya çandî ya jêre orjînal tê gotin hema bêje di astekê de ye, dişibe 'Pîgmeyan', eger mirov ji wan şaristaniya bajêr a orjînal çêke, mîna ku mirov kerê hesp bifikire. Divê ez bi bîr bixim ku bi hezaran komên jiyana wan mîna hev û di heman astê de, bi mîlyonan salan li herêmên cografîk ên hînê pêşketî nikarîbûn heman şaristanî û şoreşên çandî yên mezin pêk bînin. Ji bo fikra me were fêhmkirin, bawer dikim ev yek têra xwe mirov hîn dike.

Bêguman deverên em behsa wan dikin di van pêşketinan de bi kêr hatine. Gelek sentêz çêbûne. Belavbûn û xwecihîbûn di zikhev de bi riza û bi dil e. Jixwe ya belav dibe komên mêtinger nînin, nirxên hilberandinê yên pêşdebirinê yên maddî û manewî ne. Çandên belav dibin ên xwe îspatkirî timî weke 'mûcîzeyên pîroz ên xwedêdayî' hatine hesibandin. Gelekî girîng e ku mirov çandên qîmeta jiyanê ya maddî û manewî bilind dikin bi çandên mêtinger, dagirker û asîmîlasyonên zordar re têkilî hev neke. Çandên belavbûne pirr kêmê wan bi êrîşên hovane, mêtingerî û şêwazê asîmîlasyona bi darê zorê meşiyane. Pirraniya wan ji ber ku bilindkirina asta jiyanê îspat kiribûn bi coş dihatin qebûlkirin û yên qebûl dikirin ew weke ya xwe didîtin. Helwestên teng ên milletgiriyê ji bo dîrokê, kirin ku ji nava meseleya belavbûnê kes nikaribe derkeve. Gelekî girîng e ku mirov ji aliyê sîstema rêbaz û zanîn-agahiyê ve bi helwestên milletgiriyê yên rastiyên herikîna dîrokî berevajî dike, piştperde dike, înkar dike û zêde mezin dike, nexape.

**e-** Liberhevgirtina çanda Çînê ya dayik û çanda Aryen, wer xuya ye, mijareke têra xwe balkêş e ku divê mirov lêbikole. Tê îspatkirin û tê fikirîn ku Çîn jî di salên 4000 B.Z. de ji neolîtîkê derbasî çanda jor bûye. Wexta em bifikirin ku di heman dîrokê de çanda Aryen ji Ewrûpayê xwe gihandiye Hindistanê, weke tezeke xurt em dikarin bibêjin; çanda Aryen derbasî Çînê jî bûye. Çanda Çînê bi îhtîmaleke mezin xwe bi çanda Aryen xwedî kiriye, lê nemaze ji ber xisletên wê yên cografî (devê Çemê Zer) û dîrokî yên li derve girtî û xweseriya wê, roleke sereke daye pêşketina binecih û xwemal. Ji sedî sed tesîr li Çînê kiriye. Lê xisletên çandî yên xwemalî li gorî xwe rê li ber şoreşeke 'neolîtîk' vekirine. Fena Çîna îro ye. Pêşketineke mezin a dîrokî û şertên cografî û demografî bi hev re çawa rê li ber 'kominîzmeke' li gorî xwe vekiriye, dîsa rê li ber 'kapîtalîzmeke li gorî xwe' vekiriye. Kominîzm û kapîtalîzm heta bi karektera Çînê re nebe yek, kominîzm û kapîtalîzma Çînê çênabe. Li dijî derve bi hêz li ber xwe didin, lê wexta bi ser nekevin piştre pirr bi lez û bi hêz çanda dijberê xwe qebûl dikin. Ev yek ji xisletên bingehîn ên wan qewman e ku di koma çanda dayik a Çînê de (Japon, Kore, Tirk, Moxol, Vîetnam û yên din) cih digirin. Dîsa ji xisletên bingehîn ên van qewman e ku pirr bi hêz dikarin li ber xwe bidin, lê di heman demê de dîsa bi awayekî nedîtî dikarin çanda dijber teqlîd bikin û zû dawerivînin hinavê xwe. Ev herdu alî di heman astê de bi wan re heye. Ev xislet, di çanda van qewman de weke xisleteke hevpar û veşartî ye.

Çanda Neolîtîk û qonaxa şaristaniyê ya piştî wê di ser Çînê re derbasî endamên komên din bûye. Eger mirov Çîniyan di nava koma wê de weke Erebên di nava koma semîtîk de bifikire mirovê karibe hînê baştir fêhm bike. Fena çanda semîtîk, koma çanda Çînê jî nikarîbû weke çanda Aryen taybetmendiya gerdûnîbûnê nîşan bide. Di vê rewşê de eger mirov Aryenan li rêza yekemîn, Semîtîkan li rêza duyemîn û piştî wan Çînê deyne, bawer dikim ku em ê çêtir karibin dabaşê hîn bibin.

**f-** Ya hînê girîng ew e ku mirov têkiliya di navbera koma çand-zimanê Hind-Ewrûpî û koma çand-zimanê Aryen de rohnî bike, belkî jî ev yek ji pirsgirêkên bingehîn ên zanista dîrokê ye. Li ser vê têkiliyê gelek spekulasyon têne kirin, lê ew yek ji wan xelekan e, li ser wê şîroveyeke hevpar çênabe. Di sedsala 19. de wexta hevpariya komên ziman ên Hind-Ewrûpayê hatin fêhmkirin, dest bi lêkolînên mezin kirin. Li ser çavkaniya dayik a koman, der barê 'çand û zimanê pêşiyan' de şîroveyên nakok hatin kirin. Li ser kok û rîşên van çandan gelek tişt hatin gotin. Hinek ji wan kok gihandin Yewnanan, hinan Hind, û heta hinan gihand Bakurê Ewrûpayê, hinan ji wan jî birin heta Elmanyayê. Lê piştî ku cihêbûna ji prîmatên (ruhberên berî mirov) li Rîfa Rojhilatê Efrîka û şoreşa cotkarî-neolîtîk a li Kevana Bi Bereket îspat bû, feraziyên behsa wan hat kirin, bi tevahî têk çûn. Herdu deverên navbihurî di dîroka mirovatiyê de gelekî girîng in ku me hewl da vê yekê bi kurtî û xulase rave bikin.

Guftûgoyên li ser otantîkbûna komên çand û ziman ên li Kevana Bi Bereket niha girîngtir bûn. Bi awayê em şîrove dikin komên 'Aryen' yên ji proto-Kurd, Fars, Afgan û Belûçiyan di vê guftûgoyê de li rêzên pêş cihê girîng digirin. Nemaze rengê zimanê Hûrriyan ku proto-Kurd in, diyar bû, aîdiyeta çand-zimanê Aryen ê xwe disipêre gelên otantîk zelal bû. Teza ez bi xwe jî rast dibînim ew e ku herêma kakil a şoreşa neolîtîkê tenê bi vê çand û zimanî çêdibe. Herêma kevan jî ji sîstema Toros-Zagrosan pêk tê û weke Hîlala Bi Bereket jî tê bi navkirin. Zelal bû ku ev herêm jî navenda çand-zimanê Aryen e. Xebatên etîmolojîk, erdkolanên arkeolojîk ên dawî û qiyasên di warê etnolojîk de her roja derbas dibe vê tezê hînê zêdetir xurt dikin. Bi vî awayî pirsgirêka çavkanî û jêderê ya ji koma ziman û çandê ya Hind-Ewrûpayê re pêşengî kiriye bi giranî çareser bû.

Ji ber ku 'dem' dirêj e, û cografya pirr fireh e, zêde rast nîne ku mirov nexşeya belavbûnê ya çand-zimanê Aryen hema weke tê gotin bide. Lê bi hêsayî mirov dikare şîrove bike ku belavbûneke mîna ya ber bi başûr û rojhilat ve ber bi bakur û rojavayê

Ewrûpayê ve jî pêk hatiye. Bi giştî ya tê qebûlkirin ew e ku li derdora 5000 sal B.Z. vê pêla belavbûnê destpêkiriye û B.Z. di salên 4000î de ber bi Rojhilatê Ewrûpayê, B.Z. di salên 2000î de jî bi tevahî ber bi Rojavayê Ewrûpayê belav dibe û bi cih dibe. Di serî de Gordon Childe dîroknasên girîng dîroka Ewrûpayê dispêrin van salan. Jixwe beriya van salan 'serdema kevir a kevn' e. Homo Sapiens sîh hezar sal berê li navbera Spanya û Başûrê Franseya îro cinsekî serwer bû ku ji Bakurê Efrîkayê belav bûbû. Tê texmînkirin ku di encama vê belavbûnê de herî zêde dema mezolîtîk 'serdema navîn a kevir' hatiye jiyîn.

Em di wê rewşê de nînin ku şoreşa cotkarî û neolîtîka Ewrûpayê lêbikolin. Lê ez bawer dikim ku ji ber giringiya xwe pirsgirêka çavkaniyê hatiye zelalkirin. Dîsa ez texmîn dikim ku belavbûna li vir ne li ser bingehekî fizîkî û kolonî, lê li ser bingehê çandî pêk hatiye. Di vê mijarê de xweseriya Ewrûpayê ev e: serdema Neolotîk tevî aliyên wê yên afirîner hemû li ber destê xwe têkûz dîtiye û girtiye. Ewrûpa xwedî wî şensî bû ku deh hezar sal tev bi carekê yan jî di demekê de ku mirov dikare kin bihesibîne, karîbû dawerivîne hinavê xwe. Dikare bê gotin, çawa ku Ewrûpayê dinya çarsed sal e kiriye qada belavbûnê ji bo çanda xwe, ew bi xwe jî berî şoreşa Neolîtîk, hînê paşê jî ji bo şaristaniya Romayê û şoreşa ruh-mane ya Xiristiyantiyê bûye qada belavbûnê. Hersê şoreşên mezin zêdetir li ser hîmê çandî li Ewrûpayê belavbûne. Belavbûn ji bilî çend şerên împaratoriya Romayê bi mêtingerî, kolonîtî û asîmîlasyona bi darê zorê nebûye. Çandên jor û bilind weke 'dayîna xwedê' ji dil hatine qebûlkirin. Piştî ku Ewrûpayê bi vî awayî xwe gihand çanda mirovatiyê ya deh hezar salan ketiye serhev, hînê piştre hîmê şoreşên mezin ên Ewrûpayê (Ronesans, Refermasyon û Rohnîbûn; şoreşên Polîtîk, Îndustriyel û Zanistî) hatin danîn. Ewrûpayê bi qabîliyetên xwe yên taybet ev şoreşên mezin nekirine. Çemê Mezin ê dîrokê û şaxên wî bi hev re weke şîpekê herikîne û bi vî awayî Ewrûpayê karîbûye hîmê xwe deyne. Bêguman di heman demê de 'serdema qeşa' xwe vedikişîne, bi vê re bi saya av, ba

û hewayê daristanên teze, hêşîn û erdên bi bereket li Ewrûpayê çêbûn. Ewrûpayê bi sentêza van şertan hemûyan karîbûye gav biavêje vê şaristaniya mezin a mohra xwe li roja me ya îro xistiye. Wexta cihê wê hat, em ê li ser detay û hûrgiliyên vê çîrokê rawest in, û ji nêz ve çav lê bidêrin.

## 3- RAST ŞÎROVEKIRINA JIYAN Û PÊŞKETINA CIVAKÎ YA ÇAVKANIYA XWE KEVANA BI BEREKET E

Di bin vî sernavî de xusûsa ku ez bi girîngiyeke mezin hewl didim rave bikim ew e; zeman û mekanekî civakî yê diyar li ser şêwazekî diyar ê jiyanê bandoreke çawa dike. Di pirsgirêka rêbazê de jî mijara dûvdirêj li ser rawestiyabûm ew bû ku rastiyên civakî ew rastî ne 'bi destê mirov hatine avakirin.' Ev mijar ewqasî girîng e ku mirov xwe tam negihîne maneya wê, dibe ku her cure xebata ji bo serwextbûnê ya mirov xwe lê rakişînê weke 'hînbûnê', û 'maneyê' bibe bêmanetî û cehaleteke mezin. Îdîaya min ew e ku cehaleta di moderniteya kapîtalîst de ji wê cehaleta 'Ebûcehîl' a derketina dema dînên mezin a lanetê lê dikin, gelekî mezintir e. Sedema vê ya bingehîn jî belkî pozîtîvîzma bûye dîn ku ji materyalîzma çor û seresere ye. Ji ber ku ev pozîtîvîzma bûye dîn berhemekî zêhnê mirov e, jixwe metafizîk e.

Bi vê armancê, min di beşa rêbazê de dûrûdirêj anîbû ziman ku mirov ji aliyê zêhnî ve xwedî karektereke metafizîk e. Pozîtîvîzm hay ji xwe nîne û nabîne ku 'pûtperestiya' wê ji ya demên berê hînê çortir e. Ez fikra xwe ya pozîtîvîzm = pûtperestî ye, bi girîngî pêşkêş dikim. Pozîtîvîzm şêweyekî şîrovekirina

rastiyê nîne. Herçiqas berevajiyê wê îdîa bike jî zanista felsefeya diyardeyan[41] şîrove dike jî nîne. Ji ber ku felsefeyeke wisa nabe. Her a bi ber çav dikeve, her dîmen û dengê guhê mirov bilivîne diyarde ye. Her hiskirin jî diyarde ye. Kîjan cahil an jî dîn dikare îdîa bike ku rastiya gerdûnê tenê ji van pêk tê? Li gorî Eflatûn diyarde (fact) weke dîmen jî nayên hesibandin. Eger bibe bibe bi gotina Nietzsche tenê dikarin bibin pêhisîneke hêsan. Mirov dikare li ser dualîteyên pêhisîn-diyarde jî rawest e. Mîna ku em çawa li ser obje-sûbjeyê[42] rawestiyabûn.

Mixabin, modernîte resmê jiyanekê ye, li gorî pozîtîvîzmê hatiye girtin. Ez bi zanebûn gotina 'resmê wê ye', bi kar tînim. Ji ber ku modernîte ne bi cewherê jiyanê, seresere bi şiklê wê re têkildar e. Gotina 'Jiyaneke şaş, rast nayê jiyîn' a Adorno gotî û nikarîbû ji hev derxe, encama qudûmşikestina wî ya li hemberî qirkirina Cihûyan e. Ya rastî ev ji bo mijarê gotineke kilît e. Lê ravekirina wê nîne. Şaşiya bingehîn a jiyanê di ku de ye? Ji jiyana şaş û çewt kî berpirsiyar e? Çawa hatiye avakirin? Têkiliya wê bi sîstema civaka serdest re çi ye? Bersiva pirsên bi vî rengî tineye? Bi tenê qîma xwe anîne ku kokên wan bispêrin pêvajoya Rohnîbûn û rasyonalîteyê. Mijar, ango şêweyê jiyana şaş şîlo hatiye hiştin.

Hewldanên bi heman rengî li cem Michel Foucault jî hene. Foucault dibêje 'modernîte mirina mirov e' û vê gotinê wer dihêle. Fîlozofekî evçend navdar çawa dibe ku mijareke girîng a mîna mirina mirov di çend hevokan de bide serhev û wer bihêle? Em wexta bixwazin vê yekê rave bikin, maneya wê nîne ku mirov behsa mirina wî ya bê wext û zû bike. Şîrove û heqîqeteke girîng di niqrîska mirinê de jî hewce dike were ravekirin. Kopernîk[43] wexta di sikrata de ye, di xwe re dibîne ku berhema xwe ya têde dinivsîne 'Dinya li dora rojê dige-

[41]Diyarde: Fact (Olgu) Rastiyên berçav. Bûyer.

[42]Obje: (Nesne) Cism, eşya. Sûbje: kirde, kirdar.

[43]Kopernîk: (1473-1543) Copernik ji Polonyayê ye. Damezrînerê astronomiya modern e. Di heman demê de mirovekî dîndar e. Hîpoteza wî ya di warê rojê de gelekî girîng bû.

re' bide weşandin. Gelek şîrovegerên heqîqetê yên din welê hem li Rojava, hem jî li Rojhilat hene. Rexnegirên postmodernîteyê ji ber ku gelekî ketine nav gunehê jiyanê yê modernîteyê, rastiyan hinekî jî fediyokî tînin ziman. Ango uslûba wan a hevpar a bi kar tînin a wan kesan e ku tevlî koletî û desthilatdariyê bûne, ji şerbeta sîstematîka zanînê ya modernîteyê vexwarine. Hinekî jî uslûba Ezop![44]

Em careke din dubare bikin ku xusûsa em hewl didin rave bikin, hûnandina rast û şaş a jiyanan e. Ne tenê modernîte (kapîtalîst), jiyana şaristaniyên din ferz kirine gelo rast hatine hûnandin? Ji rahibên Sumeran ta qral-xwedeyan, ji qral-xwedayên Misrê ta Kesrayên Îranê, ji Skender ta împaratorên Roma, ji siltanên Îslamê ta monarkên Ewrûpayê, sîstemên bi awayekî fermî hîmê jiyanê danîne, gelo mirov wan jî di warê hîmdanîna şaş a cîhanê de bi qasî modernîteya kapîtalîst nikare berpirsiyar bibîne? Mîna xelekên zincîrekê, bi van xelekên xistine stûyê pêşdeçûna civakî, gelo hîmdanîna jiyana şaş her ku çûye pêk nehatiye? Têrê nake mirov ji şêwazê jiyana şaş tenê modernîteyê, nîzama wê ya qirkirin û şer berpirsiyar bibîne. Bi qasî reh û kokên pirsê bersiva wê jî kûr e. Wexta em li ser şoreşa li Kevana Bi Bereket û şêwazê jiyana rê li ber vekiriye rawestiyan, me xwest em bi çavkaniya van pirsan gişan dakevin.

Bêguman em nikarin civakê bi tevahî bi çandê rave bikin. Divê mirov gelek faktorên din li vê zêde bike. Lê divê mirov qebûl bike ku bingehê civakê jî çand e. Di vê navberê de divê em rave bikin ka em çi maneyê didin têgîna 'çandê' ya em bi kar tînin. Mebesta me ji vê 'demeke dirêj' a manedar e ku li cografya û mekanekî di jiyana civak û dîrokê de xwedî xistletên taybet ên dest ji wan nabe. Em civakê ji tinebûnê bi vê cografya û dema dîrokî ya bi sînor îfade nakin. Lê belê em dixwazin bibêjin ku di avabûn û

---

[44]Ezop: Weke Aisopos tê zanîn. Ji nivîskarê fablên berê yên Yewnan nivîsandî re tê gotin. Li gorî gotinê  ev nivîskar kole bûye. Lê belê her kes hemfikire ku nivîskarekî bi vî rengî hîç tinebû. Di lîteratura siyasî de ji awayê gotinê yê nayê fêhmkirinê an jî fêhmkirina zehmet re ezop tê gotin.

şikilgirtina gelek civakan de bûne xwediyê rolên bingehîn. Dîsa divê em di ravekirina xwe de bînin ziman ku civak ji jiyana bi xelekan bi zeman û mekan ve girêdayî pêk tê, her xelek çi qasî bi ya din ve girêdayî be jî, her wisa xweseriyeke wê bi xwe jî heye.

Cihêwaziya jiyanê ya civakên Semîtîk û Çînê ya beriya deh hezar salan hîmê wan danîne, îro jî bi awayekî diyarker jiyana wan bi mane dike. Ji bo çanda jiyanê ya Aryenî jî mirov dikare behsa heman xusûsê bike. Li aliyê din, mirov dikare ji zanista manedanê (semantics) fêhm bike ku çanda jiyanê ya li ser van hîman hatiye avakirin, di rêveberiyên dewlet û hîyararşî, qralên bi maske yan jî bê maske, yên tazî yan li pişperdeyê de xwe fermî kirine, pirr zêde rê li ber berevajîkirina maneyê vekirine, û bi awayê ji rêderxistinê li her cure krêtî, şer û qirkirinan derî vekirine. Ji jor ber bi jêr ve jiyanên fermî yan nefermî yan jî jiyanên li jêr bi xelekên cihêwaz hene. Dîsa jî jiyana civakî ya çavkaniya mezin xwedî wê xisletê ye ku şêweyên din ên jiyanê di nava xelekên din de diyar dike.

Em naveroka têgîna çandê hinekî din rave bikin. Bêguman civaka klan jî xwediyê çandekê ye, ango xwediyê jiyanekê ye. Maneya jiyanê di civaka klan de weke civaka beşerî ya gerdûnî xwedî heman maneyê ye. Ziman û fikir bi nîşaneyan tê meşandin. Ji prîmatan ango ji heywanan zêde neqetiyaye. Mirov bi çîroka klanekê dikare behsa hemûyan bike. Pêdiviyên hewceyî bi wan heye, ewlehî û zêdebûn, hema bêjin ev her sê gotin ji bo tevahiya zindiyan heman tişt e. Me têkiliya vê bi zêhniyeta bi sînor şîrove kiribû. Wexta di jiyanê de cihêbûn û ferq çêdibe, nermiya zêhn pêş dikeve, di ziman de ber bi vegotina bi sembolan gav têne avêtin û xwe gihandina avahiyên maddî yên derfetê didin vê yekê jî bêhtir mumkîn dibe.

Bi vî awayî em dikarin bibêjin; pêşketina çandê, bi pêşketina zimanê sembolan û nermiya zêhnê, objeyên maddî yên zêde tevahî îfade dike. Bi maneyeke teng çand zêhniyeta civakekê, qalibên wê yên hizirandinê û zimanê wê îfade dike, di menaya fireh de li vê zêdekirina daneheva wê ya maddî (bi tevahî amûrên

hewcedarî bi wan heye, çêkirina qût û zad, hilanîna wan, serbiserkirina wan, çûnûhatin, ewlekarî, bi tevahî amûrên delaliyê) îfade dike. Zêhniyata çandê û wekhevî û cihêwaziya di navbera amûrên wê de, newekheviya di navbera xizan û dewlemendan de, asta jiyanên wekhev û cihê diyar dike.

Em divê careke din diyar bikin ku daneheva[45] maddî û zêhnî bi qabîliyeta mirov bi xwe hatiye avakirin û di vê çarçoveyê de xwe gihandiye rastiya civakî. Di vê rewşê de eger em bibêjin; jiyana civaka klan a di serdema kevir a kevin de bi mîlyonan salan dewam kiriye zêde xwediyê wekhevî û cihêwaziyên xweser nebûye, ev yek ê rê li ber têkçûna maneyê veneke. Ji ber vê yekê, me maneyeke mezin da derketina nifşên çandî yên mezin. Ji ber ku her nifşa çanda mezin, tê maneya pêşketina jiyaneke cuda û mezin. Di vê çarçoveyê de mirov dikare pêşketina civakî û pêşketina çandî wekhev bibîne. Eger em gotinên xwe formule bikin em ê weha bibêjin: çiqas nermbûn û azadiya zêhnî ewqas jî manedana zimanê sembolan, dewlemendiya fikrî û ji vir jî xwe gihandina amûrên maddî yên çandê û ev hemû jî tên maneya pêşketina civakê.

Di vî beşî de feraziya me ya bingehîn ew e ku civakbûyîn weke rastiyeke hatiye avakirin a esas afirîneriyeke mirov e. Bêguman em di wî de mîqdara maddeyê û pêşketina wî ya biyolojîk ji nedîtî ve nayên. Em dizanin ku ev weke rastiyên fizîk, kîmya û biyolojiyê têne lêkolîn. Her weha antropolojî û psîkolojî yên mirov weke cins û zêhn lêdikolin di qada xwe de maneyê çêdikin. Herçend em rexne jî bikin, tiştên em ji rewşa parçebûyî ya zanistê hîn dibin hene. Em timûtim behsa asta cihêwaz a serwextbûnê ya rastiya civakî dikin, em vê dikin da ku ferqa wê ji zanistên din were fêhmkirin. Eger em vê ferqê nebînin, em ê jî bikevin şaşiya mezin a pozîtîvîst ketinê û em ê nikaribin xwe ji nexweşiya 'zanistiyê' rizgar bikin. Encama vê di modernîteya kapîtalîst de qirkirin e. Qirkirin, em careke din destnîşan dikin ku gunehekî mezin e, Adorno xist nava dehşetê û bi ti nêzîkati-

[45]Danehev: (birikim) Tiştên maddî û manewî yên bi demê re dikevin ser hev.

ya insanî û xwedayî nikarîbû bûyîna wê rave bike, fikirî ku ji bo vê divê pirtûkan hemûyan bavêjin nava agir û ev hemû spartin hûnandinda şaş a jiyanê. Tespîteke gelekî girîng e ku mezlûmên qirkirinê wê ji bilî vê bi ti maneyeke din neyên bîranîn. Pozîtîvîzm û jiyana modern li ber xwe didin da vê rastiyê qebûl nekin. Mîna ku tevî qirkirinan jî jiyana civakî dibe û dikare bimeşe. Yan jî bêyî ku stûnên bingehîn ê vî gunehî ji holê rake, bi nirxên maddî û berevajîkirina zêhnî ya şaristaniyê ku rê li qirkirinê vekirine, curret dike (diwêre) bijî. Adorno ji vê curreta di ti pirtûkê de nîne ango divê di ti zêhnî de nebe û cih negire, vedicinige, xwe vedikişîne qalikê xwe û dimire.

Ya ez jî hewl didim bikim, ew e ku çavkaniyên vê 'CURRET'ê û şêweyên muhtemel ên bihurandina wê bikim pirsgirêk, û di vê çarçoveyê de qabîliyetên me yên bersivdayînê derxînim holê û bigihînim mane û çalakiyê. Em nikarin ji nedîtî ve bên ku modernîteya dewam dike û diçe, her diçe rê li ber kulmozên qirkirinê yên bûne sazî vedike. Rastiya Iraqê ya li ber çavê me, sergirtî yan jî vekirî, bi tevahî rejîmên xwedî xisleta qirkirinê li Rojhilata Naverast û hevpariya vî gunehî, gelekî eşkere û di nav dehşetê de, ne tenê bi yên di navê de dişewitin û dihelin, bi yên lê temaşe dikin û çav didêrin jî xwe dide hiskirin. Lê li aliyê din, lêgerîneke mezin a li jiyaneke azad heye. Yan jiyana azad, yan jî qirkirin dualîteyek nîne ku mirov ti carî karibe pêre bijî. Bi vî awayî em nikarin bijîn û bibin hevparê vî gunehî. Ev dîrok, cografya û erdên rê li ber maneya herî dewlemend a jiyanê vekirin, çawa bû ku ketin vî halî? Li aliyekî şerê di navbera etnîsîteyên têne maneya jiyana cara pêşî de, li aliyê din jî şerên bi pêşengiya xwedayê mezin ê dawî yê modernîteyê? Wer xuya ye, em biçin û bên, bigerin û bizîvirin, em neçar in, giraniya xwe bidinê, bersiva wê bibînin û çalakiya wê li dar bixin.

Divê ez tehma jiyana li Kevana Bi Bereket hinekî bi zimanekî wêjeyî vebêjim. Ez bi çavdêriyeke Bradway ê li Çayonu ya Amedê erdkolan dest pê kir, dest pê bikim. Bradway dibêje; 'Jiyan li ti devera dinyayê mîna li qûntarên kevanên rêzeçiya-

yên Toros-Zagrosê manedartir nîne.' Gelo ev mirovê li nav çandeke gelekî dûr gihaye, çi ev gotin bi wî dan hiskirin? Arkeologekî şaristaniyê baş nas dike, dîroknasekî baş e, çima jiyaneke manedar li vê deverê dibîne? Lê yên îro li vê deverê dijîn ji bo heqdesteke herî kêm a li Ewrûpayê çil carî xwe qulopanî dikin û mîna ji şewbê (webayê) birevin dixwazin ji ser van erdan birevin. Mîna ku ti muqedesat û nirxên wan ên estetîk nemabin û wê careke din nikaribin bi dest bixin, koçberî û barkirinê mîna çarenûsê qebûl dikin.

Divê ez li xwe mikur bêm ku demekê ez jî bi nexweşiya modernîteyê ketim, dê û bav jî di navê de min xwest ez ji her tiştê van erdan birevim. Ez gelek caran li xwe mikur têm ku di jiyanê de yek ji mijara ez zêde pê xapiyam ev bû. Lê ez dizanim, ez ti carî bi tevahî ji çavdêriya Bradway qut nebûm; ez zarokê qûntara wan çiyan, min serê çiyan jî weke textê xweda û xwedawendan, qûntara çiyan jî weke hin goşeyên cenneta wan afirandî dît û timî xwest lê bigerim. Ez hîn zarok bûm navê 'dînê çiyê' li min kiribûn. Ez paşê hînbûm ku ev jiyan hînê zêde ya xweda Dionysos e. Li pêş û paşiya wî koma keçikên hunerkar û azad a bi navê Bakha, Dionysos[46] geriyaye. Bi hev re xwarine, vexwarine û kêf kirine. Min ji vê jiyana xwedayî hez kiribû. Fîlozof Nietzsche jî ev xweda tercîhî Zeus kiribû. Ji vê jî wêdetir li bin gelek gotinên xwe 'şagirtê Dionysos' nivîsandiye. Wexta ez li gund bûm, herçiqas bi dîn re li hev nedikir jî ji lîstikên keçikan ên nîşanê û wekî din wêdetir, min hez dikir ez bi wan re bilîzim. Li gorî min a bi awayekî xwezayî diviyabû bibûya jî wisa bû. Ez ti carî razî nebûm ku çanda serdest jinê bigire û piştperde bike. Min qanûna bi navê namûsê ti carî nas nekir. Ez hînê jî ji guftûgokirin, lîstik û parvekirina muqedesatên din hemûyan a azad û

[46]Dionysos: Ji xwedayên beriya Yewnanê ye. Tê texmînkirin ku ji Trakyayê yan jî Frîgyayê hatiye. Tevî Zeûs û Apollon yek ji xwedayê mezin ê fikra Yewnan e. Ew bi serê xwe bûye mîna dînekî. Şexsiyeta wî ji xisletên têkel ên xwedayan pêk tê. Xwedayê cotkarî, rez, mêwe û nexasim jî yê parastina tirî, eşq û şerabê ye.

bê sînor bi jinê re dibêjim ‘erê’, lê li ser navê çi dibe bila bibe, sedema wan çi dibe bila bibe, ez ji her girêdan û koletiya bêhna milkiyetê jê bê û li ser hîmê hêzê re, heta dawiyê dibêjim ‘na’.

Li van çiyan, min tim hewl da komên jinan ên azad bi îlhameke xwedayî silav bikim û wisa bi wan re ‘manedar’ bibim. Di nûçeyan de gelek caran tê gotin ‘Komeke jinên ji Başûr-Rojhilat ên li romorka traktorê yan jî pişta komyonê barkirî wexta ji bo rêncbertiyê diçûn filan herêmê di qezayê de mirin’; ez wexta van hevokan dibihîsim, hêrsa min a li hemberî mêrê qaşo xwediyê jinê, malbat, hiyarerşî û dewletê bi qasî li hemberî ti bûyerê nîne, radibe. Ez hêrsa xwe ya ji vê rewşê gelek caran tînim ziman. Ma çawa dibe, ji nifşên xwedawendan evqasî piçûk ketin? Ruh û hişê min ev piçûkketin ti carî qebûl nekir û zêhnê min jî ev yek ti carî ranekir. Ji bo min jin wê yan di asta pîrozbûna xwedawendan de be yan jî wê hîç nebe. Tê gotin: ‘Di civakekê de asta jiyana jinan gihiştiyê, pîvana asta jiyana wê civakê ye.’ Ez timî li ser rastiya vê gotinê difikirim. Min ji bo diya xwe hevoka ‘ji çanda xwedawendên dayik maye’ bi kar anîbû. Weke wan şîşman û qelew bû. Ji ber ku mîna jinên modernîteyê li hev nehatibû çêkirin, min nikarîbû pîrozbûna di wê de bidîta. Tevî ku min di jiyana xwe de êşên gelek mezin kişandine jî ez ti carî bi awayekî ciddî negiriyam. Lê piştî ku min qalibên modernîteyê hilweşandin di serî de diya min û di şexsê wê de dayikên herêmê (Rojhilata Naverast) hemûyan bi dilekî şikestî û çavên şil bi bîr tînim, dinêrim. Diya min ji bîrê bi zehmetî ava derdixist bi satilê dibir û wexta diwestiya û di nîvê rê de datanî min baz dida qurûs dibûm bi hemdê xwe vedixwar. Ez niha li wê maneya qurtên avê, weke yek ji bîranînên xwe yên herî bijartî û xemxwar dinêrim, dibînim. Ez ji her kesî re jî pêşniyaz dikim ku piştî qalibên zêhnê yên modernîteyê hemû hilweşandin dikarin ji nû ve li têkiliyên xwe yên dê-bavê binêrin. Ez dixwazim dîsa bi heman awayî li tevahiya ‘têkiliyên gund’ yên ji neolîtîkê mayî temaşe bikin. Bêguman serketina herî mezin a modernîteyê ew e ku karîbû nêrîna me ya çandî a panzdeh hezar sal e hatiye avakirin, hilweşîne û tine bi-

hesibîne. Mirov fêhm dike ku ti kes ji kes û komên mirovan ên evçend hatin hilweşandin û tine hatine hesibandin, nêrîneke azad, serbilind, dildariya jiyanê û berxwedanê hêvî neke.

Her heywan û nebatê li qûntara çiyayên Kevanê ji bo min objeyeke dildariyê bûn. Mîna ku di wan de maneyeke pîroz hebe min li wan dinêrî. Ez ji bo wan, ew ji bo min hevalek bûn hatibûn afirandin. Min pirr li pey wan baz da. Bi eşq û evîn. Eşqa min hinekî welê bû. Hînê jî di vê mijarê de ya min kirî û ez nikarim xwe efû bikim ew e; çivîkên ku min ew digirtin, bê rehm serê wan hildiqetand. Ji bo ez tehlûkeya mezin a di bin têgihiştina obje-sûbje de bibînim ti vegotinê bi qasî van bûyeran bandor li min nekir. Tercîha min a ji bo ekolojiyê bi dildarî û gunehê min ê zarokatiyê ve yê ez lê mikur hatim, ji nêz ve têkildar e. Ev tehlûkeya ruhî ya mezin ji çanda nêçîrê maye û hunerê 'zilamê fermandar û mêtingerê bi hêz e.' Ji bo min karîbûya ev tehlûke ji holê rakira, diviyabû min maskeya şer û îqtîdarê (xwedayên bi maske û bê maske, qralên tazî û li pişperdeyê) ya nêçîrvan derxista, naxwe min nikarîbû qîma xwe bianiya. Em heta zimanê nebat û heywanan fêhm nekin, em ne dikarin xwe fêhm bikin, ne jî em dikarin bibin civakeke ekolojîk. Bîranînên heywan û nebatên pêsîra min ber nedidan, min ê bi vî awayî maneyek bidaya wan. Li deşta hema ji qûntarê çiyê dest pê dikir, ji destpêka biharê heta dawiya payîzê ji bo rakirina bênderê dixebitîn. Ji lewra diçinîn, didêran û dexl radikirin. Her cara ku ev hemû yê li gundikê bavê min tên bîra min, hiseke ku ti roman bi min re çênake, min digire. Ez gelek zêde xeman dixwim; çima min ew rêwiyên xwedê tam fêhm nekirin û bi wan re nebûm heval? Ya rastî bi tevahî têkiliyên min di nava hevaltiyê de bûn. Lê ji rûyê têkiliyên xeternak ên modernîteyê, min nikarîbû şîna bavê xwe jî bigirim, ji lewra ez hînê jî nikarim xwe efû bikim. Bavê min belkî ji bavan evdê xwedê yê herî belengaz bû, belê saf û pak bû. Lê li gorî min bavên cotkar dîsa jî yên herî hêja ne.

Bi tevahî têkiliyên li gund, ji bo min weke têkiliyên emrê xwe bihurandî û weke hewldanên bêtaqet ên demeke nediyar xuya

dikirin. Reva ji gund û xwe avêtina bajêr jî weke gunehekî dibînim. Ez hîç guman nakim ku jiyana herî hêja û îdeal ji bo mirov li bajarên bi kansêr ên moderanîteyê (bi tevahî şaristanî) nîne, li gundên ekolojîk e. Kengî bajêr bi gundên ekolojîk re li hev kir, mirov dikare weke mekanekî qebûl bike û destûrê bidiyê.

Ez gelên li rêzeçiyayên ji Amanosan heta Zagrosan jiyan û hînê dijîn, wan weke rêwiyên pîroz ên xweda û xwedawendên li serê çiyan li textê xwe rûniştî dibînim. Li gorî modernîteyê gelên ez behsa wan dikim paşvemayî ne, lê ji sedî sed ez bawer dikim ku berevajiyê vê rast e. Li gorî baweriya min, pêşketîbûn-paşketîbûn hukmên îdeolojîk in. Ji lewra mirov çiqasî zêhniyeta modernîteya kapîtalîst a paşverû û dijminê mirovatiyê ji hev derxe; mirov pê dadikeve hîmê rastî yê mirovatiyê û pê li azadiya mezin vedigere. Kengî mirov ji cehennema modernîteyê ya ji KARÊ, ÎNDUSTRIYALÎZM û DEWLETA NETEWE pêk tê, rizgar bû her tişt wê baştir were fêhmkirin û wê rê li ber dewlemendiya jiyanê veke. Eleqedarî û kêfxweşiya ez ji til û girekî ji dema neolîtîkê mayî re nîşan didim bi Newyorkê nadim. Ev bajarê di nava xwe de ti maneyê nahewîne, bi tevahî deriyên xwe li ‘kareke hînê zêde’ vekiriye, jiyana mirov xistiye nava qefeseke hesinî û kujerê jiyanê ‘îndustriyalîzma cinawir’ himbêz kiriye. Ev bajar ji kopiyeyeke bê mane ya ‘Babîla heftê û du zimanî’ ya kesî têde tiştek ji kesî fêhm nedikir hînê bê manetir e. Ez hîç guman nakim ku ev avahiya bi kansêr a bajartiyê hilweşe mirovatî jî wê rizgar bibe.

Min ev çîroka kin got ji bo ku ez bi bîr bixim; em ji kîjan çanda jiyanê hatine. Eger em bi hostayî fêhm nekin ku ev şêwazê jiyanê berhemekî rastiya civakê ye, em ê nikaribin xwe rizgar bikin û bibin ‘ehmeqên modernîteyê.’ Heta bi şivanê serê çiyê, jiyana bi kansêr a modernîteyê her kes kiriye êsîr û min hewl da vê yeka ku tê wê maneyê di cewherê xwe de jiyan qediyaye, bi devê fîlozofên herî zîrek rave bikim û ji wan hemûyan wêdetir ez bi xwe jî vê rastiyê dizanim. Eger em xwe ji vê jiyana modernîteyê rizgar nekin, em ê nikaribin xwe bigihînin jiyana azad a

em bi zêhniyet û îradeya xwe (fikir-rêxistin-çalakî) wê mumkîn dikin û nikaribin jiyana azad bi tevahî çavkanî û dewlemendiyên wê bijîn. Çi zû çi dereng, em ê fêhm bikin ku 'jiyanên me yên şaş hatine hûnandin wê rast neyên jiyîn.'

Em bi zimanekî zanistî çîroka xwe hinekî din berfireh bibêjin. Rastiyên civakî yên di dema Kevana Bi Bereket de hatin avakirin, bi xalên sereke di dewamkirina jiyana îro de jî hebûna xwe dewam dikin. Hêmanên çandî yên maddî û hem jî yên zêhnî herçend di warê çendeyatî û çawatiyê de hinekî guherîbin jî di cewher de hînê jî dişibin hev. Ziman di hîmê avahiyê de hevpar e. Şêwazên fikrê li qadên zanistî, dînî û hunerî dabeş bûne û hebûna xwe wisa dewam dikin. Şerên êrîş û xweparastinê doh jî û îro jî hene. Weke saziya bingehîn malbat rastiya xwe dewam dike.

Cihêwaziyên di navê de, bi mezinbûna saziyên dewletê re mezin bûne. Dewletê li dijî civakê timî cih li xwe fireh kir û di çarçoveya pêdiviyên xwe de çendî danehevên çandî yên maddî û zêhnî yên civakê kir ewqasî milkiyeta xwe, timî ji aliyê çendeyatî û çawayetiyê ve guherî. Ne weke ku bawerî pê heye, lê berevajî, pêşketinên civakî tevî dewletê dewam kirine. Em ê ji dewleta rahib a Sumer heta dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst bi avabûnên dewletan re encamên civakî û çanda bajêr a rê li ber vekir û jêre şaristanî tê gotin bigirin dest û maneyekê bidin rola wê. Nexasim em ê bibînin: ne ku çînîbûnê rê li ber dewletê vekiriye, zêdetir dewletê şaxê çînîtiyê berdane û belav kiriye.

Ez wer bawer dikim ku rola têgîna 'demê' ya Fernand Braudel di pêşketina civakî de baş nehatiye fêhmkirin. Nexasim têgînên weke dem-çand, dem-şaristanî û dem-civak hewce dike mirov wan rave bike û ev yekê di warê dîrokî de gelekî bi kêr bê. Lê belê di zanista dîrokê de bi hosteyî nayê bikaranîn. Ez ê di analîza li vir de bi wêrekî bi ser vê têgînê de biçim, wê rave bikim û hewl bidim bi kar bînim.

**a-** "Dema herî dirêj" piştî ku serdema qeşayî ya çaremîn bi dawî dibe, ji bo civaka Kevana Bi Bereket a çemê mezin e, di şoreşa neolîtîk de an wê li ber serdemeke nû ya qeşayî veke, yan

wê rê li ber felaketeke nukleerî yan jî rê li ber şewbeke pêşî lê neyê girtin veke û her wekî din wê hebûna xwe bi awayê fizîkî nikaribe dewam bike, wê bajo. Çandên bi koma xwe Semîtîk û Çînê weke rûbarok an jî şaxekî van civakên ‘dema dirêj’ cihê xwe digirin. Şaxên din ên piçûk ên çandan jî di nava çemê mezin de cih digirin û mîna rûbarokan in. Divê mirov naveroka tezê baş fêhm bike. Civaka hatiye avakirin bi hêmanên xwe yên çanda maddî û zêhniyeta xwe wer qehîm e; ti sedema navxweyî ya civakî di vê ‘dema dirêj’ de nikare civakê xira bike. Em dikarin têgîna ‘civaka çandî ya bingehîn’ di berdêla vê ‘demê’ de bi kar bînin. Ji ber vê, dubare be jî ez timî qalib, naverok û danehevên civakê bi bîr dixim da ku em karibin xwe bigihînin têgîna ‘civaka çandî ya bingehîn’ û ew jî dikare şûna têgîna ‘dema herî dirêj’ bigire. Lewra têgînên ‘civak’ û ‘demê’ bi van maneyên xwe yên nû dikarin bi kêra civaknasiyê bên. Civaknasên lîberal hînê ji niha ve bi têgîna ‘dawiya dîrokê’ serwextbûna xwe ya li civakê bi metafizîkeke sexte û qelp heta hetayî mayînde bikin. Marksîst û têgihiştinên din ên ‘mehşerî’, ji zeman-mekan qut ‘serdema bexteweriya ebedî’ soz didin û peyman dikin. Yên reşbîn jî zêdetir têgihiştina ‘serdema zêrîn’ bi bîra wan tê û qala bêmanebûna ‘serdema teneke’ ya niha dikin.

Têgîna ‘dema herî dirêj’ li gorî teoriyên civakî hemûyan a herî zanistî ye. Bi qasî şertên berçav, ji bo serî û dawiya sîstema civakî argumanên bêne fêhmkirin pêşkêş dike. Dîrokê ne weke komeke bûyeran dide serhev û dixeniqîne, ne jî şêwazên teng ên civakê bi nêrtineke sivik a deman digire dest û li ser disekine. Ne şêwazên civakê, ne jî bûyerên di kêliyan de diqewimin nikarin jiyanê bi awayekî manedar şîrove bikin. Ew tenê dikarin beşekî rave bikin.

Di çarçoveya dema herî dirêj de li civaka çandî ya bingehîn her cure dîn, dewlet, huner, huqûq, ekonomîk, polîtîk û saziyên din ên bingehîn cih digirin. Sazî ji aliyê çendayetî û çawayetiyê ve timî dikarin biguherin. Hinek jê dikarin pirr piçûk bibin, dijberên wan jî mezin bibin. Hindik tine dibin, rola wan an ji aliyê

saziyeke din ve dewam dike yan jî di nava yên nû de maneya xwe dewam dikin. Eger em tevan bi yek carê bigirin dest, em ê bibêjin di nava tevahiya têgîn û saziyan de têkiliyeke diyalektîk a çêker heye. Ji ber ku civaka çandî ya mezin bi tenê ye, ev yek wê ji şirîkên bi hêz û pêkhatinên nû mehrûm dike.

Di vê nuqteyê de em dikarin şerê di navbera 'afirîner' û 'beridîneran' de (evolutionist-creationist) fêhm bikin. Afirîner haya wan ji têgîna 'dema herî dirêj' heye. Hêza xwe ya rastî jî ji vir digirin. Ayetên Xwedê yên der barê dawî û dema afirandina gerdûnê de dikarin bi têgihiştina çandê werin ravekirin. Eger em bi awayekî sosyolojîk rave bikin, em ê bibêjin; hêza afirîner haya xwe ji xisletên civakê yên pîroz, mezin û bi heybet heye. Jixwe hersê Pirtûkên Pîroz jî (Tewrat, Încîl û Quran) ji bo ravekirina jiyana li Kevana Bi Bereket şîrove ne. Piraniya mirovatiyê mensûbê van hersê dînan e, ev yek jî ji ber xisletên şîroveyên wan in. Jiyana çandî ya nû bi awayekî mûcîzewarî (ev têgîn ji bo mirovatiya demê tê fêhmkirin) pêk tê û îdîa dikin ku ev jiyan wê heta hetayê dewam bike. Vê îdîayê dike bingehê baweriya xwe. Ev yek jî ji hêza bi bandor a vê çandê tê. Em bifikirin: komên mirovan ên bi mîlyonan sal nikarîbûn ji klanê û şiklekî prîmatiyê[47] xilas bibin, bi şoreşa li Kevana Bi Bereket li avakirina jiyaneke civakê ya nedîtî û bi gotina mûcîzeyê dikare were ravekirin, rast tên. Ma dikarin vê rewşê bi gotinên pîroz, mezin, bilind, xwedayî, cejn û roşan bi nav nekin?

Em divê yekser bi bîr bixin ku sosyologên mîna Durkheim[48] û zanyarên din, civak weke koma mirovan a ji tevahiya sazî û bû-

---

[47]Prîmat: Di navê de meymûn û cinsê mirovan koma heywanên bi guhan.

[48]Durkheim Emile (1855-1917): Bi helwest û fikrên xwe, bi şîroveyên xwe yên civak û ferd, kiriye ku civaknasî weke disîplîneke din were naskirin. Durkheim têgihiştina civakê di ser her tiştî re digire. Li gorî wî civak ji tevahiya ferdan pêk nayê, ji wan zêdetir tiştek e. Eger civak were parçekirin wê têgihiştina ferdî derkeve holê, lê ferd hemû bêne komkirin civak çênabe. Lê koma têgihiştina ferdan têgihiştina civakê pêk tîne. Lê paşê têgihiştina civakî rê dide ber têgihiştina ferdî. Durkheim ji bo şîrovekirina bûyerên civakî komên di nava civakê de referans girt. Bi vê di civaknasiyê de diplînek çêkir.

yeran pêkhatî hesibandine û jê wêdetir jî neçûne. Behsên li ser çînayetî, ekonomî, huqûq, polîtîka, felsefe û dîn ji mentiqê bûyer û saziyan wêdetir naçe. Lê belê xwediyên van têgihiştinan bi ti awayî naxwazin fêhm bikin ka çima gotinên wan bi qasî Pirtûkên Pîroz buha û qîmet nabînin. Di gotinên wan de aliyê herî qels ew e ku li girîngiya civaka dema herî dirêj serwext nebûne. Ez divê careke din bi girîngî bînim ziman ku mirovatî xwediyê bîreke kûr a çîroka xwe ye û wê bi hêsayî naterikîne. Berevajî şiklê jê tê bawerkirin; girêdana civakan bi pirtûkên pîroz ne tenê ji ber xwedê û hin rîtuelan e, ji ber ku di van pirtûkan de şop û maneya çîrokên xwe yên jiyanê his dikin, ji wan re gelekî bi hurmet in. Bi gotineke din mirov dikare bibêje; ev pirtûk bi rola hafizaya civakê radibin û ji lewra dest ji wan nabe. Bûyer û têgînên di nava wan de rast in, ne rast in, ew tiştekî din e, bi pey ketina wan bi pey ketina çeqçeqoka aş e. Fernand Braudel gotina wî ya weke 'divê dîrok civaknas be, civaknasî jî dîrokî be' li cih e, û bi vê gotinê balê dikişîne ser şaşiyeke bingehîn a zanist û rêbazê. Têkiliyên civak-demê bi dîrokê re heta bi awayekî manedar neyên diyarkirin wê vegotinên civaknasî û dîrokê yên cuda cuda tenê civakê birîndar bikin û maneyê têk bibin. Hûn çiqas bûyerên bi belge bidin serhevdu, hûn çiqas sazî û rêzikên civakî hîn bibin, hûn bi belgeyan rave bikin; lê wexta hûn nikaribin bersiva pirsên weke, li ku, kengî, bi çi naverokê û yên li wir dijîn çi dibêjin, nedin; civaknasî û dîrok wê tenê weke malzemeyeke çor bi kêrî zanista manedanê bên.

Beridîner (evolutionist) tevî ku bûyer û diyardeyan baştir tespît dikin jî ji ber ku li maneya têgîna 'dema civakî' serwext nînin ji rexneyan xilas nabin. Hafiza û bîra civakî ji beridandina bûyer û diyardeyan girîngtir e. Ji bo mirovî zanista manedanê ji tespîtkirina diyardeyan li pêştir e. Li wir jiyana wan a mîna çemekî diherike heye. Ji ber hêza bîr û hafizaya civakî ye ku dest ji xwedê bernadin. Em ê di pêş de jî li ser rawest in ku civakê bi têgîna xwedê û hafiza xwe ya berê kiriye yek. Pozîtîvîzm nexweşiyeke modernîteyê ye û ji ber ku li dijî hafiza civakê ango

metafizîka civakê radiweste nikare xwe ji rexneyan rizgar bike. Mirovê bîroke çawa di jiyanê de li zehmetiyên mezin rast tê û dibe fena zarokan, civakên hafiza xwe jî wenda dikin, xwe ji bîr dikin û bi tehlûkeya xwewendakirinê re rûbirû dibin. Civakên bîroke, bi hêsayî dibin mêtingeh, têne dagirkirin û asîmîlekirin.

Objektîvîstên pozîtîvîst îdîa dikin ku civakê bi awayekî zanistî rave dikin, lê tevî vê yekê, objektîvîzma pozîtîvîst dibistaneke fikrê ye ku herî kêm herikîn û pêşketina civakê nas dike. Civakê bê dîrok weke lodeke hişk a materyalîst şîrove dike, bi ravekirineke kêm û çeloxwarî rê li ber operasyonên civakî yên bi tehlûke vedike. Têgîna muhendîstiya civakî têkiliya xwe bi pozîtîvîzmê re heye. Ev kes bawer dikin ku wê bi destwerdaneke ji derve ve karibin şikil bidin civakê. Ev helwestên em behsa wan dikin, di heman demê de têgihiştina fermî ya modernîteyê ye, û ji bo şerên îstîsmarê û desthilatdariyê yên li derve û hundirê civakê têne meşandin sedemên rewa çêdikin.

**b-** Em dikarin têgîna ‘dema pêkhatinê‘ di pêşketina civakê de ji bo veguherînên bingehîn ên sazîbûnê bi kar bînin. Eger dema pêkhatin û hilweşîna avahiyên bingehîn were destnîşankirin, ev ê karibe bi kêra bi manekirina rastiya civakî bê. Rewşa mirov a zordestî û îstîsmarê li ber çav were girtin, mirov dikare civakan weke koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst dabeş bike û belkî ev yek ji bo şîroveyên bi mane bibe mijar û dabaş. Têkilîdanîna şêweyên civakê bi van demên pêkhatinê re rê li ber lîteratureke girîng vekiriye. Lê belê ji ber ku têkiliyeke bi mane bi demên kin û dirêj re daneyne pirr bi kêr nayê, tenê maneyên klîşe têne dubarekirin. Mirov dikare civaka neolîtîk hem weke civaka pêkhatî, hem jî bi demên civakê yên çandî yên bingehîn re di zikhev de şîrove bike. Hebûna avahiyên wê yên sazûmanî yên xweser û danehevên wê yên jiyana zêhnî û madî hem dikarin bi ‘dema pêkhatinê’ werin ravekirin û hem jî ji ber ku bandorên wan ên çandî heta tinebûneke fizîkî yan jî hilweşînê dewam dikin, dikarin bi têgîna ‘dema herî dirêj’ jî werin ravekirin. Komên mirovan ên berfireh û şêweyên zêhniyetê yên ji zanist, huner, dîn, ziman,

malbat, etnîsîte-qewm û wekî wan pêk tên, herçend heta dawiya 'demê' bi gelek awayan biguherin jî bi îhtîmaleke mezin li ser piyan dimînin û mijara bingehîn a demên civakî yên çandî pêk tînin. Her weha mirov dikare ekolojiyê têkildarî encamên şaxên zanistan hemûyan, di vê demê de weke zanista ekonomiyê ya sazîbûyî îhtîmam pê bide. Siyaseta demokratîk jî yek ji wan mijaran e, divê hem weke sazî û hem jî weke zanist timî bijî û hebe.

Saziya herî bingehîn a demên pêkhatinê saziya dewletê û jiyanên bi wê re ne, tevî wê jî hiyarerşiya heyî, çîn, weke sînorên dewletê milk, erd-welat, weke şêweyên dewletê dewleta rahib, dewletên xanedaniyê, dewleta netewe û cumhûriyet ji wan mijarên girîng in. Şêweyên dînî jî ji wan mijarên girîng in. Mijarên civakan ji aliyê şêweyê hilberînê weke neolîtîk, koledar, kapîtalîst û sosyalîst dabeş dike di nav mijarên dema pêkhatinê de ne. Hilweşîna saziyan jî di nav dema pêkhatinê de cih digirin.

Belkî ya rast ew e ku mirov ji bo şaxê jêr ê civaknasiya mijarên pêkhatinê lêdikole bibêje; 'civaknasiya pêkhatinê.' Ji mijarên lêkolînê yên dema herî dirêj re jî ji bo bi tevahî bigire nava xwe karibe bibêje; 'civaknasiya çanda bingehîn'.

**c-** Mijarên dema kin û navîn hem ji aliyê hejmarê, hem jî ji aliyê çawayetiyê ve gelek bûyer û diyardeyan dikin dabaşa xwe. Di nava demên kin û navîn de bi tevahî bûyerên guhertin û veguherînê yên avahiyê dikin mijarên xwe yên bingehîn. Mijarên dema navîn, guhertinên di nava heman sazî û avahiyan de hinekî di dema dirêj de dike mijar. Mînak mirov dikare bûhranên ekonomîk, guhertinên rejîmên siyasî, her cure avahiyên rêxistinên siyasî, civakî, ekonomîk û çalakî di vê çarçoveyê de bibîne. Bi tevahî çalakiyên ferd ên civakî û civakîbûnê di nava mijarên dema kin de ne. Medya jî zêdetir bûyer û diyardeyên dema kin esas digire. Bûyerên rojane jî di her avahiya saziyê de serê quncika dema kin dagir dikin.

Civaknasiya bûyeran di dema kin de digire dest, rast e ku mirov wê weke 'sosyolojiya Auguste Comte' bi nav bike. Bi gotineke din, dibe ku li cih be, mirov wê weke 'sosyolojiya pozîtîf' (bêyî

ku mirov rexneya wê ya bingehîn ji nedîtî ve bê) bi nav bike. Ya rastî divê şaxekî sosyolojiyê hebe beşa bûyeran lêbikole. Nexasim di demên kaotîk de bûyer zêde û diyarker dibin. Eger sosyolojî tevî sosyolojiya pêkhatin û çanda bingehîn bi sosyolojiya pozîtîf a bûyeran re vedibêje bibe yek wê hevdu temam bikin.

**d-** Bûyerên civakî jî di navê de, pêkhatin û bûyerên gerdûnî hemû jî hewcedariya xwe bi rewşek e ku em jêre dibêjin kûantûm û kaotîk heye. Atmosferên kûantûm[49] û kaotîk atmosferên afirîneriyê ne. Herçiqas hebûna wan hûrûkûr nehatibe kolan jî ji sedî sed hene. Bi tevahî pêkhatinên dema dirêj, navîn û kin hem 'her kêlî', hem 'di dema navber de' 'diqewimin û diçin' li ser piya dimînin, û ev mijar êdî yek ji wan mijarên sereke ye ku zanist pêre ji dil eleqedar dibe. Ev a em behs dikin; 'Kêliya kûantûm' û 'neqeba kaosê' mirov dikare wê weke 'kêliya xuliqandinê' jî bi nav bike, nabe ku mirov ji nedîtî ve bê. Di gerdûnê de îhtimala azadiyê di vê 'kêliyê' de diqewime. Azadî bi xwe bi 'kêliya afirandinê' re têkildar e. Herçiqas bi tevahî pêkhatinên civakî û xweza, hem ji aliyê avabûnê, hem ji bo li ser piya bimînin û hem jî ji aliyê dema jiyanê ve xwedî xisletên cihêwaz bin jî hewcedariya wan bi 'kêliyên afirandinê' heye.

Ji ber vê, sosyolojiya ji alî civakî ve mijara dema kin a herî kin a afirandinê digire dest, divê mirov jêre navekî bifikire. Pêşniyara min a şexsî ew e ku mirov ji bo sosyolojiya bûyerên civakî di 'kêliya afirandinê' de digire dest bibêje 'sosyolojiya azadiyê' wê li cih be. Ya hînê girîngtir, bi saya civakbûnê mirov gihişt qabîliyeteke bê hemta û zêhna wî ya nerm rê li ber afirandineke nedîtî vekir. Ji lewra ez yeqîn dikim ku ev sosyolojiya em hinekî weke sosyolojiya zêhnî dibînin û dikarin weke sosyolojiya azadiyê bi nav dikin, gelekî hewcedarî pê heye. Îrade û fikra azadiyê di-

---

[49]Fizîka Kûantûm: Salên 1900î di serî de bi serkêşiya zanyarên weke M. Planck, A. Einstein û Niels Bohr bi alîkariya gelek zanyaran weke Fizîka Kûantûmê çêbû. Mirov dikare Kûantûmê weke fizîka perçik an jî pirtikên jêr atoman bi nav bike. Lê wexta mirov li encama vê zanistê dinêre, bi hêsayî mirov dikare bibêje ku ev terîf ji bo wê kêm e. Ji lewra mirov kûantûmê weke zanisteke nû, felsefe û şêwazekî nû yê fikrê bibîne rastire.

vê yek ji mijarên sereke yên lêkolîna wê be. Jixwe pêşketina di dema kêliya afirandinê de pêşketinek e ku aliyê wê yê azadiyê heye. Ev kêliya herî kin 'kêliya kûantûm' û 'neqeba kaosê' dikare her weha weke Sosyolojiya Afirandinê jî were binavkirin. Ji ber ku ev Sosyolojiya Afirandinê herî zêde qada civakî digire nava xwe, ango zêdetir pêre eleqedar dibe, "Sosyolojiya Azadiyê" dibe yek ji mijarên divê herî zêde were pêşdebirin.

Herçend mijara me eleqedar jî nake weke dabaşeke fikrê divê mirov behsa 'dema astronomîk' jî bike. Hînê mijarên vê demê nehatine destnîşankirin. Lê belê weke xalên sereke; 'roj' û pêkhatina 'giravên ezmên', hilweşîna wan, karektera gerdûnê ya muhtemel a 'berfirehbûn' û 'tengbûnê' û bi van ve girêdayî hêza 'kişandin' û 'dahvdanê' di nava têgîn û 'dema astronomîk' de mirov dikare weke dabaşên bingehîn bihejmêre. Temenê gerdûnê jî di nava wan mijarên sereke de ye ku divê bê guftûgokirin. Van fikrên xwe yên der barê rêbaza lêkolîna sosyolojîk de wexta cihê wê bê, em ê der barê mijarên pêwendîdar de hem rave bikin, hem jî bi cih bînin. Divê neyê ji bîrkirin ku ez bi awayekî dixebitim mirov dikare jêre ceribandin bibêje. Ji lewra pirr normal e ku fikrên me bi awayekî pêşnûme xuya bikin.

Em wexta bûyerên di civaka li Kevana Bi Bereket de careke din bi vê nêrîna sosyolojîk lêbikolin; em ê bibînin ku sosyolojiya azadiyê li herêmê di pêvajoya şoreşa neolîtîk de ji aliyê dîroka civakî ve şahidiya neqeba kaosê ya herî bi bereket dike. Komên gerok ên bi nêçîrê û berhevkirina pincaran debara xwe dikirin, piştî ku qeşa rabû û xwe vekişand serê çiyan, bi tecrûbeyên xwe yên berê pêkhatina xwe ya civakê ji hev derxistin û bi vî awayî li rê û rêbazan geriyan ji bo li deverekê bi cih bibin û cotkariyê bikin. Komên klanan ên bi sedhezar salan jiyabûn êdî ber bi komên mezintir ve diçûn. Em dikevin qonaxekê êdî zêhniyet vediguhere û dike ku benda li pêşiya avê biteqe. Li şûna zimanê bi tevahî ji zimanê sembolan û zêhniyeta kevin a klan qutnebûyî, gavavêtina ber bi xelkên mezin ên gundan û zêhniyeta etnîsîteyan di rojevê de ye. Nîzama zimanê sembolan bi lez

pêş dikeve. Bê hejmar alavên qût û xwarinê, yên çûnûhatinê, tevn, kûzik, destar, avahîdanîn, dînî û hunerî derketine holê, ji tevan re nîzama binavkirinê û qalibên zêhnî hewce dikin.

Civaka nû bi giranî xwe dispêre jiyana gund, têkiliyên klanê jî werdigerin têkiliyên etnîk. Şêweyên nû yên pêkhatinên maddî, eger çarçoveyên xwe yên manedartir nebin wê nemeşin û heta dest pê nekin. Ziman û zêhniyeta veguherînê bi nasnameya civaka klan a berê bi 'totemê' dewam dikir, sembola civaka neolîtîk 'xwedawend-dayik' e. Fîgurên toteman kêm dibin, fîgurên xwedawend-dayikê zêde dibin, naverastê tijî dikin. Jina dayik a rola wê mezin dibe temsîl dike. Ji aliyê dînî ve, ev qonaxeke li pêş e, bi xwe re dewlemendiyeke mezin a têgînê tîne. Di ziman de daçekên 'mêbûnê' derdikevin pêş. Di daçekên zimanê sembol de jin rewşa xwe ya sereke demeke dirêj diparêze. Em îro jî vê taybetmendiyê di gelek zimanan de dibînin. Bi xwedawend-dayikê re civak bi pîrozbûneke zêde dikemile. Civaka nû tê maneya têgîn û binavkirinên nû. Pêvajoya em jêre şoreşa zêhniyetê dibêjin, ji ber ku afirîneriyê dixwaze, divê em wê di nava sosyolojiya azadiyê de bigirin dest û li ser rawest in. Dîroknasên di karê xwe de hoste hemfikir in ku pêvajoya behsa wê tê kirin, têrûtijî pêk hatiye, qewimiye. Tê maneya; bi hezaran diyarde, bi hezaran nav û şoreşên zêhnî. Ji şoreşa zêhnî ya li Ewrûpayê berfirehtir, şoreşeke mezin a resen û hewldaneke afirîner mewzûbehs e. Yek ji tespîtên dîrokî ye ku piraniya vedîtin û bi tevahî têgînên îro em bikar tînin di wê demê de hatine afirandin.

Eger em bi awayekî çor dabeş bikin ji nêvî ne kêmtir gelek hêmanên civakî hatine afirandin. Di warê dîn, huner, zanist, çûnûhatin, mîmarî, dexl, fêkî, mêwe, dewar û pez, tevn, kûzik û dîzik, hêran û destar, aş û aşxane, cejn û roşan, malbat, hiyarerşî, rêveberî, êrîş û parastin, xelat û diyarî û aletên cotkariyê de lîsteyek e ku mirov dikare hînê rêz bike, ji aliyê çendeyatî û çawayetiyê ve tevî rewşa xwe ya pêşketî îro jî alavên hatine afirandin di nava lîsteya me ya bingehîn a jiyanê de cihê xwe digirin. Em wexta li pêkhatina malbat û gundê ji neolîtîkê mayî dinêrin di

serî de exlaqê civakî yê herî resen, jiyanê manedar dike û hêzê didiyê, rêz, hezkirin, cîrantî û alîkarî, gelekî di ser nirx û buhayên (an jî bêexlaqtiya wê) modernîteya kapîtalîst re ne. Qalibên zêhnî yên bingehîn ên civakê ku wê ti carî kevin nebin, esas mohra vê serdemê li ser wan e.

Ji aliyê sosyolojiya pozîtîv ve jî jiyana bûyerî ya li herêmê li gorî xwe gelekî dewlemend e. Bûyer û diyardeyên nû yên li Kevana Bi Bereket li gorî jiyana civaka klan a yeknesak ku bi nêçîrê, parastin û berhevkirina pincaran û gîhayan dewam dikir, ji bo pêşketinê dipişkive. Bê hejmar bûyer û diyardeyên nû hatine binavkirin, bi awayekî dewlemend deng û çalakiya mirov pêşkêş dikin. Em ji vegotinên pirtûkên pîroz têderdixin ku maneya bingehîn a wê demê di zêhnê mirov de rê li ber têgîna ‘cennetê’ vedike. Belkî jî em bi kêliyeke gelekî bi şens a sosyolojiya pozîtîf re rûbirû ne. Li ser mirovatiyê mîna barana stêrkan bibare pêşketinek di rojevê de heye. Bûyer û diyardeyên mîna baranê dibarin li çar aliyên cîhanê mîna stêrk û rohniyê belav dibin, pêşketina civakî weke xeyaleke buhuştê û heta kêliyên danîna wê; ango ÇANDINIYA wê ye.

Ji aliyê sosyolojiya pêkhatinê ve, mirov dikare şopên tevahiya saziyên mohra xwe li pêşketina civakî xistine li Kevana Bi Bereket bibîne. Nexasim dema B.Z. 6000-4000 sal tam dema bisazîbûnê ye. Cih û warên gund û bajar wê lê bêne avakirin diyar bûne û li van deran bi cih bûne, hiyarerşî çêbûye, dîn bûye sazî, perestgehên pêşî derketine holê, etnîsîte bi gewde bûye, şiklên zimanan xwe zelal kirine, rêûresma cîrantiyê cîbicî bûye û rêveberiya bi exlaq jî wer xuya ye dema xwe ya herî bi hêz damezrandiye. Bi gotineke din, mayîndebûna şoreşa gund û cotkariyê ya civaka neolîtîk bisazîbûna wê misoger xuya dike. Avahiyên civakî yên mijarên bingehîn ên sosyolojiya pêkhatinê ne, cara pêşî li Kevana Bi Bereket evçend pêkhatineke xurt nîşan didin. Ev avahî û sazîbûyînên resen îro jî hêjayî lêkolînê ne, û hînê jî gelek tişt hene em ji rastiya wan hîn bibin û heta weke nirxên mirovatiyê yên pêşî yên sazîbûyînê em pêkhatinên li vê qadê çiqasî lêbiko-

lin, em ê ewçend der barê damezrandina sosyolojiya pêkhatinê de bigihîjin encamên tekûz. Divê em baş zanibin ku sosyolojiya pêkhatinê ya roja îro di warê ‘zanista manedanê’ de gelekî mehrûm e. Eger weke parçeyekî sosyolojiya giştî xwe di ber çavan re derbas bike, dikare bibe îfadeyeke xurt a zanista manedanê.

Çand û zimanê hîmê wê li Kevana Bi Bereket hat danîn weke mijara sosyolojiya çanda bingehîn cihê wê di asta çavkaniya resen û orjîn de ye. Civaka li herêmê hatiye avakirin di rewşekê de ye ku dema wê dirêj e. Me berê jî gotibû, eger jiyana mirov bi afeteke xwezayî yan jî civakî bi rêjeyeke ciddî ji holê ranebe (mînak dîsa li serdema klanan venegere), nifşê şaristanî û çanda civakî ya li Kevana Bi Bereket di wê rewş û çarçoveyê de ye ku serektiya xwe dewam bike. Şaristaniya çavkaniya xwe Çîn an jî Semîtîk ji bo bibe hêzeke hegemonîk, ji aliyê hêz û çarçoveya xwe ve bê îmkan nebe jî di pratîkê de gelekî zor û zehmet e. Jixwe tevî ‘êrîşên Îslamî’ û êrîşên mezin ên çavkaniya xwe ‘Moxolî’ çanda Hind-Ewrûpayê (ango çanda çavkanî, çand û zimanê Aryen) karektera xwe ya hegemonîk hîç wenda nekir. Di demên pêş de belkî Çîn dest bi êrîşeke nû bike. Lê çanda Hind-Ewrûpayê ya li gelemperiya dinyayê bicihbûyî dagirkirin û îstîlakirina wê, mêtingeh û kolonîkirina wê, eger destekdaneke mûcîzewarî ya tesîrên derve nebe (weke mînak li derveyî herêma Çînê felaketeke mezin a civakî û xwezayî) îhtimaleke gelekî qels û lawaz e.

Em dikarin sosyolojiya çanda bingehîn bi sosyolojiya giştî re wekhev bihesibînin. Hingî mirov dikare guherîn û veguherîna şêweyên zêhniyetê, saziya malbatê, (di serî de endamên sê çandên mezin, endamên çandên din hemûyan jî di nav de) hebûnên qewm û etnîsîteyan bike mijara Sosyolojiya Giştî. Ya girîngtir, rewşên kaos û rizînê yên ku Sosyolojiya Azadiyê û Sosyolojiya Pêkhatinê bi wan re rûbirû dibin, weke palpişt û encam di jiyana wan de cih digirin, dikarin weke mijar di çarçoveya Sosyolojiya Giştî de werin lêkolîn. Li Kevana Bi Bereket civaka mezin dibe di qonaxa xwe ya duyemîn de bi ‘Dewleta Rahib a Sumer’ dest pê dike û ev qonax ‘civaka şaristaniyê’ ye. Civaka şarista-

niyê çandek e ku ya esas xwe dispêre çanda Kevana Bi Bereket û gavavêtineke bi koka xwe ya xanedan-hiyarerşiyê ye. Cewherê meseleyê ev e; xwarin û cureyên wê zêde dibin, bi vî şêwazî hilberandinê têkildar derfetên çînî bi bajêrtiyê re dibin yek, çi komeke hiyarerşî-xanedaniyê bi hêza xwe ya ji berê mayî û derfetên 'zilamê xurt' dikeve nava tevgerê û dikare ji bo avakirina rêxistiniya 'dewletê' gavê biavêje. Li Kevana Bi Bereket ne tenê li Mezopotamya Jêr, li Mezopotamya Jor û Navîn jî em li pêşketinên bi heman rengî rast tên û li wan şahidiyê dikin. Hin ji wan mayînde dibin, lê ji ber şert û mercan hin ji wan nikarin xwe bigirin û ji holê radibin. Di Pirtûka Pîroz de dewlet weke Leviathan (cinawirê ji deryayê derketî) tê şîrovekirin. Meşa vî cinawirî li ser pêşketina civakî ku car caran qir dike, îstîsmarkar û xwînrij e, em ê di mijarên xwe yên ji niha û pê de bi şêweyên rêveberiyên qralên tazî û li piştperdeyê, yên bi maske û bê maske çawa mirov dikojin, dikeritînin, dimijin, dikin kole û vê yekê çawa rewa dikin, bigirin dest û li ser rawestin.

**Beşa Sêyemîn:**

# CIVAKA ŞAREZA YA BAJÊR -SERDEMA QRALÊN LI PIŞTPERDEYÊ Û XWEDAYÊN BI MASKE-

Îdeolojiya fermî ya moderniteya kapîtalîst pozîtîvîzmê texrîbata herî mezin di qada civaknasiyê de kiriye. Pozîtîvîst li ser navê zanistê weke di fizîkê de bi têgihiştina reduksiyonîst nêzî mijarên civakî jî bûne û ew weke ojbe girtine dest, vê yekê jî kiriye ku pirsgirêkên giran çêbibin. Li ser navê 'sosyalîzma zanistî' jî bi heman rêbazê qada civakî girtine dest, nexasim jî goya ekonomiya (qada maddî ya civakê) weke qada girîng a sosyalîzm pêre eleqedar dibe bi heman têgihiştinê girtine dest û vê yekê kiriye ku pirsgirêkên maneyê hînê tevlîhev bibin û çareseriya wan zehmet bibe. Têgihiştina nêzîkatiya fizîkî ya ku bi gelekî ji ya biyolojiyê paşdetir e, hêzek welê daye destê kapîtalîzmê ti sîlehê nikarîbûye bidiyê. Min di beşa rêbazê de hewl dabû nîşan bidim ku ev rêbaz paradîgmaya herî bingehîn a kapîtalîzmê ye. Em timî destê xwe nedinê, nabe ku em pêşde biçin. Wexta tu civakê bikî obje û bi vî awayî lêbikolî û ji aliyê zêhnî ve jî li vê yekê vekirîbî, berevajî îdîayan, nemaze 'sosyalîstên zanistî' yên li ser navê proleterya û xizanên din tevdigerin ji destpêkê ve ew ji çekan kirine, bêyî ku haya wan ji vê hebe. Em ê nîşan bidin ku hûnandin û qebûlkirina ci-

vakê weke diyardeyeke xwezaya fizîkî û heta weke xwezaya biyolojîk bi xwe teslîmbûna modernîteya kapîtalîst e.

Ez divê bi êş û hêrseke mezin diyar bikim ku bextreşiyeke mezin bû, li ser navê 'sosyalîzma zanistî' têkoşîneke gelekî mezin û serbilind a ji sedûpêncî salî zêdetir hînê ji serî ve bi pozîtîvîzmeke maddeparêz a çor neçarî têkçûnê kirin. Bêguman sedema vê helwestê li ser navê 'çînayetiyê' bûn e ku gelek caran di bin navê wê de têkoşiyane. Lê ev çîn û tebeqe, ne ew karkerên têkoşer û kedkar in ku li dijî proleteriya mîna koletiyê radibin, çîna 'bûrjûva-piçûk' e ku ji zû ve di nava modernîteyê de heliyaye û teslîm bûye. Pozîtîvîzm jî tevahî îdeolojiya nêrîna serkorî û nerazîbûna pûç a vê çînê ye ku li dijî kapîtalîzmê ye. Ev çîna esilzadeyên bajêr a hay jê nîne jiyana civakê çawa pêk hatiye û her tim bûye zemînê terîqeteke bêber û teng, beşekî civakê ye ku bi hêsayî ketiye destê nîzama fermî ya serdest.

Wexta behsa têgihiştina li civakê tê kirin, pozîtîvîzm hema bêje dibe şêweyek ji pûtperestiya hemdem. Pûtperestî, çarçoveya pûç a xwedatiya maneya xwe wendakirî ye. Xwedatî demekê ji bo civakê tiştekî mezin bû, têgîneke kêrhatî ya pîrozbûnê bû, lê kengî ev rewşa wê ya kêrhatî nema ji dest derket, li dawiyê tenê rewşa wî ya pûtekî ma. Mirov dikare fêhm bike ku kesên ji zanista manedanê mehrûm çima pûtperestiyê dikin. Ji ber ku ew nizanin çavkaniya pût ji kêrhatinê ye, berevajî ew dikevin wê xefletê yan jî yeqîn dikin ku pût ê maneyê biafirîne, ew ê wan bigihîne meznahî û pîrozbûnê. Ji lewra di vê çarçoveyê de analîzkirina dînên li dijî pûtan dikare mirov gelekî serwext bike. Ez ji pûtperestiya hemdem a pozîtîvîstên mehkûmî objektîvîzmê hîç guman nakim. Fîlozofên di qada modernîzmê bi xwe de jî dibêjin ku ev pûtperestên hemdem 'mîna pûtekî objeyên zêdexwarin û bikaranînê himbêz dikin.'

Marks û ekola wî yeqîn dikirin ku wê civak, dîrok, huner, huqûq û heta dîn bi ekonomiyê analîz bikin û ji hev derxînin. Bêguman bi tevahî saziyên civakî mîna şaneyên bedenekê têkildarî hev in, û bandorê li hev dikin. Lê wexta ku em bikevin qa-

da civakbûyînê her tişt diguhere. Saziyên civakî yên ji aliyê zêhnê mirov ve hatine vedîtin şaneyên biyolojîk nînin. Heta em dikarin bibêjin ku şaneyên bedena mirov jî nînin. Zêhnê mirov di nav rewşa civakî de weke çiyayekî volkanîk e ku ji bo çêkirina mane û îradeyê her tim dikele û diteqe. Di cinsên din ên zindiyan de hemtayekî wî bi vî rengî nîne. Belkî mirov karibe hin aliyên hevbeş di cîhana kûantûm de bifikire. Em ji bîr nekin ku zêhnê mirov bi xwe li gorî nîzama kûantûmê dixebite. Dinya maddî jî (avahiya ekonomîk a civakî jî di navê de) qeşagirtin û qaşilgirtina kêrhatina kûantûmê îfade dike. Hewce nake mirov hîç nîqaş bike, eşkere yê civakê bi rêve dibe zêhn e. Dîsa hewce nake ku em piştrast bikin, mirov çawa bi xebata zêhnî xwe digihîne ekonomiya civakî.

Dubare be jî divê ez careke din bibêjim ku mirov dîrokê bike sosyolojî, sosyolojiyê jî bike dîrok di zanista manedanê de yek ji şertê sereke yê pêşketinê ye. Yek ji avantaja vê rêbazê ew e; rê dide mirov şîroveyeke nêzî rastiyê bike ka dîrok çawa çêbûye û heta îro wer herikiye, hatiye. Ez girîngiya fikra spekulatîf înkar nakim. Berevajî ji bo ev şêwazê fikrê kêrhatî be, bûyerên dîrokî çawa li pey hev qewimîne û bihurîne, divê zanibe xwe bigihîniyê. Naxwe were gotin ‘binesazî dîrokê diyar dike’ yan jî berevajiyê wê ‘dîrok ji çalakiya dewletê pêk tê’ û di vî warî de çiqas bûyer bêne rêzkirin û analîzkirin, ji aliyê zanista manedana dîrokê ve, rewş ji berevajîkirin û ji rêderxistinê zêdetir tiştekî din nîne û ti encamê nade. Eşkere li naverastê ye, bi vê rêbazê behsa dîrokê ango civakê nayê kirin. Ya li vir tê kirin dîrok nîne, fîzyolojiya civakî ye. Saziyên civakî (di fîzyolojiyê de şane) çawa bandorê li hev dikin an jî hev diyar dikin, ji sedî sed dîrokvegotin nîne; pozîtîvîzmeke gelekî çor e.

Ji bo mirov karibe behsa dîrokeke manedar bike pirsa kilît ew e ku mirov zanibe hêza wê ya herikînê çawa ye, û di dema herikînê de çawa pêk tê. Eger mirov zanibe kîjan zêhn û îrade xebitiye û di wê kêliyê de bi tesîr bûye, xwegihandina wê mane û îradeyê, çêkirina dîroka rastî ye yan jî şîrovekrina wê ye. Dibe ku ev yek pên-

gaveke ekonomîk be, her wisa dibe ku çalakiyeke dînî be. Ya girîng ne sîleh e, ya girîng kêliya kişandina lingê wê ye û destê wê dikişîne ye. Tu çiqasî dixwazî ewqas hewl bide sîlehê ji aliyê ekonomîk, hunerî, siyasî û eskerî ve analîz bikî, lê vegotina te ya bi vî rengî dibe ku tenê qîmeteke xwe ya xemlê hebe; lê divê ez her tim dubare bikim ku wexta were gotin herikîna dîrokê ya divê mirov fêhm bike; lingê sîlehê timî ji aliyê destê xwediyê xwe ve tê kişandin. Belkî ji bo çêkirina sîlehê behsa hewcedariya bi hostetiyeke mezin û xebateke ekonomîk were kirin. Ew dibe. Lê ev helwest bi xwe jî ji îfadekirina dîrokê hîç fêhm nake. Divê neyê ji bîrkirin ku dîrok sîlehek e ku timî dixebite. SÎLEHEKE DIXEBITE, TIMÎ FÎŞEK LI BER E, DEST LI SER LINGÊ WÊ YE. Di dîrokê de yên xwedî berpirsiyariyên stratejîk vê baş dizanin. Ji împaratorên Romayê, -ez şaş nebim Valentillanos bû- ji bo şîrîkatiya împaratoriyê birayê xwe dide erêkirinê. Kesên ew hilbijartine piştî demeke kin dibêjin ku ew ji ya xwe vegeriyane. Lê ew ji wan re dibêje; 'Ji ber ku we carekê hilbijart mafê we yê liberrabûnê nema', bi vê gotina xwe baş îfade dike ka dîrok çi ye.

Girîngiya vê vegotina der barê rêbazê de ji bo maneya dîroka modern a kapîtalîst, ez ê di beşê pêwendîdar de qala wê bikim. Em ji bo ketina dîroka şaristaniyê pirsgirêka rêbazê ji nedîtî ve neyên da ku hinek xwê ya me jî di hevîrê zanista manedanê de hebe. Nirxê şîroveyekê bi qasî ku hêza wê ya ravekirinê ye, ewqasî jî nirxê wê yê bikaranîna di xizmeta kesên timî li bin nîrê hukmê dîrokê de dimeşin lê dîsa jî timî dikarin insiyatîfê bi kar bînin e. Şîroveya dîrokî ya rastî ji bo kesên di rola qurbanên dîrokê de ew e ku wan ji rola qurbanan derîne, wan bigihîne serwextbûn û îradeya ku hêza bi cihanîna azadiyê bide. Şîroveyeke dîrok-civakî ya zêdetir qurbanên xwe (bindest û yên tên mêtin hemû) mehkûmê yên kirine qurban dike, bi gotina 'rizgarî di demeke nêz de ye' serî li wan bigerîne, çendî îdîa bike ku zanistî ye jî, çendî li ser navê qurbanên xwe behsa şîroveyê bike jî eger ev kes niyetxirabên bi zanebûn mirovan ji rê derdixin nebin di rewşeke gelekî xafil de ne; serhatîbêjên dîrokê yên pûtan in.

## 1- DIVÊ EM CIVAKA SUMERAN ÇAWA ŞÎROVE BIKIN?

Mijara me destpêka Sosyolojiya Pêkhatinê ye, girêdayî vê armancê em ê cih bidin Sumeran. Em li vir bi dîroka şaristaniyê danakevin. Lê divê şîroveyên ji bo kêrhatina wê bêne fêhmkirin. Ez li bersiva vê pirsê digerim: em divê mînaka Sumeran di şîrovekirina dîrokê de çawa bigirin dest û binirxînin? Divê bersivên em bidin hem rêbazê zelal bikin, hem jî ji bo destpêkirina dîrokê bi kêr bên. Gelekî baş û kêrhatî ye ku mirov vê mînakê ji pirr aliyan ve bigire dest û li ser rawest e.

**a-** Li Mezopotamya Jêr li devera Dîcle û Firat nêzî hev dibin û dibin yek, ev şaristanî li ser erdên dewlemend ên alîvyon û bi qamir ava bû, hînê li bakurê wê Til Xelef (B.Z. 6000-4000) ket qonaxeke mezin ku jêre qonaxa bi sazîbûna neolîtîk jî tê gotin, têde qût û zadên cûrbicûr hatin bidestxistin. Bi qasî teknîkên rê li ber vê hilberandinê vekirin, ya esas civaka gund bû ku rê li ber zêhniyeta teknîkê keşif bike vekir. Bicihbûyîn hewcedariya xwe bi erd û axê heye; bi vê re saziyên civakî yên hevdu xwedî dikin pêş dikevin. Bi sazîbûnê re zêhniyeta civa-

kî xwe bi rêxistin dike, kolektîf dibe. Xweşbûna demsalan û barana têr dibare avdaniyê di rêza pêş de ferz nake. Lê mirov li girîngiya avdaniyê serwext dike. Ber bi salên 3000 yên B.Z. tê îspatkirin ku gelek gund li Mezopotamya Jêr li ber bajarbûnê ne; di vî warî de bi dehan mînakên di encama erdkolanên li qadên arkeolojîk de derketine, hene.

Yek ji nîşaneyên bajarbûnê diyar dike, bedenên dor li wargehên li ser gelek gir û tilan digirin in. Lê ji ber ku avdanî bi sînor tê kirin û debir bi baranê tê, mezinbûna zêde û bi hejmar pirrbûnê dixe zehmetiyê. Li jêr Dîcle û Firatê gelek erd hene, bi bereket in, û ji bo avdaniyê baş in. Îspat bûye ku di salên 5000 B.Z. de gundên pêşî yên bi cihbûyî ji bakur ji çanda Til Xelef daketine. Jixwe şêniyên wê demê zêde dibin li deverê timî tevgerekê ferz dikin. Gundên mezin û zêde dibin, ji bo belavbûna li çardorê xwe li maneyê digerin. Me hewl dabû ku em vê pêvajoyê bi xalên sereke diyar bikin. Li jêrtir, li başûr kêmbarîna baranê avdaniya li herêmê ferz kiriye û vê yekê jî bi xwe re rêxistiniyeke berfireh hewce kiriye. Em dibînin rêxistiniya îdeal a jêre Zîggûrat tê gotin di çarçoveya perestgehan de pêk tê.

Sê fonksiyonên Zîggûratan ên di zikhev de, ji bo mirov bi tevahî civaka Sumeran ji hev derxîne û fêhm bike, têra xwe girîng in. Fonksiyona yekemîn; li qatê herî jêr ê Zîggûratê xebatkarên li nav erdê perestgehê dixebitin. Hosteyên amûr û alavan jî li vî qatî dihewin. Fonksiyona duyemîn; li qatê duyemîn rahibên rûniştine, wezîfeya rêveberiyê bi cih tînin. Rahib karê hilberînê yê mezin dibe hesab dike, ji bo xebatkaran kollektîf bide xebitandin divê hêza razîkirinê ya rewakirinê çêke. Ango divê hem karê dinyayê û hem jî yê dînî bi hev re bimeşîne. Fonksiyona sêyemîn jî hebûna xwedayî ya li qatê sêyemîn e ku numûneyeke pêşî ya weke panteona xwedayan bi cih tîne. Di warê bandorê de, çawa ku min di Parêznameya xwe ya bi navê ‘Mirovê Azad’ de jî îdîa kiribû, Zîggûrat ji bo civakên şaristaniyê yên paşê bên fena modelekê ye. Ev damezrandineke wer îdeal e ku modela sereke ye, ya ku civaka bajarên îro hejmara wan bi sed hezaran

e, û serjimara wan ji mîlyonan bihuriye, jê zêde bûne. Û min gotibû: malzaroka rêxistiniya rengê dewletê ye ku di nava civaka bajêr de xwe saz kir. Zîggûrat di dema xwe de ne tenê navenda bajêr e, bajar bi xwe ye. Bajar jî dabeşî sê beşên sereke dibe. Yek jê perestgeh e (Mala Xwedê) ku li vir rewakirin û bi cihanîna wê tê kirin, beşa hinekî firehtir ew beş e ku lê rêveberên bajêr rûdinin û beşa herî berfireh kolanên xebatkar lê dimînin in. Zîggûrat van hersê fonksiyon û karan bi hev re bi cih tînin. Di heman demê de li dinyayê mînaka yekemîn a damezrandinê ye.

Em wexta hinekî din ji nêz ve binêrin, em ê bibînin ku ji sedî sed rahib mutteşebîsê yekemîn e. Li gorî dema xwe kapîtalîst (ji bo baş were fêhmkirin wisa dibêjim, naxwe moderníteya kapîtalîst hînê cihêwaz nebûye) yan jî patron û axa ye. Karên wî yên dîrokî hene ku divê bi cih bîne. Berê pêşî damezrînerê bajêr e ku mohra xwe li civaka nû dide. Li dora wî ne gundekî ji rêzê, bajarek reng digire, bi gewde dibe. Eger em zehmetiya vî karî di roja me ya îro de jî li ber çav bigirin, em ê mezinahî û zehmetiya wezîfeya rahib hînê baştir fêhm bikin. Ji bo bajarê nû ava dibe, hewcedarî bi gelek xebatkaran heye. Wê ev xebatkar ji ku bêne anîn? Ji klan û etnîsîteyan girtin û stendina mirovan gelekî zehmet e. Weke îro bê karî bi sazî û bi cih nebûye. Tek tûk mirovên ji etnîsîte û klana xwe qut dibin têrê nakin. Mirov hînê neketine dema bi zor kolekirinê. Bi îhtîmaleke mezin avantaja rahib hemû bikaranîna xwedê weke sîlehê ye. Ha di vir de bikêrhatina şahane ya rahib li ser kar e: wezîfeya AVAKIRINA XWEDÊ. Ev mijar têra xwe girîng e. Eger di vê erk û wezîfeya xwe de bi ser nekeve, wê civak û bajarê nû, ango hilberîna zêde çênebe. Ev mînak jî baş rave dike çima rêveberên pêşî yên dewletê rahib in. Ne bi tenê bajêr, hilberîna zêde û civaka nû, bi xwedê re bi tevahî dinya têgînan, hesab, sêhr, zanist, huner, malbat û heta serbiserkirina pêşî jî Zîggûrat divê ji nû ve plan bike, bi projeyekê ve girê bide û ava bike. Rahib muhendisê pêşî yê civakê ye, mîmarê pêşî ye, modela pêşî ya pêxemberiyê ye, ekonomîstê pêşiyê ye, karsazê pêşî ye, serkarê pêşî ye, qralê pêşî ye.

Em bi awayekî berfireh li karên bingehîn ên rahib binêrin:

**b-** Yek ji karên girîng ên sereke yên rahib avakirina dînekî nû û xwedayekî ye. Li gorî şîroveya min, cewherê vedîtina dîn a rahibên Sumeran girêdayî perestina 'totemên' berê ne. Ev vedîtina dîn a rahibên Sumeran xelekek e ku têkiliya xwe bi dînên Brahîmî re heye, dînên Brahîmî jî ji pûtperestiyê bihurîbûn. Vedîtina dînê rahibê Sumeran û dînên Brahîmî ji hev qut xuya dikin, lê ez bawer dikim ku di nava wan de têkiliyek heye. Ango weke têgîna hêzê xwedayê bi nîzama ezmanan re mijûl dibe û dînê totemîk ê nasnameya civakê diyar dike di nava hev de xuya dikin. Şîroveya dibêje; 'totem nasnameya klanê û şiklê wî yê berfirehtir qebîleyê îfade dike', bi giştî tê qebûlkirin. Her çi objeyeke di jiyana klanê de girîng be, dikare bibe totem. Bi pirranî objeyên hêzê îfade dikin têne hilbijartin. Di navê eşîr û bavikan de em îro jî rastî navên mîna şêr, baz, mar, gur, roj, ba, baran, dar û nebatên girîng tên. Ev nav ê ji wê demê mane. Hêza dînamîk a neolîtîkê jin-dayik e, û tiştên pîroz li dora wê çêdibûn. Ev yek rewşa rahibê mêr bi bîr dixe. Nîşaneyên xwedayên ezmanî û totemîk, sembolên bereket û zêdebûnê bi navê jin-dayikê girîng dibin.

Xwedawendiya dayiktiyê wê hînê paşê bi xwedayên rahibên Sumeran bikevin nava şerekî mezin. Nemaze xwe li hev rakişandina xwedayê mêr ê xasûk 'Enkî' û fîgura sereke ya xwedawendiyê 'Înannayê' mijara sereke ya destanên Sumeran e. Di binê vî şerî de berjewendiyên cihê hene. Li tejaneya Firat û Dîcleya Jor bi pêşengiya jin-dayikê li dora gundan civakeke gund a neolîtîk a rê nade mêtingeriyê heye, li aliyê din civaka bajêr a cara pêşî ji aliyê rahib ve tê avakirin heye. Di navbera van herdu civakan de şer û pevçûneke berjewendiyên cihê heye. Di dîrokê de cara pêşiye ev çend 'pirsgirêkên civakî' yên ciddî derdikevin holê. Bêguman çavkaniya şerê di navbera rêveberên herdu civakan de pirsgirêkên civakî ne. Weke em di dîrokê de dibînin; têgîn û zimanê vî şerî, ji aliyê şêweyên zêhniyetê yên wê demê ve têne diyarkirin. Ji ber ku şêweyên zêhniyetên îro wê de-

mê tinene. Civak bi xwe, bi nasnameyeke nîv-xwedê tê îfadekirin. Zêhnê mirov hînê ji nasnameyeke muccered gelekî dûr e.

Zêhnê mirov ê wê demê yeqîn dike ku xweza zindî ye. Xweza bi xweda û ruhan tijî ye (Ev yek, li gorî roja me ya îro tiştekî paşketî nîne, li gorî min pêşketî ye, şîroveyeke nêzî rastiyê ye). Destdan û destwerdana wan dikare encamên bi tehlûke bi xwe re bîne. Bi tevahî pîroz in. Divê mirov bi rêz û hurmeteke mezin nêzî wan bibe. Li hemberî wan bê hurmetiyeke herî piçûk dikare rê li felaketê veke. Ji lewra ji bo neqehirin divê ji wan re qurban û boraq bêne dayîn. Ew çend girîng dibe ku pîrozan û xwedayan bi qurbanan razî û xweşhal bikin, qurbankirina, zarok, keç û xortên ciwan demeke dirêj weke rêûresmekê dewam dike. Ev rêûrismeke ku dike grîzok bi bedena mirov bikevin, lê her kes bawer dike ku bi vê civak li ser piyan dimîne. Ev rêûresm di demeke dirêj de ji aliyê rahib û rahîbeyan ve ji rê tê derxistin û tê berevajîkirin. Lê eşkere ye ku cewherê wê ji sedî sed bi pîrozbûn û parastinê re eleqedar e. Her cure têkiliya di navbera komên mirovan de bi têkilî û nakokiyên di navbera van pîroz û xwedayan de tê îfadekirin. Zêhn û ziman bi vî awayî hatiye avakirin. ‘Zimanê zanista pozîtîv’ a îro tineye. Mirovatî vî zimanê zanista nû ya pozîtîv (ya rastî ‘dîn’) di van dused salên dawiyê de nas dike. Em dema hewl didin dîrokê şîrove dikin, divê em vê rastiyê ti carî ji nedîtî ve neyên, piştguh nekin.

Ji lewra şerê di navbera Înanna û Enkî de pevçûneke dijwar a civakî ye. Bêguman bingehê maddî yê vî şerî heye. Jixwe em di pevçûna îro li Tirkiyê de jî dibînin ku şîroveya em dikin, rast e. Hêzên CHPê yên xwe zanistî û pozîtîvîst dihesibînin û AKP ya metafizîk a îdîa dike ser bi bawerî û dînê Îslamê ye li ber hev didin. Pevçûna di navbera van herdu hêzan de careke din ji nêz ve nîşanî me dide ku diyalektîka dîrokî çawa cereyan kiriye. Em divê baş fêhm bikin ku ti hêza ekonomîk, siyasî û eskerî tineye ku dîn tevlî pevçûna civakî neke. Em vê fêhm nekin, heye ku em bikevin rewşa ‘sosyalîzma pêkhatî’.

Vedîtina rahibên Sumeran xwedayê ezmanan 'En' û xwedayê li erdê 'Enkî' xwedî karektereke nêr ango mêrane ne. Ev yek, rastiya mêr a di civaka sumeran de derdikeve pêş nîşan dide, ango mêr pîroz dikin û wî dikin xweda. Ev pîrozbûneke welê ye ku mêrê nû yê bilind û pêşeng, civaka 'ji erdê heta ezmanan bûye pîroz û xwedayî' bi xwe ye. Eger em binê meseleyê hinekî din bikolin, em ê baş bibînin ku ya tê bilindkirin û mezinkirin 'çîna rahiban' bi xwe ye. Çawa ku em binê baweriya 'Înannayê' dikolin jî em dibînin hêza afirîner û rêveber a neolîtîkê hêza civakî ya jin-dayikê ye. Têkoşîna di navbera aliyan de herçend di dema civaka Sumeran de heta salên 2000î B.Z. mêzîna wê li dijî jinê xira bibe jî di nava weznekê de ye. Têkoşîna di navbera jin û mêr de ya heta îro dewam dike, mirov di dîrokê de bi rengên wê lêbikole wê sûdewar be, û mirov wê karibe jê hîn bibe. Em ê hewl bidin vê yekê bikin.

Rahib qatê jor ê Zîggûratê ji xwedayan re (her diçe hejmara wan kêm dibe) veqetandiye, û vê derê weke sirrekê vedişêre. Ji bilî xwe (serrahib) destûrê nade ku kes biçe vî qatî. Ev gava taktîkî ji bo pêşketina dînî girîng e. Bi vê yekê, hem meraq û rêzgirtina mirovan, hem jî girêdana wan pêşde dibe. Serrahib ji civakê re timî dibêje û belav dike ku li qatê jor bi Xwedê re dipeyive. Yên dixwazin gotina Xwedê bibihîsin divê guh bidin 'gotina' serrahib. Ji ber ku ew bi tenê berdevkê erkdar ê Xwedê ye. Ev rêûresma bi heman awayî derbasî dînên Brahîmî jî bûye. Hz. Mûsa li Çiyayê Sînayê (Tûrî Sîna) bi Xwedê re peyivî û 'DEH FERMAN' anîn. Navekî din ê Hz. Îsa 'BERDEVKÊ XWEDÊ' ye. Gelek caran xwe li axaftina bi Xwedê re ceribandiye, lê her carê ev hewldanên wî ji aliyê şeytên ve hatine asêkirin. Lê di dawiyê de bi ser dikeve. Derketina Hz. Muhammed a Mîracê jî nîşan dide ku heman rêûresm bi Îslamê dewam dike. Qatê jor, di dînê Grek-Romayê de weke Panteonê gelekî bi rêkûpêk û bi heybet tê sazkirin. Di dînên Brahîmî de jî bi rêya Hawra, Dêr û Mizgeftê hîn bi heybet û ji nû ve têne sazkirin. Rola tebeqeyên dînî ya di nava civakê de zêde dibe eşkere xuya dike.

Serrahib ew kes e ku li qatê Xwedê, li mala wî dikare bifikire, bihizire û biponije. Ji bo sererastkirina nû ya civakê serketî û bi tesîr be, divê ev sererastkirin li gorî gotinên di navbera wî û Xwedê de dibin pêk bê û ev yek gelekî girîng e. Ji bo temsîla hin xwedayan cara pêşî hin heykel li vî qatî têne bicihkirin. Bi vê vedîtinê meraq û kakûniya mirovan hînê zêdetir bû. Fîgur û pûtên sembol ên 'xwedayê têgîn' hewce têne dîtin. Jixwe mejiyê mirovê wê demê li şûna bi van têgînên muccered û neberçav bifikire, zêdetir mêyila wî li ser xebata bi pêşnûmeyên zêhnî yên fîguran e. Fikra ne fîgurî, ango fikra devkî, fikra muccered[50] fêhmkirina wê pirr zehmet e. Tesîrên zimanê sembolan (bi şiklekî zimanê beden û fîguran) gelekî li ser komên mirovan heye. Ji lewra têgînên xwedayan ên bi fîgur û pûtan têne fêhmkirin. Ji serdema dayikxwedawendan gelek fîgurên jinên qelew mane hînê nefspiçûk in, û jin-dayika hilberîner û bi bereket temsîl dikin.

Mala xwedê ya pêşî qatê jor ê Zîggûratê ye, paşê panteon, dêr, sînegog, mizgeft û cemîe (zanîngeh) ne ku mirov têra xwe ji van mînakan hîn dibe. Ev pêkhatinên dîrokî yên weke xelekan bi hev ve girêdayî ne, hafiza û bîra pîroz a civakê û nasnameya wê îfade dikin. Îlahiyat, bi navê wê yê din teolojî an jî xwedênasî vê hafizayê bi awayekî felsefîk hîn dike: ji mînaka pêşî qut û muccered hîn dike. Di dîrokê de berevajîkirin û çeloxwarîkirinên herî mezin di qada teolojî-îlahiyatê de têne kirin. Bêguman mirov nikare di pêşketina zanist û felsefeyê de rola îlahiyatê ji nedîtî ve bê. Lê ji ber ku çavkaniya civakî ya xwedayetiyê destnîşan nekirine, ji mucceredê çûne mucceredê, ji pût xwe avêtine pût û wisa meşandine; ji ber civaka avakirine, bi giştî ji şaristaniyê û bi taybetî jî ji pêkhatina şaristaniya îro çîna berpirs a sereke ye.

Bêguman şîroveyên îlahiyatê yên xwe ber didin çavkaniyên resen û rast gelekî bi kêra zanista manedanê hatine. Lê divê mirov ji bîr neke ku ew bi pozîsyona xwe ya li cem tevahiya nîzamên

---

[50]Muccered: (soyut) Abstract. Gotinek bi erebî ye. Tu tiştekî ji tiştekî dike û wî bi serê xwe digire dest. Mejiyê mirov ê ji hebûnên berçav rengê xwe girtiye dikare xwe ji wan bike û li ser rengê heyî rengên nû biafirîne.

fermî yên hiyarerşî û dewletê, bi zanebûn an jî xweber maneyê gelekî berevajî û çeloxwarî dikin. Ji bo fêhmkirina Rojhilata Naverast a îro, em ê van xusûsan û di her qonaxa girîng de şêweyên wê yên nû, analîz bikin û hewl bidin da ku bêne fêhmkirin.

**c-** Karê duyemîn û girîng ê rahib, muhendîstiya civakê ye. Hem di plansazî û avakirina civaka nû de û hem jî di rêveberiya wê de bi xwe cih digire. Ev wezîfe li qatê rahiban qatê duyemîn ê Zîggûratê tê meşandin. Rahib weke qasidên Xwedê, wê di bin berpirsiyariya serrahib de weke çîneke pîroz zêde bibin. Weke komeke hindikayî ya rêveberên her bajarî wê kasta hiyarerşîk a pêşî (rêveberiya pîroz) pêk bînin. Me bîla sebeb negot ev modelên pêşî yên rahib û profesoran jî ev in. Rahiban kesên di qatê yekemîn de dixebitandin (destpêkirina ebediyetê), ew bi xwe jî bi Xwedê re bi zanist û bi cihanîna wê re mijûl dibûn. Nivîs, matematîk, astronomî, bijîşkî, wêjeyî û bêguman zanista xwedayetiyê hîmê wan li qatê navîn li odeyên rahiban hat danîn. Qatê navîn di heman demê de modela pêşî ya dibistan û zanîngehan e. Perestgehên li qatê xwedayan prototîpa dibistanên li qatê rahiban bûn. Ji ber ku karûbarên civaka bajêr mezin dibin, bêguman rêvebirina van karan di vê yekê de bi tesîr e. Divê mirov baş fêhm bike ku xebatên maddî bi serê xwe, ango bi şîroveya Marks bi ‘kedkarên azad’ ti carî nehatin meşandin. Dema kapîtalîst jî di navê de, di ti civaka çînî de nabe ku xwediyên milkên taybet an jî kollektîf bibin xwediyê kedkarên azad. Ti mirovê bi rewakirin û zordestiyê nekiribin evd wê nikaribe di nav milkê xelkê de azad bixebite! Wexta cih hat em ê van mijaran jî şîrove bikin.

Rahib karên rêveberiyê bi pirranî bi rewakirinê dimeşînin. Di vê de hunera wan a herî mezin, berdevkiya xwedê û zanista di yekdestiya wan de ye. Berdevkiya wan a Xwedê û vedîtinên wan ên zanistî hêzeke mezin a rêveberiyê dide. Em ji bîr nekin ku di kapîtalîzmê de jî **ZANIST HÊZ** e. Em bi bîr bixin ku hîmê vê zanistê di civaka neolîtîk de, nemaze di dema Til Xelef de (B.Z. 6000-4000) hat danîn. Kêrhatinî û alîkariya xwedawendên jin-dayikê di vê demê de diyarker in. Divê baş were fêhmkirin

ku jin-dayik di kedîkirina heywanan, tevahiya nebatan, tevn, kûzik û gîzikan, destar û hêran, mal û malên pîroz de hîndekar û perwerdekara pêşî ye. Xwedawenda dayik Înanna di têkoşîna xwe ya li dijî xweda Enkî de, îdîaya wê ya herî mezin ew e ku bi israr ji Enkî re dibêje; sedûçar vedîtinên (meyên) wê jê dizîne û ew xwediyê van vedîtinan e. Di bin vê israrê de ev rastiya em balê dikişînin ser heye. Ango gelek vedîtin berhemên jin-dayikê ne. Rêveberên mêr ev ji wan dizîn. Em ê bibînin ku qonaxa şaristaniyê hinekî jî li ser vî esasî hatiye avakirin.

Bêguman em nikarin vedîtinên rahiban piçûk bibînin. Di hîmê zanistî yê şaristaniyê de ji sedî sed vedîtinên wan ên weke nivîs, astronomî, matematîk, bijîşkî û îlahiyatê hene. Li cih e ku mirov bibêje; di pêvajoya destpêkirina zanistî de rahibên Sumeran xwedî roleke sereke ne.

Di dîrokê de bi qasî ku tê zanîn ji qralên pêşî yên Sumeran re rahib-qral dihat gotin. Rahib-qral di civaka bajêr de qralên pêşî ne. Her bajar pêşî rahib-qralekî xwe heye. Li ser hîmê zanist û îlahiyatê xwe rewa dikin ku ev jî sedema bingehîn a rêveberiya qraltiya wan e. Ev rewş di heman demê de wê bibe aliyê wan ê qels û lawaz. Piştî demeke diyar wê dema xanedaniyan destpê bike. Di vê de jî serê xanedaniyê bi ‘zilamê xurt’ re hevdu digirin û eskerên li dora ‘zilamê xurt’ di vê de xwedî rola bingehîn in. Zor, wê karibe zora ‘lîstika rahiban’ bibe. Em ê paşê li ser vê mijarê rawestin.

**d-** Li qatê herî jêr xebatkar hene. Ji ber ku kesên di vî qatî de cih digirin, bûne hîmê pêşî yê koletî, serftî û karkertiyê divê em wan baş fêhm bikin û li ‘xebatkarên qatê yekemîn’ baş serwext bibin. Ev ji ku û çawa peyda kirin? Di vê de rola zor û razîkirinê çi ye? Ev ji kîjan komê û di berdêla çi de têne peydakirin, di nava wan de jin hene? Rola jinan û malbatê çi ye? Bersivdana van pirsan wê mijarê gelekî baş zelal û rohnî bike.

Di pêkanîna komên pêşî yên xebatê de, heye ku hêza razîkirinê ya rahib li pêş bû. Mirov dikare bifikire ku di sîstema hilberînê ya pêşî de bi xêra zad û qûtê bi riya avdanê zêdebûyî,

kesên dihatin xebitandin ji cihên jê hatin baştir dihatin xwedîkirin. Bi zêdebûna şêniyan û koçberiyê re, kesên di encama pevçûnan de bi qebîleya xwe re li hev nekiribin û cihekî pêde biçin tine be, heye ku perestgeh ji wan re cihekî çare û rizgariyê be. Sedemeke din a muhtemel ew e ku xebata di avakirina perestgehan û suxreyên wê de pîroz bû. Belkî jî vê roleke girîng lîstibe. Di rêûresma Rojhilata Naverast de gelek caran tê dîtin ku her qebîle û malbat di çarçoveyeke bi sînor de zarokên xwe didin xizmeta perestgehê. Angarya[51] perestgehê kategoriyeke giştî ye. Heta payeyeke anorê jî dide. Kesên li perestgehê dixebitin di nava civakê de hînê zêdetir xwedî rûmet û anor in. Bi şiklekî mirov dikare bişibîne keşîşxane û xelwetên Xiristiyanan. Aliyên wê yên dişibin terîqetan jî hene. Di nav milkê şêx de xebat hem anor e, û hem jî xêr e.

Zîggûrat, ji ber ku mînakên herî pêşî û safî yên xebatên kollektîf in, balê dikişînin. Mînak hin sosyolog vê xebatê weke 'sosyalîzma Firewnan' dibînin (Max Weber). Eşkere ye ku Zîggûrat mînaka pêşî ya bicihanîna komînîstiyê ye. Komên pîşekar jî di nava koma xebatkaran de cih digirin. Tev bi hev re dişibin hilberîna karxaneyekê. Berhemên zêde di kewaran de têne hilanîn. Eşkere ye ku ev li dijî xelayê pergalekî baş e. Xebat û tevgereke bi vî rengî hêza rahiban bi awayekî nedîtî zêde dike. Ti malbat an jî qebîle nikarin xwe bigihînin vê astê. Hêzek çêdibe ku ji tevahiya malbat û qebîleyan mezintir e. Zîggûrat malzaroka civaka nû û dewletê ye. Herdu li vir ruh bi wan dikeve û bi lebat dibin. Bi qasî Zîggûratan ti mînak nikare vê rewşa civaka nû û dewletê raxîne ber çavan.

**e-** Pirsa, 'di sîstema Zîggûratan de rewşa jinê û malbatê çi bû ?' girîng e. Dijberiya dînê dayik-xwedawendê bi dînê rahibên Zîggûratan re di metnên Sumeran de gelekî tê dîtin. Dijberî xwe bi gelek awayan nîşan dide. Bi giranî rahîbe perestgehan ava dikin. Hema bêjin her bajarek xwedawendeke xwe ya star û parastinê heye. Mînaka balkêş serhatiya Xwedawenda Ûrûkê

[51]Angarya: Xebata bi nanozikê.

Înannayê ye. Ûrûk (herhal navê Iraqa îro ji Ûrûkê tê) di dîrokê de weke dewlet-bajarê pêşî yê Sumeran xwedî cih û maneyekê ye ku ji vî alî ve mînakeke hêjayî lêkolînê ye. Her weha ji ber ku bajarê qral Gilgamêş e jî navdar e. Dibe ku Ûrûk mînaka pêşî ya dewlet-bajar be. Di dîrokê de salên 3800-3000 B.Z. weke dema Ûrûkê cih digire. Ji ber ku damezrîner xwedawend Înanna ye, ev jî kevintiya bajêr û rola jin-dayikê ya hînê sereke ye, nîşan dide. Têkoşîna Ûrûkê li dijî Erîdûyê (bajarê xweda Enkî; belkî jî dewleta yekemîn a rahiban) destanwarî ye. Di şexsê Înanna û Enkî de têkoşîna di navbera mêr û jinê de bi qasî mînakeke berçav e, her wisa aliyê wê yê destanwarî jî nîşan dide. Fîgurê xwedawendê bi demê re kêm dibe. Di dema Babîlê de jin ji sedî sed têkçûyî xuya dike. Jin bi qasî ku kole ye, her wisa êdî bi awayekî fermî orûsipiyeke taybet û giştî ye.

Tê zanîn ku di beşekî Zîggûratê de jinan weke objeyeke eşqê cih girtine. Hem jî keçên malbatên herî baş weke objeyeke eşqê rol girtine û ev yek jî payeyeke anorê ye. Keçikên neqandî û cihêwaz li wir têne qebûlkirin. Di nîzama rahiban de pêşandana jinan muhteşem e. Li Zîggûratan di nîzama qesran de di warê ciwanî û delaliyê de bi her awayî tên perwerdekirin. Di hin warên huner û muzîkê de dibin hoste û pispor. Ji bo ku mêrên herêmên dewrûberê biecibînin, têne nîşandan. Wexta bi hinan ji wan re li hev bikin, dihatin zewicandin. Bi vî awayî hem hatina aborî û hem jî bandora perestgehê gelekî zêde dibe. Jingirtina ji perestgehê bi tenê para mêrên esilzade dikeve. Ji ber ku ev jin li perestgehê hatine perwerdekirin, qebîleyên nû yên diçin nava wan temsîl dikin û bi dewlet-civaka nû ve girê didin. Bi awayekî din, ev jin mîna ajanên gelekî baş ên civak-dewleta nû ya rahiban in. Di serî de Îsraîl hînê jî gelek dewlet vê rêbazê pirr bi tesîr bi kar tînin. Bi vî rengî kollektîfkirina jinê prototîpa hunerê ‘mala giştî’ ye. Jin çiqas piçûk dikeve, jina eşqê û xwedawenda esilzade ya perestgehan, dibe karkereke xirab a xwe dixe bazarê û neçar dibe dikeve ‘mala giştî’ ango kerxaneyê. Civaka Sumeran di vî warî de jî xwedî anor an jî bêanoriya yekemîn e.

Lê tiştekî din jî heye ku ez nebêjim nabe ez vê mijarê li pey xwe bihêlim. Eger ev rêbaz nehatibûya îstîsmarkirin û ber bi payeyeke birûmettir ve biçûya wê bibûya tiştekî îdeal. Çi nîzama jin-dayikê jêre pêşengî kir, çi jî nîzama mêr-bav jêre pêşengiyê dike, di wan de gihandin û mezinkirina keçan bi awayekî baş zehmet e. Ne zanîn, ne jî derfetên maddî ji bo vê rê didin. Gihandin û mezinkirina jinê hostatî û maddiyatê dixwaze. Ji bo jinan dibûya ku perestgehên jinan îdeal bûya. Lê civaka mêr têde serwer bi darê zorê û îstîsmarê van saziyan dixe. Mirov dikare di vê mijarê de ji mînaka Sumeran têra xwe hîn bibe. Di dema Sumeran de saziyek heye civak dilê xwe dibijînê û her kes hewl dide keçên xwe bide wir. Li gorî vê, bi vî halê xwe jî hînê mînakek e ku mirovatiyê xwe negihandiyê. Keçik di van perestgehan de (mirov dikare wan bişibîne enstîtuyên keçikan ên îro) ji bo gelekî pêş bikevin xwedî derfet û îmkan in. Armanca wan a bingehîn jî neqandina mêran nîne, armanca wan pêşengiya dewlet-civaka nû ye. Ji bo civakeke hînê bi esil û bi eşq a destê mirov jê nebe alîkar in, kêrhatî ne. Di civakeke îdeal de divê keçik di nîzama hêlînek, dibistaneke bilind û pîroz de werin perwerdekirin. Nexasim her malbat û malbatên fireh perwerdekirina wan a jinan gelekî paşverû ye û ji dayîna koletiya civaka giştî (civaka mêr) pêve ti armancên xwe nînin. 'Enstîtuyên Jinan ên Azad' dikarin bi rola perestgehên hemdem rabin. Ez ê di Sosyolojiya Azadiyê de hewl bidim li ser vê babetê rawest im. Her weha ez ê hewl bidim bi tevahî li ser dabaşa malbatê jî bisekinim û ji hev derxînim.

Diyar e ku Zîggûratan gihandin û perwerdekirina jinê li gorî ku bikeve xizmeta dewlet-civaka nû kirine. Em fêhm dikin ku rahib bi rastî hem bi awayekî balê bikişînin û avzûnkirî fikirîne, hem jî civak dewleta nû nêzî îdealê bi rêkûpêk kirine.

Weke çalakiyeke civakî 'bazirganî' nû pêş dikeve û rola Zîggûratan di vê yekê de eşkere ye. Herçend di metnan de tine be jî ez texmîn dikim ku Zîggûrat di heman demê bi rola ticaretxaneyê jî rabûne. Hilberandina amûrên pîşesaziyê û berhemê zêde jî karê bazirganiyê ye. Dîrok dema B.Z. 4000-3000 salan weke serdema

pêşketina bazirganiyê qebûl dike. Civaka Sumeran ji sîstema diyarî dayînê (kom û malbat di nava xwe de diyariya didin hev) derbasî sîstema serbiserkirin an jî bi hev guherandinê dibe û ev dem li belavbûna zêde ya serdema metabûnê (ji bo buhaya guhertinê hilberandin) rast tê. Ji lewra divê ku 'civaka serbazirgan' çêbibe. Ji mînakên di dîrokê de em fêhm dikin ku wisa bûye.

Di dema B.Z. 3500-3000î de wer xuya dike ku sîstema kolonîtiyeke Ûrûkê destpê dike. Di sîstema Toros-Zagrosan de koloniyên Ûrûkan bi awayekî xwezayî li ser navê dewletê belkî jî pêngava pêşî ya kolonîtiyê ne. Koloniyên xanedaniyê kevintir in. Her weha koloniyên cihê yên qebîleyan, koloniyên rastî nayên hesibandin. Ji bo koloniyê hewcedarî bi bajarekî 'metropol' heye. Divê Ûrûk weke 'metropoleke' gelekî navdar xwediyê koloniyan be. Hînê paşê koloniyên Ûr (B.Z. 3000-2000) û Asûrê (B.Z. 2000-1750) navdar in. Fikra min a şexsî ew e ku bajarên serdema kevin Harappa û Mohanjadaro yên li Pêncavê (B.Z 2500) û şaristaniya Misrê bi xwe jî (B.Z. 4000-0.000) di çarçove û maneyeke fireh de nîzameke koloniyê ne ku çavkaniya wan şaristaniya Sumerê ye. Herçiqas ser bi xwe bin, yekser têkiliya xwe bi bajarên Sumeran re nebin jî ji şaristaniya Dîcle-Firatê derketine. Di pergala rahiban de diyar e ku bazirganiyê roleke misoger lîstiye. Ji ber ku berhemên xwe yên zêde û kêm (li geliyê jêr ê Mezopotamyayê gelek madde û alav kêm in. Ji lewra bazirganî yan jî desteserkirin mecbûrî ye. Dibe ku herdu jî hatibin kirin.) divê pirraniya pêdiviyên xwe bi rêya bazirganiyê tedarik bikin. Nîzama kolonî ya tevna xwe li her deverê daniye jî ji bo vê yekê ye. Li keviyên Dîcle û Firatê gelek kolonî bi vê armancê hatine damezrandin. Mirov şopên van gelekan dibîne. Nemaze bazirganiya kereste, maden û berhemên tevnê zêde ye.

Çawa ku me bi xetên stûr hewl da li dora Zîggûratê nîşan bidin ku pêkhatina prototîpa civaka dewleta nû misoger dibe. Pêşketina civaka dewletê bi awayekî berçav çavkaniya xwe Sumer e. Ev mînaka pêşî ya ku bandora xwe li tevahiya sîstema me ya şaristaniyê kiriye, hema bibêjin misoger e ku vedîtina Sumeran

e. Jixwe mînakên din jî yên ji Misrê heta Çînê heman rê dişopînin. Dewlet-civaka şaristaniyê bi rastî jî di 'malzaroka perestgehên rahiban' de çêbûye. Em li mînakeke din a berçav rast nayên ku bi awayekî din meyiya be.

Em niha di çarçoveya şîroveya xwe ya li ser mînaka Zîggûratan de dikarin bibêjin; bi civaka Sumeran serdema qralên pêşî yên bi maske û li piştperdeyê destpê dike. Qralên pêşî yên bi maske rahibên Sumeran bûn, li pey wan jî qralên nixumandî (yên bi kincên polîtîk) paşê tên. Hem jî bi çi xummênî û meşa bi ezamet!

**f-** Em dibînin piştî dewlet-civaka rahiban dewleta xanedaniyê tê. Pêşketineke civakî ya mîna civaka bi dewlet manebarkirî ye, û ev yek rola rahib di vê de derdixe pêş. Berê pêşî ji bo plansazî û rewakirinê hewcedarî bi mirovên zîrek û kûpê aqil heye. Avakirina civakekê di rojevê de heye ku divê xwe îspat bike. Zehmet nîne ku mirov şîrove bike, ev yek bi hêza eskerî û polîtîk nabe. Ji bo bikaranîna zorê, hewcedarî bi civak û sîstema wê ya rêveberiyê heye ku divê li bazirganî û hilberîna zêde vekirîbe û xwe gihandibiyê. Di vê çarçoveyê de divê civaka nû xwe bi sazî kiribe. Eger hêza eskerî û polîtîk civakeke bi vî rengî bi sazî bûye zevt bike, maneya xwe heye. Naxwe ji çêkirina aloziyê wêdetir bi roleke din ranabe.

Bêguman dîroka xanedaniyan li Mezopotamyayê kevn e, û bi hêz e. Piştî ku etnîsîteyê xwe bi nasnameyên cuda îfade kir, her eşîr-qebîle di nava nîzama xwe de ji bo parastina eşîrê, ji bo bicihkirina wê li deverên bi bereket û ji bo pirsgirêkên xwe yên navxweyî çareser bikin li dora kesekî xwedî tecrûbe û ezmûn civiyan. Ev jî pêşketina xanedaniyê bû. Muhtemel e, malbatek an jî qebîleyek di nav de bel bibe. Yan ê rêveberiya eşîrê çêkin an jî wê bixin destê xwe. Riza endamên eşîrê bêguman diyarker e. Di nava wan de têkiliyên xizmtiyê xurt in. Ji xerîban re cih tine (Eger bi awayekî munasib bikevin nav û di navê de bihelin dibe). Bi taybetî di dema şikilgirtinê de weke nasnameya civakî piştî qelsbûna nasnameya klan nasnameya herî bi hêz e. Tê gotin, ev pêşketin di dîrokê de B.Z. di salên 5000 de çêbûye. Çav-

kaniya xwe civaka Sumeran nîne. Bi îhtîmaleke mezin pêşketina eşîretê bi komên pêşî yên çand-zimanê Aryen pêk hatiye. Pêşketineke bi heman rengî li cem Semîtîkan belkî jî hînê kevintir e, û tê gotin B.Z. di navbera salên 9000-6000î de çêbûye.

Em bi hêzbûna xanedaniyê li Mezopotamya Jêr heta salên 5000î B.Z. dibînin. Dema El Ubeyd (Navend Erîdû B.Z. 5000-4000) ya beriya dema Ûrûkê behsa wê tê kirin ji aliyê xanedanan ve bi hêz bû. Lê em nabînin ku gav diavêjin dewletbûnê. Zêdetir delîl û belge hene ku ber bi kolonîtiyê ve çûne. Di navbera salên 5000-4000 B.Z. de em dibînin malbatên mezin ên Semîtîk di nava tebeqeyên çandî yên Aryen de bi cih dibin. Kolonîtiya Semîtîk a pêşî li tejaneya Dîcle-Firat a Jor xuya dike.

Divê mirov xisleteke xanedaniyê baş fêhm bike. Ji ber ku ev xislet roja me ya îro jî ji nêz eleqedar dike. Ew jî ev e: divê malbat bibe xwediyê gelek kuran, ev hîmê bingehîn ê îdeolojiya xanedaniyê ye. Daxwaza sereke ya îdeolojiya xanedaniyê zewaca bi pirr jinan û çêkirina gelek kuran e. Sedema vê yekê ya divê mirov fêhm bike hêza polîtîk e. Rahib bi hêza ‘maneyê’ pêşengtî dikir, kesê bi hêz ê xanedaniyê jî bi hêza ‘polîtîk’ rola pêşengtiyê bi cih tîne. Di guhnedana têgîna hêza polîtîk de dibe ku zor derkeve holê. Di guhnedana hêza rahib de jî hêzeke manewî ya weke ‘xezeba xwedê’ bandoreke bi tehlûke ya hişyar dike, pêk bê. Serçavkaniya hêza polîtîk jî hêza eskerî ya di bin destê zilamê xurt de ye. Di dema berê ya nêçîrvaniyê de, nexasim di dema jindayik bi bandor de, hema bibêjin; mêr bêgav û cih lê teng bûye.

Ji bo mirov vê diyardeyê bi kurtî fêhm bike, divê mirov nîzama jin-dayikê û li rastiya malbatê serwext bibe: di dema jindayikê de mêr an diyar nîne, yan jî bintûte ye, gelekî li ber çav xuya nîne. Jin-dayik wexta zarokan tîne, wisa di wê rewşê de nîne ku bi mêrê jê hez dike eşqê bike. Eşq û civaka cinsiyetparêz hînê di rojevê de nîne. Jin bi ti ben û tayî ji bo pîrektiyê bi mêr girêdayî nîne. Mêr jî di wê rewşê de nîne ku li ser jinê serwer bibe û jêre bibêje ‘tu jina min î’. Nêçîrvanî karek e ku xwe pê mijûl dikin û ne berdar e, wexta nebe jî zêde qîmeta xwe nî-

ne. Di nava civakê de hîn ew rewş nîne ku bibêje; ev zarokên min in. Zarok ên jin-dayikê ne. Jin-dayik li gorî xwezaya xwe di wê rewşê de nîne ku li pey şehweta xwe biçe û ji bo zewqê têkiliya cinsî deyne. Bi qasî her ruhber û zindiyî seksualîteyeke wê heye. Têkiliyeke cinsî ji bo zêdebûnê heye. Jin-dayik zarokan mezin dikin, ji ber ku zarok ji wan in. Ji ber ku ew zarokan tîne û xwedî dike, vî mafî jî bi dest dixe. Ji lewra di demekê de ku ti maneya diyarbûn û nediyarbûna bavbûnê di nava civakê de nîne, behsa mafê bavtiyê jî kirin kelevajiye û heta tiştekî dûrî aqilan e. Lê xuşk û birayên jin-dayikê girîng in. Ji ber ku bi wan re mezin bûye. Xal û xaltîk hêza xwe ji vê huqûqa kevin a jin-dayikê digirin. Malbata jin-dayikê wê wextê ji xal, xaltîk (eger hebe zarokên wan) û ji zarokên wê bi xwe pêk tê. Gotina ‘malbata dayikanî’ jî vê mijarê îfade dike. Jin-dayika li serê quncika neolîtîkê rûniştî û çanda civakî ya xwedawendiyê ya ji wê çêbûyî mirov dikare bi vî awayî şîrove bike. Ji bilî xalan mêr bintûte, hebûn û tinebûna wan zêde li ber çavan xuya nake. Mêrtî û bavtî hînê çênebûye.

Xanedantî weke îdeolojî û pratîk di encama berepaşkirina vê nîzamê de pêş dikeve. Di vê nîzamê de ku weke nîzama ‘bavikanî’ jî tê bi navkirin tecrubeya ‘kalemêr’, ‘hêza eskerî ya di bin destê zilamê xurt de’ û bi hevgirtina şaman ê şiklekî rahibê berî pîroziyê, rêveberiya bavikanî şax û kokên xwe ber didin.

Ezmûnên kalemêr serhatiyên wî yên jiyanê îfade dikin. Mirov dikare civateke kalemêr û rûspiyan bifikire. Di lîteraturê de rêveberiya kalemêran a jêre dibêjin jerontokrasî di nava eşîrê de zû pêş dikeve. Kalemêr kesekî bi aqil e ku pê dişêwirin. Civat hewceyî wî ye. Ew jî van ezmûn û serhatiyên xwe bi kar tîne û hewl dide zehmetiyên ji ber kalbûnê dikişîne kêm bike. Di nava civatê de bi vî awayî mêzînek di navbera aliyan de çêdibe.

Zilamê xurt ew mêr e ku bi nêçîrvaniyê gihiştiye hêza xwe û dixwaze ji çembera jin-dayikê rizgar bibe. Hêza wî ya fizîkî û bi awayekî serketî bikaranîna wî ya teknîkê şensê wî zêde dike. Bi ciwanên ku dixwazin ji van xisletên wî sûdê bigirin bi wan re

yekîtiyekê datîne û bi vê yekê re serketî dibin. Belkî jî di dîrokê de eskerên xulam ên pêşî bi vî awayî çêbûn. Zilamê nêçîrvan di dîrokê de eşkere ji jinê zêdetir serdest bûye. Hevgirtina bi kalemerên qebîleyê re, bavpîrtiyê li hemberî dapîrtiyê xurtir dike.

Xeleka dawî ya bi wan re hevgirtinê dike, yên derman didin civakê û xwediyên mûcîzeyan Şaman in. Fonsiyonên hevpar ên rahib û sêhrbaz li cemê henin. Perwerdekar e; belkî jî di civakê de pisporê pêşî ye. Hinekî bi qeşmerî be jî pisporiya şaman di nava civatê de bi sazî dibe. Şaman zêdetir mêr e. Di avakirina xanedaniyê de bi hevgirtina bi van hêzan re nîzama dapîrtiyê derbeke mezin dixwe. Em di metnên Sumeran de şopên têkoşîneke mezin di navbera wan de dibînin. Mêr di bin vî nîzamî de hem xwediyê zarokan e, bav e; hem dixwaze bibe xwediyê gelek zarokan (ji bo hêzê bi taybet jî zarokên kur), hem jî xwe dispêre van û danehevên jin-dayikê hemûyan desteser dike. Pergala milkiyetê pêş dikeve. Li kêleka milkiyeta kollektîf a dewleta rahib, milkiyeta taybet a xanedaniyê jî çêdibe. Bavtiya ji zarokan re ji vî alî ve jî hewce dike. Ango ji bo mîrate ji zarokan re (bêtir jî mêr) bimîne mafê bavtiyê şert e.

Xanedantî îspat û nîşaneya nêzîkbûna civaka çîna bavîtî û bavpîrtiyê ye. Xanedan dema xwe li dewleta rahib radikişînin hêza xwe ya eskerî jî bi kar tînin û bi vî awayî 'şoreşeke polîtîk' dikin. Di metnên Sumeran de mirov gelek şer û serûbinbûnên polîtîk ên bi vî rengî dibîne. Jixwe piştî bajar-dewletên Ûrûkê sîstema 'dewletên Ûrê' ya hat avakirin karektera xwe xanedantî ye. Xanedantiya I., II. û III. ya Ûrê vê pêşketinê destnîşan dike. Rêveberiya xanedantiyê li gorî rêveberiyên teolojîk ên rahiban, sîstemeke hînê laîk polîtîk xuya dike. Xwedayên nû têne çêkirin. Rahib êdî ketine rewşekê ku bûne alîkarê lîderê siyasî. Dîsa jî rola wan mezin e. Lê piştre her biçe wê hêza wan kêm bibe û wê bibin hin kesên ji rêzê yên bi propagandayê nîzamê pîroz û rewa dikin. Yên dewlet ji wan çêbû ango xwedayên bi maske êdî li dereceya duyemîn û sêyemîn di xizmeta qralê li piştperdeyê de ne. Ji bo ku zirxê rewabûnê yê

çîna rahibên dewlet saz kirî bi kar bînin, êdî wê texsîr nekin xwe weke 'qral-xwada' bidin zanîn. Her roja biçe çîn û tebeqetî wê xurt bibe, hejmara bajaran zêde bibe û bi vî awayî civaka em jêre 'şaristaniya Sumeran' dibêjin wê mayîndebûna xwe piştrast bike û xwe bi sazî bike. Rêûresma xanedantiyê ya di civaka Rojhilata Naverast de gelekî kevn e, xwe heta roja me ya îro aniye. Li Rojhilata Naverast pêşneketina sîstemên weke cumhûriyet û demokrasiyê têkiliya xwe ji nêz ve bi dewletbûnên çavkaniya wan rahib û xanedan re heye.

Modela civaka şareza ya Sumeran herî kêm bi qasî modela neolîtîkê pêşketina şaristaniya li dinyayê diyar kiriye. Weke têgîn cihêwaziya 'Şaristaniyê' ji 'çandê' bi çînîtî û tebeqetiyê re eleqedar e. Şaristanî têkiliya xwe bi çanda çînî û dewleta wê re heye. Bajarîtî, bazirganî, îlahiyat û bisazîbûna zanistê, pêşketina eskerî û polîtîk, li şûna exlaq derketina pêş a huqûqê, cinsiyetparêziya civakî ya mêr nîşaneyên serdest ên civaka şareza ne. Mirov ji tevahiya van xisletan re bi maneke din dikare bibêje; çanda civaka şareza. Di vê rewşê de herdu têgîn jî dibin hemwate. Di heman maneyê de wê bêne bikaranîn. Mîna belavbûna li dinyayê ya çanda civaka neolîtîk a çavkaniya wê Hîlala Bi Bereket, pêvajoyeke mezin a duyemîn bi heman rengî li pey wê tê. Vê carê erdên Kevana Bi Bereket ên bi rola 'dergûşa şaristaniyê' rabûn, ewladê xwe yê za û mezin kir (êdî keçik nîne, kur e) wê bi keçikên gihiştî yên dinyayê re bizewicîne û xwe zêde bike. Ev şibandin li cih e. Em dikarin qebûl bikin ku keçên xwedawend-dayikê di belavkirina çanda neolîtîkê de her devera lê gihiştin bi sazî kirin. Civaka şareza ya çanda serwer a mêr îfade dike, li deverên belavbû tê maneya bi sazîbûna zarokê kur. Mêrê xasûk zaroka keç kire pîreka xwe û bi xwe ve girê da. Ji neslê wî (civaka bi giranî jin wê di nava civaka mêr têde serwer de bihele) wê her mêr zêde bibin û mêrtiya şaristaniya me wê heta îro zêde bibe, bi hêz bibe û dewam bike.

## 2- ŞÎROVEKIRINA RAST A CIVAKA ŞAREZA

Em hewldana xwe ya şîrovekirina civaka Sumeran hinekî din berfireh û giştî bikin, ev yek ê hêza me ya fêhmkirinê zêde bike û bêtir mejiyê me rohnî bike. Ya divê mirov bike ew e ku divê şaristaniyê analîz bike û ji hev derxîne; maskeyên sazî û zêhniyetên xurt hevdu girtine daxîne, bike ku rûyên li pişt wan, berjewendiyên wan ê rastî û rewşa wan berçav di nav civakê de zelal xuya bike. Bi îdîaya kaltî û pîrtiya şaristaniya qedîm a dîrokî-civakî radibe û xwe bi dabeşkirina dîrokê ya bi navên 'serdema nû, serdema nêz' dixwaze xwe ciwan û teze nîşan bide. Di vê de rewşeke seyr û xerîb heye. Ciwantî dema zayîn an jî dema nêz a zayîna diyardeyekê îfade dike. Eger weke ku me îspat kir, şaristaniya civaka Sumeran kêliya destpêk an jî zayînê temsîl dike, wê wextê divê ciwantî jî li gorî wê were diyarkirin. Di vê rewşê de wê baş were fêhmkirin ku sifetên weke nû û ciwan ji xapandinê wêdetir tiştekî din nînin û em ê fêhm bikin ku em civaka şaristaniyê ya herî pîr û kal in. Eger mirov demê berepaş bixwîne û ciwan pîr nîşan bide, ev yek ê bibe dewama piştperdekirin û bi maskekirina civaka şareza.

Pirsa divê em bikin ev e: civaka şareza ya em dikarin wê weke şaristaniya bajêr jî bi nav bikin çima evçend hewcedarê maskekirinê ye?

Hostatiya rahibên Sumeran di warê bi maskekirinê de bê rawestan dewam kir. Xwedayetiya di destpêkê de naveroka xwe manedar û bi esil bû, çima bû têgîna sereke ya bêmanebûn û têkbirinê?

Civaka şareza, heta niha gelek fikir li dijî wê û ji bo palpiştiya wê hatine ziman. Lê ya herî bi zehmetî hatiye îfadekirin û bi awayekî serketî nehatiye kirin, rexnekirina şaristaniyê bi awayekî radîkal û gavavêtina ji bo bihurandina wê ye. Ev yek jî serneketina şîroveyên hatine kirin nîşan dide. Hukmekî hevpar e ku tê gotin; li ser xwesteka mirovatiyê ya ji bo azadiyê zext û zordestiyeke mezin çêbûye. Gelek caran tê gotin; ji zû ve gihiştiye sînorekî wisa dewam nake. Hegel dîroka şaristaniyê dişibîne seremoniyeke 'selexaneyê'[52] û bi vî awayî wê mehkûm dike. Saleke wê ya bê şer derbas bibe tine. Jiyana bi zor û zext mîna qanûneke xwezayîbe tê nîşandan. Îstîsmar mîna rêzik û pîvaneke jiyanê tê qebûlkirin. Duristî, pakî û sadetî weke kêmaqilî tê dîtin.

Ez dixwazim bigihîjim vê: divê mirov şîroveyekê bike ku têde cih bide rexneyeke dixwaze ji civaka şareza bibihure. Bi rexnekirina modernîteya kapîtalîst bi tenê civaka şareza li dawiyê namîne û nayê bihurandin, ev yek di serî de Marksîst ji hewldanên gelek ekolan eşkere bûye. Di vê de sedema bingehîn ew e ku civaka şareza ya weke xelekekê pêve ye, nehatiye analîzkirin. Fikra dinyayê ya navend-Ewrûpa hema bêjin dijberên xwe yên herî hişk jî bêtesîr kirine. Çawa ku di têkiliya çanda neolîtîk û şaristaniya Ewrûpayê de, di têkiliya civak û dîroka şaristaniyên berê û şaristaniya Ewrûpayê de jî şîrovekirineke were fêhmkirin yek ji wan xusûsan e hewcedariya me pê heye. Mehkûmiyeta min a di bin zexteke dijwar a vê şaristaniyê de, bi amatorî be jî di vî warî de pêşdebirin û xurtkirina şîroveyê hem weke heqekî, hem jî weke wezîfeyekê datîne pêşiya min.

[52]Selexane: (Mazbaha-kesimevi) Cihê heywan lê têne serjêkirin û guran.

**a-** Şîrovekirina şaristaniyê berê pêşî pirsgirêkeke sosyolojiya pêkhatinê ye. Eger şertê bingehîn ê ku ji bo zanist bibe zanist ew e ku mirov di nav çirava pozîtîvîzmê de neperpite, ji cihêwazkirina obje-sûbje bibuhure û bigihîje 'zanista manedanê', hingî herî zêde hewcedariya sosyolojiya pêkhatinê bi vê qadê heye. Wezîfeya bingehîn a sosyolojiya giştî (çawa ku ya bijîşk jî teşxîs û dermankirin e) destnîşankirin û dermankirin e. Sedemeke bi tenê ya zanînê dikare hebe: jiyana em pirr pêve girêdayîne manedar bike. Manedarkirina jiyanê jî wê derfet û îmkanê bide me ku em karibin pirsgirêkên pêkhatinê fêhm bikin û eger hebin aliyên nedurist ên pêkhatinê, em ê karibin ji nû ve ava bikin.

Ji bo zanista manedanê, civaka şaristaniyê lod û gidîşeke pêkhatinê ye ku herî zêde têde zehmetiyê dikişîne. Hebûna vê lod û gidîşa pêkhatinan, yekser û ji nêz ve têkildarî jirêderxistina zanista manedanê û bêmanekirina wê ye. Levîathanek e, mexlûqekî sosret e; çi sîlehên wî hene di dest de, bi ser qurbanê xwe de diçe. Qurbanê wî jî li ber ruh dide. Weke gotina dawî wê yan qurbana wî bi "DEREWÊ" mikur bê, yan jî bi her şêwaz rêbazê "TINE" dike. Mirov vê şaristaniyê, weke helwesteke li cih dikare bişibîne her cure cinawirî. Lê ev jî helwesteke paşvemayî ye. Tew pênaseya me ya zanyariyê hebe, ev ê tenê xeyalên me (xeyalên cinawiran) yên zarokatiyê be, û jê wêdetir ne tiştekî din. Bi hostayî teşxîskirina cinawir têr nake. Ya divê bi lez û bez were kirin, dermankirin e. Eşkere li naverastê ye, bi tevahî hewldan û ceribandinên ji bo dermankirinê negihiştinê encamê û pûç bûne. Ez bi hevokekê dikarim rewşa herî dawî rapor bikim; di qonaxa wê ya dawî de lehiya xwînê rabûye, jiyan bi gelek êş, jan û qirkirinê derbas dibin, ya herî xerab birçîbûn û bêkarî, her cure nexweşî û şewb, û talankirin û hilweşandina eko-hawîrdorê (hawîrdora ji bo jiyanê hewcedariya me pê heye). Eger sosyolojiya me ya pêkhatin û azadiyê dixwaze ji loda sergo ya bi hezaran kesên bi navê civaknasiyê kirine, rizgar bibe; divê hêza xwe ya teşxîs û dermankirinê îspat bike. Naxwe weke Adorno gotî, 'Piştî kampên

qirkirinê, bi tevahî xwedayên li ezmanan –zanyarên berdevkiyê dikin- wê gotineke wan a karibin bibêjin tine be.'

Şaristanî ne tenê seremoniyeke 'selexaneyan' e, hînê tiştekî zêdetir e; şaristanî qirkirineke dewamî ya azadiyê ye ku ev azadî yekane sedema jiyana mirov e. Jixwe li dawiyê gincirê jiyanê dimîne. Bi teşxîseke hêsantir mirov dikare bibêje ku piştî jiyana azad ji maneya wê hat kirin a jê dimîne şaristanî ye.

Em wexta li jiyana ruhberê herî besît dinêrin, ya em dibînin maneya ew dide jiyanê ye. Maneyeke wisa ye ku dihêle bigihîje mîlyonan cureyî, di nava zinaran de şax ber dide, hewce bike li qutba sar jiyana xwe dewam dike, hewce bike difire, ango hêza teknîkeke bê sînor dide ku gelek vedîtinên mirovan li ber wan nikarin behsa hebûna xwe bikin. Civaka şareza jî ji destpêkê ve bi dekûdolaban, bi derewan, bi zora rêxistinkirî hebûna jiyana herî bi mane bê mane kir û di qonaxa xwe ya dawiyê de bir ber xwekuştinê, gelo ji vê hêza wê pêve ti mane yan jî bêmanetiya wê heye?

Di qonaxa şaristaniya navend-Ewrûpa de sosyolojî bûye sozek ji bo vê hêza wê ji nû ve pê bide naskirin. Çawa ku di Xiristiyantiyê de tê gotin, ev 'gotina' dawî ya xwedê ye. Weke pêdiviya bi rêzgirtinê ya ji bo maneya jiyana ruhberekî herî besît, divê ev gotin bêne terikandin. Hebûna herî pêşketî ya exlaq, nikare evçend neheqiyê bi tiştekî rave bike. Em careke din bi bîr bixin: GOTINEKE BI TENÊ YA ÎLAH BIBÊJIN NEMA YE.

Ya weke dîrok bi me dane qebûlkirin, ma ne çîrokên damezrandin û hilweşîna saziyên dewletê û saziyên neyekser bi ser wan ve ne? Ma ne armanca bi tenê mezinbûn û serberjêrçûna xanedanan, bi dekûdolaban û bi darê zorê bi destxistina taca desthilatdariyê ya xanedaniyê ya weke 'şivantiya keriyan' tê zanîn ne? Ma ne armanca bi tenê ya vê yekê jî îstîsmarkirina hirî, şîr û heta hewce bike goşt û çerm e? Kîjan çîroka qehremaniyê ji zordariyê azade ye? Kîjan ji îstîsmarê dûr e? Yên ji bo eşîr, qewm û dînê xwe rabûne, kîjanî îspat kiriye ku ji bilî taca desthilatdariyê xwedî nirx û buhayekî ye?

Civaka şareza ya qadeke wê ya mirov lê bimîne û saleke wê ya bê şer nema ye, ma bi rastî ji bilî navê saziya 'selexanê' navekî din ê manedar heq dike?

Yên weke pêşketinên zanistî, huner û teknîkî çîrokên wan tê-ne gotin, kîjan bêyî serê mûcîdên xwe yên rastî nexwaribin an jî nehatibin desteserkirin pêkhatine?

Rastiya bi çîrokî weke nîzam, aramî û aştiyê tê vegotin ma ne bêdengiya berxikan e, yan jî ma ne seansên şanoyê yê behsa stûxwarkirina li evdan (kole, benî, serf, karker, kedkar, bi tevahî bindest) dike ne, ma ji vê zêdetir maneyeke hûrûkûr heye? Pirsên der barê şaristaniyê de bê sînor zêde dibin û xwedî maneyeke hûrûkûr in. Ya hînê seyr û sosret ew e ka çawa diwêrin bi zirzopî van çîrokan weke dîrokeke serfiraziyê, dînê pîroz, destanên delalî û eşqê, vedîtinên harîqa, xeyala cennetê ya ku mirov ê rojekê bigihîjinê, dostanî, camêrî û hevgirtinê weke meşeke mirovatiyê ya qederwarî û mutleq pêşkêş dikin.

Bêguman armanca kirina van pirsên min ew e ku têkoşerên maneya jiyanê ya bi tenê azadî ye, yên ku cewherê wan qehremanî, pîrozî û eşqa destanwarî ya rastî ye, ez gelekî eleqedarî vî cewherê wan û gotinên wan ên dawî û negotî me; û her weha ez rêzê ji bîranîna wan re digirim û dilsozê wê me. Dareke gulê ji bo parastina gulên xwe yên delal xwe bi stirî û dirîk dike, eger weke dara gulê hewcedarî bi vê yekê hebe, ji bo hêza maneyê belkî ji bo parastina jiyana mirovê azad a bi qasî bêserûbiniyê delal e, divê mirov zanibe şer bike.

**b-** Em niha ji hukmên xwe yên exlaqî derbasî hukmên xwe yên teorîk bibin. Di dema modernîteyê (kapîtalîst) de gelekî behsa têgîna 'çînayetî' ya dijberan dikirin, nexasim rola wê ya di nav herikîna dîrokê de û bi giş aliyên wê fêhmkirin gelekî girîng e. Naxwe wê bibe 'benîştekî demagojîk' ê zêde tahmsarkî û amûrekî piştperdekirina zanista manedanê û ne tiştekî din. Ji bo çînayetî bi rastî were fêhmkirin xusûsa pêşî ya divê were zanîn ew e ku lebatên weke ling û dest organîzeya wê ya hêzê pêk tînin. Ev lebat bi serê xwe ti qîmeta wan a maneyê nî-

ne. Belkî şibandina me zêde sosyobiyolojîk e, lê di cih de ye. Herhal ne ya guftûgokirinê ye ku em bibêjin; desthilatdariya di civakê de, Levîathanê di civaka şareza de hêza herî organîzekirî ye. Eger em dewletê bi rengê ku di civaka çînayetî de bi giştî îstîsmar û zordariyê pêk tîne şîrove bikin û em bibêjin dewlet ji yekparebûna têkiliyên herî pêşketî yên desthilatdariyê pêk tê, ma ne hingî yên di bin zordestiyê de û yên têne îstîsmarkirin jî parçeyên vê tevnê yên jê nabin pêk tînin? Ne tenê dewlet, ma Şaristanî ji dîn heta ekonomiyê pêkhatineke yekpare û hêza rêxistinkirî nîne? Ma ya esas jî kole, serf û karkerê hatiye organîzekirin û bi qasî neyê jimartin tebeqeyên civakî yên ji jor heta jêr pêkanîn, karê bingehîn ê vê hêzê nîne?

Ez divê bi girîngî bibêjim: di rêxistinkirina hêzê de hîç derfet û îmkan nayê dayîn dest û ling bibin sûbje an jî kirdar. Eger desthilatdarî organîzeyeke serketî îfade dike, ji sedî sed li ser kedkarên girdomirdo dibîne serdest bûye. Herçend ev berê hebe jî di şert û mercên desthilatdariyê de qîmeta wê ya sûbjebûn û kirdariyê wenda dikin. Ji ber vê yekê, ji Spartakus heta Komunarên Parîsê şensê serketinê yê serhildanên kedkarên kole tineye. Bi şertekî heye: eger ji bo desthilatdariyê qîmeta wan a bibin xwîna teze hebe! Ev yek jî tê wê maneyê; ji bilî ku bibin movikeke bi ser civaka şareza pêve ti çareya wan nîne. Ezmûneya sedûpêncî salî ya sosyalîzma zanistî mînakeke balkêş a xulaseya vê rastiyê ye.

Baş e, gelo di navbera kirina nava çarçoveya têkiliyên desthilatdariyê û van encaman de pêwendiyek nîne? Xusûsa divê were fêhmkirin ew e ku asta girêdana çînayetiyê û çawatiya wê bi desthilatdariya fermî re çi ye; çînayetî bi serê xwe weke çalakiyekê mane yan jî qîmeta xwe heye yan na. Tebeqeya jor a çînayetiyê çi efendî, senyor, patron û bûrjûva be, çi jî tebeqeya jêr kole, serf û karker be, di têkiliya bi desthilatdariyê re heman nêzîkatiya îdeolojîk-polîtîk tê fêhmkirin. Îtîraza di nava xwe de dikin zêde qîmeta wê nîne. Ev têkilî û tevneke welê ye, bi hezar ben û girêkan bi hev ve ye. Tu li ber yekê rabî, yan jî

biqetînî, 999'ê wan yekser û tavilê li ser kar in. Cihê qetandî girê didin an jî bi hev ve dikin, yê qetandî jî heta baş girê nedin bernadin. Hewce bike serê wî jî jê dikin.

Em di pêşnûmeya pêşî ya dewlet-desthilatdariyê de ya ji serekên xanedan û rahibên Sumeran ve avakirin, di têkiliyan de li rewşa xebatkar û kedkarên qebîleyê bifikirin. Xebatkarê rahiban dest pê kiriye wî dikin evd, bi dijwarî di bin bandora rewakirina xwedayên li du qatan di ser wî re nû çêkirî de ye. Jixwe ti hêza maddî bi qasî têgînên pîroz nikare bandorê li ser ferd bikin. Jixwe xebatkar di bin bandora vê rewakirinê de nebe wî nagirin wê derê. Ya duyemîn, li gorî berê wî baş xwedî dikin. Ji xwedîkirinê wêdetir, alternatîfeke din ji bo wî xuya nake. Ya sêyemîn, li gorî berê ji aliyê xwestekên cinsî ve jî bi rastiya horiyên delaliya wan li her deverê belav dibe xeyalên wî têne xemilandin. Ji artêş û medyayên îro qat bi qat zêdetir ji bo stûtewandin û guhdana sîstemê jin têne pêşkêşkirin!

Di çarçoveya çînî de ev evdekî nû yê serhildarê ji bo azadiyê nîne, bibe bibe xayinekî azadiyê ye, yan jî bûyereke ji têgihiştina jiyana azad bêpar e, belkî tiştekî din e. Xanedan jî wextê dikeve nava têkiliyên dewlet-desthilatdariyê dikeve nav heman pratîkan. Şertê pêşî, di nava hêzên hevgirtinê yên sereke de rêxistiniyeke xurt a xwe dispêre berjewendiyên darîçavtir û zexmtir e. Di nava mal û malbatê de, di nava qebîle û eşîrê de ji xanedan re rêz tê girtin û rewşeke wî ya rewa heye ku rê li ber tirsê vedike. Rêûresmên qebîleyê hiyarerşiyê timî mezin dikin. Nerehetiyên piçûk jî yan bi aştiyê yan jî bi şer bi dawî dibin. Di nava guloka van têkiliyan de xanedanekî ber bi dewletbûnê ve diçe, eger mirov weke aliyê wî yê herî qels karektera wî ya çînî nîşan bide, ev ê nebe nêzîkbûneke stratejîk. Ez dixwazim bigihîjim vê: çînayetî yek ji karekterên bingehîn ê şaristaniyê ye. Lê wexta mirov şoreşên çînî ji aliyê maneya stratejîk ve bigire dest, ji aliyê teorîk ve bê îmkan nebe jî di pratîkê de ji encamgirtinê dûr in. Bi tevahî desthilatdarî û şaristaniyên ji text daxistine xwarê tevî evd û kedkarên xwe daketine. Desthilatdariyên

ji alî kedkar û evdên wan ve ji text hatine xistin yan gelek kêm in, yan jî hebin, desthilatdariya nû dike ku sed carî xweziya mirovan bi ya berê were, weke makîneyeke îstîsmar û zilmê dixebite û jê wêdetir nabe xwedî maneyekê.

Eger mirov dîrokê weke ku bi tenê ji şerên çînî pêkhatiye bibîne, ev ê bibe fikreke zêde reduksiyonîst. Zordestî û îstîsmar şêwaz û sîstema şaristaniyê ye, ango dîroka şaristaniyê xwe bi vî awayî dewam kiriye. Lê îdeolojî, polîtîka û heta ekonomiya vê cuda dixebitin. Ya rastî li dijî çîna teng çîn, şêwazê dîrokê yê herikînê nîne. Em li vir xeternakiya koletiyê, çawa sîstem piçûk dixîne û înkarkirina azadiyê guftûgo nakin. Ya ku em dixwazin şîrove bikin ev e; avabûn û hilweşîna desthilatî û sîstemên şaristaniyê bi mane û stratejiyên din diqewimin, mentiqê çîn li dijî çînê yan bi zanebûn weke şêweyekî nû yê desthilatdariyê tevlî sîstem, şaristaniya desthilatiya heyî dibe yan jî berevajiyê vê, tevî ku li ber radibe jî ji sîstemê re neçar dibe xwîneke nû û teze mîna ezmûnên Sovyet û Çînê. Ev vê guftûgo dikin. Belkî jî ev guftûgoyên me yên der barê desthilatiyê de zêde reduksiyonîst bêne dîtin û ji niha ve em bêne rexnekirin ku em rêya rizgariyê ji desthilatiyê û rêya çareseriyê nîşan nadin. Ez jî dixwazim bersiv bidim û bibêjim, ez ê di beşê Sosyolojiya Azadiyê de bi berfirehî li ser vê mijarê rawestim. Lê ji niha ve jî ez bibêjim; azadî jî herî kêm bi qasî îdeolojî, polîtîka û rêxistiniya desthilatiyê xwediyê qadeke cuda ya civakî, mentiq û stratejiyê ye.

**c-** Di roja me ya îro de pirsek di pratîkê de heye û tê gotin; şerê di navbera şaristaniyan de yan jî hevgirtina wan, ev pirs herçend di pratîkê de tê kirin jî maneya wê ya dîrokê hîn berfirehtir e.

Civaka şaristaniyê pêkhatineke welê ye; çi di nava xwe de, çi jî di nava şaristaniyên cuda de timî şer çêdike. Mane û armanca çêbûna vê pêkhatinê, çîna xwe spartiyê, ji bo vê zordestî, îstîsmar, timî xapandin û piştperdekirina wê ya rastiyê, karektera wê ya timî şer çêdike baş rave dike. Desthilatî û çînayetî bi xwe şer in. Li derve û hundir çêbûna vê yekê cewherê

wê naguherîne. Bi wesifkirinê naveroka şaristaniyan naguhere û nabe ku mirov weke xwedî cewherekî din e nîşan bide. Şerxwaz-aştîxwazbûna wê, yek xwedayî-pirr xwedayî, bi bereket-bê bereket, cahil-şareza, ji yek qewmî-ji qewmên cihêbûna wê, xislet û taybetmendiyên wê naguhere. Hêza wê ya rê dide ber, xwe ji bo fetihkirina tevahiya dinyayê wezîfedar dihesibîne. Xwesteka wê ya dixwaze bibe hêza cîhanê nexweşiyeke bunyewî ye; çavkaniya xwe desthilatdarî ye. Kengî berfirehbûna wê rawestiya êdî paşveçûyîna wê destpê dike. Encama vê xwe vekişandineke normal nîne, encam hilweşîne. Ji ber ku di tevahiya sîstemên desthilatdariyê de ya normal tineye. Weke nexweşiya kansêrê ne, xwe wisa hewce dibînin ku divê yan tine bikin an jî bêne tinekirin. Pirr kes hene ji serek-eşîrtiyeke sûkî li hespê şarezatiyê suwar bûne û xwe kirine xwedê.

Di binê îddîaya xwedayetiyê de hêza tinekirina mirovatiyê heye. Yê yeqîn dike ku wê karibe bi şerên mezin tine bike, wê bawer bike ku dikare mezin jî biafirîne. Ji aliyê derûnî û psîkolojîk ve eger 'ezezî' neyê kontrolkirin wê bi nexweşiya xwe zêde mezinkirinê ya bê sînor bikeve. Sîstema şaristaniyê, civaka ku ev nexweşî karibe lê cih bibîne, pêşkêş dike. Tê gotin, ti kesayet û nirxên civakî nînin ku desthilatdarî dejenere neke. Ev nirxandineke bi cewherê desthilatdariyê ve eleqedar e. Ji ber ku şaristanî civakên desthilatdaran e, sîstemên herî zêde bi jiyanê re nakok in. Ji bira bigire heta hevjînê, dost û hogir ti kesê ku ji bo desthilatdariyê neyê fedakirin tineye. Wexta hêzên rêveberiyê yên şaristaniyê bêne lêkolîn, wê were dîtin ku ti qetl û qutûl, bêbextî û dekûdolabên nekiribin nînin. Ji sîstemkirina derewan re polîtîka dibêjin.

**d-** Di civakên şaristaniyê de xisleteke xwe bi sazî kiriye heye ku divê mirov balê bikişîne ser. Em ji vê rastiyê re dikarin bibêjin rewşa civakê ya li gorî desthilatdariyê. Mîna ku jin çawa li ser rêûresma pîrekbûnê ji nû ve were afirandin, desthilatî jî bi heman şêweyî heta civakê ji pîrekbûnê re amade neke, ji hebûna xwe piştrast nîne. Kengî bi tevahî çanda jin-dayikê ji

aliyê zilamê bi hêz û yên di xizmeta wî de bi têkoşînên berfireh û demdirêj hat têkbirin û civaka cinsiyetparêz serwer bû, pîrektî weke koletiya herî kevin bi sazî bû. Ev çalakiya serweriyê belkî jî şaristanî hînê bi temamî pêşneketibû di nava civakê de cihê xwe dît. Ev têkoşîneke ewçend dijwar û zêde ye, tevî encamên xwe ji bîra mirovan çûye. Nayê bîra jinê ku çi, kengî û li ku çawa wenda kiriye. Stûxwariya jinê weke rewşeke normal û xwezayî ya jinê dihesibîne. Ji ber vê yekê ti koletî bi qasî koletiya jinê ji dil nehatiye qebûlkirin û rewakirin.

Du encamên vê pêkhatinê yên malwêran û xiraker li ser civakê çêbûne: ya yekemîn, civak li koletiyê vekiriye; bi tevahî koletî li ser hîmê pîrekkirinê hatin meşandin. Pîrektî ne tenê weke tê zanîn objeyeke cinsiyetparêz e. Taybetmendiyeke biyolojîk bi bîra mirov naxîne. Pîrektî di cewherê xwe de xisleteke civakî ye. Koletî, stûxwarkirin, daqurtandina heqaretê, girî, hînbûna derewan, bêîddîabûn, xwepêşkêşkirin û her wekî din, bi tevahî tevger û helwestên bi vî awayî yên exlaqê azadiyê red dikin ji pîşeyê pîrektiyê têne hesibandin. Ji vî alî ve zemînek e, civak lê piçûk tê xistin e. Zemînê bingehîn ê koletiyê ye. Bê exlaqî, bi tevahî koletî û yên herî kevin, li ser vî zemînê bi sazî bûye kar dikin. Ha civaka şaristaniyê bi nîşandana vî zemînî ya tevahiya kategoriyên civakê têkildar e. Ji bo sîstem bimeşe hewce dibînin ku civakê bi tevahî bikin pîrek. Desthilatî bi mêrtiyê re hemta û hemcewher e. Naxwe wê wextê pîrekkirina civakê ferz e. Ji ber ku desthilatî prensîba azadî û wekheviyê nas nake. Berevajî nikare hebe. Wekheviya desthilatî û civaka cinsiyetparêz cewherî ye.

Yewnanî xwediyê yek ji qonaxên mezin ên şaristaniyê têne hesibandin. Li cem Yewnaniyan bi awayekî fermî ciwanên kur weke ‘kurên qûnde’ ji mêrekî bi tecrûbe re dihatin pêşkêşkirin. Min demeke dirêj sedema vê yekê ji hev dernexistibû. Fîlozofekî mîna Sokrates jî di vî warî de weha dibêje: ‘Ya girîng ew e ku kurik timî were bikaranîn û ji aliyê efendiyê xwe ve were terbiyekirin.’ Di vir de mentiq û armanc timî bikaranîna kurikan nîne,

zêdetir dixwazin wan bi xisletên pîrektiyê amade bikin. Em hînê bi awayekî zelal û were fêhmkirin bibêjin; şaristaniya Yewnan civakeke bûye pîrek dixwaze. Heta ku ciwanên bi şeref û bi esil hebin ev civak ê çênebe; ji bo ev civak çêbibe divê tevgerên mîna jinan ji dil dawerivînin hinavên xwe û qebûl bikin. Di tevahî civakên şaristaniyan de meylên bi heman rengî hene. Kuriktî (qûnde) di vê civakê de gelekî zêde û belav e. Ketiye rewşeke welê ku her efendî kurikekî xwe heye û ev yek weke rêûresmekê rûniştiye. Girtina kuran a ber destê mêrên xwedî ezmûn ji rêderketineke cinsî û nexweşiyekê wêdetir, girîng e ku mirov wê weke diyardeyeke civakî ya civaka desthilatdar û civaka çînî bi nav bike. Di civaka şareza de desthilatî û seksualîte nexweşiyên civakî ne. Hem jî nexweşiyên mîna kansêrê. Bêyî hevdu nikarin hebin û hevdu zêde dikin: mîna şaneyên kansêrî yên zêde dibin. Jixwe em ê têkiliya di navbera kansêra ferdî û kansêra civakî de di modernîteya kapîtalîst de bi berfirehî şîrove bikin.

Ez ji wir dixwazim bêm vir: di civakên şareza de zemînê desthilatiyê bi hezarên salan hûrûkûr û bi mîsala pîrekkirinê hatiye amadekirin. Hukmê rêûresma şaristaniyê ew e ku jin ‘zeviyê mêr’ e. Rêûresmên bi heman rengî di nava civakê de jî xwedî hukm in. Mêr divê weke jinê xwe pêşkêşî desthilatdariyê bike. Yê serî rake, isyan bike, li ber xwepêşkêşkirinê rabe, wê hewl bidin bi şer wî amade bikin, wî bînin wê astê.

Eger mirov pêvajoya desthilatdariyê weke çalakiyeke ji nişkê ve ya kesekî, zumreyekê, çîn yan jî neteweyekî bibîne ev yek ê me bixapîne. Belkî hukûmet ji nişkê ve bêne damezrandin, lê desthilatdarî û sîstemên siyasî di civakên şareza de berî her tiştî ji aliyê bi sedan împaratoriyên hov, klîk û her cure hêzên serwer weke çandeke serwertiyê, rêûresm yan jî zevî hatine amadekirin. Çawa ku pîrek mîna çarenûsa wê be li benda mêrê xwe dimîne û vê bendemayînê qebûl dike, civak jî wisa hewceyî desthilatdariyê hatine kirin an weke zeviyekî li benda xwediyê xwe ye, ji bo bê û bajo yan jî ew wisa hîn kirine. Desthilatdarî di civakê de weke çandeke serweriyê heye.

Di vê çarçoveyê de gotina Bakunin[53] gotî gelekî manedar e ku weha dibêje; 'Demokratê herî ji xwe razî jî bîstûçar saetan bibe desthilatdar wê xira bibe.' Min demeke dirêj nikarîbû rave bikira, lê min hewl dida rave bikim ka ev xirabûn çima dibe. Di dawiya dawiyê de ya ez gihiştimê ew e ku zemînê desthilatdariyê vê xirabûnê çêdike. Kursiya desthilatdariyê ya bi hezarên salan e bi şer û mêtingeriyên bêsînor, bi îstîsmar û derya xwînê çêbûye bêguman wê yê li ser rûnê di nava bîstûçar saetan de xira bike. Tenê bi şertekî xira nake: eger ê li ser rûnê mîna îbadet bike xwe biparêze! Desthilatdariya di nava mêtingerî, şer, fen û fûtên bêsînor de hatiye avakirin weke rêûresm, çand û sîstem gelekî bi hêz e, û hema bêjin ji sedî sed mirovan xira dike. Ji bo vê yekê mînaka herî balkêş serhatiya 'sosyalîzma pêkhatî' ye.

Ji dilsoziya bi armancan û niyeta baş a damezrînerên sîstemê guman nayê kirin. Baş e, wê wextê damezrînerên sosyalîzma pêkhatî ku gelekî li dijî kapîtalîzmê şer kirin, çawa bû ku bi dilê xwe teslîmî wê bûn? Li gorî min şêweyê wan ê hatina desthilatdariyê û bikaranîna wê, sedema bingehîn a vê trajediya dîrokî ye. Damezrînerên sosyalîzmê li ser çanda civaka şareza bûn desthilatdar. Ango tevî ku îdîa dikirin gelekî li dijî mîrateya mêtinger û bi xwîn a civaka hînî rêûresma desthilatdariya dewletê bûye radiwestin, bihêlin ku xwe ji vê çandê dûr bigirin û li ser xirbeyên wê xwe ava nekin, berevajî xwe bi çar lepan pê girtin. Nexwestin fêhm bikin ku desthilatdarî fahîşeyeke welê ye, ti xwediyê wê yê nikaribe ji rê derxîne tineye. Di vê mijarê de hin rexneyên hatin kirin jî weke oportu-

[53]Bakunin: (Mihail Aleksandrowiç) Anarşîstekî navdar ê Rûs e. Yek ji anarşîstên pêşî ye. Di 30'ê Gulana 1814'an de li Bakur-Rojavayê Moskovê li gundê Pîrûmûkhîno ji dayik dibe. Piştî ku zanîngeha Petersbûrgê diqedîne diçe eskeriyê. Ji Artêşê vediqete û derbasî Elmanyayê dibe. Tevlî Hegeliyên çepgir dibe. Di damezrandina Enternasyonalê de bi Marks re tevdigere. Lê di kongreya Lahey a 1872'an a Enternasyonalê de ji ber ku li ber Marks rabû hat tesfiyekirin. Weke prensîb li dijî dewlet, desthilatî û otorîteyê ye. Alîgirê Yekîtiyên Azad û Federasyonên Karkeran e.

nîzmê hatin nirxandin. Ji ber ku Sovyet bi lez ber bi desthilatdariya dewletê ve diçûn Kropotkîn[54] Lenîn rexne kiribû. Wallerstein, dibêje; Sovyet bi bandora hevpar a sîstema kapîtalîst a dinyayê ve ji hev de ket û hêza wê tinebû ku vê bandorê bişkîne. Bêguman bi vê tespîtê nêzî rastiyê ye. Lê ji destnîşankirina cewherê meseleyê gelekî dûr e. Dîsa Michel Foucault jî wexta dibêje; ji ber ku sîstemê teknîka desthilatî û zanînê bi kar anî bi ser sîstemê ve bû, bêguman nêzî rastiyê ye.

Şîroveyên bi heman rengî ji Komuna Parîsê heta bi bêhejmar tevgerên rizgariya neteweyî, ji hewldanên sosyal demokrat heta bi komînîst mirov dikare ji bo hemûyan qebûl bike. Her zevî û erd li gorî xwe nebatan digihîne. Li nav zeviyê hezar salan ê zanîn û desthilatiyê bi giştî nebatên azadiyê û bi taybetî jî nebatên sosyalîzmê nagihîjin. Ji bo vê jî divê teorîsyen û çalakgerên sosyalîzm û azadiyê berî her tiştî zeviyên xwe amade bikin, li nav zeviyê desthilatiyê divê timî nexweşiyên vedigirin û şewbê teşxîs û derman bikin, ya hînê girîngtir jî divê xwe ji her cure sazîbûn û kesayetên weke şitlên desthilatiyê hêşîn dibin dûr bigirin, şitlên xwe, yên bi her şêwe dewlemendiya demokrasiyê, deynin û bigihînin. Naxwe mîna di tevahiya dîrokên şaristaniyan de hatiye dîtin wê bibêjin; min 'azadî çand' lê paşê wê bibînin ku ya çandine ti cudahiya wê ji ya sîstemên desthilatiyê yên berê nîne û wê nikaribin xwe ji hezarî caran dubarekirina van mînakan rizgar bikin. Li vir min xwest têkiliya mijarê bi sosyolojiya pêkhatinê re destnîşan bikim, naxwe ez ê bi awayekî berfireh di Sosyolojiya Azadiyê de mijarê şîrove bikim. Li vir weke gavavêtineke nava mijarê min hewce dît hinekî behsa meseleyê bikim.

**e-** Gelekî girîng e ku mirov di civakên şaristaniyan de bandora rola saziyên weke zanist, felsefe, huner û exlaqê nîşan bide.

Îdîa ew e ku di navbera şaristaniyê û pêşketina dîn, zanist,

---

[54]Kropotkin: (Peter Alekseyeviç Kropotkin) Di 9'ê Kanûna 1842'an de li Moskovê ji dayik bû. Bi Komuna Parîsê ya di sala 1871'ê de eleqeya wî ji bo tevgera karkeran zêde bû. Di sala 1872'an de derbasî Swîsreyê bû û li vir anarşîst nas kirin û bi fikrê wan rabû. Hewl daye teoriya komînîst-anarşîst xurt bike. Di 8'ê Sibata 1921'ê de jiyana xwe ji dest da.

felsefe, huner û exlaq de têkiliyeke nêz heye. Hukmekî li şîroveyê vekirî jî di vê qadê de ye. Ez yeqîn dikim ku qadên behsa wan têne kirin, me bi awayekî berçav nîşan dabû ku di dema dewleta rahib a Sumer de bi çi armancê û çawa bi awayekî muhteşem hatine avakirin. Dîsa me nîşan dabû ku qadên behsa wan tê kirin cara pêşî li tejaneya Dîcle-Firatê bi çanda neolîtîk rûşên bûne û ruh bi wan ketiye.

Di hîmê têgîna qutsiyetê de qût û zad ê mirov xwe pê xwedî dike heye. Ji ber ku mirov pê debara xwe dike qût û zad gelekî bi nirx û buha ne. Mirov wexta gihiştine gelek qût û zadî, ev yek weke qenciyeke xwedayê ku wî û nasmaya xwe ya civakî wekhev girtine, dîtine û ji lewra jî malavahiya wî kirine. Di roja me ya îro de jî hewl tê dayîn ku jiyana em bi temamî tênagihin, bi sêhrbazî û avzûnkirî manedar bikin. Dema ev tê kirin têgîna herî zêde serî lê tê dayîn weke şêwazekî rêzik û pîvaneke afirîner `xwedayetî‘ ye. Divê mirov xwedayetiyê û Ellah tevlîhev neke. Ellah di rewşa çanda Semîtîk de hatiye avakirin, xwediyê maneyeke taybet û cihê ye. Di tevahiya civakên mirov de prensîba ‘pêkanînê’ bi xwedayetiyê tê îfadekirin, ji lewra têgîneke welê ye ku li şîroveyê gelekî vekiriye û vê xisleta xwe hînê jî diparêze. Ji hebûneke mîna mirov ê qabîliyeta wî ya têgihiştinê bi sînor e, îdîa bike ku dikare tevahiya gerdûnê şîrove bike, ev yek tê wê maneyê ku em mirov zêde mezin dikin. Mirov ê agahî û kapasîteya zanîna wî gelekî bi sînor e, çi tiştê lê serwext nabe li têgîna xwedayetiyê bar dike û bi vê maneyê ev yek metafizîkeke baş e. Ez yeqîn dikim ku ev jî ne tiştekî mirov jê fikaran bike ye. Berevajiyê vê, mirov ê weke xwedayê bi tenê were qebûlkirin û ez yeqîn dikim, ewçend xwe mezin dîtin wê nebe maneya gerdûnê.

Rahibên Sumeran dema xweda çêdikirin ji metafizîkeke pêşketî wêdetir, ji bo civakên ava dikirin weke riya ravekirineke hêsan û bandora exlaqî nirxandin. Belkî jî rahiban cara pêşî maneyên guneh û xêrê li têgîna xweda bar kirin û ev yek di çêkirina hisa guhdanê (taetkirin) de bi kar anîn. Xwedê hêdî hêdî dikin DEWLET. Reform jî di vê nuqteyê de ye. Li ser teht û gelek zi-

naran wexta şêwazê rûniştina rêveberên dewletê ango rêveberên civakê hatin çêkirin di wan de bi taybetî hêza wan a gewî hat destnîşankirin. Wexta Qral li ser navê xwedayê xwe çû şer, pirr bi hostayî berjewendiyên xwe yên di şer de bi maske kirin. Di tevahî, nivîs, neqş û xetan de rêveber weke kurê herî baş ê xwedê tê nîşandan, dijminên wî jî şeytan in ku divê bela xwe bibînin. Êdî hêdî hêdî komeke xwedayan bi gewde dibe. Ev, eşkere pêkhatina rêveberiya nû nîşan dide.

Bi qasî ku di civaka Sumeran de xweda û rêveber hemtayê hev hatine nîşandan di ti civakeke din de ev yek wisa nehatiye nîşandan. Êdî pirsa kî maskeya kê ye, pirr girîng nîne. Bi qasî ku xwedê dikin dewlet, di şexsê çîna rêveber de weke afirînerê mezin, rêveber û hêza çavdêr dibe xwediyê maneyê. Rêvebertî çendîn dibe xwedî xislet, xwedayê wî jî jê kêm namîne. Civak çiqasî bi fazîlet û ferasetê were rêvebirin, ben û tayê rêveber bi xwedayetiyê jî ewqasî piştrast dibe. Ji bo beşekî civakê yê tê rêvebirin her diçe zehmet dibe ku rêveber û xwedê ji hev derxîne. Metafizîka xirab bi van bûyeran re têkildar e. Xwedayetiya hatiye çêkirin êdî ber bi metafizîka xirab ve diçe. Ji vê qonaxê û pêve, bi tevahî civakên şareza ji bo rewakirina rêveberiyên xwe wê bi hêza bi sêhr a xweda û dîn bihesin û wê timî bi kar bînin. Herçiqas xwedawenda berê ya pîroz, ya dizê û pêk tîne di quncikên his û fikrên bindestan û yên tên rêvebirin de cih bigire û bimîne jî dîn û xwedayê dibe dewlet, bi rêya evdên xoşewîst ên rêveber wê eşkere rolekê îfade bike.

Di nava hejmara xwedayan û şêweyên civakan de têkiliyeke balkêş heye. Pirr xwedayî têgihiştina serdema wekheviya di nava qebîleyan de îfade dike. Kêmbûna hejmara wan û li gorî mezinbûnê rêzbûna wan bi protokola rêveberan ji nêz ve eleqedar e. Her diçe ber bi xwedayê sereke ve gav têne avêtin. Ev yek jî dide nîşan ku ji nava rêveberan yek ê derkeve. Di nava têgihiştina xwedayê xuya nake, wêneyê wî nayê çêkirin û derketina dewletê ji destê şexsan û bi sazîbûna wê de têkiliyeke gelekî manedar û tayên balkêş hene ku divê ji hev

bên derxistin û analîzkirin. Di vê çarçoveyê de xebateke teolojîk gelekî bi qîmet e ku dikare rêya me rohnî bike.

Li cem hêzên rêveber her diçe cihê xwedê kêm dibe û bi vê re maske jî ji rûyên wan dibin. Li aliyê din zelal dibe ku dewlet tê çi maneyê û berjewendiyên kê îfade dike. Dîn êdî hêza xwe ya rewakirinê wenda dike û weke berê bi hêz nîne. Li hemberî van pêşketinan, civaka şareza bi qasî zordestiyê hêza rewakirinê ya dîn jî bi kar aniye. Taybetîkirin û dewletkirina dîn bi civaka şareza û bi taybetî bi pêşketina rêveberiya wê re bi hev re dimeşin. Ev rewş di dînan de peydebûna mezheban û şeran jî rave dike. Şaristaniyên şer dikin, mezheb û dînên şer dikin bi xwe ne. Berê pêşî şer li ser navê dîn û mezheban tê kirin da ku bi tevahî civakê jî beşdar bikin. Şerên mezin û dirêj ên şaristaniyan timî di bin kirasê şerên dînên mezin de hatin meşandin. Jixwe bi qasî ku hewce nake mirov serê bigire, diyar e ku şerên li ser navê Îslamiyetî, Xiristiyantî û Mûsevîtiyê ji bo bûna hêza sereke ya şaristaniya Rojhilata Naverast hatine kirin. Kengî weke îdeolojiyên fermî yên dewletê hatin îlankirin jî rewşa wan a eşkere berçavtir bû. Çawa ku gelek caran hatiye dîtin tiştekî digihîje asta herî jor, di çarçoveya vê rêzikê de girîngiya wan jî piştî vê qonaxê serberjêr çûye. Mezhebtiya muxalif an jî dijber li derveyî civaka şareza her tim weke helwesteke ala serhildêr a civaka marjînal li ba bûye. Hinekî be jî nakokiya çînî nîşan dide. Ber bi roja me ya îro ve di avakirina dewleta netewe ya kapîtalîst de bûne mezheb û wergeriyane şiklekî milletparêziyê. Seferên şer ên xwînrij vê carê jî bi vî kirasê li xwe kirin û maskeyên pê rûyê xwe girtin meşandin.

Di dîroka şaristaniyê de cihê felsefeyê li gorî dîn herçend bi sînor be jî girîng e. Pêşketina zanista manedanê û kêmasiya dîn di warê ravekirinê de hewcedariya bi felsefeyê derxistiye holê. Zanyariya dîroka wê bi qasî dîn kevin, mirov dikare destpêka felsefeyê bihesibîne. Zanyar mirovê difikire temsîl dike û ji teolojiyê cuda xwedî çavkaniyeke maneyê ye. Mirov bi qasî guh bidin berdevkên xwedê serî li fikrên wî didin. Zanyar bi dewlet

û şaristaniyê re zêde li hev nînin. Bêhtir girêdayî civaka derveyî civaka fermî ne. Di pêşketina exlaq û zanistê de rola wan diyarker e. Herçend di çavkaniyên nivîskî de xuya neke jî di civaka neolîtîk de jinên dayik-xwedawend û beşê hiyarerşiyê yê dejenere nebûyî nêzî zanyariyê ne. Em şopên vê yekê di civaka Sumeran de bi xurtî dibînin. Di derketina pêxemberan de gelek zanyar hene. Rêûresma zanyarî û felsefeyê ya Rojhilata Naverast hewcedariya xwe bi lêkolînê heye. Beriya çanda Yewnan cihê felsefeyê ne ya guftûgoyê ye. Şensê fîlozofên Yewnan ew e ku tevî mekanê cografîk şensê qonaxa bilind a şaristaniyê bi hev re jiyan. Çawa ku rahibên Sumeran avakirina dîn û xwedê, tevî avakirina dewlet û civakê bi hev re meşandin, fîlozofên Yewnanan jî di qonaxa jortir de civaka şareza bi nîv dîn û nîv felsefeyê di zikhev de ava kirin û meşandin. Heman kar hatiye kirin: bikaranîna hunerê têgînan. Ya pêşî bi avakirina dîn radibin, ya din jî bi têgînên felsefî bi heman rolê radibin. Dest pê dike, xwedayên bê maske wê cihê xwe ji xwedayên bi maske û qralên tazî re bihêlin. Di vê yekê de têkiliya di navbera felsefe û pêşveçûna fikra mirov de heye.

Di civaka Yewnan û Romayê de fikra felsefî rolake bi sînor lîst, wê di civaka kapîtalîst a Ewrûpayê de şoreşeke mezin çêke. Aloziyeke mîna di nava dînan de em li vir di nava pêşketina felsefî de jî dibînin. Di vê aloziyê de di qonaxa nû ya şaristaniyê de para berjewendiyên çînî û neteweyî yên ji aliyê sîstemê ve derketin pêş, gelekî hebû. Kengî bi şerê dînan nakokî çareser nebûn, zêdetir kar ket ser milê felsefeyê. Şerên di navbera salên 1618-1649'an de şerên dawî yên dînan in. Sedsala 17'an jî sedsala şoreşa felsefî ye. Felsefeya di civaka Yewnan û Romayê de roleke bi berpirsiyarî lîst di civaka şaristaniya nû de şêweya sereke ya îdeolojîk e. Ekolên mezin ên felsefî derdikevin. Li aliyekî 'mirina xwedê' tê îlankirin, li aliyê din serê qralên li piştperdeyê tê firandin. Bi dewleta netewe re ku bi xwe dibe mîna xwedê, qonaxa dewleta kapîtalîst dest pê dike ku ji qralekî tazî wêdetir tiştekî din nîne.

Şoreşa neolîtîk di hunerê de jî rê li ber şoreşê vekir. Piştî xetên hêsan ên li dîwarên şikeftan, ew dem bi fîgurên dayik-xwedawendê tijî dibin. Berhemên pêşî yên hunerî ev fîgur in. Pêşiyên heykelan têne hesibandin. Bi civaka şareza re fîgurên xwedê û rêveberan di nava hev de têne xêzkirin. Bi zêdebûna erka rêveberiyê û çînayetiyê re rê li hunerê vedike, bi qasî dîn dewletdar bibe. Nexasim di hunerê Misr, Çîn û Hindê de xweda, qral û rahib hema bêjin ketine nava pêşbaziyekê û xwe li hev radikişînin. Heykel û fîgurên mezin nîşaneya danasîna van hêzan e. Mîmarî jî li ser heman şopê diçe. Xaniyên dînî û rêveberan cihê mîmariyê ne. Perestgeh û qesrên gelekî mezin tên avakirin. Qebrên mezin tên çêkirin. Ev bi tevahî nîşan dide ka di civaka şareza de îstîsmara mirov bi darê zorê di çi asteke xeternak de dimeşe. Ji bo perestgehekê, ji bo pîramîdekê bi tenê, bi sed hezaran mirov heta bibin gincir têne bi karanîn. Bazirganiya mezin dibe jî xwe di fîgurên hunerî de nîşan dide û yek ji rûyên di nav fîgurên hunerî de xuya dike bazirgan in. Bazirganên bi qasî qralan bi hêz jî mirov dikare wan di nava berhemên hunerî de bibîne.

Bi destpêka qonaxa şaristaniya Roma û Yewnan re di mîmariya bajêr de şoreşek çêdibe. Bajarên berê ji kelheyên hundir û derve pêk dihatin, paşê bi mîmariyeke wisa hatin avakirin îro jî mirov li ber wan bi heyranî radiwestin. Di binê vê de berdêla keda heyî, kolekirina beşekî mezin ê civakê heye. Pirraniya keda koleyan di mîmariya bajêr de hatiye têkbirin. Nîşaneya koletiyê jî qebir, perestgeh, kelhe û bajarên mezin in. Ev nîşane di heman demê de nîşan didin ku civaka şareza di nava kîjan xwîn û xwêdanê de hatiye avakirin. Civaka Roma û Yewnan di warê heykeltraşiyê de jî qonaxeke nû ya şaristaniyê ye. Mîna ku bixwazin bêserûbinîbûna meznahî û xweşikiyê di heykel de bidin xuyakirin.

Çand û hunera Yewnan û Romayê ku bi Ronesansê vejiya, hêza îlhamê ya şaristaniya Ewrûpayê ye. Ewrûpaya dîn lê hukim dikir, bi çanda Ronesansê hinekî li fikra azad vebû û pêre bû xwediyê pencereyeke zêhnî ya nû. Bi bûrjûwaziya ku çîna şareza ya nû ye, huner bi tenê di warê hejmarê de bû xwe-

dî bandor. Careke din wê negihîje heybeta xwe ya berê. Bi tevahî mîmariya bajêr, muzîk, resm û heykeltraşî dikeve xizmeta kapîtalîzmê û dejenere dibe, pîrozbûna xwe wenda dike û huner bi navê îndustriyê bê nasname dibe û weke metayeke bikaranînê wê têkçûna maneya xwe îlan bike.

Mirov dikare serçavkaniya wêje û muzîkê jî bibe dema bisazîbûna neolîtîkê. Muzîka otantîk mîna ku deng û awazê wê demê be. Bilûra şivanan, dahol û zirne, hewaya wê demê ya tije xem û coş îro jî dikarin bidin hiskirin. Mîna ku pêşiyên muzîkê bin. Di dema civaka Sumeran de naverok û şêwe hînê tê pêşxistin. Di qesra qrêl de û di perestgehan de muzîsyen û sazbend xwedî cihekî bûn ku bê wan nedibû.

Destanên devkî hesret û qudsiyeta nasnameya pêşî ya eşîrê bi fesahet û belaxeteke mezin tînin ziman. Serçavkaniya destanên nivîskî ne. Destana Gilgamêş di dîrokê de metna nivîskî ya pêşî ye. Belkî jî serçavkaniya wêje û heta metnên pîroz e. Gelek metnên dînî û wêjeyî yên Sumeran, ne tenê ji bo vegotinên teolojîk û wêjeya Yewnan çavkaniya îlhamê ne. Di serî de destanên Yewnanan, bi tevahî hûnandinên mîtolojîk, versiyonên destanên Sumeran ên di ser Anatolyayê re derbasbûyî û veguherî ne. Li vir çanda muzîk û wêjeyê ya hinekî veguherî di civaka bûrjûva ya Ewrûpayê de bi romanê di revîzyona dawî re hat derbaskirin û ew kirin pop û wergerandin çanda îndustriyê, bi vî awayî heybet û qudsiyeta xwe ya destpêkê wenda kir û weke di hunerên din de jî kirin metayeke besît a bikaranînê ku bi qedandinê re rûbirû bibe.

Di exlaq de cihêbûna ‘baş’-‘xirab’ têkiliya xwe bi dabeşbûna bingehîn a civaka şareza ve heye. Ji aliyekî ve mesafeya di navbera komên berjewendîperest de rave dike. Bi giştî jî ‘baş’ û ‘xirab’ cihêbûna di nava civakê de îfade dike. Cewherê xwe civakbûyî ne. Girêdana bi civakê ve exlaqê baş îfade dike, dûrbûna jê û nakokiya bi nirxên civakê re jî xirabiyê îfade dike. Ji destpêkê ve damezrandina civakî xwediyê karekterekî exlaqî ye. Ango mirov bi riza xwe û li ser hîmê qudsiyetê bi rêzik û pîvanên plansaziya civakê ve girêdayî ne. Rêzik û pîvanên exlaqî ‘Des-

tûra Bingehîn a pêşî’ ya civakê ye. Di cewherê civakê de exlaq heye. Civaka bingehê xwe yê exlaqî wendakiribe ji hilweşînê nafilite. Rêzik û pîvanên civakî jî di cewherê xwe de girêdana bi nasnameya civakê, zimanê wê û hebûna wê ya xwedayî, û her weha weke ku yekwucûd bin dilsoziya bi endamên din ên civakê re îfade dike û wexta hewce bike di vî warî de mirinê li ber çav digire. Jixwe eger civak kesekê/kesekî ji nava xwe biavêje, ev yek weke mirinê ye.

Huqûq yek ji vedîtinên girîng ên civaka şareza ye. Ji sedî sed bi dabeşbûna civakî, çînî û dewletbûnê dikeve rojevê. Bingehê huqûqê exlaq e. Lê çawa ku pîrozbûnên dînî kirin dewlet û çawa rê li dewleta dînî vekirin, dewletkirina exlaq jî rê li huqûqê vekir. Huqûq, rêzik û pîvanên exlaqî yên plansaziya civaka dewletdar a nû û berjewendiyên çîna rêveber, mal û milkê wan û ewlekariya wan îfade dike û ev jî ‘Destûra Bingehîn’ a civaka nû ye.

Em mînaka pêşî ya huqûqê gelekî berî qanûnên Hammûrabî di civaka Sumeran de metnên nivîskî dibînin. Ji lewra derketina huqûqê ne Roma û Atîna, dewleta sîte-bajêr a Sumeran e. Di dema Roma û Atînayê de têkiliya huqûqê bi cumhûriyet û demokrasiyê re tê destnîşankirin. Hê bi awayekî fermî û nivîskî bi rêkûpêk nehatiye kirin. Derketina cumhûriyet û demokrasiyê ji bo pêşîgirtina li rêveberiyên kêfî yên dîktatorî yên qraltî û despotîk, gera li rêveberiya kollektîf a giregir, efendiyên civaka kole û kesên hilbijartî yên arîstokrasiyê îfade dike. Herçend em şopên wan di dema civaka Sumeran de nebînin jî em li îfadeyên wan ên pêşî yên fermî û nivîskî di qonaxa pêkhatina şaristaniya civaka Roma û Atînayê de rast tên. Derketina cumhûriyet û demokrasiyê bi bihurandina kaos, alozî û zehmetiyên rêveberiyê û plansazkirinê têkildar e. Di şaristaniya bi mohra bûrjûvaya Ewrûpayê de destûrparezî, komarparêzî û demokrasîparêzî di huqûqê de ji wan mijarên sereke û li pêş in ku herî zêde tên guftûgokirin. Vedîtina wan a herî dawî jî der barê ‘mafê mirovan’ de bû; mohra ferdiyeta zêde dibe û temsîla di asta civakî de berfireh dibe li ser heye.

Divê mirov pêşketina zanistî parçeyekî ji van kategoriyên bingehîn û sereke bibîne. Şêwazekî têgihiştin û serwextbûnê ye. Cudahiya wê ya bi tenê ew e ku beşekî zanînê yê bi ceribandinê her kes jê piştrast dibe îfade dike. Ne bi tevahî agahiyan, agahî û zanînên xwedî mayeke taybet ên bi ceribandinê mirov ji wan piştrast dibe digire nava xwe. Di çarçove û maneyeke berfireh de agahiyeke ne ya ceribandinê be nîne. Ji hevkirina zanînê bi dualîteyên weke teorîk û pratîk, pozîtîf û metafizîk, ya tê ceribandin û ya nayê ceribandin di civaka şareza de pêş dikevin. Ev rewş girêdayî têkiliya zanîn-desthilatdariyê ye. Di çarçoveya agahiyên zanistî de dîrok sê şoreşên mezin nas dike. Dema yekemîn, bi sazîbûna dema Neolîtîkê ye, ango dema Til Xelef B.Z. 6000-4000 sal û pêve girêdayî yên civaka Sumer li vê şoreşê zêde kirî, dema duyemîn, 600-300 sal B.Z. civaka Atînayê û Anatolya Rojava ye, dema sêyemîn jî salên 1600 P.Z. û piştî wê, dema Ewrûpa Rojava ye. Têkiliya agahiya zanistî bi qonaxên şaristaniyê re eşkere ye. Her qonaxa dîrokî bi şoreşa xwe ya zanistî pêş dikeve. Lê divê mirov zanistê bi dîn, felsefe, wêje, huner û huqûqê re di nava têkiliyeke nêz de bibîne. Zehmet e ku mirov bi cihêtiya di navbera zanist û felsefeyê de bihise. Mirov dikare ji aliyê teorîk û pratîk ve jî li heman bûyerê bifikire.

Bi tevahî mirov dikare di navbera van kategoriyên maneyê û civaka şareza de têkiliyekê deyne û ev yek jî dikare dualîteya mane-desthilatdariyê îfade bike. Ev kategoriyên mezin ên maneyê û îfadeyên wan ên pratîk ji pratîka civaka mirov û zêhniyeta rê li ber vekirî zêde bûn. Beşa bûyî dewlet a civaka şareza wan desteser dike û berevajî dike. Beşa civaka şareza ya bûye dewlet, berê pêşî dest avêt van kategoriyên maneyê û ew li gorî paradîgma û çavkaniyên xwe yên hêzê bi rêkûpêk kirin. Her qonaxa şaristaniyê bingehekî nû yê paradigmayê ango guhertineke bi bingeh a nêrîna li dinyayê bi awayekî sîstemkirî bi rêkûpêk dike. Ev kar an jî bi rêkûpêkirin, li gorî wan gelekî pozîtîf in (diyardeyên berçav) lê ji bo yên têne rêvebirin tê maneya tarîkirin, piştperdekirin û ZINCÎRKIRINA mezin. Li gorî rêveberiyên eş-

kere zordariyê dikin, rêveberî rewakirina bi paradîgmayên nû timî esas dibînin. Dîsa yek ji karê bingehîn ê rêveberiyan giranî û berjewendiyên xwe yên weke tevahiya civakê dibînin û heta weke çarenûsa civakê be nîşan didin. Di vê de jî çiqasî serketî bin, ewqasî temenê civakên weke civakên şareza têne hesibandin dirêj dikin. Şaristaniya hêza xwe ya razîkirin û rewakirinê wenda bike, wextekê şaristaniyeke herî mezin a cîhanê be jî nikare xwe ji hilweşînê rizgar bike. Weke mînak sedemên bingehîn ên hilweşîna şaristaniya Romayê li hundir Xiristiyantî, ji der ve jî bi koçberiya qewman bûn ku derb li Romayê xistin, rêz û balkêşiya wê jî nema. Komên mirovan wexta bi komên dînî yên nû û komên qewman re bûn yek, hêza Romayê ya bi heybet rewatiya xwe wenda dike û ji hev dikeve.

Di vê çarçoveyê de ev saziyên civakî yên em dikarin wan weke kategoriyên metafizîk jî bi nav bikin wexta mirov wan bi serê xwe bigire dest, heye ku rê li ber berevajîkirinê jî veke. Bêguman rastiyên metafizîk ên ji aliyê materyalîstan pirr bi awayekî çor û hişk hatine rexnekirin, bi serê xwe nabin ku mirov wan weke baş û xirab dabeş bike. Li gorî ku zêhniyeta mirov bêyî metafizîkê nikare debar bike, wê wextê mirov dikare wan bi hev re û bi civakê gelekî girêdayî weke metafizîka baş û xirab binirxîne, ev yek ê ji aliyê rêbazê ve hînê manedartir be.

Şaristaniyên mezin bi giştî şaristaniyên dînî ne. Kengî dîn hêza xwe ya rewakirinê wenda bike, bi pirranî dawiya wê şaristaniyê tê. Ev çi felsefe, çi zanist an jî dînekî nû be jî encam naguhere. Tevahiya van rastiyan girîngiya kategoriyên maneyê (dîn, felsefe, huner, huqûq, zanist, exlaq) ji bo civaka şareza (civaka bi çîn, bajar û dewletdar) nîşan didin. Wezîfeya Sosyolojiya Pêkhatinê ye ku di civaka şareza de cihê van kategoriyan rohnî bike, erka Sosyolojiya Azadiyê jî ew e ku di çarçoveya rexnekirina van kategoriyan de şîrove bike ka wê wan çawa bi jiyana civakî ya azad û demokratîk re bike yek. Ev mijar ê di beşê pêwendîdar de bi awayekî berfireh were nirxandin.

**f-** Di civaka şareza de dîroka şîroveyên ekonomîk hem dikare rê li aloziyê veke, hem jî gelekî rê dide berevajîkirinê. Yek ji marîfetên şaristaniya kapîtalîst e ku ekonomiyê ji aliyê teorîk û pratîk ve dike mijara lêkolînê. 'Materyalê' rastiya civakê hûrdikole. Li gorî şîroveya rast û mafdar a Fernand Braudel; sîstema şaristaniya kapîtalîst xwe weke şaristaniya maddî kiriye dîrokê û ji lewra mirov dikare jêre bibêje; sîstemeke ekonomîk e. Çawa ku nabe sedema fikaran mirov ji tevahiya sîstemên berê yên şaristaniyê re bibêje 'sîstemên metafizîk', bi heman awayî mirov ji kapîtalîzmê re bibêje 'sîstema materyalîst' ev yek ê pêşiya me rohnî bike.

Komên cinsên mirov jî di navê de çi civaka neolîtîk, çi jî bi tevahî civakên şareza yên beriya kapîtalîzmê xwe hişk bi qudsiyetê ve girêda bûn, manedan û sêhr jî di navê de bi tevahî qîmeteke mezin didan metafizîkê, wekî din jî jiyan şîrove nedikirin, lê pêşketineke balkêş e ku şaristaniya kapîtalîst xwe mîna rejîma 'xwedayên bê maske û qralên tazî' nîşan dide. Ji bo vê hewcedarî bi şîroveyên berfireh û yên xwedî maneya hûrûkûr heye. Hêza şaristaniya kapîtalîst ya çeloxwarîkirin û berevajîkirinê, xapandin û asîmîlekirinê gelekî zêde ye.

Li gorî qenaeta min a şexsî, cewherê rastî yê kapîtalîzmê ew e ku karûbarên di bin navê 'ekonomiyê' de bi rêxistin kirine, herî zêde şêweyekî civakê ye ku aliyê wê yê desteserkirin û diziyê xurt e. Gotina ekonomiyê gotineke Yewnanî ye, û maneya wê 'qanûna malê' ye. Rêzik û pîvanên maddî yên debara malbatê, hawîrdora wê, alav û materyalên din îfade dike. Eger em maneya wê di civaka şareza de hînê bi giştî bigirin dest, em dikarin bibêjin; ji bo komên piçûk 'rêzikên debarê' îfade dike. Rastiya civakê ya herî kêm hatiye taybetîkirin û dewletdarkirin. Şaneya herî bingehîn a kollektîfkirina civakê ye. Kes li dewletdarkirin û taybetîkirina wê nafikire. Dewletdarkirin û taybetîkirina ekonomiyê ew e ku şaneya bingehîn a civakê tê xirakirin. Ango civak ji rêzik û pîvanên herî girîng tê bêparkirin. Ji ber vê yekê, ti civakê bi qasî kapîtalîzmê, taybetîkirin û dewletdarkirin nekiriye xisleta sereke ya civakê û newê-

riya bû vê bike, ne jî lê bifikire. Bêguman di civaka şaristaniyê de tevahiya qadan dewletdar kirine, şaneya wê ya herî bingehîn ekonomî jî hem kirine milkê taybet hem jî kirine milkê dewletê. Lê belê ti sîstemê bi qasî civaka kapîtalîzmê bi awayekî fermî û eşkere milkiyeta dewletê û ya taybet weke sîstem îlan nekiriye.

Ev xusûs gelekî girîng e: taybetîkirin û dewletdarkirina ekonomiyê weke desteserkirin û diziyeke zû hatiye şîrovekirin. Karl Marks[55] ev xusûs hînê bi îfadeyeke 'zanistî' destnîşan kiriye û gotiye; ji ked û nirxa zêde tê dizîn û weke karê tê binavkirin. Hewcedariya mijarê bi şîroveyeke hûrûkûrtir heye. Li gorî min sedema ekonomî bûye mijara milkiyeta dewletê û taybetî ew e ku nirxa-zêde ji bilî berhema zêde ya berê divê weke desteserkirin û diziyekê were qebûlkirin. Ekonomî weke şaneya bingehîn a civakê, taybetî û dewletî jî di navê de bi tevahî şêweyên milkkirinê bêexlaqî ne. Dikevin çarçoveya dizî û desteserkirinê. Çawa ku dilê mirovekî yan jî organekî wî yê din were taybetî û dewletîkirin bê mane ye, yan jî bi fikar e, ji bo ekonomiyê jî mirov dikare heman tiştî bibêje. Ez hêvî dikim ku vê mijarê di beşa kapîtalîzmê de bi berfirehî bînim ziman.

Em dibînin ku di civaka şareza de metabûyîn weke diyardeyeke gelekî girîng pêş dikeve. Ango di navbera metabûyîn û civaka şareza (milkiyeta taybetî, çînî, bajarî û dewletî) de têkiliyeke xurt heye. Meta û metabûyîn ji bo civakê yek ji kategoriyên sereke yên şaristaniyê ne. Wê wextê gelekî girîng e ku mirov metayê rave bike. Bi kurtasî mirov dikare bêje, eger objeyek ji bilî

[55]Karl Makrs: (1818-1883) Di nava civaknasiya materyalîst a dîrokî de yek ji doktrînerê civaknas ê Elman û damezrînerê kominîzma şoreşger e. Marks di dema zanîngehê de Hegel û Feuerbach nas dike û ji fikrên wan bi tesîr dibe. Marks bi rexnekirina nêzîkatiya Feuerbach a dîrokê û rêbaza diyalektîkê ya Hegel sîstema materyalîst a dîrok û diyalektîkê sîstematîze dike. Marks paşê bi Engels re sîstema xwe ava dikin û vê jî weke 'sosyalîzma zanistî' bi nav dikin. Marks fikrên xwe di Manîfestoya Kominîzmê de weşandin û anî ziman ku mirovatî bi têkoşîneke rêxistinî ya proleteryayê dikare bigihîje dinyayeke bê çînayetî û azadiyeke bê sînor ku ev jî kominîzm bi xwe bû. Marks kapîtalîzm û civak bi awayekî berfireh nirxand û bi berhema xwe ya Das Kapîtal mohra xwe li sedûpêncî salê dîroka nêz xist.

pêdiviya mirov bi cih bîne, bibe xwedî nirxa guhertinê ya danûstendin û bazirganiyê êdî em dikarin behsa metabûyîna wê bikin. Civak demeke dirêj ji guhertina nirxê re xerîb e. Li vê yekê nafikire, şerm dibîne. Objeyeke bi qîmet bibîne, diyarî dide kes an jî koman. Li şûna diyariyê cihgirtina 'guhertinê' bi temamî hîle yan jî vedîtineke şaristaniyê ye. Civaka beriya şaristaniyê yan jî civaka li derveyî wê guhertinê şerm dibîne û heta neçar nemîne ji vê yekê dûr disekine. Civak ji ezmûnên xwe yên hûrûkûr baş dizane ku objeyeke bi karanînê, eger derkeve derveyî saziya ekonomiyê ya weke şaneya wî ya bingehîn e, û bibe mijara guhertinê, dikare her cure belayê bîne serê wê. Ji lewra jî li hemberî guhertinê gelekî nazik e.

Piştî ku meta bû nirxa guhertinê bazirganî û bazirgan di kategoriya şaristaniyê de cihekî girîng girtin. Ez bi kurtî bibêjim ku ez metayê mîna Karl Marks şîrove nakim. Ango îdîaya ku dibêje; nirxa guhertinê bi keda karker tê pîvan, weke pêvajoyeke bi fikar a destpêka çêbûna têgînê dibînim. Eger em di roja me ya îro de jihevdeketina civakên ti dera wan a nebûye meta nemayî li ber çav bigirin wê wextê baştir wê were fêhmkirin ka ez çi dixwazim bibêjim. Ji aliyê zêhnî ve qebûlkirina metabûyînê, destberdana ji mirovatiyê îfade dike. Ev rewşeke welê ye ku ji hovîtiyê jî wêdetir e. Eger em bişibînin meseleyekê; mîna ku heywanê li selexaneyê hatibe parçeparçekirin û were firotin li ser tevahiya civaka mirov were ferzkirin. Di hîmê xirabiya civakî de faîz, di hîmê faîzê de jî bazirganî, di hîmê bazirganiyê de jî meta heye. Têkiliyeke nêz di navbera hilweşandina ekolojî û bazirganiyê de jî heye. Ekonomiya nebe şaneyeke civakê, êdî destpê dike ji kokê ve ji xwezayê qut dibe. Ji ber ku yekîtiya nirxên maddeyê û nirxên zindî ji kokê ve têne veqetandin. Mîna ku tovên metafizîka xirab bêne danîn. Maddeyê ji ruh, ruh jî ji maddeyê dikin, bi vî awayî rê li ber dualîteya herî zêde zêhnê dîroka fikrê şîlo dike vekirin. Guftûgo û cudakirina bi şiklê maddeparêzî û manewiyatparêzî, tevahiya dîroka şaristaniyê jiyana ekolojîk û azad ji holê radike. Bi têgihiştina gerdûn û maddeyeke mirî, bi têgihiştina ruhparêzi-

yeke çi ye, ne çi ye diyar nîne, mîna ku zêhnê mirovan dagirkiribin û îstîlakiribin dikin mêtingeh.

Ez dixwazim gumana xwe di nuqteyeke din de diyar bikim. Meta jî di navê de ez bi guman im ku nirxên civakî bêne pîvan. Ne tenê keda zindiyan, maddeya berhema kedên nayê jimartin nabe ku weke nirxê keda kesekî were hesibandin, ev şaşî bi xwe helwesteke rê li ber dizî û desteserkirina nirxê vedike. Sedem jî eşkere ye. Kedên nayên jimartin wê çawa bên pîvan? Wekî din, kedkara nirxê wê hîç nayê pîvan dayika kedkaran tîne dinê û wan mezin dike, nirxê malbatê wê çawa were pîvan? Obje weke nirx di nav tevahiya civakê de çêdibe, wê wextê wê heqê civakê çawa bê pîvan? Em guftûgoyê dikarin dirêj bikin. Ji lewra nirxê guhertinê, berhemê zêde, ked-nirx, faîz, kar, rant û têgînên weke van bi diziya fermî ya bi destê dewletê hemnav in. Ji bo guhertinê divê mirov yan pîvanên din bibîne yan jî pêşdebirina şêweyê diyarîdayînê belkî manedar be. Piştre ez dixwazim vê xusûsê di beşê modernîte û jiyana azad de rave bikim.

Di çanda Yewnan de jî bazirganî yek ji wan pîşeyan bû ku bi çavê ne baş lê dihat nêrtin. Haya Yewnanan ji têkiliya bazirganiyê ya bi diziyê re hebû. Di civaka Romayê de jî cihekî bazirgan ê wisa bi rûmet tinebû. Gelek kêm obje weke meta hebûn. Di civakê de asta metabûyînê bi taybet û nazikî kêm dihat girtin. Ez behsa exlaqê civaka neolîtîk dikim. Berî ku kapîtalîzm bibe sîstema serdest jî di nava hin mîhraqan de cih didît, lê civakên şareza jî destûr nedidanê berfireh bibe û pêş bikeve. Timî di asteke marjînal de dihiştin. Di sedsala 16. de li Hollanda û Ingilistana îro cih dîtina wê bi şert û mercên gelekî xweser ve girêdayî ye. Belkî jî ji bo Hollanda û Ingilistan çêbibin hewcedarî bi sîstema kapîtalîzmê hebû. Jixwe wisa jî bû. Di nava çarsed salî de tevahiya dinyayê rastî belavbûna vê sîstemê hat. Em ê vê dema şaristaniyê bi navê modernîteyê weke beşeke cihê şîrove bikin. Me bi awayekî kin û hinekî jî hişkeber weke gava pêşî şaristanî bi nav kir ku em agahiyên xwe yên dîrokî û civaknasiyê li ser hîmekî tekûz deynin. Mi-

jarên ku dîroknas û fîlozofên herî hosta tevahiya temenê xwe nikarin ji nav derkevin, ji bo mirov wan bi carekê bide fêhmkirin qabîliyeteke nedîtî pêwîst e. Bêguman em xwediyê vê îddîayê nînin. Lê belê ji ber ku rêz û hurmeta me ya ji bo jiyaneke azad me erkdar dike, û ji ber ku hêzeke me ya şîroveyê ya dîrokî-civaknasî û manedanê heye û her kesê xwe li ber pirsgirêkên civakî ji dil berpirsiyar dibîne beriya her tiştî divê wê qabîliyetê weke şertê pêşî di xwe de bibîne.

Ji ber trajediyên sedûpêncî salî yên 'sosyalîzma pêkhatî', rêçeteyên bi dehan şoreşên rizgariya neteweyî û sosyal-demokratan di nav hesabên qeşayî yên sermaya fînansê de heliyan; ji bo hêza me ya şîroveyê ya hosteyane bi giştî der barê şaristaniyê û bi taybetî jî der barê şaristaniya kapîtalîst de divê bi sosyolojiya azadiyê ya der barê jiyana azad de bibe yek da ku em ji bo dozên azadiyê yên mezin nexapin û nexapînin.

## 3- PIRSGIRÊKA BELAVBÛNA CIVAKA ŞAREZA

Guftûgoyên zanistî yên der barê dem, serîdan û şaxdana kakilê şaristaniya îro de ya ku hukim li dinyayê dike, mêyildar in ku li ser tejaneya Dîcle-Firat a Jor û Jêr li hev bikin. Herdu beşên dawiyê ku em bi giranî li ser rawestiyan, ya me gotî piştrast dikin. Şîroveyên me jî nîşan didin ku devera pêkhatina vê kakilê tejaneya Dîcle-Firat a Jor a li qûntara çiyê ye. Kakil an jî sîsika vê pêkhatinê li vir meyiya û şitla wê ya pêşî jî ji aliyê rahibên Sumeran ve hat qelemkirin û bi vî awayî hîmê civaka şareza hat danîn. Divê neyê jibîrkirin ku ev bûyerên manedar ên me di nav hevokeke bi qasî pênc saniyeyan de bi cih kirine, bi ceribandinên hezar salan ên dûvdirêj hatine bicihanîn, meyiyane û mayînde bûne.

Sosyolojiya pozîtîf di çarçoveya zeman û mekan de bi tevahî xwe venagirin his dikin. Bûyer û diyardeyên behsa wan dikin zeman û mekanê wan nîne. Qaşo bi îddîaya zanista ceribandin û diyardeyî radibe. Çiqasî bê zeman û mekan analîzan bike, bawer dike ku bi awayekî zanistî tevgeriyaye. Bi çar lepan bi rêbazê di-

gire û xwedî lê derdikeve. Ya rastî, di bin hîmê vê nêzîkatiyê de têgihiştina modernîteyê ya xwe di nava zeman û mekan de bêserûbinî dibîne, heye. Bi tevahî huner, felsefe û zanista navenda wê Ewrûpa ye, xwedî meyleke bi vî rengî ye.

Çawa ku Xwedê jî ji zeman û mekan munezzeh e[56], ev rahibên hemdem ên îdeolojiya şaristaniya Ewrûpayê hûnandine jî di warê bêsînorî û bêserûbiniya zanista xwe de ji xwe razî ne, û rehet in. Ew çiqasî ji tengavbûna zeman û mekan birevin, ewqasî yeqîn dikin ku tejika xwe ya zanistê ji avê derdixin. Her demê xwediyên paradigmayan vê çewtiyê gelek caran dikin. Em baş dizanin ku ti bûyerek, diyardeyek, saziyek, çalakiyek, kesayetek û civakek nîne ku bandora zeman û mekan li ser nebe.

Rêbaza ku çarçoveya zeman û mekan dike hîmê xwe, hêza şîroveyê ya maneyê zêde dike. Di qada zanistên civakî de dîrok 'niha' ye, 'niha' jî dîrok e. Cudahiya di navberê de zêdetir şiklî ye, hînê kêmtir cewherî ye. Berî ku ez Fernand Braudel bixwînim, min fêhmkiribû û weke rêbaz qebûlkiribû ku bi taybetî bêyî têgînên 'demê' em ê nikaribin sosyolojiyeke manedar bimeşînin. Ez vê rêbazê ji bo mekan jî weke rêbazeke mirov nikare jê bigere qebûl dikim. Herçend parêznameyên min bi amatorî bin jî bi cihanîneke xurt a vê têgihiştinê îfade dikin. Mirov dikare di tevahiya analîzên min de heman şopan bibîne. Wê wextê zanyarên Ewrûpayê yên di mijara rêbazê de ewqas nazik in, çima di mijara zeman û mekan de weke amatorekî mîna min ji dabaşê haydar nînin an jî jê direvin? Mirov vê yekê dikare bi NAVENDPERESTÎ û GERDÛNPERESTIYA EWRÛPAYÊ rave bike; bi van xisletên xwe nekarîn ji metafizîkeke çor rizgar bibin an jî mîsyon û baweriya wan a bi avakirina civakeke metafizîk e.

Wexta ku em dîrokê û mekanê li sosyolojiyê zêde bikin, jiyan çawa diherike û diçe, em di dîrokê de û 'niha' çi ne, em ê baştir fêhm bikin û lê serwext bibin. Eger dîrok û niha gelekî nêzî hev in, dîsa mekan mîna pêpelûkên pêlikê yên li pey hev tên hevdu temam dikin, wê wextê em dikarin bibêjin mirovatî yekpare ye,

---

[56]Munezzeh: pak, nişmî û ji tiştekî dûr e.

bêyî qewman, dînan, dewletan, neteweyan, hevgirtinan, NY û enernasyonalan jixwe di nava yekîtî û yekparetiyê de ye. Wer diyar e, saziyên qaşo li yekîtiyê digerin, dibin ew sazî ku berevajiyê vê yekê dikin. Civaka şareza pêkhatineke seyr û ecêb e. Xisleteke wê heye ku her tiştê dibêje berevajiyê wê rast e. Ji bo em li hemberê vê rastiya wê matmayî nemînin, divê em civaka şareza her tim berevajî û berepaş bixwînin.

Min ev pêşek pêşkêş kir da ku zêdetir balê bikişînim ser belavbûna şaristaniyê ji aliyê zeman û mekan ve û ez nîşan bidim ku divê mirov çawa şîrove bike.

**a-** Pirsgirêkên Belavbûna Şaristaniyên Bi Kokên Xwe Misr û Sumer

Vegotinên me yên der barê bi sazîbûna neolîtîkê de çêbûna kakilê şaristaniyê rohnî kiriye. Eger hûn vî kakilî nefikirin, hûn ê qelemkirina şitlê ya Sumeran li ku biteamînin? Li naverastê kakil û dendikeke zîl bide tine. Hebe jî di wê rewşê de nîne ku bigihîje. Em çawa DYE'yê nikarin bêyî Ewrûpayê bifikirin, belkî hînê zêdetir bêyî kakilê şaristaniyê li Dîcle-Firat a Jor, wê Dîcle-Firat a Jêr bi tenê çirav û qamir bûna. Meyandina şaristaniyê li aliyekî bihêlin, belkî bi tenê jiyaneke mîna ya Pigmeyan pêk bihata.

Di warê belavbûnê de pirsgirêkeke girîng jî ew e ka çima li Dîcle-Firat a Navîn û heta li Anatolyayê wargehên gelekî li pêş nebûne an jî nekarîne bibin bajar. Wexta em ji niha pênc hezar sal paş ve diçin, em dibînin ku gelek herêm li ber şaristanîbûnê ne, gelek gundên mezin hene li ber bajarbûnê ne, lê paşê ji ber sedemên em baş nizanin bêyî ku pêşde biçin hildiweşin. Mînak Çatalhoyuk û deverên di navbera Îran-Turkmenistanê de deverên bi vî rengî ne. Yek ji xusûsên ku em dizanin ew e ku li herêmekê zêdebûna şêniyan girêdayî mezinbûna berhemê wê yê zêde ye. Ya vî berhemî zêde jî bike tejaneya erdên bi bereket ên li ber devê çeman e ku têne avdan. Li nêzî ketina deryayê çemên Nîl û Dîcle-Firatê erdên bi aluvyon ên bi bereket çêkirine ku ev yek jî vê fikrê piştrast dike. Ji bo destpêkê bi qasî çêbûna bajêr, şertê pêş ew e ku divê hejmara xwe zêde û ma-

yînde bikin. Şertekî din ew e ku ji sedî sed divê nêzî wan herêman, mercên çandî yên xwe bi xwe biafirînin hebin. Ti qada bi aluviyon bi serê xwe rê nade çanda neolîtîkê. Ji ber ku şert û mercên vê çandê nînin. Di çanda neolîtîkê de şertên bajarvaniyê yên mezinbûn, mayîndebûn û pirrbûna hejmarê tinene. Ji ber van rewşan hewcedarî bi temamkirinê heye.

Bi qasî li jêr nebe jî, tevahiya nîşaneyan îşaret dikin ku li tejaneya Dîcle-Firat a Navîn rêzeke bajarên bi mezinahiya navîn hene. Lê berî ku ez behsa vê bikim, di salên 3500 B.Z. de şaristaniya bajarê Ûrûkê sîstemeke xwe daye qebûlkirin afirandiye. Ûrûk nîzama koloniyan ava dike, modeleke hejmara bajarên zêde bike pêşkêş dike û bi rola xwe radibe. Di dîrokê de dibe xwediyê şerefa şaristaniya pêşî ava bûye. Kulta xwedawend Înannayê û Destana Gilgamêş îspatên bêmiriniyê ne. Heye ku B.Z. di salên 3000î de ji aliyê hevgirtina bajarên li bakur ên bi bereket û hejmara wan zêde bûyî tê hilweşandin.

Dema xanedaniya Ûrê di salên 3000î B.Z. de destpê dike. Bi şêweyê sê xanedaniyan di çarçoveya heman mentiqê avabûn û hilweşînê de xwe vekişand bakur û heta salên 2000î B.Z. dewam kir. Xanedaniya Aqad a Sargonî û dema Gudea'yê Gotî di vê çarçoveyê de mirov dikare bihesibîne. Metnên pêşî yên huqûqê yên nivîskî, destanên wêjeyî, akademî, şerên bajaran ên bê rehm mîna yên îro, mînakên balkêş ên weke Loriya Ji bo Nîppûrê û Destana Lanetkirina Agadeyê ji wê demê mane ku yekser têne hişê mirov. Tê fêhmkirin ku sîstemeke berfireh a koloniyê ya Ûrê heye. Jixwe koloniyên pêşî li kevana hundirîn a sîstema Zagros-Torosê gelekî bi lez zêde dibin û bi lez jî bi dawî dibin.

Encama mirov ji vê derxîne ew e ku civaka di nava wê de kolonî ava kirine, çanda wê bi hêz e. Şaristaniyên Misr û Harappayê tevî şaristaniya Elam-Sûsê herçend weke şaristaniyên bajaran ên serbixwe bêne nirxandin jî têkiliya yekser nebe di çarçoveya objektîv de mirov dikare wan bi Sumeran re tenê ji aliyê koloniyan ve bide ber hev û muqayese bike.

Serdema Babîlan di salên 2000î B.Z. de li bakur bi heman mentiqî dest pê kir. Herçend li şûna Sumeran ji etnîsîteya Aqadan ango çanda Semîtîk bê hesibandin jî bi xwe şaristaniyeke Sumerî ye. Ji aliyê bisazîbûn û zanistê ve asta herî jor a şaristaniyê tê qebûlkirin. Weke bajar Babîl mîna Parîs a Ewrûpayê xwedî rolekê ye. Bajarê çand û zanistê ye. Bazirganên wê zêde bûne, tevahiya çandan lê hatine cem hev, cara pêşî rewşeke kozmopolît[57] pêk hatiye. Bandora wê li ser dewrûberê zêde ye. Di dîrokê de serdema Nemrûtan ango qralên bi hêz ên pêşî, dide destpêkirin. Mîna bajarê rohniyê balê dikişîne ser xwe. Sê qonaxên xwe yên girîng hene. Serdema derketinê ya bi heybet, B.Z. di salên 2000-1600î de bi Hammûrabiyê navdar tê naskirin. B.Z. di salên 1600-1300î de kengî qewmên Hûriyan bandor lê kirin serxwebûna xwe ji dest da. Dema sêyemîn, B.Z. salên 1300-550î ye, bi bandora Asûran ji aliyê Persan ve hatiye dagirkirin. Serdema Babîlan a 1500 salî pirr xuya neke jî şopên gelekî xurt di bîra mirovan de hiştin. Şerê xweda Mardûk û xwedawend Tîamatê û destana navdar a Enûma-Elîş çîroka bi êş a têkçûnê ya jin-dayikê ye. Astronomiya wê, kehaneta rimildaran, esareta Ben-î Îsraîl, gelek metnên edebî yên nivîskî bermahiyên berxwedana li dijî Asûran e ku ji navenda çanda Kaldeyê mane û ji wan bîranînan in ku neyên jibîrkirin. Di serî de Solon[58] gelek fîlozofên Yewnan dersên xwe yên pêşî li vî bajarî girtin. Em wexta vê tînin bîra xwe, em bandora xelekwarî baştir fêhm dikin.

Em dema Asûr dikarin bikin sê beş. Dema yekemîn, salên 2000-1600 B.Z. dema qralên bazirgan e. Bazirganî her diçe mezin dibe. Bazirganan bajarê Nînova yê li nêzî Mûsil a îro ji bo xwe kiribûn navendeke bazirganiyê. Asûr xwedayê parastina vî bajarî bû. Bazirganan yekem car di dîrokê de koloniyên herî me-

---

[57]Kozmopolît: Li cemhevbûna gelek cudatî û cihêrengiyan.

[58]Solon: Di serdema antik a Yewnan de zilamekî dewletê ye. Di navbera salên 600-500 B.Z. de jiyaye. Bi qanûnên bi navê wî têne hildan navdar e. Bi qanûnên xwe koletiya navxweyî rakiriye. Koletiya ji ber deynan bi dawî kiriye. Di pêşketina demokrasiya Yewnan de Solon gavên girîng avêtine.

zin ên bazirganiyê ava kirin. Ji Rojhilatê Derya Spî heta keviyên Pêncavê, ji Derya Reş heta Derya Sor li gelek deveran gelek bajarên kolonî yên bazirganiyê ava kirin.

Mirov dikare bibêje ku di ware mîmarî û bazirganiyê de qonax bihurandine. Bajarê Kultepe (di dema Asûran de jêre Kanîş dihat gotin) yê nêzî Kayseriyê û bajarê Karkamişê (ji Karûmê yanî acenteya bazirganiyê tê) yê li nêzî devera îro Firat têre derbasî Sûrî dibe ji wê demê mane. Salên 1600-1300 B.Z. dema serweriya dewleta Mîtanî ya bi koka xwe Hûrî ye. Rêûresma Asûr, herçend girîngiya xwe ya berê kêm bibe jî hebûna xwe dewam dike. Dema wan a herî bi heybet salên 1300-612 B.Z. ne. Di dîrokê de împaratoriya pêşî ya herî bi hêz û herî berfireh ava kirine. Di şer de bi xedarî û bêrehmiya xwe têne naskirin. Tê gotin ji serê mirovan kelhe û birc ava kirine. Di dîrokê de cara pêşî şopên qirkirina mirovan û bi tevahî valakirina deverekê di vê demê de têne dîtin. Dîsa herî zêde têgihiştina gelan a berxwedanê di vê demê de xurt bûye. Berxwedana herî mezin bi pêşengiya qralên Ûrartûyan, proto-Kurd Hûriyan nîşan dane. Lê di vir de nuqteyek heye divê ez destnîşan bikim û ji cihê mayî ez ê paşê dewam bikim, ew jî ev e; koka etnîk a Ûrartûyan mijarek e ku li ser guftûgo tê kirin. Ev xusûs ji bo tevahiya xanedanên rêvebeRiyê welê ye. Xanedanên Ûrartûyan hemûyan ziman û çanda demê ya serwer esas girt. Jixwe li Ûrartûyê û hînê paşê li qesrên Persan jî zimanê fermî yê dewletê zimanê Asûrî û Aramî ye. Em ji cihê mayî dewam dikin. Me behsa berxwedana Hûriyan kiribû. Ji bo karibin xwe li vê cografya îro bigirin, rola vê berxwedanê gelek e. Jixwe bi hevgirtina Medên bi koka xwe Hûrî û Babîlan ev împaratoriya dêw û mezin di sala 612'an B.Z. de bi dawî bû û di nava rûpelên dîrokê de cihê xwe girt. Weke şaristaniya dawî ya bi koka xwe Sumer di dîrokê de ji bo belavbûna şaristaniyê û nexasim ji bo pêşdebirina bazirganî û mîmariyê bi kêrhatina xwe û rola xwe xwedî cihekî cihêwaz e.

Em cara pêşî ji bilî Mezopotamya Jêr navendên şaristaniyên din dibînin. Hem di warê şikil û hem jî di warê naverok û cew-

her de veguherîn û pêşketin xuya dikin. Çi di pêkhatina şaristaniya Sumer de, çi jî di belavbûna wê de mirov Mezopotamya Navîn weke xeleka pêşî bibîne wê nebe destnîşankirineke şaş û çewt. Em der barê vê nifşa bi koka xwe Hûrî de nemaze bi saya erdkolanên arkeolojîk, etîmolojî û etnolojiyê hînê zêdetir dibin xwedî agahî û zanîn. Hûrî ji ziman û çanda Aryen koma pêşî ya etnîk an jî gel e ku di çavkaniyên nivîskî de navê wê tê hildan û nasnameya wê diyar dibe. Otantîk in; ango ji serdema qeşayî ya dawî ve li sîstema Zagros-Torosan bicihbûyî ne. Di pêşdebirina cotkarî û heywan xwedîkirinê de xwediyê roleke sereke ne. Ya rastî, li deverê serê koma şoreşa cotkarî û gund a neolîtîkê pêşde bir, dikişîne. Nasnameya wan a etnîk ji salên 6000 B.Z. ve cihê û diyar dibe. Eger mirov Hûriyan weke proto-Kurd bi nav bike, destnîşankirineke li cih e. Şêwazê ziman, analîza etimolojîk a gelek peyvan û etnolojî têkiliya wan bi Kurdan re têra xwe eşkere rave dike. Bicihbûyîna li deştan, koçêriya li çiya û zozanan bi hev re û di nava hev de ye. Îhtîmaleke xurt e ku Sumer yek ji komên pêşî yên Hûriyan be. Jixwe paşê dema dagirkeriya Gotiyan salên 2150-2050 B.Z., dagirkeriya Kassîtan salên 1600 B.Z., tevî Hîtîtan salên 1596 dagirkeriya Babîlan a pêşî, gelekî paşê belavbûna li dij a Med û Persan vê rastiyê piştrast dikin. Bi Sumeran re herî zêde nifşa neolîtîk di nava têkiliyê de ye. Yên din jî Aramîtên bi koka xwe Semîtîk in.

Em dema bi sazîbûna neolîtîkê salên 6000-4000 B.Z. nehesibînin, em şopên şaristaniya pêşî ya bi koka xwe Hûrî serê salên 3000î B.Z. têra xwe dibînin. Ya rastî em li pêşketineke bê navber rast tên. Nifşên pêşî yên li Sumerê bi cih dibin zû gav diavêjin şaristaniyê, yên mayî jî ji ber sedemên avdaniyê û şertên hewayê yên demsalan, hêdî be jî dikarin wargehên xwe ber bi bajarbûnê ve bibin. Di erdkolanên arkeolojîk ên li beşên navîn ên tejaneya Dîcle-Firatê de mînakên gelek bajaran hatine dîtin. Di nava sînorên Ûrfayê de, li Kazaz, Tutrîş, Grevre, Zeytûniyê û herî dawî jî di erdkolanên li Gobeklîtepeyê de gelek wargehên li derve û hundirên wan kelhe û birc, avahiyên mîna

perestgehan, fîgurên qîmeta wan a hunerî heye û gelek alavên bazirganiyê, çêbûna bajaran nîşan didin. Dîroka gelekan ji wan heta salên 3000-2750 B.Z. diçe. Ya rast ew e ku mirov bibêje; ev komên bajaran ji Sumeran serbixwe ne. Gelekî manedar e ku li deverên nêzî wan koloniyên cuda û bi koka xwe Sumerî hatine dîtin. Mirov ji van koloniyan fêhm dike ku car caran li dagirkeriyên Ûrûk, Ûr û Asûran rast hatine. Erdkolanên nû yên arkeolojîk, xebatên etîmolojîk[59] û etnolojîk[60] dikarin nîşan bidin ku navendên bajarên li tejaneya Dîcle-Firat a Navîn her yekî navendeke mezin a şaristaniyê ne. Jixwe lêkolînên dawî yên zanistî jî îşaret bi vê yekê dikin. Nexasim berhemên li Gobeklîtepeyê hatine dîtin xwedî wê xisletê ne ku dikarin bibin sedema jinûve nivîsandina dîrokê.

Pêla şaristaniya bi koka xwe Hûrî ya nifşê duyemîn hînê berfireh dibe û gav diavêje şêwazê rêveberiya siyasî ya dişibe împaratoriyê. Nemaze Mîttaniyên ji Mezopotamya Navîn in, balê dikişînin. Bi qasî ku em fêhm dikin, ji salên 1600 B.Z. heta salên 1250 B.Z. yên mezinbûna împaratoriya Asûr împaratoriyeke bi hukim bûne. Paytexta wan li navbera sînorê îro yê Mêrdîn û Sûrî, bajarê Serêkaniyê Amûdê ye. Navê xwe hê wê demê bi kurdî Xweşkanî ye. Ji kevalan em fêhm dikin ku zimanekî xwe yê cihê heye û bi koka xwe Hûrî ye. Ji Kerkûka îro (navê Kerkûkê ji wê demê maye) heta Til-Alal a nêzî Antakyayê karîbûye belav bibe. Em dizanin ku timî Asûr di kontrola xwe de girtine. Bi Hîtîtan re ku li navend Anatolyayê di heman demê de dewleta pêşî ava kirine, yan xizm in, yan jî ji heman kokê tên. Em vê yekê ji zimanê pê diaxivin fêhm dikin. Ji ber ku ew jî bi zimanê koma zimanên Aryen dipeyivin. Divê em bi bîr bixin ku Şûpîlûlîûma yê Hîtîtî yê Heleb û Kargamêş fetih kir qîza xwe da prensê Mîtaniyan Matîzava û nameya ji wî re şandî

[59]Etîmolojî: Zanista li ser reh û rîşên peyv û gotinan lêkolînê dike.

[60]Etnolojî: Zanisteke mirovan li gorî nijad, kok, pêkhatin, belavbûna wan a li rûyê erdê, têkiliyên di navbera wan de û wan qiyas dike. Her weha rêûresm, ziman û çandên wan lêdikole. Civakên berê û îro mayî li ber hev digire. Çandên wan ên maddî û manewî bi amûrên etnografyayê rave dike.

jî belgeyeke girîng e. Ji hiyeroglîfên[61] li qesrên Misrê tê fêhmkirin ka çiqasî bi hêz in. Ji bo vê jî mirov dikare Nefertîtiyê weke mînak destnîşan bike. Ji ber ku bi serê xwe çarsed salan karîbûn Asûran di bin kontrola xwe de bigirin, ev yek jî hêza wan nîşan û piştrast dike. Em dikarin heman xusûsê ji bo Babîlan jî bibêjin. Em dibînin ku nivîsa bizmarî û hiyeroglîfî bi kar anîne. Hin mîmariyên xweser ên Mîtaniyan û seyîsên hespan ên bi navê 'Kîkulî' ji şopên wan ên di dîrokê de hiştin e. Şaristaniya duyemîn a girîng a bi koka xwe Hûrî divê were rohnîkirin.

Gelekî li cih û rast e ku mirov Hîtîtiyan jî daxilî vî nifşî bike. Berevajî ku tê gotin, Hîtîtî ji wan koman nînin ku di derbendan re, ji Qefkasan û rojhilatê Îranê hatine. Ji ber ku di nava çanda wan de şopên hûr ên ziman û çanda Hûriyan hene, em weke encam dikarin wan mîna komeke rêveberên esilzade yên Hûriyan destnîşan bikin. Xwedayên wan, wêjeya wan, têkiliyên wan ên dîplomatîk û bermahiyên ji qesrên Misrê nîşan didin ku ew jî fena Mîtaniyên li Anatolya Navîn bin. Çawa ku Mîtaniyan navendên Asûr kirin kontrola xwe, Hîtîtan jî di heman demê de dawî li dema kolonî ya Asûrê anîn, di heman demê de împaratoriya Hîtîtan di salên 1600-1250 B.Z. de ava kirin û dewam kirin. Fena ku li du herêmên mezin ên navendî rêveberiyên Hûrî ava kiribin, lê hê jî em rastiya vê baş nizan in. Ne tenê di warê xizimtî û ziman de, di her warê jiyanê de bi giranî dişibin hevdu. Xeleka wendabûyî di navbera herdu herêman a Mîtanî û Hîtîtan de ye. Ez yeqîn dikim ku lêkolîn çiqas xurt bibin ev yek jî wê zelal bibe. Di serî de Hattûşaş a ji dema Hîtîtan mayî û navendên wê yên girîng, xuya ye ku di hin pêşketinên şaristaniyê de rol lîstine. Cih û warên wan ên pîroz ji Zîggûratan bihurî ne. Perestgehên dînî, qesrên rêveberan, cihê mayîna xebatkaran û kewarên wan gelekî ji hev cihê û diyar bûne. Bircên wan ên fireh hene. Gelek bajarên bi vî rengî li herêmê têne dîtin. Li gorî wê demê ji aliyê eskerî ve dewleta herî pêşketî ye.

[61]Hiyeroglîf: Li Misra kevin nivîsa bi resman e. Piştî nivîsa bizmarî ya Sumeran e.

Li rojava ji bajarê navdar Troya (Yan Hîtîtiyan damezrandiye, yan jî hevgirtiyên wan ên nêz in, di koma heman çandê de şaristaniyeke xweser e), Ahiyevayên pêşî (Mirov vê komê weke komeke ketiye bin bandora Anatolyayê yan jî komeke Aryen a di salên 1800î B.Z. de koç kiriye bihesibîne wê rastir be. Dema ku mirov bibêje bi koka xwe ji bakur, ji Ewrûpayê ne, ev berevajî berê herikîna belavbûna şaristaniyê ye. Heman çewtî di mijara Hîtîtiyan de jî tê kirin) bi koka xwe ji nîvgirava Yewnan, li bakurê Antalyayê Aşkavayî, li bakurê wan Kaşkayî (yên ji Derya Reş) û li Çûkûrovayê Kilîkyayî (Gelê li Torosê, di heman demê de li gorî demeke dirêj Lûwî ne), li başûr bi rikeberên xwe yên navdar bi dewleta Firewnên Misrê re cîrantiyê dikin û danûstendina wan heye. Gelê li devera navendî, Hattiyên xweser in. Welatê xwe weke 'welatê hezar xwedayan' bi nav dikin. Ev yek ji hevrikiya di nava xwedayan de zêdetir girîngiya bi dostaniyê didin nîşan dide ango hevgirtina begtî û mîregan îfade dike. Di dîrokê de peymana yekemîn a nivîskî piştî şerê li Qadeşê, nêzî Çemê Asî û Hamayê di navbera Firewnê Misrê Ramsesê duyemîn û qralê Hîtîtan Hattûşîlî yê sêyemîn de hat mohrkirin ku yek ji bîranînên girîng ên dîrokê ye. Wer tê fêhmkirin ku bi şiklekî xwediyê meclîseke arîstokratan a bi navê Pankûşê ne. Mirov dikare şîrove bike ku pêşiyên begê Hatûşaşê bi şiklekî federasyoneke beg û mîran ava kirine.

Me gelek caran qala şaristaniya Misrê ya li keviyên rojhilatê Nîlê kir. Herçiqas derketina wê serbixwe xuya bike jî mirov dikare bibêje ku şopên nirxên çanda Aryen lê hene. Ango bi şiklekî din mînakeke Sumeran a dûr e. Dînamîkên hundir ên Nîlê û cîranên wê yên nêz ji bo şaristaniyeke nû çêkin li naverastê xuya nakin. Di vir de ya herî bi serê mirov bikeve ew e ku di encama koçberiyê de çanda Aryenî gihiştiye herêmê. Bêguman mezinahiya şaristaniya Misrê nayê guftûgokirin. Lê rastiyek e ku ji keviyên Nîlê wêdetir jî nikarîbûye belav bibe. Pirseke hêja ye, mirov bi pey bikeve ev e; çima ev şaristaniya evqasî mezin belav nebûye. Li keviyên Nîlê çandeke xweser a xwe bispêrê

xuya nake. Mîna ku mucîzeyeke ji ezmên hatibe. Na, eger wisa nîne, divê em rastiya qebîleyên Hîksos û Îbraniyan li ber çav bigirin û neçar gelek caran bibêjin ku çavkaniya wê şoreşa neolîtîk a li sîstema Toros-Zagrosan e.

Nivîsa hiyeroglîfî ji nivîsa bizmarî paşvemayîtir e, û ji bo pêşketinê li cih nîne. Bikêrhatina wê bi sînor e. Dibe ku mîmariya pîramîdan şahane be. Lê yek ji wan dînîtiyan e ku têra xwe keda koleyan daqurtandiye. Wexta ku mirov dabeşî demên cihê bike, dema qraliyeta kevin salên navbera 3000-2500î B.Z. digire. Ji gelek xanedaniyan re şahidî kiriye. Li nêzî erdên bi aluviyon li keviya Qahîreya îro çêbûye. Bi qebrên mezin ên pîramîdan tê naskirin. Di navbera salên 2050-1850 B.Z. de dema Qraltiya Navîn e. Di vê demê de perestgeh hatine avakirin, ango di vê demê de giraniya rahiban xuya dike. Di salên 1800î B.Z. de dagirkeriya Hîksosan mirov difikirîne. Rejîma Firewnên ti qewman nikarîbû bi wan, Hîksosan hilweşand û ev yek hêza rêxistinî û çanda li pişt Hîksosan nîşan dide. Bi qasî sedûpêncî salî Misr bi rê ve birine. Di salên 1600î B.Z. de dema Qraliyeta Nû bi Setê Yekemîn hat avakirin. Mîna Asûran dema vê avabûnê li pêşketina bazirganiyê rast tê. Dîsa weke Asûran li Mezopotamya Jêr derketina wan, dema qraliyeta nû li herî başûrê Nîlê li Karnakê pêşxist. Dema qebristanên cuda destpê kiriye. Tevî ku rahib bi hêz in jî êdî di dereceya duyemîn de ne.

Qebîleya Îbranî di vê demê de hatiye Misrê. Piştî Hîksosan salên 1600î tarîxeke li cih e. Tê texmînkirin ku piştî ku 300 salan dimînin dîsa di dawiya salên 1300î B.Z. de vedigerin. Qral Eknaton muhtemelen di salên 1400î B.Z. de cara pêşî dînê yek xwedayî îlan kir û bi vê yekê navdar e. Ji Hîtît û Mîtaniyan gelek keynikan weke bûk tîne qesrê. Mînakên qebrên wan nîşan didin ku bûne xwediyê mîmariyeke gelekî pêşketî. Di warê mîmariyê de ji Sumeran zêdetir bandor li şaristaniya Greko-Romen kirine. Şiklê wan ê dînî yê tevlîhev mîna kopiyeke Sumeran e. Rêûresma Îsîs-Orîsîs rêûresma Înanna-Enkî tîne bîra mirov. Rêûresma Amon-Ra jî nêzî sîstema Zîggûratên rahibên Sumeran e.

Ev pirs wê her tim were kirin: ji Misr û Sumerê kîjanê bandor li kîjanê kir? Di çêkirina kelekan de, di danîna stûnên bi kevir de, di çêkirina resmên li dîwaran de, di zanista salnameyê de, di bijîşkiyê de, di astrolojiyê de û di mûmyakirinê de gavên resen û orjîn ên Misrê hene. Eşkere, bi vê rê bandor li çanda Yewnan kiriye. Têkiliyên Misriyan bi Fenîkeyiyan re jî pêşketî bûn. Mîtanî û Hîtîtiyan jî li ser Sûrî û Filîstina îro xwe li hev rakişandibûn. B.Z. piştî salên 1000î ji başûr jî qewmên bi koka xwe Sûdan-Habeşî êrîşên xwe zêde kirin, di salên 670î B.Z. de jî bi êrîşên Asûran cara pêşî dikevin bin serweriya hêzeke derve. Li gorî rêzê di sala 525 B.Z. de Pers, di salên 333'an B.Z. de jî ketin bin rêveberî û dagirkeriya Skender. Ber bi Zayînê ve dema Kleopatraya bi koka xwe ji çanda Helen li hemberî Romayê têk çû qonaxa pêşî ya şaristaniya çar hezar salî bi dawî bû.

Ev şaristaniya ku herî kêm bi qasî Sumeran di dîrokê de gelek şop hiştine, sîstema koledariya klasîk bi halê xwe yê herî saf bihurandiye. Yekîtiya kole-efendî di ti şaristaniyê de bi vî rengî pêş neketiye. Ji bo koleyên li vê dinyayê rûyê rehetiyê hîç nedîtin, hisên dînî yên axiretê roleke xurt a rewakirinê bi cih anîn. Paradîgmayên axretê, cennet û cehennemê li vê qada xurt a şaristaniyê hatin vedîtin. Zewaca xuşk û birayan a Firewnan dibe ji rêûresma kevin a klanê hatibe yan jî ji hewcedariya bi mayîndetiya xanedanê jî pêk hatibe. Dînên Brahîmî bi îhtîmaleke mezin herî kêm bi qasî baweriyên dînî yên Sumer û Babîlan bandora xwe kirine. Hz. Mûsa ji çanda Misrê tê, pêşiyên wî Hz. Brahîm jî ji ber Nemrûtên Babîlan reviyaye, ev yek bandora xurt a herdu çandan û sentêza wan tîne hişê mirov. Mirov nikare dînên Brahîmî li derveyî bandora van herdu çandan bifikire. Bi halê xwe yê orjînal rejîma Firewnên Misrê sîstemeke herî nêzî 'kominîzma dewletê' ye.

Şaristaniya Ûrartûyan jî ji nifşê yekemîn ê şaristaniyan e. Bi têkoşîna Naîriyan ku timî bi Asûran re di nava nakokiyê de bûn, tê texmînkirin ku di salên 870î B.Z. de piştî dema dirêj a konfederasyonê cara pêşî ber sîstema qraliyeta navendî ve gav avêti-

ye. Naîrî bi maneya xelkê çem e, û heye ku Kurdên otantîk ên li ber devê Çemê Dîcleyê û şaxên wê îfade dike. Di kîtabeyên bi zimanê Asûrî de Qral Sardûrî (heye ku Serdar be jî) pesnê xwe dide ku di bin çavdêriya Xwedayê Mezin Xaldî de (Diyar e, Guda, Gudea û Got ji navê heman xwedayî tên. Li cem Semîtîkan Ellah çi be, di çanda Aryen de jî Guda ew e. Tê maneya xwe bi xwe çêbûye. Di Kurdî û Farisî de hînê li şûna Ellah weke Xweda tê bi karanîn.) her kesê derdikeve pêşiyê têk dibe, û ev yek mizgîniya meşa bi heybet dide ku wî ber bi qraliyeta navendî ve dibe. Wana îro weke navend hatiye hilbijartin. Ji ber ku ji qebîleya Wanîlîlî hatine navê Wanê maye. Navê din jî Tûşpa ye ku ji xwedayê rojê Teşûpa çêbûye. Li navendê gelek kelhe ava kirine. Ji qûntara çiyayên Zagrosê yên Rojhilatê Îranê heta keviyên Firatê yên rojava, li bakur ji geliyên Arasê heta herêmên Asûr ên li başûr û sînorê bakurê Sûrî serweriyeke navendî ya bi hêz ava kirin. Tê texmînkirin ku cara pêşî sîstema eyaletan ava kirine. Di dîrokê de ev rastî ji alî navendbûnê ve cara pêşî pêk hatiye. Sîstema wan a baweriyan pirr bi hêz di bin bandora Sumer û Asûran de ye. Nivîsa bizmarî bi kar anîne. Ji bilî zimanê Asûrî yê ji rêveberên Asûran girtine, zimanekî bi bermahiyên Hûriyan û ji qebîleyên ji Qefkasan koç dikin têkel zimanek pêk tê. Herçiqas baş neyê zanîn jî sîstemeke ziman a nêzî Ermenîkî çêdibe û ev gelekî xwezayî ye. Gotina 'Li Babîlê heftê û du ziman dihatin axaftin' têra xwe mirov difkirîne û rohnî dike.

Xusûsek heye ku dixwazim bi taybetî destnîşan bikim, ew jî ev e: zimanê qesrê her tim ji yên komên di bin destên wan de cuda bû. Hînê di sedsala derbasbûyî de li qesrên Ewrûpayê zimanên ti eleqeya xwe bi xelkê xwecîh ê herêmê re tinebûn dihatin axaftin. Mînak weke Elmanî û di demên berê de Latînî. Li Rojhilata Naverast zimanê Erebî demeke dirêj weke zimanê qesrê îtîbar û rûmetek xwe hebû. Zimanê Osmanî hema bibêjin bi qasî zimanekî biyanî ji Tirkî dûr e. Ingilîziya îro zimanê fermî yê bi dehan welatan e ku ti têkiliya xwe ya neteweyî, etnkîk û qewmî bi Ingilîzan re nînin. Li navenda qraliyeta Ûrartû jî diyar e,

heman pîvan û rêzik hene. Ji ber ku berê Asûrî dihat axaftin, mirov dikare vê rastiyê bibîne. Şaristaniya herî bi hêz a serdema hesin dihate hesibandin. Gelek sîleh, firaq, beroş û alavên ji têkeliya hesin û sifir heta roja me ya îro mane. Şaristaniya pêşî ye ku herî zêde hesin bi kar aniye. Têgihiştina bajêr, navend û eyaletan lê pêşketiye. Tevna rêyan, îşareta bi Rêya Qral dike. Hînê jî mirov dikare cihên ev rê têre derbas dibin ji hev derxîne. Qebrên qralan ên di zinaran de hatine çêkirin muhteşem in. Ji her gelê cîran karîbûne koleyan bidin hev, di avahkirina bajar û kelheyan de bixebitînin. Di çêkirina cihokên avê û golan de pêşketîne. Hêza bi tenê ye ku karîbû li hemberî Asûran li ser piyan bimîne. Bi qasî sê sed salan bi hev re şer kirin, lê vê yekê di heman demê de û ji aliyê heman hêzan ve di sala 615'an B.Z. de dawiya herduyan anî. Dîrokê li ser heman cografyayê li pêkhatineke siyasî ya bi heman rengî careke din şahidî nekir.

Împaratoriya Med-Pers di nava nifşê pêşî de ya herî dawî ye bi heybet derketiye. Medan şert û mercên pêngava destpêkê çêkirine. Gotina Med jî zêdetir ji çanda Yewnan maye. Dîroknas hemfikir in ku Med ji şaxekî xurt ê Aryen tê. Ji ber ku devera wê nebûye wargehê komeke din a etnîk, mirov dikare bibêje Med û Medya xwediyê çandeke otantîk in. Jixwe gotinên Med û Medyayê hînê jî ji bo heman deverê têne bikaranîn. Mirov dibîne ku di rêzeçiyayên Zagrosê de bi cih bûne. Mirov dikare koka wan bibe heta Gotî û Kassîtan. Dîsa fikreke hevpar e ku di çarçoyeya binavkirina giştî ya Hûriyan de ne. Mirov dikare bibêje ku ji wan eşîran in, herî zêde bi Asûran re şer kirine û êş kişandine. Dewletbûna wan jî ji nêz ve têkildarî vê berxwedanê ye. Sirra serketinê di konfederasyona eşîran de dibînin.

Di salên 715'an B.Z. de qebîleyên cara pêşî têne cem hev yekîtiyeke sist çêdikin. Wer tê fêhmkirin ku êrîş û zextên Asûr û Ûrartûyan kirine ku bi qebîleyên Skîtan ên ji Qefkasan (herhal rêûresmeke dîrokî ye) hatine, bikevin nava tifaq û nakokiyê. Pêşengî car caran dest diguhere. Piştî berxwedaneke bi qasî sê sed salan ajot Medan qesrên Ûrartûyan li derdora salên 615 B.Z., û

hema paşê jî paytexta Asûrê hilweşandin û bi vî awayî dawî li du şaristaniyên mezin ên Mezopotamyayê anîn. Li nêzî Hemedana îro ya Îranê Medan paytexteke bi navê Ekbatanê ava kir û tê gotin dora wê bi bircên heftrengî girtine. Li rojava sînorê firehkirine gîhandine heta Çemê Sor. Bi Frîgyayiyan re bûne cîran. Serweriya wan demeke kin ajot, di vê yekê de para têkiliyên qebîleyên xizmên nêz ên Persan heye. Bi xebat û hewldaneke mezin pêkhatineke siyasî ya li derdora sê sed salî ava kirin û dewam kirin, bi dekûdolabeke di nava qesrê de pirr bi lez û di demeke kin de dan destê Xanedaniya Axemenî ya Fars. Persekî bi navê Kîros ê ji qîzên wan çêbûyî, bi fermandarê eskerî yê qesrê Harpagos re li hev kir û bi darbeyeke eşkere ya di nava qesrê de pîremêrê Keya Astiyag ji text xist. Li hemberî vê bêbextiya rezîlane em ji Dîroka Herodot hîn dibin ku Keya Astiyag weha gotiye: ‘Rezîlo! Te ez ji text xistim, min ew fêhm kir, lê çima te desthilatdarî da destê bêjiyekî Pers? Qet nebûya tu li desthilatdariyê bimana. Te çima serwerî da destê Persan? Qet nebûya bila di destê Medan de bimana!’ Bi rastî, eger Herodot ev ji xwe re li hev çênekiribe; jixwe em neçar in pê bawer bibin, ji ber ku ew dîroknasekî pêşî ye, pirr digere û zana ye; ev rewş hebûna xisteleteke gelekî rezîl a hevkariya bi dijminan re ya Kurdan a berî hezarê salan nîşan dide.

Ez yeqîn dikim ku di dîrokê de hevkarê Kurd ê pêşî Enkîdo ye. Qralê Ûrûkê Gilgamêş wî ji daristanê tîne û ji bo dagirkirina deverên daristanî wî weke ajan-hevkarekî bi kar tîne. Di wan deman de deverên daristanî zêdetir wargehên proto-Kurdan in. Ango dîroka hevkariyê bi qasî ku bibe dabaşa destanan kevn e. Weke gelek caran bûyî dîsa ev hevkarî bi destê jinekê pêk hatiye! Enkîdo hevalên xwe û hewaya çiyê ya azad kiriye qurbanê şîrînî û şehweta xapînok a rahîbeyeke perestgehê. Çiqasî dişibe rojên me yên îro. Bi sedan Harpagos ji nava Tevgera Azadiya Gelê Kurd û PKKê derketin. Divê mirov baş zanibe, şexsiyeta îro ya Kurd a hevkar di dîrokê de çêbûye; ji bo jina xwe û malbata wî ya pênc peran nake ti nirx û buhayê nefiroşe tine; ji ber vê yekê

jî ji jiyaneke bi esalet, polîtîk, zanyarî, bi zewq (bi jiyana azad dibe) û manedar dûr e, ji lewra gelekî bi awayekî rezîl dijî.

Yewnanî (ez qala Yewnaniyên berê dikim, behsa van sosretên modern nakim), nemaze Heredot beşekî mezin ê dîroka xwe ji Medan re vediqetîne. Ez texmîn dikim ku yên ji çanda Hûriyan hatine hemûyan weke Medan bi nav dike. Ji meznahiya Medan re bi rêz û hurmet e. Persan di rêza duyemîn de dihesibîne. Wexta dibêje; li deverê çanda Medan serdest e, û ev çand ji Medan tê, mîna ku rastî dîtibe. Pers di wê demê de nû derketine ser dika dîrokê, bê nav in, û komeke çanda wan hejar e. Heybeta çanda Hûriyan ji peravên Egeyê heta Elamê, ji sînorên Qefkasan heta qesrên Misrê holan dide. Heredot jî bi awayekî mafdar vê rastiyê di dîroka xwe de rave dike.

Bi giştî di damezrandina pêşî ya tevahiya şaristaniyan de û di şaristaniya Sumeran de rola rahibên pêşî di avakirina xwedê û zêhniyeta nû de çi be, li heman deverê ji bo şaristaniya berê hatibû avakirin a Ûrartûyan û ji bo ya Med-Pers jî heman tişt e. Şaristaniya em behsa wê dikin ji aliyê rahibên bi navê Mag ên pêşengtiya Zerdeştî ne, hat damezrandin. Mag heye ku navek be an jî fîgureke sembolîk be. Bajarê wan ê pîroz li herêma Bradost a îro Muşasîr bû. Em dikarin şîrove bikin ku panteona xwedayên pêşî li wir hatiye avakirin û paşê ji wir derbasî Tûşpa û Ekbatanê, ji wir jî barkiriye Persepolîsê. Ji ber ku eger rêûresmeke dûrûdirêj a rahiban nebe, avakirina şaristaniyên ciddî zehmet e. Di çanda Yewnan de felsefe û fîlozofan, di şaristaniya Ewrûpayê de jî di dema Rohnîbûnê de rewşenbîr bi heman rolê rabûn. Li cem Semîtîkan şêxan û li cem Îbraniyan jî mirov pêxemberan di heman kategoriyê de bibîne wê hê bêtir zêhnê mirov veke û rê nîşan bide.

Zerdeşt û rahibên Mag di derketina Medan de rola wan girîng e. Lewma divê mirov rola wan a di vê pêvajoyê de baş zanibe. Ez yeqîn dikim ku damezrînerê vê baweriyê Zerdeşt û rahibên wî bi bawerî û exlaqê xwe bi qirêja şaristaniyê nelewitîbûn. Tê şîrovekirin ku bi pîrozkirina heywan, cotkarî û agir baweriya

Zerdeştî nirxên civaka neolîtîk di nava xwe de dihewîne. Zerdeştîtî ji vedîtina rahibên Sumer ê qral-xwedayên bi maske cuda ye. Hetta mirov dikare bibêje; berevajiyê wê ye. Li gorî vê baweriyê gerdûn bi qencî-xirabî, tarîtî-ronahiyê tijî ye. Di vê çarçoveyê de xwediyê têgihiştineke diyalektîk e. Rahibtiya Zerdeşt bi hewaya pak û azad a çiyê (di çanda Yewnan de jî çanda Xweda Dionysos e) bi tevahî bi şaristaniyê nebûye, destûra wê ya bingehîn exlaqê azad e. Ji çêkirina xwedê zêdetir, behsa pîrozbûna cotkarî û heywanan, û karektera mirovê azad dike. Di têkçûna Asûran û mezinbûna Med-Persan de roleke diyarker a vî exlaqî heye. Eger xwesteka wan a ji bo jiyana azad nebûya wê weke gelên din bi hêsayî êsîr biketana. Wexta ez dibêjim gelên din, ez behsa yên ketine bin bandora civaka şareza dikim.

Piştî mirina Kîros (di demên 559-529 B.Z. de), bi darbeyeke rahibên Medan a di sala 528'ê B.Z. de komeke bi eslê xwe Medî ya serwerî xistibû destê xwe bi hêsayî hat tesfiyekirin û bi vî awayî dema Darîûsê navdar (586-521 B.Z.) dest pê kir. Di nava demeke kin de piştî ku Babîl, Misr û bajarên Îon ên li peravên Egeyê şikestin, ji peravên Egeyê heta keviyên Pêncavê di dîrokê de împaratoriya herî mezin hat avakirin. Ji bilî Çînê mirov dikare bêje dinya şareza hemû di bin destê wan de bû. Bêguman ji çanda şaristaniyê ya Sumer, Asûr û Ûrartû gelek tişt girtibûn. Her weha xwe bi damara çanda azad a Aryen xwedî kiribû. Her weha ji çanda Skîtên navdar ên ji bakur hatibûn û hînê jî li rojhilat ji proto-Tirkan bi tesîr bûbûn û bi wan re di nava têkiliyê de bûn. Bi vî awayî gelek çand di nava xwe de sentez dikirin û mînakeke xweser di dîrokê de nîşan dida.

Împaratoriya Med-Persan nûnerê dawî yê nifşê yekemîn e ku herî zêde mezin bû. Lê bi rastî Med hem di rêza duyemîn de bûn, hem jî di nava artêşê de hêzên bingehîn bûn. Di vê yekê de têkiliyên xizmtiyê bi tesîr bûn. Împaratoriya Med-Persan di nava çanda şaristaniya nifşên yekemîn de bi qasî ku karibin sînorê xwe heta dawiyê firehkirin û gihiştin asta şaristaniyê. Îhtîşama wê ya li navendê (bermahiyên Persepolîsê hînê jî gelekî bi

heybet in), hêza navendên eyaletan weke şiklekî pêşî ê împaratoriya Romayê xuya dike. Bandoreke mezin e ku dinya Greko-Romen amade kir. Di dîrokê de piştî Ûrartûyan cara pêşî wan sîstema eyaletan danî. Hem bi sîstema xwe ya siyasî, hem jî bi rêyên xwe yên mezin ên çûnûhatinê û posteyê navdar e. Di dîrokê de rêya herî dirêj a tê zanîn Rêya Qral e: ji peravên Egeyê ji Sardê dest pê dike û li Persepolîsê diqede. Yekîneya muhafizên taybet û alaya nemiran navdar e. Artêşa wê xwe gihandiye hêzeke bi sed hezaran were îfadekirin. Di mîmariyê de pêş ketiye. Di baweriyên dînî û rîtuelan de karîbûye bibe xwediyê cihêwaziyan. Dînê esilzadeyan û dînê gel Mîtraîzm ji hev cihê bûne. Bi rêûresma qebîleyan rê li arîstokrasiyeke pêşketî hatiye vekirin. Qadên şaristaniyê ji yên beriya xwe hemûyan zêdetir pêşde birine. Cara pêşî ye karîbûn bi awayekî hosteyane gelek qebîle, eşîr, dîn, mezheb, ziman û çandan li bin banekî bînin cem hev. Li rojhilat şaristaniya dawî ya serdema destpêkê ye ku bi heybet e, û wer bala mirov dikişîne û rohniya wê li çavên mirov dixe, çavên mirov li ber dikuskusin. Li gorî şaristaniya Yewnan a klasîk ku nû pêş dikeve, ji her alî ve xwedî cihekî welê ye ku dana ber hev û qiyasê qebûl nake. Şagirtê Arîsto Skender, ya rastî li hemberî çanda Rojhilat bi kompleksekê diperpite û ji bo bibe xwediyê vê heybet û hebûnê natebite û ji bo vî welatê cîran di rola dagirkerekî hov de ye. Li hemberî Gotan împaratoriya Roma çi be, ji bo bê karên Yewnan û Makedonî, reîsên qebîle û qralokan jî împaratoriya Persan heman tişt e. Ji sedî sed ji aliyê dewlemendî, meznahî û heybetê ve ji Romayê kêm nîne. Eger em ji vî alî ve li dagirkeriya Skender binêrin, em ê dîrokê hînê rast û manedar şîrove bikin.

Em çend tiştên din li mijara pirsgirêkên qonax û belavbûna dema yekemîn a civaka şareza zêde bikin, em ê vê mijarê bi dawî bikin. Yek ji van pirsgirêkan jî ew e ka divê mirov di pêşketina civaka şareza de cihekî çawa bide qebîleya Îbraniyan. Gotina pêşî ya em bibêjin ev e; xisleteke Îbraniyan heye ku di navbera çand û zimanê Semîtîk û çand û zimanê Aryen de, dîsa di

navbera şaristaniya bi koka xwe Sumer û şaristaniya bi koka xwe Misrê de ji salên 1700î B.Z. ve heta roja me ya îro timî çûne û hatine. Di Pirtûka wan a Pîroz de navê Serûç, Ûrfa û Harranê bi xwe têne hildan. Weke warên pêşiyên Brahîm qala van deran tê kirin. Ji wir jî heta bi Misrê bi îhtîmaleke mezin li pey keriyên xwe çûne, wer xuya ye hinekî jî bi bazirganiyê re mijûl bûne. Baweriya wan di navbera Yahveh û ELLAH de diçe û tê. Ji bo di nava civaka şareza de nehelin li ber xwe didin. Têkiliya vê berxwedana wan bi baweriya wan a xwedê ya xweser heye. Xwediyê wê cihêwaziyê ne ku xwedayê qebîletiyê gelekî pêş xistine. Jiyana wan a bi dijberiya bi Brahîm li dijî Nemrût (qralên Babîlê) dest pê kir bi dijberiya Mûsa a li dijî Firewnan (qralên Misrê) dewam kir. Ji ber vê yekê li Filistînê têkoşîna wan a bi gelek xwedayên xwezayî û qebîleyan dewam kir. Di Pirtûka Pîroz de di vî warî de gelek çîrokên balkêş hene. Demeke dirêj bi pêşengiya rahibên bi koka xwe digihîjin Harûn birayê Mûsa (eger em bişibînin Sumeran weke qralokên pêşî yên rahiban e) xweseriya xwe dewam dikin.

Piştî dema rahibên pêşî yên bi Mûsa dest pê kir (di dawiya salên 1300î B.Z. de) û bi rahibê bi nave Samuel bi dawî bû, dema qraliya aliyê xwe yê polîtîk û eskerî xurt dest pê dike. Ev pêvajoya qralan ji salên 1020î B.Z. de bi Saul, Dawid, Silêman û yên din dewam dike. Li şûna qralên destpêkê yên xurt ên hejar û qels cih digirin. Qraliyeteke piçûk çêdikin. Di navbera qral û rahiban de timî nakokî hene. Bi sê çar partiyên bi hêzên derve girêdayî timî dijîn. Beşê wan ê hevkar û têkoşer di salên 720î B.Z. de bi berxwedana xwe ya li dijî Asûran têk diçin. Di sala 540î B.Z. de nefîkirina wan destpê dike. Piştî ku Persan dawî li serweriya Babîlan anî ew jî rizgar dibin. Ev rewş jî dişibe rewşa Cihûyên li Berlînê ku kengî artêşa Sovyetê ketibû Berlînê Cihûyên li wir sax mabûn rizgar bûbûn. Jixwe gelek çîrokên wan ên bi vî rengî hene. Di xwe li hevrakişandina Pers-Grekan de dîsa du partiyên hevkar çêdibin: Sadûkî û Ferisî. Paşê berxwedana li hemberî Romayê, nefîkirina yekemîn û duyemîn (B.Z. û P.Z. salên 70î) dest-

pê dikin; pêşî Misr û Anatolya, paşê li gorî rêzê li tevahiya deverên şaristaniyan belav dibin. Pers, Grek û di dorê de Roma heye.

Xilaskar û têkoşer Îsa derdikeve. Wî li çarmîxê dixin. Ji bo proleterên Romayê destpêka efsaneyekê ye, û dibe destpêka derketina dînê duyemîn ê Brahîmî. Serhatiya bi bela ya qebîleya piçûk a Îbraniyan bi şaristaniya Greko-Romen û Ewrûpayê re dewam bike. Ji beşekî mezin ê pêşengên xwe re gotinên nebî û rabbî bi maneya qasidê xwedê û efendî bi kar tînin. Bi vî awayî şecereyeke dirêj a pêxemberan didin destpêkirin. Îsa û Muhammed dibin pêxemberên dawî. Lê Mûsevî van pêxemberan qebûl nakin. Nakokiyên dînî bi pevçûnên siyasî dewam dikin. Dema nivîskaran bêhtir piştî serweriya Romayê dest pê dike. Heta roja me ya îro herî kêm bi qasî nifşên pêxemberan rêûresmeke xurt a nifşê nivîskar-rewşenbîran jî dewam dike. Gava berê ya piçûk a bazirganiyê, her çû di derketina kapîtalîzmê û serweriya fînans-kapîtal a roja me ya îro de rola sereke lîst û dilîze. Hejmara wan kêm e, lê bi qasî împaratoriyan bandora wan li ser dîroka şaristaniyê ya dinyayê heye. Mijara qebîleya Îbraniyan divê herî kêm bi qasî şaristaniyan bi nazenînî hûr bê kolan. Mîna ku di mijarên zanist, qanûn û pereyan de împarator bin. Heman rola wan bi qasî di dîrokê de îro jî bi aliyên xwe yên balkêş hemûyan dewam dike. Çîroka min a şexsî jî hinekî dişibe ya vê qebîleyê. Ez jî mîna Brahîm ji Serûç a Ûrfayê derketim. Têkoşeriya me mîna Îsa bi alîkariya qralên sîstemê di çarmîxeke cuda de dewam dike. Qralên sîstemê ji bo Îsa qral Yehûda bû, ji bo min jî hevkariya MOSSAD-DYE ye.

Pirsgirêkeke din jî êrîşên ji bakur ên Skîtan e. Van êrîşên ku di salên 800î B.Z. de xwe nîşan dan, ji qebîleyên bi koka xwe Qafqasî hatin. Ev qebîleyên ku ji nava Ewrûpayê heta hundirê Asyayê, ji deştên başûrê Rûsyayê heta Mezopotamyayê li her deverê belav bûn, ji ber ku ji çandê zêdetir bi hêza xwe radibûn li dawiya xwe zêde şop nehiştin. Lê belê weke qebîleya Îbraniyan di damezrandin û hilweşandina gelek împaratoriyan de rola wan heye. Mirov fêhm dike ku weke eskerên xizmetê

dikin û jinên qesran rol lîstine. Ev rol heta împaratoriya Osmanî û heta Komara Tirkiyê jî dewam dike. Lê diyar e bi qasî Îbraniyan nikarîbûne xwe biparêzin. Weke rengekî nijadî tehm û rengekî didin çandan û dikarin rê li xweşikbûnê vekin. Dibe ku helwesteke wan a egîdane jî hebe. Di civaka şaristaniya nifşê yekemîn de yek ji mijara divê baş were hûrkolan mijara Skîtan û yên weke wan in.

Di pêkhatina sîstemên dîrokî de mirov dikare têgîna navend-hawîrdorê weke feraziyeyekê bi kar bîne. Wexta mijar navenda şaristaniyan be, pirsa li hawîrdorê çi diqewime girîng dibe. Di dîrokê de wexta cara pêşî navendên şaristaniya Sumer, Misr û Çînê çêbûn, ji bo Sumer û Misriyan hêzên hawîrdorê qebîleyên Semîtîk Aramît û Apîrû bûn; ji bo Çîniyan jî proto-Tirk Hûn bûn; ji bo Romayiyan jî Got bûn. Ev eşîrên ji qonaxa barbariyê bihurîne, kengî serekên wan hîn bûn sîlehên şaristaniyê bi kar bînin û bi dest bixin, timî şerekî mîna yê gerîlla yê 'êrîş bike û xwe biparêze' meşandine. Çarenûsa wan ew e ku yan di nava şaristaniyên serdest de bihelin, yan jî şaristaniyeke bi heman rengî li hawîrdorê ava bikin. Mînak Amorîtan hingî êrîş birin ser Aqadan ew jî bûn xanedan û dewlet ava kirin. Îbranî jî bi awayê ji Misriyan hîn bûbûn qraliyeta xwe ya serbixwe ava kirin. Yek ji tevgera herî bi hêz a hawîrdorê ku dîrokê nas kir, Hûn bûn, lê hem li Çînê, hem li Ewrûpayê û heta li Îranê nikarîbûn xwe ji helandinê xilas bikin. Serekên wan ên qebîleyan bi giştî li navenda çanda şaristaniyan weke şefên rêveber man û heliyan, ezbetên qebîlê yên xizan jî demeke dirêj marjînal jiyan yan jî heman pozîsyon bi serekên nû yên dîtin ceribandin. Gotan timî êrîş birin ser Romayê û bi vî awayî hîmên mîrtiyên Elman danîn. Carnan jî taca Romayê dan serê xwe. Di dîrokê de mînakeke manedar heye; serekên qebîleyên Moxol û Oxûz ên di nava damezrînerên pêşî yên xanedanên Osmaniyan de cih girtin bi çavên şaristaniya Bîzansê bi tevahî hêzeke hawîrdorê bûn, lê di têkoşîna sedan salan a navend û hawîrdorê de navend bi destxistin û ew êdî hêzeke hawîrdorê nebûn.

Skîtî jî nemaze ji bo navendên şaristaniyê yên nifşa yekemîn, bi giştî weke hêza bakur û bi taybetî û giranî jî weke hêza Qefkasan a hawîrdorê rol lîstine. Kengî şaristanî nas kirin û bi sîlehên wan xwe bi sîleh kirin bûn hêzeke dijwar a êrîşê. Tê texmînkirin ku di navbera salên 800-500 B.Z. de gelekî çalak bûne. Tevî ku weke eskerên bi peran û weke xizmetkarên qesrê gelekî rol lîstine jî nikarîbûne ji bo xwe navendên şaristaniyê yên girîng damezrînin, û piraniya wan di dawiyê de nikarîbûne xwe ji helandinê xilas bikin.

**b-** Di çanda Çîn, Hind û Çermesoran de pêşketin

Çandên Çîn, Hind û Çemesorên Emerîkayê sîstemên şaristaniyê yên xweser in. Eger em bi kurtî çav li pêşketinên di van çandên xweser de bigerînin, bawer dikim ku em ê gelekî ji wan hîn bibin.

Weke berê jî me behsa Çînê kiribû; bi dawîbûna dema qeşayî ya dawî re komên mirovan ji Başûr-Rojhilatê Sibîryayê ji salên 10.000 B.Z. ve ber bi başûr ve belav bûn. Li vê herêma ku komên mirovan bi cih bûn jêre Çîn tê gotin. Erdên bi bereket ên li keviyên çeman û deryayê, rengîniya nebatan û celebên zêde yên heywanan hem ji bo çanda neolîtîkê û hem jî ji bo şaristaniya bajaran şert û mercên baş pêşkêş dikin. Em di salên 4000î B.Z. de şoreşeke neolîtîk a Çînê dibînin. Di vir de pirsa girîng ew e ku gelo ev şoreşa çanda neolîtîk çiqas xweser e, çi qas jî di encama belavbûna çanda Aryenîk de bi tesîr bûye. Çanda neolîtîk a Aryen berî ya Çînê bi şeş hezar salan çêbûye, lewra em difikirin ku çanda Aryen bandora xwe li Çînê kiribe. Hînê jî gelekî girîng e ku çanda Aryen çiqasî diyarker e. Dîrok nîşan dide ku şoreşên mezin ên çandî bi hêsanî pêk nayên û ji bo vê yekê şert û mercên xweser û demdirêj divên. Li gorî texmîna min sosyalîzm û kapîtalîzma Çînê ya îro çiqasî orjînal û navmalî ne, şaristanî û neolîtîka Çînê jî ewqasî xweser in, û mohra navmalê li wan heye. Bila şaş neyê fêhmkirin, ez hîç guman nakim ku kapîtalîzma herî zêde tê gotin navmalî û millî ye, ji derve hatiye. Ji bo Çînê jî ev xusûs welê ye. Em dikarin şîrove bikin ku neolîtîka Çînê paşê li Vîetnam û li nîvgira-

va Hindûçînê, li giravên Îndonezya û Japonyayê, û nîvgirava Koryayê belav bû ku em dikarin bibêjin ev bûyer hemû berî 4000 salan B.Z. neqewimîne. Ji bo şaristaniya koledar a Çînê salên li derdora 1500î B.Z. weke destpêkê têne qebûlkirin. Ez dikarim bibêjim ku di vê demê de împaratoriya mezin a pêşî ya navendî hat avakirin. Bi gelek muqedesatan barkirî bû û mîna Ûrûka Çînê bû. Em di salên 1000î B.Z. de mîna Sumer û Misriyan, dibînin ku piştî damezrandinê belav û berfireh dibe. Di vê dema duyemîn de gelek dewletên bajaran têne avakirin û mîna Sumeran a di dema Ûr de gelek bajar di nav rikberiyekê de ne, û ji bo vê yekê şer diqewimin. Di dema sêyemîn de (B.Z. 250-P.Z. 250) xanedaniyên navendî ji nû ve bi hêz dibin. Di qonaxa feodaliyê de giraniya xanedaniyên navendî zêde dibe. Mumkîn e ku xwecihî yan jî biyanî bin. Ev xanedaniyên navendî heta serê salên bîstî jî bi awayekî hişk hebûna xwe dewam kirin. Di vê demê de em dibînin ku şaristaniya Çînê ji salên 500î P.Z. li Hindûçîn, giravên Japonyayê û li Asya Navîn di nava Moxol û Proto-Tirkan de belav dibe.

Ji vedîtina xweda ya mîna rahibên Sumeran wêdetir, di çanda Çînê de şîroveya gerdûnê ya zanyaran balkêş e. Şîrove û têgihiştina wan a li xweza û gerdûnê hînê zêdetir zanistî ye. Gerdûnê weke hebûneke zindî difikirin. Mirov dikare ji ravekirina wan a enerjiyê hîn bibe. Mirov bi giştî ji manewiyata Çînê re dikare bibêje; 'Taoîzm'. Mirov dikare navê zanyartî jî lê bike. Konfuçyûs ê di salên 500î B.Z. de jiya, bêhtir hewl dide rêzik û exlaqê nîzama bajar û dewleta şareza bike têgîn. Bawer dike ku rêvebirina civaka dewletê ji qanûnên fermî zêdetir divê xwe bispêre pîvanên exlaqî yên tekûz û vê têgihiştinê pêşde dibe. Di dema Zerdeşt û Sokrates de jiya û bi qasî wan li civaka şareza ya di navê de bandor kir. Ev hersê zanyarên mezin zêdetir behsa exlaqê mezin û fazîletê dikin. Ew zanyar û parêzvanên exlaqê mezin in.

Çîniyan di şaristaniya maddî de gelek gavên girîng avêtin. Di warê pêşketina îndustriyel de gelekî berî Rojava pêşketibûn. Wan barûd, kaxiz û çapxane dîtin. Di bazirganiyê de li seriyê din yê li rojhilat cih digirin û ji vê derê jî rêya dîrokî

Rêya Hevrişim destpê dike. Di sedsalên destpêkê yên B.Z. û P.Z. de têkiliyên xwe bi şaristaniyên Rojhilata Naverast re zêde ne. Di nîvê sedsala 19. de li kapîtalîzmê vedibe. Di roja me ya îro de weke dêwekî mezin dibe û meraq tê kirin ka wê weke Levîathanekî nû çi bike û çawa tevbigere.

Em li Hindistanê pêşketineke neolîtîk a demdirêj a xwecihî dibînin. Tê texmînkirin ku berî têkiliyên wan ên pêşî bi Aryenan re weke Pigmeyên reş ên dema klanên destpêkê jiyane. Ketina Aryenan a pêşî ya Hindistanê di salên 2000-1500î B.Z. de ye. Şoreşa neolîtîk bi vê ketinê re têkildar e. Ji vê şoreşê re û ji şoreşa şaristaniyê ya di salên 1000î B.Z. de yên pêşengtî kirin weke di dema Sumeran de li vir jî dîsa rahib bûn. Ji vê tebeyê re herweha weke ku bi nav û deng bûn tê gotin Rahibên Brahman. Pirtûkên wan ên pîroz ên bingehîn Vedayên ku ji salên 1500î B.Z. mayî ne. Veda bi awayekî weke versiyona Hindî ya Pirtûka Pîroz a Îbraniyan e. Lê belê gelekî dirêj û tevlîhev e. Li ser hîmê xwedayetiyê çawa tebeqeya rahiban tê avakirin bi çîrokbêjiyê tê gotin. Xemsariyê nakin, her weha wê dikin destanek. Dibin hîmê rejîma kast ê. Xwediyên hêza eskerî-siyasî ‘Raca’ di salên 1000î B.Z. de diyar dibin. Bi Brahmanan re dikevin nava şerekî dijwar. Di encamê de weke li cem gelek şaristaniyan hatiye dîtin herdu jî dibin xwediyên nû yên dewletê. Dibin hêza duyemîn a kastê. Weke li Çînê li Hindistanê jî devê derya û çeman ji cotkariyê re baş in. Bajar zêdetir di salên 1000î B.Z. de pirr dibin, paşê perestgeh û qesrên mezin xwe nîşan didin. Cotkarî gelekî pêşketiye û ji lewra cotkar û pîşesaz tebeqeya sêyemîn a kastê pêk tînin. Di tebeqeya herî jêr de Parya hene ku bi çavekî ji heywanan jî xirabtir li wan dinêrin. Destdana wan û bi wan bûn jî guneh tê hesibandin.

Hindî teolojiyeke gelekî rengîn çêdikin. Bi qasî xwedayên mezin, gelek hebûnên xwedayî yên neyên jimartin jî li hev çêdikin. Ya rastî gelek bandorên hûr ên Sumeran xuya dikin. Rengên wan ên mejiyê mirovan tevlîhev dikin ji kêmasiya qabîliyeta wan a sentêzê ye, û ji ber ku çavkaniya wan derve ye.

Weke ku di tevahiya şaristaniyên girîng de tê dîtin (li Çînê Konfuçyûs,[62] li cem Grekan Sokrates,[63] li cem Medan jî Zerdeşt) di salên 500î B.Z. de li Hindistanê jî reformkerê mezin ê dîn Bûda derdikeve û dijî. Bûda xwe naspêre xwedayan, bi reforma xwe ya dispêre exlaq navdar e. Êş û elemên di civakê û xwezayê de dibîne û dixwaze vê bi têgihiştineke metafizîk bidebirîne. Bûdîzm têgihiştin û doktrîneke ji şaristaniyê nerazî û xwedî karektereke hawîrdorparêz e. Li Çîn, Hindûçîn û Japonyayê zemînê belavbûnê dibîne. Têgihiştinek e ku divê mirov ji alî metafizîka exlaq ve bi girîngî li ser rawest e. Doktrîneke xwedî tevgereke bi hêz e, rejîma li xwe guhdarîkirin, kontrolkirin û islahkirinê ye. Wekî din reformkeriya xwedê ya bi navê 'Krîşna' heye. Li dijî kulta Zeûs (zêdetir qonaxa destpêkê ya qraltiyê sembolîze dike) dişibe kulta Dionysos. Di Bûdîzmê de bandorên xurt ên çanda neolîtîkê hene. Bi jiyana çiyê, geroktî û çîrokên eşqê yên alayên jinên azad barkiriye. Ya rastî, têgihiştineke exlaqî ye ku qîmet û buhayekî mezin dide xwesteka ji bo jiyana azad. Di heman demê de li beramberî xwedaparêziya Hindan a li dijî metafizîkiya zêde ya bi meyla materyalîst barkirî, cihêbûna mezin û zêde ya jiyanan û aloziya civakî nîşan dide.

Şaristaniya Hindê piştî dagirkeriya Pers û Skender navendî dibe. Racayên li kesî guhdarî nakin û zêde bûne di salên 300î B.Z. de împarator Maşoka wan cara pêşî bi awayekî esasî navendî dike. Dişibe têkiliya împaratoriya navendî ya Pers-Med bi reform-

[62]Konfuçyûs: B.Z. di salên 551'ê de li Çînê li gundê Tsûyê tê dinê. Di sedsala wî de koletî gihiştiye astekê mirov nikarin xwe lê ragirin. Exlaqê civakî têra xwe riziyayî û dejenere bûye. Ji lewra Konfuçyus bi qasî sêzdeh salan ji gundê xwe derdikeve, digere û heta fikrên wî distewin. Di sala 479 B.Z. de wefat kir.

[63]Sokrates: Zanyarekî Yewnanî ye. Di navbera salên 469-399 B.Z. de jiyaye. Sokrates bi dijwarî sofîst û demagogan rexne dike û ji bo rêvebirina dewletê bawer dike ku divê mirovên bi exlaqên bêne gihandin. Sokrates bi têgihiştina xwe ya navdar 'xwe nas bike' rabûye û rêveberên dewletê ji ber vê lê hatine xezebê. Bi bahaneya ku exlaqê ciwanan xira dike cezayê darvekirinê lê dibirrin. Herçend şagirtên wî revê jêre pêşniyar dikin jî ew jehrê dixwe û darvekirinê bi destê xwe pêk tîne. Herçend Sokrates belgeyên nivîskî zêde li pey xwe nehiştibe jî şagirtên wî nexasim Platon fikrên mamosteyê xwe bi xebatên xwe belav kirine.

keriya dîn a Zerdeşt, Maşoka yê reforma dîn a Bûda qebûl kiriye jî di vê hewldana xwe de bi ser dikeve. Lê paşê bi qasî Çînê nikare serketina xwe dewam bike. Jiyana aloz û beredayî ya racayên Hindistanê hebûna xwe dewam kir. Di salên 1000î P.Z. de ji aliyê dewletên Misilman ve hat dagirkirin. Di serê salên 1500î P.Z. de ji aliyê împaratoriyên misilman ên bi koka Moxol careke din li rêveberiye navendî vedigere. Pêşketineke şaristaniyê ya berçav çêdibe. Belavbûna dewam dike. Ji salên 1500î û pêve ketina nava wê ya xwe dispêre kapîtalîzmê di nîvê sedsala 19. de bi mêtingeriya kapîtalîzma Ingilîzan ket qonaxeke nû. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bû dewleteke serbixwe. Herçend ji du seriyên xwe yê bakur-rojhilat û bakur-rojava du deverên bi navê Pakistan û Bangladeşê ji dest bide jî ji qûntarên Hîmalayan bi çem û peravên tevahiya nîvgiravê zevt dike, îro jî tevî aloziyên xwe gişan neçar e dewlemendiya xwe ya çandî bi şaristaniya kapîtalîst biteamîne û dewam bike. Di rewşeke tijî pêkhatinên bi nakok û kaotîk de dînên rengareng, ji huner û exlaqê bigirin heta pêkhatinên polîtîk û zimanên cihê, wexta bi demokrasiyê jî hevdu nas bikin, heye ku ji cinawirekî pirrserî veguhere Levîathanekî xurt û bi qasî Çînê jî meraqa wê tê kirin ka ev cinawir ê bandoreke çawa li dinyayê bike.

Japonya, Endonezya, Vîetnam, Korya û welatên din ên mîna wan bi koka xwe ji çanda sereke ya Çînê tên, pêşketinên wan jî bi heman karekter û awayî ye. Di rewşeke welê de ne ku pêşketina şaristaniya sereke dişopînin û wê belav dikin. Ji bo mijara me ev yek ne hewceyî bi lêkolîneke cihê ye.

Belavbûna şaristaniyê li parzemîna Emerîkayê xwedî du qonax e. Tê texmînkirin ku di qonaxa yekemîn de komên Çermsor di salên 7000î B.Z. de di tengava Beringenê re pêşî li Bakur, paşê jî li Başûrê Emerîkayê belav bûne. Tevî ku di vî warî de şîroveyên cihê yên dîrokî hene jî ya herî aqilane belavbûna piştî dema qaşayî ye. Ew jî di vê demê de çêbûye. Tê texmînkirin ku di salên 3000î B.Z. de gavavêtine şoreşa neolîtîkê û di salên 500 P.Z. de jî gavavêtine şaristaniyê. Li Rojhilat ango Başûrê Eme-

rîkayê ji Meksîkayê heta Şîliyê şaristaniyên pêşî yên bi navê Aztek, Maya û Înkayan pêk hatin. Ev şaristaniyên ku dişibin şaristaniya Ûrûk a di demên pêşî yên Sumeran de, hînê nikarîbûn bajarên mezin ava bikin û hejmarên wan zêde bikin tefiyan. Tê texmînkirin ku di vê yekê de zêdetir şert û mercên cografîk û rewşa av, bahewayê bi tesîr bûye. Kengî Ewrûpî gihiştin parzemîna Emerîkayê jî hebûna xwe hînê bi awayekî tefiyayî be jî dewam dikirin. Bermahiyên perestgeh û avahiyên bajarên wan ên xurt balê dikişînin. Eger li parzemînê bi tevahî belav bûbûna belkî derfet û îmkanê xwe gihandina qonaxeke hînê jorê bi dest xista. Belkî gelek navend ava bikira û bigihişta sîstemeke navendî. Di van hewldanên avakirina şaristaniyan de mirov beriya her tiştî giraniya rahiban dibîne. Ji lewra mirov dikare ji van şaristaniyan re bibêje; şaristaniyên rahiban. Çawa ku di gelek şaristaniyan de mirovan ji xwedê re dikin qurban, di vê şaristaniyê de jî qurbankirina ciwanan xeternak e. Tevî ku hin îşaretên wan ên dişibin nivîsê hene jî nivîs pêş neketiye. Di warê salnameyê de têgihiştina wan xurt e. Hin cureyên nebat û heywanan diyarî şaristaniya giştî kirine. Bakurê Emerîkayê di vê demê de negihiştiye şaristaniyê û nas nekiriye.

Li parzemîna Emerîkayê şaristaniya mezin bi awayekî esasî di sedsala 16'an P.Z. de bi tevgerên keşfê, dagirkerî û mêtingeriyê destpêkir. Di sedsala 19'an de weke şaristaniya kapîtalîzmê ya nû kapîtalîzm bi dewletên netewe qaşo dabeşî welatên serbixwe bû, li Bakurê Emerîkayê DYE'yê hat damezrandin, tevlî sîstema şaristaniya dinyayê bû û pêre bû yek. Ji ber ku DYE'yê berê ti şaristanî nas nekiribûn pirr bi lez kapîtalîzm xist hinavê xwe û pêre bû yek. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn DYE'yê weke hêza hegemon a sîstemê gav avêt û hebûna xwe dewam kir. Li dijî şaristaniya kapîtalîst a Başûrê Emerîkayê, Ewrûpa û DYE'yê, gera li modeleke nû ya welatên weke Kuba, Venezûella û Bolîvyayê di roja me ya îro de jî bi heyecan dewam dike.

Levîathanê dêw ê roja me ya îro Ewrûpa di dema yekemîn de ya para wê dikeve ew e ku çanda neolîtîkê bi sazî bike. Dema

belavbûna împaratoriya Romayê di salên 100î P.Z. de ji bilî çend eskergehên Romayan navê şaristaniya Ewrûpayê jî tinebû. Skît, Hûn, Got, Kelt, Nordîk û hînê gelek qebîleyên din ên bi koçberî tên û şer dikin hene. Tevî pêşketina gund û cotkariyê ji kanên madenê pirr kêm be jî maden tê derxistin û bazirganiya wê tê kirin. Em çanda Yewnan û Romayê ji vê pêvajoyê cihê digirin. Em ê tenê du seriyên rojava yên xwe digihînin şaristaniya Rojhilata Naverast bi sernavekî nû analîz bikin.

Ji wexta mirov dest bi meşê kir, di destê wî de amûr li qût û zad geriya, ji sembolan gihişt zimanê bi deng li herêmên çanda bi kok a Efrîkayê dilsoziya bi çanda bi kok a demdirêj re hînê dewam dike. Wexta şaristaniya Misrê ji Sûdanê wêdetir nedihat naskirin, di serdema destpêkê de şaristaniya Xirîstaniyê tenê li guhereke Hebeşîstanê xwe girtibû, Erebên Semîtîk ên bi şaristaniya Îslamê gavên mezin avêtin bakurê parzemînê dagirkirin û kirin îslamî, di sedsala 19'an de ji her alî ve ji aliyê şaristaniya kapîtalîst a Ewrûpayê ve dor lê hat girtin. Efrîkaya ku şaristaniyan ji ber bunya xwe ya hundirîn bi zehmetî qebûl dike di roja me ya îro de bi sedema kaosa heyî, hebûna çandên cihê û qonaxên cihê yên şaristaniyan bi temamî bûye mîna şorbê yan jî çeqilmast. Bi fikar, bi meraq û bi hêvî çawa hinekî çav li ser Rojhilata Naverast û mînaka Başûrê Emerîkayê be, bi heman awayî jî çav li ser Efrîkayê ye ka gelo bi şaristanî yan jî modernîteyekê, bi jiyaneke azad re çawa dikare bibe yek.

**c-** Şaristaniya Bi Koka xwe Greko-Romen û Pirsigirêkên Wê Yên ê Belavbûnê

Em wexta belavbûna şaristaniya bi koka xwe Misr û Sumerê bi hev re lêbikolin divê kes loma neke. Herdu jî şaristaniyên kok têne pejirandin. Di dîroka mirovatiyê de cara pêşî bi awayekî bandorê li hev bikin derketine û pêşketine. Di dema belavbûnê de jî ji nêz ve bandorê li hev dikin. Sedema yekîtiya wan ew e ku herdu jî weke kok ji Rojhilata Naverast in. Ji ber xisletên karekterîstîk ên herêmê hînê ji dema derketinê di zikhev de mezin dibin. Me dît herdu jî di vedîtinên pêşî de xwedî rol in. Kes nikare înkar bi-

ke ku belavbûnên piştî herdu şaristaniyan bi şêwe û naverokên wan pêk nehatine. Bi tevahî yek bi yek wekhev nebin jî di warê kokê de yek in. Bêyî Sumer û Misrê em nikarin ti şaristaniyeke din têra xwe analîz bikin, em bikin jî wê kêm bimîne. Weke ku di şaristaniya kapîtalîzmê de, modela şaristaniya koledar a pêşî ya esas li cem Sumeran e, û di rêza duyemîn de çawa di mînaka Misrê de tê dîtin bi guhertinên gelekî hindik dubare û belav dibe. Ka çi hikmet e, civaknas û dîroknas bêyî vê têkiliya nazik deynin şîroveyên xwe her dubare dikin. Em jî ji bo van têgihiştinên klîşe hilweşînin bi israr vê nuqteyê destnîşan dikin.

Di belavbûna vê modela pêşî de zehmetiyên em bi wan re rûbirû dibin me anîn ziman. Ya yekemîn ew e ku asta bandora Sumer û Misrê li hev kiriye. Ev mijarek e ku divê were rohnîkirin. Ya duyemîn, şaristaniya Med-Persan e ku şaristaniyek e, cara pêşî li derveyî Mezopotamyayê ava bûye, û gelo divê em wê weke şaristaniyeke cihê ya bi kok bihesibînin an na. Tê zanîn ku gelek kategoriyên xwe yên bingehîn ji Sumeran û dewamên wê Babîl, Asûr û Ûrartûyan girtine. Lê bi dîrokê sabit e ku reformên mezin kirine. Şoreşa exlaqî ya Zerdeştî ku nêzî exlaqê azadiyê ye, sîstema navend-eyaletan, û nîzama wan a artêşê ji wan reforman ên sereke ne. Lewma em neçar man weke xelekeke cuda û girîng di navbera şaristaniya Greko-Romen û şaristaniya Misr-Sumerê de şîrove bikin. Bi têgihiştineke rast a dîrokî, ev cudatî û girîngî di çareserkirina meseleyên qonaxên şaristaniyan de roleke kilît dilîzin. Naxwe em nikarin şaristaniya Greko-Romen rast analîz bikin yan jî em ê bi xisletên mûcîzevî îfade bikin û bi şîroveyên nezanistî em ê mijarê tevlîhevtir bikin.

Ya sêyemîn, pirsên der barê koka şaristaniya Çîn û Hindistanê de ne. Me destnîşan kir ku divê xweseriya van şaristaniyan bi pareke îhtiyatî li ber çav were girtin. Nêzîkbûneke bi vî rengî wê firsendê bide me ji bo em karibin cudatî û wekheviyên di navbera şaristaniyan de rast şîrove bikin.

Şaristaniyên Başûrê Emerîkayê weke ku têne gotin xweser bin, dîsa şaristaniyên Harappa û Mohanjadaro jî xweser bin, şîroveya

herî rast ew e ku mirov bibêje; hînê qonaxa bajarên pêşî yanî şêweyê Ûrûkê nebihurandine û vemirîne. Divê em bînin ziman ku li Efrîka, Ewrûpa (Greko-Romen ne têde) û heta Awûstûralyayê di gelek belavbûnên piştre de şaristanî pêş ketiye, Emerîka jî di navê de weke esas li ser hîmê kapîtalîzmê bûye xwedî şaristanî, şaristaniya Îslamî jî berê û di vê qonaxê de jî di şaristaniya van herêman de rol lîstiye. Bi vê kurtepêşekê em niha dikarin şaristaniya Greko-Romen rast bi nav bikin û belavbûna wê baştir şîrove bikin.

Bêguman şaristaniya Greko-Romen ji mînaka Med-Persê gelekî li pêş xwedî xweseriyekê ye. Lê mirov belavbûna berfireh a şaristaniyên piştî Sumer û Misrê yên Asûr, Mîtanî, Hîtît, Ûrartû û Med-Persan li ber çavan negire û xisletên wan ên karekterîstîk nehesibîne, û îddîa bike ku vê xweseriyê hema di nava şertên nîvgiravê de zîl daye û derketiye, ev yekê ji korfêhmiyeke dîrokî û berevajîkirinê bêhtir tiştek nebe. Vedîtinên di destê me de hemû, kategoriyên zêhniyetê, pêşketinên dînî, exlaqî, felsefî, hunerî, polîtîk, aborî û zanistî tev di pêvajoyên derketin, pêşketin, şer û nakokiyên şaristaniyên navbihurî de pêk hatine. Ji pêvajoya bi sazîbûna civaka neolîtîk ji wan re mîrateyeke mezin maye. Me hewl da em çîroka vê bibêjin. Nemaze jî desteserkirin, dizî, piştperdekirin û hewldanên vedîtina rewakirinê ya beşê rêveberan me piştguh nekir û em ji nedîtî ve nehatin.

Rohnîbûn û zanista Ewrûpayê demeke dirêj mîna ku haya wê ji vê rastiyê nebe xwe nîşan da. Kokên xwe gihandin Ronesansa xwe dispêre çanda Yewnan û Romayê, lê bi israr anî ziman ku pirraniya vedîtanan ê wê ne. Ji lewra jî ji binavkirina şaş a şaristaniya Greko-Romen jî berpirsiyar e.

Dîroka Herodot[64] bi tenê jî were xwendin, zehmet nîne ku mirov bi giranî çavkaniya çanda Yewnan keşif bike. Bi tevahî belgeyên dîrokî yên di dest de hene nîşan didin ku ji salên 5000î B.Z. ve çand û zimanê Hind-Ewrûpî (Aryen) ketiye nîvgirava

[64]Heredot: Dîroknasekî Yewnanî ye. Di sedsala pêncan B.Z. de jiyaye. Weke sermamosteyê dîrokê tê qebûlkirin. Der barê dîroka Med û Yewnan de agahiyên girîng dide. Nexasim di çarçoveya dîroka Medan de agahiyên girîng li ser jiyana rojhilat dide.

Grek û şoreşa neolîtîkê pêk hatiye. Ji bo xwendineke rast a dîrokê girîng e mirov çavkaniya vê qonaxê ji nedîtî ve neyê. Em dikarin şîrove bikin ku ji salên 1800î B.Z. pêlên koçberiyê yên nû vedîtinên şaristaniyê bi xwe re belavkirine. Cara pêşî di salên 1400î B.Z. de bajarên mîna yên Ûrûkê ava dikin. Ev qonax û pêvajo ji sê aliyan ve destekê û modelê digire. Bi giranî ketiye bin bandora Hîtîtiyan. Hîtîtî van herêman bi navê Ahîyeva bi belge dikin. Di ser Troyayê re ji salên 3000î B.Z. bi herêmê re çûnûhatineke bazirganiyê dest pê dike. Troya ji bo nîvgiravê di wê demê de (B.Z. 3000-1200) xwedî rola bajarekî gelekî girîng dilîze. Ji lewra yek ji hedefên wan ê sereke ye. Hîtîtî hem ji aliyê îdeolojîk ango xweda, wêje û zanistê ve, hem jî ji aliyê materyal ve ango bi tevahî alavên bazirganiyê yên weke dîzik, berhemên tevnê û tiştên madenî, têra xwe pêşkêşî bazarê dikin. Di barkirin û destguhertina şaristaniyê de bi roleke girîng radibin. Fenîkeyî nexasim hunerê deryayê û alfabeya Fenîkî hîn dikin. Li gorî modela Rojhilata Naverast bajarên bazirganiyê ava dikin. Ji sedî sed pêşengiyê dikin. Misrî hem yekser hem jî di çarçoveya koloniyan de (şaristaniya bi tenê ya xweser a Misrê bandor lê kiriye) bi rêya şaristaniya Girîtan bandorê dikin. Her cure vedîtinên şaristaniya Rojhilata Naverast bi van çar rêyan ji salên 2000î heta 600î B.Z. timî şaristaniya Greko-Romen xwedî dikin. Herî dawî Solon, Pîsagor û Thales di sedsalên 7. û 6. B.Z. de li nava nîzam, dibistan û qesrên Misr, Babîl û Med-Persan digerin, pergala pîvan û dersên wan hîn dibin û vedigerin nîvgiravê.

Piştî ku Troya[65] di salên 1200î B.Z. de ket, peravên Rojavayê Egeyê ji aliyê qebîleyên Îon, Aîol û Dor ên ji nîvgiravê hatin, hat dagirkirin. Em hatina van qebîleyan dikarin bi salên 1000î yên B.Z. bidin destpêkirin. Misrî xwediyên van êrîşan weke qewmên deryayê bi nav dikin û ev êrîşên pêşî bi ketina Troyayê ve têkildar in, û heta Rojhilatê Derya Reş û Misrê diçin. Ev komên

[65]Troya: Dewleteke site ya Yewnan a berê ye. Li gorî erdkolanan diyar dibe ku di nava sînorên bajarê Çanakaleya îro de ye. Bajarê Troya ber bi salên 2000î B.Z. de tê avakirin.

giravên Egeyê tijî dikin ji bo şaristaniyên Troya û Hîtîtan weke 'barbaran' e. Qada wan a şaristaniyê welatê Hîtîtan û qraliyeta piçûk a Troyayê ye. Barbar kengî demeke dirêj di nava çanda xwecihî ya şareza de bimînin dikarin şareza bibin. Jixwe wisa jî dibe û piştî demeke dirêj çi li nîvgiravê û çi jî li girava Egeyê û peravên wê ji salên 700î B.Z. dest bi bajarvaniyê dikin. Homeros behsa qehremaniyên şer ên ji vê dema dirêj a bi cihbûnê dike, nemaze bûyerên li dora Troyayê diqewimin dike destan. Odysseia jî çîrokên bi cihbûna giravê ne. Rast e, bajarvaniya li peravên Egeyê heta astekê xwedî xisletên orjînal e. Mîrateya pirrçand a hemta û dewlemend, erdên ji aliyê nebat û heywanan têrûtijî, hêz û îmkan da wan ku vê sentêza bêhemkûf di nasnameya avakirina bajaran de nîşan bidin. Di warê veguherandina faktorên hem îdeolojîk û hem jî maddî yên Rojhilata Naverast de, hinekî jî bi cewherên nû û bi veguherîneke girîng a şikil afirîneriya xwe ya mezin di warê sentêzkirinê de nîşan didin. Mirov dikare bibêje; keşif û vedîtinên di dema neolîtîkê yên salên 6000-4000î B.Z. de û bi qasî keşif û vedîtinên di dema Sumer, Misr, Hîtît, Ûrartû û Med-Persan alîkarî û kêrhatina xwe ya dîrokî jî li vê rastiyê zêde dikin. Pêngava çandî ya mezin a duyemîn an jî ya sêyemîn bi cih tînin.

Li vir yek ji pirsên girîng jî ew e ka di dîrokê de yek ji pêngava girîng a rohnîbûnê navenda wê li ku ye. Avakirina bajarê pêşî salên 1400î B.Z. mayînde nebû, pêvajoya paşê jî di tariyê de maye, wexta mirov tenê hin koloniyên bazirganiyê yên Fenîkiyan li ber çav bigire, mirov ê bibîne ku nîvgirava Grek heta salên 700î B.Z. ti şaristanî nehewandine. Şerên qebîleyan hene. Yên mîna Akayan nav û dengê wan hene, nexasim timî di ser Egeyê re êrîşan dibin ser herêmên şaristaniyê yên Anatolyayê. Ji sedî sed diyar e ku hînê di qonaxa barbariyê de ne. Yê li ser wan jî ji qralekî wêdetir (ji bo qral divê bajar hebe) di rewşa serek qebîleyekî de ye. Herçend em di salên 600î B.Z. de mezinbûna Athenayê (Atîna) dibînin jî di wê astê de nîne ku bibe navendeke şaristaniyê. Bi tevahî îhtîmal îşaret bi

bajarên qebîleyên li peravên Egeyê dikin ku wan roleke navendî lîstiye. Di serî de Homeros, Heft Zanyar, Thales, Herakleitos, Parmenios, Demokritos û Phitagoras kesên navdar hemû ji peravên Rojavayê Egeyê derdikevin. Li pey hev weke zincîrekê bajar li vir têne avakirin.

Xusûseke din a girîng ew e ku di serî de Apollon[66] pirraniya çîrokên derketina xwedayên navdar an koka xwe ji vê herêmê ne, yan jî koka xwe ji herêmên nêz in. Li vê herêmê şaristaniya maddî li gorî nîvgiravê gelekî pêş ketiye. Navendên kehanetê û perestgehên herî navdar dîsa li Rojavayê Egeyê ne. Gelek belgeyên ku hînê mirov dikare pêşkêş bike, nîşan didin ku piştî Hîtîtî, Frîgyayî û Lîdyayiyan an jî di heman demê de bajarên Îon navendên şaristaniya nû ya Egeyê ne. yên li nîvgiravê dewama wan in. Nuqteya nazik ew e ku di salên 545 B.Z. de împaratoriya Med-Pers ev der dagirkirin û pêre navenda şaristaniyê bû Atîna. Ji lewra salên 500-400î B.Z. mirov dikare weke serdema Athena ya bi heybet şîrove bike. Weke tê zanîn, berhemên maddî û îdeolojîk ên şaristaniyê yên li peravên Egeyê bar dikin Athenayê. Pirraniya rewşenbîran diçin wir û hinek ji wan jî xwe diavêjin Başûrê Îtalyayê û hin giravan. Herêm di bin serweriya Persan de hêdî hêdî girîngiya xwe ya berê wenda dike.

Şaristaniya Persan jî bêguman di wê demê de şaristaniyeke bi heybet e. Tenê ji herêma Grekê nagire, gelekî li wir jî zêde dike. Lê piştî ku Egeyê serxwebûna xwe ji dest da, herêmê şensê xwe yê avakirina şaristaniyeke mezin belkî cara pêşî û cara dawî wenda kir. Eger wisa nebûya, bi hêsayî dikarim bibêjim ku wê ji wir heta Anatolyayê şaristaniyeke ji şaristaniyên Sumer, Misr, Hind, Çîn, Hîtît û Persan mezintir bihata avakirin. Belkî jî nîvgiravên Grek û Îtalyayê weke eyaletên pêve girêdayî bimana. Hem ji aliyê naverokê hem jî ji aliyê berfirehbûnê şensê avakirina împaratoriyeke qat bi qat ji Bîzansê mezintir wenda dikin. Hebûna Persan a li Egeyê hem dawî li wan anî, hem jî nehişt

[66]Apollon: Di mîtolojiya Yewnan de xwedayê huner, muzîk û helbestê ye. Kurê Zeûs û Letoyê ye, û cêwiyê Artemîsê ye.

Egeyî pêşengiya sîstemeke mezin a şaristaniyê bikin ku ev yek mafê wan bû. Mirov çiqas li ber bikeve û dilê xwe bişewitînin li cih e. Makedoniyan ev şens di şexsê Skender de ceribandin. Di encamê de ya derket holê pirr parçebûn, navendek tinebû, gelek navend hebûn û çandeke senteza Rojhilat-Rojava bû. Herçiqas ji vê re dinya çandê ya 'Helen' jî were gotin, ji sentezeke bi serhevkirî û qetqetokî wêdetir tiştekî din nîne. Ji afirîneriyeke orjînal a rastî gelekî dûr e. Paşê împaratoriya Romayê vedît hat û ji bilî bibe eyaleteke navend Bergama ti şens neda Egeyê. Ya Persan li rojhilat kir, Romayiyan li rojava dubare kir.

Şaristaniya navenda wê Athena, hem ji aliyê mezinbûna bajaran ve û hem jî ji aliyê zêdebûna hejmara bajaran ve mirov weke şaristaniyeke bi rastî şîrove bike, weke têgîn rast e. Di qada şaristaniyê de ji aliyê îdeolojîk û maddî ve mohra xwe li serdemekê xistiye. Wexta mirov Athenayê dinirxîne, divê weke parzûnkekî şaristaniyên heta niha me navê wan jimartine têde hatibin dawerivandin bibîne û di encamê de tiştekî nû derketiye holê, qebûl bike. Bi qasî dîroka şaristaniyê bi tevahî destketiyên dîroka çanda neolîtîkê, bi qasî vedîtinên wê yên maddî û îdeolojîk, bandorên xwecihî bi dema nû re dike yek û şoreşeke mezin a şaristaniyê pêk tîne.

Xisleta wê ya mezin a yekemîn ew e ku ji aliyê îdeolojîk ve felsefeyê weke şêweyê bawerî û fikrê ji dînên pûtperest zêdetir qebûl dike. Felsefe dibe sedem ku di warê mane û manedanê de pêngavên gelekî mezin werin avêtin. Tovê tevahiya ekolên felsefî di vê demê de hatine reşandin; tevahiya şêweyên fikrê yên xwedî naveroka Îdealîzm, materyalîzm, metafizîk û diyalektîkê mumkîn dibe ku peyda bibin û werin guftûgokirin. Beriya Sokrates 'felsefeya xwezayê' li pêş bû, lê bi Sokrates re 'felsefeya civakê' giraniya xwe çêbû. Bi mezinbûna 'pirsgirêka civakî ' re ango zordestî û mêtingerî di pêşketina van bûyeran de rol digirin. Xusûsek heye divê ez careke din diyar bikim, em wexta 'pirsgirêka civakî' dibêjin ango em dixwazin bibêjin; rêzezincîra bajar-bazirganî-dewlet-rêveberî hatiye

avakirin. Her weha bajar weke şaristaniya maddî dihêle ku fikra felsefî ferz bike. Bajar bi xwe qutbûna ji civaka organîk îfade dike. Ji lewra zêhniyeteke ji xwezayê qutbûyî di nava bajêr de bi hêsanî dikare şikil bigire. Malzaroka her cure fikra mucered, metafizîka çor û fikra materyalîst, li ser hîmê bêbextiya bi hawîrdorê re şaristaniya bajêr e.

Hingê mirov dikare bibêje; felsefe ji aliyekî ve di warê fikrê de gavavêtinek e, li aliyê din şêwekî fikrê yê xerîbketina bi xwezayê re ye. Sofîstên zanîna felsefî belav dikin bi awayekî mîna rewşenbîrên sedsala 18'an ên Ewrûpayê ne. Bi peran dersê didin zarokên malbatên halê wan xweş. Çawa ku rahiban vedîtinên dînî dikirin û mirovên perestgehan çêdikirin, fîlozof jî dibistanên xwe bi xwe çêdikin. Mîna ku dêrên (meclîsên) xwe bi xwe ava dikin. Fena dînên pirrxwedayî gelek dibistanên felsefî çêdibin. Ango mirov dikare her dibistanê weke dînekî yan jî selexaneyekê şîrove bike. Ji ber ku di dawiya dawî de dîn jî şêweyekî fikrê ne, mirov dikare wan weke felsefeya şêweyê baweriyê girtiye û bi sazî bûye qebûl bike. Divê mirov cudahiya di nava wan de bi temamî dijberê hevdu fêhm neke. Xwarina îdeolojîk a gelên tên rêvebirin dîn e, ciwan û rewşenbîrên tebeqeya jor jî xwarina wan felsefe ye. Eflatûn[67] û Arîsto[68] bi awayekî dixwazin wezîfeya rahiban a avakirina bajêr, parastin û rizgarkirina wî bi riya felsefê serketî bi cih bînin. Jixwe mijûliya bingehîn a fîlozofan ew e ka civak û dewleta sîte hînê baştir çawa tê rêvebirin, û beriya her tiştî çawa dikare li ser hîmekî baş bê danîn.

Xisleta duyemîn û girîng a şaristaniya Athenayê ew e ku cara pêşî ji aliyê teorîk û pratîk ve bi girîngî li ser demokrasiyê (cum-

[67]Eflatûn: (B.Z. 428-348) Weke Platon jî tê naskirin. Fîlozofekî Yewnanî ye. Tevî mamosteyê xwe Sokrates û şagirtê xwe Arîstoteles ji damezrînerên felsefeya Rojava ne. Felsefeya bi giranî li ser etîkê û îdeya mutleq hatiye avakirin. Fikra wan bandoreke mezin hem li Xirîstiyantî û hem jî li Îslamê kiriye.

[68]Arîstoteles: (B.Z. 322-384) Zanyar û fîlozofê Yewnanî ye. Xwedî agahiyeke ansîklopedîk e. Di gelek mijaran de nivîsandiye. Mamosteyê Skenderê Mekodonî ye.

hûriyet) sekinî ye. Bi awayekî giştî di dîroka şaristaniyê de ev qonaxeke girîng e. Lê ev tenê demokrasiyeke ji bo arîstokrasiyê[69] ye. Welatîbûna sîteyê pirr bi sînor qebûl dike, wexta mirov vê li ber çav bigire, belkî ji sedî dehê civakê jî nagire nava xwe. Lê dîsa jî nûbûneke gelekî girîng e. Di çêbûna hunerê polîtîka û felsefeyê de roleke mezin dilîze. Demokrasiyê weke têgîn mijûliya gel bi polîtîkayê ango bi karên rêveberiyê re îfade dike. Di tevahiya pirsgirêkên civakî yên girîng de hizirîn, guftûgokirin û biryardan hîmê siyaseta demokratîk e. Ji lewra ev yek di şaristaniya Athena de tê maneya civaka vekirî û şefaf ku ev yek ji xisletên siyaseta demokratîk e, û kêrhatin û alîkariyeke gelekî girîng e.

Panteona xwedayan xwe bi mîmariyeke nû diyar dike. Bi şiklê xwe yê çargoşe û bi stûnên dor lê hatiye girtin û ji derve jî bi bircên berfireh ên xwe lê badane, şahane ne. Perestgehên Apollon, Artemîs û Athaneyê li tevahiya bajarên sereke mîna hevrikê hev bin, xuya dikin. Ji ber ku xweda hatine çêkirin û hûnandin di civaka Atînayê de hînê baş têne fêhmkirin. Baweriya dînî ya rêûresmî her diçe qîmeta wê ber bi nemanê ve diçe. Belkî jî damezrînerên xwedayên bajaran ên Sumeran di şaristaniya Athena û Romayê de mîna ku demên xwe yên dawî bijîn. Ji ber ku Atîna hatiye avakirin, ji avaker û parêzvan Xwedawend Athenayê jî navê xwe girtiye. Xwedawenda Ûrûkê Înannayê tîne bîra mirov. Ev mînak bi xwe jî wekheviya şaristaniyan û çawa bi rêûresmeke balkêş li pey hev tên, nîşan dide. Beşên din ên bajêr weke Agora (bazar), dêr (meclîs), şano, stoal, jimnasyum (stadyum) û hwd. gelek sazî û dezgeh çêbûne. Bajar bûne xwedî gelek xisletên cihê, bajar êdî bêyî bircan jî dibin, gelek qesrê xwe û avahiyên xwe yên pêşketî hene. Hinekî dişibin Hîtîtiyan lê ji wan bihurandine. Şêniyên wan hînê zêdetir in.

Wêjeya devkî pêş ketiye. Belkî jî em di dîrokê de bi çanda edebî ya herî mezin a bi belgeyên nivîskî hatiye tomarkirin rûbirû ne. Şanoyê dema herî şoreşgerane di vê demê de dît. Des-

---

[69]Arîstokrasî: Şêweyekî rêveberiyê yê dîrokî ye ku hêza aborî, civakî û siyasî di destê çîna esilzadeyan de ye.

tan û trajedî têra xwe têne lîstin. Berhemên dîrokî têne nivîsandin. Destena Homeros[70] weke pirtûka dersê tê xwendin. Bûyerên balkêş dikin şano. Mîna ku mizgîniya hatine sînemayê bidin. Deryavanî û bazirganî pêş ketiye. Piştî Fenîkiyan şaristaniya herî zêde di warê keştiyan de hosta ye. Herçiqasî bazirganî pîşeyekî zêde balê nekeşîne be jî di civaka Athena de dendikên pêşî yên kapîtalîzmê bi hindikî be jî têne danîn û hebûna wan xuya dike. Eger hinekî din gavê biavêjin, hema mirov dibêje qey wê gavê biavêjin sîstema kapîtalîzmê. Mîmarî pêş ketiye. Jixwe avahiyên bajêr têra xwe vê yekê îspat dikin. Heykeltraşî gihiştiye astekê mirov dikare jêre bibêje; îdeal e. Dîmenên mîtolojiyê yên li ser dîwar û keviran hatine niqirandin gelekî balkêş in. Em hema yekser divê bibêjin; bi tevahî ji mîtolojiyên şaristaniyên berê (baweriyên nedînî, şêweyên fikrê) sentezeke wan a xurt a wêjeya mîtolojîk heye. Mîtolojî hunerek e ku bûyerên civak nikarin wan ji hev derxînin û wan îdealîze dikin bi çîrokî îfade dike û ev şêwe di serdema destpêkê de gelekî belav heye.

Muzîk çi di warê hejmara enstruman û amûran de, çi jî di warê cureyên wan ên weke îlahî, qesîde, eşq û destanan de pêş ketiye. Lîr estrumanek e ku balê dikişîne. Şêweyê vegotinê yê helbestwarî bi qasî demên qehremaniyê ango qonaxa hema berî bajarvaniyê qonaxa di ser hovîtiyê re nebe jî hebûna xwe dewam dike.

Piştî Atînayê Sparta tê. Taybetmendiya Spartayê ew e ku rêûresma qraliyetê bi hişkî meşandiye. Di nava wan de timî şer û nakokiyan dewam kiriye. Modela Atîna û Spartayê li tevahiya nîvgiravê şop hiştiye. Belavbûna bajaran bi lez bûye. Li giravê û peravên deryayê yên li hember bi heman modelan bajar tijî bûne. Li peravên Derya Reş û Marmarayê jî bajar hatine avakirin. Şêniyên zêde û bazirganiya pêşketî rê li ber serdemeke kolonî ya nû vedike.

[70]Homeros: Yek ji wêjevanê herî kevin ê Yewnan e. Tê texmînkirin ku di sedsala 10. B.Z. de jiyaye. Nivîskarê destanên kevin ên Yewnan ên herî mezin Îlyada û Odîesseîa tê qebûlkirin. Li gorî hin lêkolîneran Homeros kesek nîne nave komekê ye. Homeros wêjevanekî gerok e. Di dema wî de mîtolojiya Grek û teolojiya wê hatiye çêkirin. Di Îlyada û Odîesseîayê de serdema qehremaniya Yewnan û teolojiya wê bi zimanekî destanwarî tê vegotin.

Li Misrê jî dikare bajarek an jî kolaneke bi ser Grekê ve hebe. Paşê ev dibin bajar. Başûrê Îtalyayê jî bi giranî bûye kolonî. Mîna ku rola Fenîkiyan dewr girtine. Tevî van pêşketinan hemûyan û avakirina yekîneyên bajaran ên li nîvgiravê, nikarîbûye xwe bigihîne hêzeke împaratoriyê ya weke Persan û Romayê. Li gorî ruhê demê, ya nikaribe bibe împaratorî dikeve bin serweriya împaratoriyeke din. Şaristaniya giravê ya bi pêşengiya Athenayê di salên 340î B.Z. de, bi gefxwarinên Makedonyaya li bakurê wê weke qraliyetekê mezin dibe rûbirû ye. Şaristaniya Grek a nikarîbû hêza xwe ya mezin a îdeolojîk û maddî bike navendî û xwe bigihîne sîstemeke polîtîk a ji sîteyan wêdetir, piştî çend şerên berxwedanê ji sala 330î B.Z. û pêve serxwebûna xwe bi awayekî wenda kir ku careke din nebîne. Lê mîna Babîlê wê weke navendeke nû ya çandê hebûna xwe demeke dirêj dewam bike.

Demokrasiya Athenayê derba herî dawiyê ji qraliyeteke nû mezin dibe ji yekîtiya Makedonyayê xwar. Jixwe berê jî di şerê dirêj ê sîh salî de ji Qraliyeta Spartayê derb xwaribû. Makedonî ji çanda Yewnan in, û zimanekî cuda bi kar tînin. Filîp û kurê wî Skender ên hewl didin serekeşîrên qebîleyên cihê li cem hev bigirin di sala 359'an B.Z. de kirin ku li tevahiya nîvgiravê serweriya wan were naskirin. Skenderê ku jiyaneke wî ya balkêş heye, demeke dirêj li ber destê Arîsto xwendekarî kir. Arîsto jî li bajarekî herêma nêzî Makedonyayê ji dayik bûbû. Diyar e, ji xwendekariyê wêdetir têkiliyeke nêz di navbera wan de heye. Piştî mirina Skender reva wî ya yekser ji Atînayê vê yekê nîşan dide. Arîsto, Skender li bajarê peravên Egeyê perwerde kiribû. Di demên dawî yê serweriya Persan de, bi tevahî nirxên çanda Yewnan û xwedayên mîtolojîk mejiyê wî tijî kiribû. Ti siyasetvanê Yewnanan nebû ku nizanîbû dewlemendiya împaratoriya Persan rê li çavbirçîtiya mirov vedike. Demekê berî demekê têkbirina Persan weke xwestekeke xurt bi cih bûbû. Ev, hisek welê bû, dişibiya xwesteka Îslamê ya ji bo têkbirina Bîzansê. Li cem tevahiya eskerên beşdarî êrîşê bûbûna ev bîrûbawerî hebû. Artêşa Skender artêşeke rêûresmî ya ji koleyan nebû.

Divê mirov baş fêhm bike ku Skender bi çandeke serketina xwe îspatkirî û yekîneyên eşîran ên di bin rêveberiya serekeşîrên nû hewl didan ji barbariyê derkevin û çav berdane dewlemendiyên Rojhilat de bi rêxistina artêşeke nû ya ji yekîneyên falanj tevdigeriya. Li Anatolyayê bi şerê Granîkos, li Çûkûrovayê û Rojhilatê Derya Reş bi şerê Îssos, li Bakurê Iraqê bi şerê Arbella û bi şerekî bêyî bêhn bide herî dawî heta keviyên Îndûs ên Hindistanê fetih kirin. Dîsa bi meşa xwe ya bi bela ya Başûrê Îranê li navenda dinyayê Babîlê ji ber sedemeke bi tevahî nayê zanîn hînê di sîhûsê saliya xwe de mir û wexta çavên xwe li jiyanê miçandin li pey xwe ji împaratoriya Persan berfirehtir cografyayek hişt. Ev, cografyayek bû ku bi tevahî li çanda Yewnan hatibû vekirin.

Ev cografya berê jî bûbû xwedî şaristanî. Lê hêmanên wê yên maddî û îdeolojîk xwe dispartin nifşê pêşî yê koledariyê. Jixwe çanda Yewnan ji zû ve ji çanda vê şaristaniyê bihurîbû. Hînê gelekî ciwan bû û ji bo paşerojê xwedî nîşaneyên baş bû. Ji lewra qabîliyeta wê ya karibe biteamîne hebû. Çawa ku rahibên Sumeran çanda neolîtîk teamandin çîna pêşî, bajar û çanda dewletê ava kirin bi heman hûrûkûrahiyê nebe jî çanda Yewnan jî ji bo deverên şaristaniyên berê teamandineke ciwankirinê bû. Di vê demê de ku jêre ‘Helenîzm’ jî tê gotin û tê texmînkirin ku li derdora salên 330 B.Z. û 250 P.Z. de dewam kiriye gelek qraliyet hatin avakirin. Li Misrê qraliyeta Ptoleme, li Anatolyayê ya Bergamos, li Sûrî û Mezopotamyayê ya Selevkosan qraliyetên nû yên bal li ser wan bûn. Piştî têkçûna xanedaniya Axemenî xanedaniyeke nû bi navê Partan hewl da împaratoriya Îranê restore bike. Di heman demê de Partên di salên navbera 250 B.Z. û 220 P.Z. de hukmê xwe meşandin tiştekî nû temsîl nedikirin. Li derdora pêncsed salên ‘Helenîstîk’ nexasim di avakirina bajarên nû de gavên mezin avêtin, di serî de xwedayên Yewnan û Îranê panteonên çandên têkel temsîl dikirin çêbûn, çand û zimanê Yewnan li tevahiya vê cografya ziman û çanda serdest û fermî bû û di encama vê de sentezeke gelekî girîng çêbû. Jiyana Skender bi xwe sentezeke Roj-

hilat-Rojava bû. Bêguman senteza çandên wê demê serdest bûn, lê dîsa jî gelekî girîng bû. Dîrok ti carî nebûye şahidê sentezeke çandan a evçend mezin. Roja me ya îro jî di navê de ev welê ye. Belgeya herî berçav û hînê zindî ya vê rastiyê, xirbeyê qebristana Qralê Komagene Antiochus a li Çiyayê Nemrûtê ye. Ev qraliyeta bi hêz a wê demê navenda wê Semsûr e. Paytexta wê demê bajarê Samosatê bû ku di binê ava Firatê de ma. Qebra li Çiyayê Nemrûtê yek ji harîqeyên dinyayê ye, û ji ber ku vê rastiyê tîne ziman, sembola senteza Rojhilat-Rojava ye.

Li vir a ji bo mijara me girîng ew nîne ku şaristaniya koledar belav bûye û di vê demê de deverên vala yan jî çanda neolîtîk û barbar xistiye nava şaristaniyê; li vir şaristaniyeke koledar a nû gihiştiye qonaxeke hînê jor ango şaristaniya Yewnan-Helen ji Hindisanê heta Romayê, ji peravên Bakurê Derya Reş heta Derya Sor û heta Kendava Îranê tevahî dever kirine bin serdestiya çanda nû û hewl dide di nava xwe de şareza bike. Li bajarê Romayê nûnerê ciwan û jêhatî yê çanda nû li ser heman xetê wê bi xurtî bimeşe û li gorî dema xwe wê împaratoriya koledar a herî mezin ava bike.

Danasîna çanda Romayê, herî kêm bi qasî ya Atînayê girîng e. Sedema pêşî ya girîngiya wê ew e ku tepela şaristaniya koledar e, ji bo wê Çiyayê Everestê ye. Ji wir û pêve şaristaniya koledar serberjêr diçe. Ya duyemîn, di warê berfirehî û kûrahiya çanda împaratoriyê de nûnerê herî mezin e. Di dîrokê de ti împaratorî bi qasî Romayê nebiriqiye û muhteşem nebûye. Ya sêyemîn, nûnerê herî bi hêz û dawî yê qral-xwedayên bi maske ye. Bi qasî împaratorên Romayê ti kesî xwe hem mirov û hem jî xwedê nehesibandiye, hêza xwe ji îradeya xwe ya ferman û çalakiyê girtine, bi hêza xwe ya maddî û manewî hewce nedîtine hesab bidin ti kesî, lê dîsa ti îrade û hezeke din weke wan nehatiye dîtin ku li dinyayê hesab ji her kesî û ji her tiştî bipirsin û bigirin bin destê xwe. Çaremîn, ew dewlet e ku welatîbûn û huqûq bi komên mirovan ên berfireh dane naskirin. Pêncemîn, ew împaratorî ye ku cara pêşî rê li welatîbûna dinyayê, kozmopolîtîzm û pê-

ve girêdayî rê li dînê dinyewî (katolîk, ekumenîk[71]) vekiriye. Şeşemîn, şeveqa şaristaniya Ewrûpaya mezin e, serê pirê ye. Heftemîn, demeke dirêj weke komar hebûna xwe dewam kiriye.

Bajarê Romayê bêguman ev pêşketinên mezin bi mûcîzeyan nekiriye. Beriya wê çar çandên mezin hene û wê jî weke nûnerê wan ê dawiyê hêzeke potansiyel û aksiyonel bi dest xistiye. Çanda yekemîn, çanda herî kevin çanda şoreşa neolîtîk e. Vê çandê di salên 4000î B.Z. de weke li tevahiya Ewrûpayê nîvgirava Îtalyayê jî kir bin bandora xwe û nûnerê dawî yê vê çandê qebîleyên Îtalîk yên Latîno bûn. Mirov dikare texmîn bike û bibêje; di salên 1000î B.Z. de destpêkirine nasname dane Îtalya îro û nasnameya wê ya etnîk diyar kirine. Bawer dikim tespîtek bi vî rengî wê nêzî rastiyê be. Mirov dikare diyar bike ku bi vê nasnameyê tevahiya saziyên neolîtîkê û zêhniyeta wê nas kiriye. Divê bi koka xwe Ewrûpî bin. Koma duyemîn a nasnamehilgir Etrusk e. Bi îhtimaleke mezin di salên 1000î B.Z. de ji Mezopotamyayê çand û zimanê Aryen di ser Anatolyayê re anîne. Koma em behsa wê dikin xwediyê şaristaniya nîv-neolîtîk û nîv-koledar e. Ev kom, bi îhtîmaleke mezin di salên 800î B.Z. de li bakurê Îtalyayê bi cih û belav bûye. Ji wan gelan e ku cara pêşî tovê şaristaniyê li Îtalyayê û bajarê Romayê reşandiye. Ya sêyemîn, çanda Grek a navend Athena ku di serdema xwe ya muhteşem de bû û hînê çêdibû, şaxekî xwe weke kolonî cara pêşî berda Başûrê Îtalyayê. Phitagoras û koma xwe di salên 500î B.Z. de li Başûrê Îtalyayê bi cih bû. Çaremîn, koloniya Kartaca û koloniyên din ên Fenîkiyan damezrandin di salên 800î B.Z. de çanda Misrê û Derya Spî ya bi koka xwe Semîtîk birine nîvgirava Îtalyayê.

Mirov dikare bibêje; ev her çar çand ji bilî Çînê weke hungivê tevahî çandan dawerivîbe û herikîbe nîvgiravê û ev jî bingehê çîroka Romayê ye. Mîna ava cewherî ya di malzarokê de be.

[71]Ekumenîk: Li tevahiya dinyayê saziya herî bilind a Ortodoksan e. Çawa ku organê dînî yê bilind ê Katolîkan Papa ye, yê Ortodoksan jî Ekumenîk e. Navenda Ortodoksan a li dinyayê jî Stenbol tê qebûlkirin. Ji ber vê yekê, dixwazin Patrîkê Ortodoks ê Rûm weke organê bilind ê Ortodoksan ê Ekumenîk were qebûlkirin.

Ya nêzî rastiyê mirov bibêje ew e ku sentezek gelekî di ser sentêza çandî ya Atîna û Rojavayê Egeyê de bi hatina cem hev a hêza potansiyel û aksiyonel a her çar çandan dibe. Mîtolojiya xuşk û bira Romulus û Romus ên ji dêlegurê bûyî û Roma ava kirî, çîrokbêjiyeke gel e, ji bo avakirina gelek deveran tê gotin. Ji bo kovîtiya çavkaniyê (ji der ve) û dawerivandina wê di parzûnkekê de (çandên cihê) îfadeyeke balkêş e!

Piştî şikestina Troyayê şaristaniya Romayê ji aliyê yek ji hevalên Parîs ên şer Aineais ve tê avakirin. Çîroka vê bûyerê bi awayekî mîtolojîk karekterê wê yê Anatolyayê nîşan dide û ji vî alî ve têra xwe kêrhatî ye, û mirov dikare jê hîn bibe. Nêzîkbûna me bi awayekî destanwarî îfade dike. Çîroka avakirinê ya qralên rahib li derdora salên 700î B.Z. li gorî tevahiya damezrandina bajarên şaristaniyê yên sereke li cih e. Li hawîrdora wê gelek çîrokên şerên qebîleyan hene ku ev jî di damezrandina bajaran de têkiliya dewletbûn-çînê zelal dike û tê fêhmkirin. Şer û xwelihevrakişandina Etrusk û Latînoyan, dîsa di gelek damezrandinên mînak de tê dîtin ku ev yek jî ji nakokiya navbera çanda neolîtîk û çandên şaristaniyê yên xerîb têne hesibandin pêk tê.

Di mezinbûn û bilindbûnê de şensê Romayê hebû ku li nîvgiravê bû, di xeleka şaristaniyan de li serê dawî yê rojava cih digirt û li bakur hêzeke şaristaniyê ya çavkaniya xwe parzemîna Ewrûpayê be, tinebû. Tehlûke ji du aliyan ve dikarîbû bihata: ji şaristaniya navend Atîna ya li nîvgirava Grek û ji koloniya herî bi hêz a Bakurê Efrîkayê ya Fenîkiyan ku ew jî Kartaca ya gihiştibû şaristaniya bajêr a serbixwe. Ji ber ku şaristaniya Yewnan nikarîbû ji serdema pêşdebirina koloniyan bibihure, ji ber ku ji rojhilat timî zexta Persan his dikir, ji ber hevrikiya zêde ya di navbera bajaran de dikir û nedikir rê nedida bibe împaratorî yan jî qraliyeteke navendî, ji ber ku di demeke kin de ket bin serweriya Qraliyeta Makedon, diyar dibû ku wê ji bo Romayê nebe çavkaniya tehlûkeyekê. Dibe ku Kartaca hevrikekî hînê ciddî bû. Ji ber ku nêzî hevdu bûn, li heman deveran belav dibûn û li gorî karekterê şaristaniyên wan timî li pey hukimraniyê dibezîn û vê yekê jî nêz

an jî dûr wê wan bianiya beramberî hevdu. Şerê ji sedsalekî zêdetir di dawiya dawî de benda herî mezin a li pêşiya serketina Romayê ji holê radikir. Skender berî bi demeke kurt bimire hedefa xwe weke Roma destnîşankiribû û ev jî dikarîbû bibe tehlûke û gefxwarineke ji dil. Lê jixwe nîvgirava Yewnan serweriya wî bi navê xweda-qral qebûl dikir. Lê mirina zû ya Skender şensekî din ê mezin ê Romayê ye. Împaratoriya Skender a li şûna împaratoriya Romayê bihata damezrandin bi hêsayî dikarîbû bûbûya hêza herî mezin a dinyayê. Li cem Skender qabîliyeteke gelekî mezin hebû. Piştre ango piştî şerê dawî yê Kartacayê di salên 150î B.Z. de bi tevahî şaristaniyên berê û dinya çanda neolîtîk li ber çavbirçîtiya Romayê li fethê vekirîbû. Ji bilî împaratoriya Îranê ya ji xanedanên Part û paşê Sasanî.

Gavavêtina Romayê ya komarê di sala 508an B.Z. de mîna dewama bisazîbûna demokrasiya Atînayê xuya dike. Di vê de bi qasî hebûna bingehekî xurt ê çandî para arîstokrasiyeke bi hêz jî girîng e. Her weha di bihurandina ezmûna berê ya qraliyetê de, dibe ku mîna Spartaya li beramberî Atînayê roleke pêşxistinê bi cih neanîbe. Qraliyet bi giştî muhafezekar in, û firsendê nadin ku arîstokrasî li dora wan cih bibîne.

Weke Cumhûriyet bajarê Romayê gelê xwe zêde serwext kiriye û di warê berjewendiyên wan de jî bi îrade kiriye. Avahiya ji du meclîsan a ji bo arîstokratan û welatiyên ji rêzê, konsultî, pêşketina dadgeriyê weke saziyeke cihê û bisazîbûna hêzên parastina bajêr nîşan didin ku Cumhûriyeta Romayê li gorî demokrasiya amator a Atînayê têra xwe profesyonel e, û bicihbûyî ye. Rêveberiya cumhûriyetê yek ji çavkaniya bingehîn a pêşketina hunerê polîtîkayê ye. Ev rewş di heman demê de tayê di navbera polîtîka û huqûqê de nîşan dide, ango huqûq bi sazî bûye, ji lewra ev mînakeke orjînal a dîrokî ye ku nîşan dide huqûq polîtîkayek e ku mirovan li ser li hev kiriye. Bi cumhûriyetê Roma di nava xwe de dibe xwedî pêşketineke bi heybet a çandî û li derve jî dibe xwediyê fethên mezin. Mirov dikare bibêje; şaristaniya Romayê bi cumhûriyetê gihiştiye sîno-

rên xwe yên xwezayî. Çîroka gavavêtina ji cumhûriyetê ber bi împaratoriyê ve, ya rastî mikurhatina li şer û tehlûkeyên derve û hundir ên mezin e. Pevçûna Julius Sezar û hevrikên wî, nakokiya di navbera pleb û arîstokrasiyê, navend Roma û hawîrdora wê de nîşan dide. Brutus ji bo îxaneta xwe veşêre weke bahane îdîa dike ku şerefa mezin a Romayê ji bo derve tê fedakirin. Bi vê îdîayê xwestiye xwe mafdar nîşan bide. Ji ber ku pleb pişta Sezar digirin û nûnerên neqane yên arîstokrasiyê di nava bêbextiyê de cih digirin û li eyaletan piştgiriya zêde ya ji bo Julius Sezar wer xuyaye vî hukmî piştrast dikin.

Li derve serhildan dewam dikin û Îranî jî heta Firatê hatine. Seferên Sezar ên Galya, Brîtanya û Germanyayê, serhildanên li Anatolyayê, kesê sêyemîn Crasius di şerê bi Îranê re serê wî hat jê kirin, li Rojhilatê Derya Spî serhildana Cihûyan, şerên bi dawî nabin ên li nîvgirava Yewnan û Balkanan, êrîşên Hûn, Skît û Gotan ên dest pê kirine û hema dibêjin em tên, li herî başûr seferên xenîmetê yên qebîleyên Ereban, li Misrê bermahiyên qraliyetê yên hebûna xwe hînê bi xurtî dewam dikin, mezinahiya tehlûke û gefxwarinê nîşan didin. Diyar bû ku guftûgoyên bê dawî yên senatoya cumhûriyetê, xwe li hev rakişandina hizbên hevrik ji bo namzetên konsulan[72] û rewşa gel a polîtîk a hînî xenîmetên derve bûyî, di têkoşîna li dijî tehlûkeyên derve û rewşên bi lez ên hewceyî biryardanê, rejîma cumhûriyetê tengav dikin.

Ji cumhûriyetê gavavêtina împaratoriyê li serê dema mîladê rastê. Sembolê vê yekê Augustus di bingehê polîtîkayên wî de şert û mercên me jimartin hene. Ya ku şert ferz kirin ew bû ku li hundir aramî û li derve jî polîtîkayên ewlehiyê bûn. Serdema Aştiya Romayê (Pax Romana) ya muhteşem heta salên 250î P.Z. bi saya van polîtîkayan bû. Tê zanîn ku li ser hîmê van nîzam û sererastkirinan dimeşiyan. Senato bi temamî ji hêzê hatiye kirin û ketiye rola meclîseke şêwirmendan, li şûna hilbijar-

[72]Konsul: Gotineke Îtalî ye. Tê maneya serok, şah, padîşah û hwd. Li Romayê ji du salan carekê serokê dihat hilbijartin jêre konsul dihat gotin. Di navbera salên 1799-1804'an de ji her sê serokdewletên Franse rêvebirine konsul tê gotin.

tinê serê saziyan bi wezîfedarkirinê tê destnîşankirin û rêvebirin, gel rojên xwe bi kêf û şahiyan dibihurîne, li derve jî eskergehên ewlekariyê yên bi hêz têne avakirin, bi bircan kelehên qehîm têne lêkirin û gav diavêjin şerên parastinê. Herçend ji aliyên me jimartin hemûyan êrîş hatibin kirin jî bi temamî seferên êrîşê bi armanca parastinê ne. Ji vir û pêde em xwediyê lîsteyeke împaratorên navdar in. Lîsteyên kesên nîv-mirov û nîv-xweda ne! Ya balkêş jî ew e ku împaratorên Romayê bi xwe jî roj bi roj pê dihisin ku panteona xwedayên klasîk bêmane ye. Pêşiya xwe baş didîtin ku wê bi maskeya van xwedayan nikaribin hebûna xwe bi awayekî rewa dewam bikin.

Împaratoriya bi pirr seriyan dihat meşandin û aloziya mezin a piştî salên 250î P.Z. îşaretên dabeşbûnê didan. Qralîçeya navdar a Palmyrayê Zennûbeyê jî li Misr, Sûrî, Anatolya û Iraqê ji bo xwe li pey avakirina împaratoriyekê bû. Navên deverên min jimartin wê demê tinene, lê ji bo were fêhmkirin bi kar tînim. Çîroka wê ya xembar mîna klasîkeke Romayê ye. Li Rojhilat damezrînerê Xanedaniya Sasanî ya nû Ardeşîrê Yekemîn û hemtayê Augustus împarator Şahpûrê Yekemîn li pey hev artêşên Romayê şikandin. Tê zanîn ku Sasanî heta bi Rojhilatê Derya Spî û Torosan çûbûn. Di vê navberê de, bajarê eskergehê yê navdar Zeugma yê li nêzî Firat-Bîrecûkê, di salên 256an P.Z. de bi awayekî ku careke din bi ser xwe ve neyê ket bin erdê. Di navbera împaratoriyên Îranê Sasanî û Partan, û împaratoriya Romayê de, nexasim Mezopotamya Jor bi temamî bûbû devereke şer û destguhertina deveran. Ev erdên pîroz ên lê şaristaniyên pêşî yên bajaran derketin û şoreşa neolîtîk lê pêk hat, bûbû qutbekî berevajî mentiqê diyalektîka xwe, ew erdên jê şaristanî derketibûn bûbûn erdên şer û pevçûnê. Ev erdên ku piştî Ûrartûyan bi ti awayî nikarîbûn nîzamekî xwe yê navendî çêkin, heta roja me ya îro ji aliyê hêzên şaristaniyê yên din ve hatin dagirkirin, îlhaqkirin[73] û weke rejîmên mêtingehê hatin rêvebirin ku ev yek ji bûyerên herî trajîk ên dîrokê ne. Mî-

[73]Îlhaq: Bi ser xwe ve kirin. Welatek erdê welatekî din bi ser xwe ve dike.

na jin-dayikê ye ku çawa şoreşa çandê ya herî mezin afirand û paşê bû hebûnek e ku herî zêde hat binpêkirin.

Artêşên Romayê dîsa jî bi êrîşên dijber heta peravên Dîcleyê diçûn. Împaratorê navdar Julianus ku mîna teqlîda Skender bike tevdigeriya sala 365'an P.Z. li peravên Dîcleyê di şerê herî dawî yê mezin de bi awayekî trajîk mir û bi vê êdî serdema împaratoriya mezin a Romayê jî bi dawî dibû. Şerên li rojhilat û parzemîna Ewrûpayê nîşan didan ku êdî nabe împaratorî ji Romayê were rêvebirin. Wexta împaratorê navdar Diecleitianus di sala 306'an P.Z. de mir, li serê împaratoriyê di heman demê de şeş împarator hebûn. Yê karîbû xwe ji nav wan derxîne û derkeve pêş Konstantînê Yekemîn di sala 312'an P.Z. de dînê împaratoriyê, di sala 325'an de jî paytexta wê guherand. Piştî împaratorê dawî Julianus ê ji silaleya Konstantîn, bi awayekî fermî di sala 395'an de parçebûnê destpêkir. Împaratorên Romaya Rojava êdî bûbûn pêlîstokên şefên êrîşkar ên Gotan. Sereke Hûnan Atîlla jî bixwesta dikarîbû di sala 451'ê de Roma bigirta. Di sala 476'an de bi destê Qralê Gotan Odoakr Împartoriya Romayê ya Yekemîn dawî lê hat, çanda wê demeke dirêj di binê axê de li benda derketina xwe ma, lê nemir.

Romaya Duyemîn ango çîroka Bîzansê hînê tepisokî û teqlîdker demeke dirêj hebûna xwe dewam kir. Hem Rojhilat û hem jî Rojava teqlîd dikir, nikarîbû sentezekê çêke ango împaratoriyeke berdar nebû. Ji bo deverên berê yên împaratoriyê di destê xwe de bigire hewldanên mezin ên Justinyen (P.Z. 527-565) Herçend bi tesîr bûn jî dîsa eyalet hêdî hêdî ji dest diçûn.

Bîzans xwe weke Romaya Duyemîn bi nav dike. Konstantinopolis ji bo bibe Romaya Duyemîn xwe zêde mezin dikir ango ev îddîaya wê li cih nîne. Li ser deverên berê yên Romayê xwe dubare kiriye û ji vê wêdetir tiştekî din nekiriye. Rengê wê yê Xiristiyantiyê jî dabaşeke din e. Divê mirov cihê li ser rawest e. Piştre Osmanî û heta Slavên Rûsyayê ên navend-Moskow gelekî hez dikin ku xwe weke serdema Romayê ya sêyemîn bi nav bikin. Weke çanda îdeolojîk Xirîstiyantî û pêre Îslam îdîaya wan

a di warê Romaya sêyemîn de welê îdîayeke tewş nîne, dem û çandên cihê tevlîhev têne kirin û bi vî awayî rê li ber aloziyeke mezin a maneyê vedibe. Ez ê di beşê piştî vê de têgînên bi pirsgirêk ên weke 'şaristaniya Mûsevî, Xiristiyanî û Îslamî' bigirim dest û hewl bidim şîrove bikim.

Li ser bîranîna Romayê ji Ingilistanê heta Derya Reş gelek împaratoriyên nû zêde bûn. Bi Romayê re pûtperestî jî hilweşiya, lê ji bo şoreşeke nû ya dînî valatiyeke mezin çêkir. Mîtolojî û pûtperestiya Ewrûpayê li hemberî ya Romayê bejinbihostî bû. Jixwe pûtperestiya dînî fermî yê Romayê bû û pêre hilweşiya, diyar bû, wê weke îdeolojî Ewrûpayê têr neke. Herçiqas hewcedariya serdemê bi şoreşên maddî, polîtîk û ekonomîk hebû, ew qasî jî bi şoreşên dînî û manewî hebû.

Ez berî ku behsa mane û derketina şoreşên Xiristiyantî û piştre Îslamî bikim, ez ê hewl bidim bîlançoya maddî û çandî ya Romayê bi xetên stûr rave bikim.

Li deverên şaristaniyê yên herî mezin ên dinyayê ku têne zanîn, bazirganî, pîşesazî, maden û cotkarî di bin banê împartoriyê de hînê mezintir bûye. Gotina 'Rê hemû diçin Romayê' berê çavkaniyên aboriyê diyar dike. Dinyayê Roma xwedî dikir. Bi vê kurtêlxuriya mezin di serî de Roma bajarên bi heybet hatin avakirin. Bajarên dema Helenîstîk hatin parastin û hatin mezinkirin, pêşdebirin. Piştî Romayê, Antakya, Skenderiye, Bergama, palmyra, Samosat, Edessa, Amîd, Erzenî Rûm, Neo Kayser û Kayserîa, Tarsûs, Trapezûs û hînê gelek bajarên din ên Helenîstîk weke stêrkên Rojhilat bûn. Li Ewrûpayê di serî de Parîs, em dibînin hîmên pêşî yên bajarên nû yên dinyayê têne danîn ango Ûrûkên nû derdikevin, hiltên. Mîmariya wan heman mîmariya bajarên Yewnan bû. Lê hînê mezin û hînê bi heybet bû. Dîsa kêmberên avê yên muhteşem, çerx û cihok gelekî pêşketibûn. Tevn û nîzama rêyan bi awayekî nehatibe dîtin hatibû danîn. Ewlekarî temam bû. Bi rastî Pax Romana hebû. Amûrên mîmariyê û yên madenkariyê pêşketîbûn. Di warê kanên keviran û niqirandina wan de mirov dikare bi Mis-

ra berê re bide berhevdu û qiyas bike. Rûkêşkirina zirxê madenî û sîleh çêkirin, bi awayekî xwezayî pîşeyên herî pêşketîbûn. Bazirganî bi temamî bi sazî bûbû. Li gorî çanda Yewnan bûbû xwedî paye û li rewacê bû. Bazirganên navdar hebûn. Di bazirganiyê de demeke welê ye ku gavên girîng têne avêtin.

Di dîrokê de huqûq belkî cara pêşî evqasî pêşketiye û bi sazî bûye. Navlêkirinên huqûqê ewçend hosteyane bûn ji bo îro jî hînê numûne ne. Encama xwezayî ya huqûqê saziya welatîbûneke bi hêz e. Welatîbûna Romayê cihêwaziyeke mezin bû. Li tevahiya dinyayê bazirgan û arîstokratan dixwest mîna Romayiyan bijîn û ev weke cihêwazbûnekê didîtin. Mîna jiyana modernîteya kapîtalîst a di roja me ya îro de şêwazê jiyana Romayê jî weke şewbekê belav dibû. Belkî jî bandora modekariya Îtalyayê li tevahiya dinyayê ji vê rêûresmê tê.

Spor gelekî bi awayekî hov dihat kirin. Şerên gladyatoran, şerê bi şêran re û êsîrên zindî yên li arenayan diavêtin ber şêrên birçî gelekî hov bûn. Gel hînî van şahiyên hovane dikirin û bi vî awayî ew ji exlaq dikirin. Panteon û perestgehên li ser navê xwedayan hatine avakirin jî di demên dawî de girîngiya wan gelekî kêm dibe. Teolojiya Romayê bi tenê navên teolojiya Yewnan guhertibû û qebûl kiribû. Vergiliuis, Destana Troya ya Homeros ji xwe re kir mînak û destana damezrandina Romayê Aieneis nivîsand. Wêjeya Yewnan jî di navê de bi tevahî hêmanên çandê bi tenê kirin Latînî û bi vî awayî hatin qebûlkirin. Nivîsandina şano, dîrok û felsefeyê jî di navê de. Dîsa jî gelek berhemên girîng derketin holê. Xîtabkirin hunerekî xurt bû. Romayî di heman demê de uslûbeke axaftinê bû. Tevî ku di kincan û li xwekirinê de bandoreke hûrûkûr a Rojhilat hebû jî gelekî xweser bûbû. Latînî hêdî hêdî li şûna Grekî weke zimanekî standart di dîplomasî û qada navneteweyî de tê bi karanîn û dibe zimanê fermî. Di wendabûna klasîkên Yewnan de bandora wergerên bi Latînî gelekî heye. Polîtîka di vê demê de bûye mîna hunerekî.

Em wexta ku çanda Roma û Atînayê bidin ber hev û qiyas bikin, em ê bi hêsayî bibînin ku aliyê îdeolojîk yê çanda Atînayê

girantir e, li hemberî vê jî aliyê maddî –polîtîk yê çanda Romayê girantir e. Lê girîng e ku mirov bibîne herdu çand yekpare ne. Mîna ku berhemên hîmdanîna çandî ya Atînayê berê pêşî Skender û qraliyetên piştî wî û paşê jî Romayiyan berhevkirine. Bêyî ku mirov çanda Atînayê bifikire nikare Romayê di hişê xwe de çêke û bihûne, jixwe xuya ye, hîç nikare vê yekê weke împaratoriyeke dinyayê bihizire.

Lê ya hînê girîngtir ew e ku ev herdu çand di pêşketina çanda Rojhilat de qonaxa dawî ne. Weke tê zanîn, Atîna û Romayê çand û împaratoriyeke orjîn neafirandine. Herduyan jî çavkaniyên çanda Rojhilat li gorî şert û mercên xwecihî û xwemalî di asteke jor de sentez û bi encam kirine. Ewrûpayê jî bi çavkaniyên van çandan, bi senteza Roma û Atînayê ve bi hev ve kirin û di şoreşa xwe ya mezin a çandê de bi ser ket. Li derveyî dergûşa mezin a Rojhilat Mezopotamya û Misrê mirov nikare li çandeke Ewrûpayê bifikire.

Di aliyê maddî de jî bûyerên dîrokî yekpare ne. Çêbûn û zêdebûna bajaran bi Ûrûkê destpêkir û weke xelekên zincîrekê bi hev ve girêdayî ne. Me dît ku hema hema her şaristaniyek 'Ûrûk'eke xwe heye. Ev xusûseke xweber nîne. Diyalektîka bajaran e. Di derketin û belavbûna neolîtîkê de jî heman bûyera diyalektîkî derketibû pêşberî me. Em di vê nirxandin û tomarkirina xwe ya li ser belavbûna şaristaniyan de dibînin ku em nikarin maneyê bidin bûyerên civakî yên ji zemînên dîrokî û mekanî qut in.

Fetihkirina dinya me ji aliyê sîstemên şaristaniyan ve bi giranî bi şaristaniya Romayê temam bûye. Jixwe ji nû ve li fetihkirina deverên berê vegeriyane û xwe bi awayekî bê ber dubare dikin. Di navbera şaristaniyan de fetihkirin a rastî xwedî karekterê desteserkirin û talanê ye. Ji ber ku karekterê şaristaniyan wekhev in. Ji ber ku şaristanî hemû jî li pey kurtêlên ketine ser hev in, û dixwazin wan bi talanê bikin milkê xwe. Ez wexta dibêjim; 'kurtêlên ketine ser hev' mebesta min ji vê têgînê hatina ji milk e. Çi milkê taybet dibe, çi jî yê dewletê be, piştî nanozikiya mirovên li nava zeviyan têne xebitandin bi tevahî nirx û buhayên

têne berhevkirin kurtêl têne hesibandin. Ji lewra belavbûna di encama şeran û destgurtina deveran de pêk tê, nirxên nû bi xwe re peyda nakin, tenê nirxan têk dibin û hildiweşînin.

Em wexta vedigerin, li pey xwe dinêrin, pêvajoya bi Asûran destpêkiriye, em dibînin ku bi desteserkirina nirxên şaristaniyên berî xwe, xwe ji yên berî xwe cihêwaz kiriye. Împaratorên Asûran ên bi hovîtî şaristaniyên Hîtît, Hûrî, Fenîke û Misrê zevt kirin bi lêkirina birc û kelehan ji serê mirovan pesnê xwe dan û ya esas bi vê yekê, li rastiyekê eşkere mikur hatin ku ew jî ev bû: şerên şaristaniyan hovîtî ne. Hegel heman mentiq bi gotina 'selexaneyên dîrokê' bi nav kiribû. Ji ber ku wexta mesele destguhertina milk û kurtêlxuriyê be, mumkîn nîne ev yek bi awayekî din pêk bê. Li aliyekî civakeke jiyana wê bi temamî girêdayî çanda şaristaniyê, li aliyê din jî civakeke şareza ya din ku dixwaze wê desteser bike heye: eger yek a din ji tevahî nirxên wê yên maddî û manewî qut bike, digihîje armanca xwe; ango ji yekê ji wan re ji bilî tinebûnê ti rêya din namîne. Jixwe teslîm bibe jî wê beşê civakê yê herî hoste û kêrhatî ji tinebûnê xilas nebe. Erê teslîm bibin jî weke rêzikekê, zarok û jin ê bêne desteserkirin û mêrên gihiştî jî wê bêne kuştin. Jixwe ya trajîk ev e.

Rewşenbîrên Yewnan ev xusûs baş ji hev derxistine û çîrokên herî trajîk ên serdemê yên klasîk nivîsandine. Destanên Sumeran jî heman çîrokên trajîk in. Lorîka Mirinê Ji bo Nîppûrê û Destana Lanetkirina Agadeyê mîna ku ji Bexdaya îro xeberê bide. Împaratoriya Persan jî xwedî heman nav û dengî ye. Nemaze rênedana ji bo pêşketina peravên Egeyê bi awayekî serbixwe, yek ji trajediyên dîrokî ye. Piştre Skender heman mentiqê şaristaniyê mîna gundorekî di ser moriyan re derbas bibe bi kar aniye. Xwedatî-qraliyet her tim ji bo mirovan mîna moriyan bipelixîne navnîşanek e. Hin bûyerên bi vî rengî dibe ku di egoya hin mirovan de bi cih bibin. Ya Romayê di vî warî de kir, belkî ev mentiq bi tenê gihand xisleteke herî bi huner û hostatiyê. Her tim di ber singê xwe de rûniştin, vî mentiqî bi awayekî bêber her xwe dugêsinî kir, hovîtiyên destguhertinê, xwediyên berê yên tevî xizmetka-

rên xwe hatin tinekirin an jî mîna êsîrên kêrhatî hatin bikaranîn, ma ev çalakî guvaştina wijdanê mirovatiyê nîne çi ye?

Wexta ku dînên yekxwedayî bêne lêkolîn wê were dîtin ku bi zêhniyet û pratîkeke nû li ber rejimên şaristaniyê yên bi pûtperestî û pirrxwedayetiyê wekhev dihatin dîtin rabûne ku ev yek di dîrokê de yek ji pêşketinên herî manedar e. Herçiqas belavbûna hin şaristaniyan li ser hîmê van dînan dewam kir jî diyar e, em bi bûyerên nû yên dîrokî re rûbirû ne. Em ê di bin sernavekî cuda de van gavavêtinên nû şîrove bikin.

# 4- QONAXÊN CIVAKA ŞAREZA
# û PIRSGIRÊKÊN BERXWEDANÊ

Di dawiya sedsala çaremîn de bi hilweşîna Romayê re bi tenê bajarek û şaristaniyeke bi navê wî tê hildan hilnaweşe. Bi tevahî şaristaniyên serdemên destpêkê û klasîk bi dawî dibin. Piştre serdema tê û weke serdema tarî tê bibîranîn û navê serdema navîn lê tê kirin ku navlêkirineke bi vî rengî ji rêûresmê ye. Ji ber şêweyê zanista dîrokê serdem bi vî awayî têne bi navkirin, naxwe qîmeteke xwe ya hêja ya maneyê tineye, û heta mirov dikare bibêje; aliyê wê yê xirakirina maneyê zêdetire. Em navekî din jî lê dikin û jêre dibêjin; serdema feodal, nameze ev yek jî ji şêweyê têgihiştina dîrokê ya Marksîst û rêbaza wê ya pêkanîna civakê tê. Binavkirina civakî ya feodalîteyê hinekî bê hemdê xwe ye, hinekî bi zorê ye. Maneyeke kûr têde nîne. Weke me gotî belkî jî ji tevlîhevkirina maneyê re zêdetir xizmetê dike.

Eger mirov hilweşîna Romayê weke ji hevdeketina bi tevahî sîstemên serdema destpêkê û serdema koledar a klasîk bibîne û şîrove bike, wê maneyeke hînê kûr bide. Jixwe Manîfestoya Xirîstiyantiyê Încîl a koka wê heta Sumer û Misrê dibin di hilwe-

şîna Romayê de para wê zêde tê dîtin, ev îfade jî ya bereyê hember e ku yekparebûna serdeman destnîşan dike. Heman xusûs ji bo dualîteya Îslam û Bîzansê jî welê ye.

Bi ya min, divê mirov dema piştî Romayê cuda şîrove bike. Weke destpêk û pêşekekê dixwazim bibêjim; ji dema nû re gotina 'serdema navîn a tarî' yan jî gotina 'serdemên nûranî yên Xiristiyantî û Misilmantiyê' ji bo ya diqewime tam bi mane bike gotinên li cih nînin û heta mirov dikare bibêje; bi van gotinan rastî tê berevajîkirin. Me di tevahiya nirxandina xwe ya şaristaniyê de behsa girîngiya avakariya rahiban kir. Ya rastî me di dîrokê de li vê yekê çav dêra. Paşê me dît ku xwediyên hêzên eskerî û polîtîk ên dawî li dema rahiban anîn dema wan a qraliyetê destpêkir û bi giranî wan mohra xwe li pêvajoyên şaristaniyan xistin. Me hewl da em bi şîroveyeke xurt bibêjin; bi tevahî çanda şaristaniyê bi çanda neolîtîk re şer kiriye, timî hewl daye qada wê teng bike, wê asîmîle û tesfiye bike û wê bike mêtingeh. Me destnîşankiribû ku pevçûn û şerê çandan a ji têkoşîna çînî ya teng bihuriye girîngtir e, û divê têkoşîna çînî parçeyekî vê yekê were dîtin. Her weha me şerê şaristaniyan ên di nava xwe de dikin jî weke 'selexaneya serjêkeran' destnîşankiribû.

Li gorî min mirov van vegotinan bi tevahî li binê du têgînan kom bike wê kêrhatî be, ango weke çanda maddî û îdeolojîk. Ez girîng dibînim ku Fernand Braudel ji çanda kapîtalîst re gotiye; 'çanda maddî'. Eger em vê gotinê ne tenê ji bo şaristaniya kapîtalîst ji bo şaristaniyên bi dewlet, bajar û çîn bi kar bînin, wê hem derfetên me zêde bibin û hem jî em ê baş meseleyan ji hev derxin û analîz bikin. Ji pêvajoyên damezrandina şaristaniyan ve çandên manewî û maddî heta qonaxa kapîtalîzmê bê navber dewam kirine. Kapîtalîzm di nava vê pêvajoyê de ji aliyê çanda maddî ve qonaxa dawî û tepelika wê temsîl dike. Çanda îdeolojîk ango çanda manewî yan jî zanista manedanê ji destpêkê ve heye û kengî sosyolojiya azadiyê ket wezna kapîtalîzmê êdî di wê qonaxê de divê derkeve asta xwe ya herî jor û tepelikê. Eger em lêkolîna xwe di vê çarçoveyê de berfireh bikin, em ê hem ka-

ribin di tevahiya dîroka şaristaniyê de şaristaniyê û çanda maddî û îdeolojîk a pêre di nava şer û têkiliyê de ye bi hêzeke xurt manedar bikin; hem jî em ê karibin têkiliya 'serdema navîn û modernîteya kapîtalîst' bi sosyolojiya azadiyê re deynin, bi vî awayî em ê di çarçoveya maneya jiyana azad de ji aliyê çanda îdeolojîk ve amadekariyeke baş bikin.

Ez ê bi çavdêriyên heta niha yên li çandên şaristaniyan û neolîtîkê hewl bidim xwe biceribînim sosyolojiya azadiyê ava bikim. Lê kengî me bi awayekî berfireh çav li şaristaniya modernîteya kapîtalîst gerand, ez ê xebatên me yên bingehîn ên ji bo avakirina sosyolojiya azadiyê bikim.

**a-** Di cihêbûna çanda neolîtîk weke çanda maddî û îdeolojîk de pirsgirêk ê nebe, lê zêdetir di pêvajoya xetimînê û li hemberî pêşketina civaka şaristaniyê de tinebûna hêza wê ya xweparastinê bi pirsgirêkan re rûbirû dibe. Lê berê pêşî hewce dibînim ku ez têgîna 'pirsgirêkan' a timî min di sernavên mijaran de jî bi kar aniye rave bikim. Ev têgîn li gorî maneya min bi kar aniye weha ye; çanda maddî û îdeolojîk ji aliyê civak û ferd ve êdî nabe dewam bike ango rewşeke kaotîk îfade dike. Kengî civaka nû bi awayekî manedar rengê xwe yê nû girt, ev yek nîşan dide ji rewşa bi pirsgirêk derketiye. Çanda îdeolojîk weke min gelek caran şîrove kiriye, avahî, sazî, şane û erkên wan, maneyên wan û rewşa wan a zêhnî îfade dike. Çanda maddî jî fenomen, diyarde, sazî, avahî, şane û têgînên ez hewl didim wan rave bikim, ango aliyê din ê maneyê ku beşê mirov bi destan dikare bipelîne îfade dike. Eger em bixwazin bi gerdûntiyê re bikin yek, hewl dide dualîteya diyalektîk a enerjî-maddeyê di rastiya civakî de bibîne û şîrove bike.

Li binê rohniya van têgînan, di nava hêmanên çanda maddî û îdeolojîk a civaka neolîtîkê de bi giranî xusûsên jiyanê bixin tehlûkeyê yan jî rê li şer vekin di qonaxa damezrandin û bi sazîbûnê de çênabin. Exlaqê civakî firsendê nade vê yekê. Sedema bingehîn a dike ku derz li civakê bikeve milkiyeta taybet e, û ew derfeta pêşketinê nabîne. Bi vê ve girêdayî, mijara din, dabeşki-

rina kar di nava cinsiyetan de ye ku heta hingî hînê têkiliya bi zorê û milkiyetê nas nakin. Her weha berhemê hevpar ê xwarinê jî hînê nebûye milkê taybet. Di tevahiya van xusûsan de çanda maddî û îdeolojîk a hevpar a civaka ku hînê ji aliyê hecm û hejmarê ve mezin nebûye, heye. Ji ber ku zor û milkiyeta taybet wê avahiya civakî xira bike weke tehlûkeyekê tê dîtin, piştgirî û parvekirina hevpar di nava civakê de weke pîvana bingehîn a exlaq tê qebûlkirin ku civak xwe pê li ser piyan digire. Civaka neolîtîk li ser hîmê vê prensîbê ji aliyê hundir ve gelek qehîm û tekûz xuya dike. Ji ber vê sedemê jî bi hezarê salan dewam kir. Di çarçoveya têkiliya civak û xwezayê de wexta mirov wê bi civaka şareza re bide ber hev û qiyas bike, li gorî pîvana ekolojiyê ji aliyê herdu çandan ve jî bi hêz dewam dike. Zêhniyeta civaka neolîtîk xwezayê bi pîroztî û xwedatiyê barkirî dibîne. Xwezayê jî weke xwe zindî qebûl dike. Ji ber ku xweza av, hewa, agir, her cure nebat û heywanî dide wan, wê weke xwedê dibînin, ya rastî weke hêmana herî bi hêz a xwedayetiyê qebûl dikin. Em dibînin ku têgîna xweda û xwedatiyê bi awayekî bi hêz bi van sedeman û rastiyan ve pêwendîdar e.

Wexta cihê wê hat, em ê maneya civaka şareza daye têgîna xwedê şîrove bikin. Ya girîng ew e ku zêhniyeta civaka neolîtîk têkiliya xwe bi xwedayetiya bi zext, mêtingerî û zordariya sergirtî re nîne. Di têgihiştina xwedayetiyê ya neolîtîkê de zêdetir dilovanî, malavahî, bereket, hezkirin û coş heye, wexta ku kar ne li rê diçin vê yekê bi têgînên mîna tirsê û rohniyê têkildar dibîne û gelekî hewl dide bi wan re li hev bike, ango bi awayekî zanistî bi xwezayê re dide û distîne, ekolojîk tevdigere. Wexta hewce dibîne, nirx û buhayên xwe yên herî hêja, zarokên parçeyekî wan in, keç û xortên xwe yên ciwan dikin qurban û pêşkêş dike. Ji aliyê civakbûnê ve xwedê di civakên berê yê klan de bi têgînên weke 'totem', 'tabû' û 'manayê' weke kulteke dapîra[74] civakê dihat qebûlkirin. Bi gotineke din, 'dapîrtî' weke dînê 'da-

[74]Dapîrtî-Bavpîrtî: Ev herdu gotin ji bo îfadekirina sîstema dayiktî û baviktiyê hatine bi karanîn.

yik-xwedawendê' maneyeke xwe hebû. Pîroztî û têgînên me jimartin totem, tabû û mane bi temamî xwedayetî neyên hesibandin jî weke ewrekî giran ê zêhniyetê timî li ser serê wan digere. Pîroztî jî di cewherê xwe de helwesteke li hemberî her tiştê li ser jiyana wan bi bandor e. Li hemberî xuşû û coşê, carnan tirs û fikarê, carnan hezkirin û rêzê, carnan êş û girî helwestek e. Nirx û qîmetekê didin obje û maneyên li ser jiyana wan bi bandor in. Em dikarin vê yekê weke exlaq jî şîrove bikin. Jixwe di bingehê exlaq de jî ev xweda û pîroztî hene ku bawer dikin civaka wan li ser piyan digire û rola bingehîn dilîzin. Civak di vê mijarê de gelekî ji dil û ciddî ne. Wer bawer dikin ku binpêkirineke piçûk a rêzikan, bêhurmetî ye, û nedana qurbanan dibe ku rê li felaketekê veke. Ango bi temamî civakeke exlaqî ne.

Herçiqas bi hin nebatên ku kiribin çanda xwe hin heywan kedîkiribin jî û di warê civakî de wan weke yê xwe dihesibînin jî hînê em nikarin ji vê yekê re milk bibêjin. Milk di nava xwe de subjektivîzmê dihewîne. Li naverastê rewş û zêhniyetek e ku rê li cihêbûna obje-subje veke hînê tineye. Obje jî weke wan têne hesibandin. Ew ji bo hev çiqas milk in, heywan û nebatên kedîkirine û kirine çand jî ewqasî milk in. Ji lewra mirov nikare behsa binpêkirineke ciddî ya ekolojiyê bike. Bêguman gavek ber bi rê vekirina li milkiyetê hatiye avêtin. Lê belê ji bo ev yek veguhere milkiyetê di şert û mercên cuda de wê demeke dirêj dewam bike. Ji rewşên em behsa wan dikin, divê kes civaka neolîtîk weke 'buhuştê' fêhm neke. Civak hînê teze ye, û paşeroja wê diyar nîne, şert û mercên xwezayê yên timî diguherin civakê gelek caran dibe ber qirbûne û ji ber vê yekê civak di tehlûkê de ye. Civak li hemberî vê rewşê serwext e. Jixwe ya mohra xwe li zêhniyetê dixe jî ev e. Çareya vê yekê jî çêkirina metafizîkeke mîtolojîk û dînî ye. Ev rewş herçiqas pirr weke saftî were dîtin jî rewşeke neçar xuya dike.

Li ser hîmê van şîroveyan, em dikarin metafîzika xwedatî û pîroztiyê ya li dora jiyana kolektîf a jin-dayikê hat avakirin, fêhm bikin. Dayika mîna xwezayê da, za, xwedî kir û kezeba

xwe şewitî rola wê ya sereke di çanda manewî û maddî de destnîşan kir. Eger em zilamtiya mêr bidin aliyekî hînê siya wî jî li ser kolektîvîtiya civakê tineye, û nabe. Şêwazê jiyanê yê civakê destûra vê yekê nade. Ji lewra wesfên mêr ên weke cinsê serdest zilam, xwediyê milk û xwediyê dewletê bi tevahî xwedî karektereke civakî ne, û paşê çêdibin. Wexta civak tê gotin, jin-dayik, zarokên wê û birayên wê îfade dike. Eger namzetê mêrtiyê yê muhtemel zilam be, kêrhatina xwe ji bilî mêrtiyê bi marîfeteke din, mînak bi nêçîrvanekiyeke baş, bi gihandina nebatan û xwedîkirina heywanan îspat bike, dikare bibe endamê civatê. Hînê his û heqekî mîna mêrê jinê me, bavê zaroka me weke diyardeyeke civakî çênebûye. Em ji bîr nekin ku bavtî û heta dayiktî, herçend neyê gotin aliyên wan ên derûnî û psîkolojîk nîne jî ya esas diyarde, hiskirin, serwextbûn û têgînên sosyolojîk in.

Civaka neolîtîk kengî ket tengavê yan jî hewl dan ji wê bibihurin? Di vê mijarê de mirov dikare li ser hîmê sedemên derve û hundir şîroveyan bike. Kengî zilam qelsiya xwe bihurand û bû nêçîrvanekî baş û bi kesên di xizmeta xwe de gihişt statuyeke baş, heye ku ji bo nîzama dapîrtiyê bûbe tehlûk e. Dibe ku gihandina nebat û heywanan jî rê li ber vê hêzê vekiribe. Bi giranî çavdêriyên me nîşan didin ku civaka neolîtîk ji ber sedemên derve hatiye helandin. Bêguman ev sedem, civaka dewleta pîroz a rahiban e. Çîrokên civaka şareza ya pêşî li Nîl û Mezopotamya Jêr bi giranî vê yekê piştrast dikin. Çawa ku me bi belgeyan jî got, bi çanda pêşketî ya civaka neolîtîk û tejaneya erdên bi bereket avdaniya bi teknîkeke baş, rê li ber berhemê zêde yê ji bo vê civakê hewce vekiriye. Civaka nû ya li dora berhemê zêde yê mezin bajar ava kirine, xwe bi şêweyê dewletê bi rêxistin kiriye, bi giranî bi hêza zilam xwe gihandiye pozîsyoneke gelekî cuda. Bajarbûyîna zêde bi xwe re metabûnê tîne. Ew jî bi xwe re bazirganiyê tîne. Ew jî bi şiklê koloniyan diçizire demar û rayên civaka neolîtîk û metabûna her diçe zêde dibe, nirxê guhertinê û milkiyeta belav dibe ji hevdeketina civaka neolîtîk bi lez dike. Di civaka neolîtîk de nirxê bikaranîna objeyan tê qebûlkirin. Li şûna guhertinê jî diyarîki-

rin heye. Di warê ji hevdeketina civaka neolîtîk de mînakên koloniyên Ûrûk, Ûr û Asûrê vê rastiyê eşkere ispat dikin.

Herêma bingehîn a neolîtîkê tejaneyên Dîcle-Firata Jor û Navîn di vê çarçoveyê de tevlî şaristaniyê bûne. Bi tevahî komên klanan û komên din ên mirovan ku çi gihiştibin asta neolîtîkî yan jî negihiştibinê, civaka şareza ya ji derve tê bi êrîşên xwe ew kirine mêtingeh, dagirkirine, asîmîlekirine û hewl daye wan qir bike. Li gorî çavdêriyên me li tevahiya herêmên mirov lê jiyane bûyerên bi vî rengî qewimîne. Piştre li her qadê û di her qonaxa jortir de bi êrîşên civaka şareza civaka neolîtîk a em dikarin wê weke şaneya kok a civakê bihesibînin û komên mirovan ên ji berê mane, dikevin pêvajoya ji hevdeketinê û weke bermahiyekê heta roja me ya îro hebûna xwe dewam dikin. Li gorî fikra min a şexsî, civaka beriya şaristaniyê ti carî tine nabe û nayê tinekirin. Ne ku ev civak gelekî bi hêz in, ji ber ku weke şaneyên kok hebûna civakê bêyî wan mumkîn nîne. Civaka şareza bi tenê bi civaka beriya xwe dikare hebe. Ev xusûs tiştekî wisa ye ku çawa bêyî karker kapîtalîzm nabe, ev rastî jî welê ye. Civaka şareza hebûna xwe bi civakên nîv-şareza yan jî şareza nebûyî weke diyalektîk mumkîn dike. Dibe ku hin caran hin îmha û tinekirin qewimîbin, lê bi temamî pêk nayên, ji ber ku ev bi xwezaya civakbûnê re li hev nake.

Tevî vê yekê, divê mirov çanda îdeolojîk a civaka neolîtîk a di tevahiya dîrokê de li ser piyan maye piçûk nebîne. Huqûqê dayikê, hevdugirtina civakî, xuşk û biratî, hezkirina civakî ya ji berjewendiyan dûr, rêz û hurmet, fikra qenc ango exlaq, alîkariya bêberdêl, rêz û hurmeta ji kesên civakparêz û hilberînerên nirxên rastî, dilsoziya bi cewherê têgînên pîroztî û xwedatiya xira nebûyî, hurmeta ji cîrên re, hesreta bi jiyana azad û wekhev gelek nirxên bê serûbinî sedemên bingehîn ên vê civakê ne, û di heman demê de heta jiyana civakî dewam bike wê qîmeta xwe jî her hebin. Şaristanî ji ber ku bi nirxên weke zext, mêtingerî, desteserkirin, talan, destavêtin, komkujî, bêwijdanî, bê exlaqî, qirkirin, helandin û hê bi gelek hêmanên çanda manewî û maddî yên bê kêr barkiriye, hebûna wan a di civakê de demborî ye.

Ev zêdetir rengên civaka bi pirsgirêk û nexweşokî ne.

Em ê di Sosyolojiya Azadiyê de şîrove bikin ka wê çawa nirxên berevajîkirî û nexweşokî yên civaka şaristaniyê bêne bihurandin û bi nirxên civaka mayînde yên li dawiyê bimînin, bi civakeke demokratîk, wekhev û azad re bikin yek.

**b-** Eger mirov civaka şareza di sê qonaxan de şîrove bike wê kêrhatî be. Weke qonaxên destpêk, navîn û dawiyê. Lê divê mirov destnîşan bike ku civaka şareza yekpare ye, ji lewra dabeşkirina wê bi vî rengî wê rê bide ku analîz hêsan bibe, lê divê mirov baş zanibe ku bi awayekî berçav tevlîhevî û yekparebûna wê ji aliyê 'dema dirêj' ve xwe biparêze.

Ji bo civaka şareza dibêjin; kibar e, nazik e, camêr e, bi rêz û hurmet e, bi rêzik û pîvan e, bi plan û biaqil e, bi heq û huqûqê ve girêdayî ye, aştîxwaz û dadperwer e. Ev rengên civaka şareza yên me jimartin bi temamî li hevçêkirî ne, û tenê bi armanca propagandayê ne. Rûyê rastî yê civaka şareza şîddet, derew, xapandin, çortî, dekûdolab, şer, talan, êsîrkirin, tinekirin, bendetî, bêwefatî, desteserkirin, bêwijdanî, nasnekirina heq û huqûq, serîtewandina ji hêzê re, bikaranîna prensîba pîroztî û xwedatiyê ji bo kulmek kesên berjewendîperest û berevajîkirina wê, tecawizkarî, civakbûna cinsiyetparêz, aliyek di nava mal û milk de xeniqîbe aliyê din ji birçîna bimire, komên mezin ên koleyan, gundiyên aware, karkerên bê kar û hê gelek rengên din, nexweşiyên civakî û çeloxwarîkirin rengên civaka şareza ne. Bi hêza propagandayê, bi nêzîkbûneke xirab û qelp a metafizîkê ji bo rûyê xwe yê rastî veşêre timî bi awayekî rêxistinkirî hewl dide.

Eger em bi awayekî hînê zanistî bi nav bikin; bi bajêr re çînayetî pêk hat û civaka ji aliyê rêxistina bi navê dewletê hat rêvebirin civaka şareza ye. Piştgirî û xizmtiya etnîsîte-eşîrtiyê herî zêde heta bi hiyarerşiyê di nava civakê de rê li ber cihêtiyekê vedike. Dabeşbûna civakê ji aliyê çînî ve û xwe gihandina wê ya dewletê bi xwezaya wê re li hev nake. Çanda eşîrê bi çanda çînî û dewletê re li hev nake. Tebeqe û çînayetî ya esas bi berhemê zêde re çêdibe. Kengî erd û amûrên rê li ber berhemê zêde

vedikin têne desteserkirin an jî wan dikin milk, çinayetî jî peyde dibe. Weke her tim tê gotin, milkiyet diziya ji civakê ye. Berhemê zêde jî berdêla diziyê ye. Ya esas, rêxistiniya bi navê dewletê jî vî milkî diparêze û berhemê zêde yê hatiye komkirin li xwediyên wan belav dike. Milkê xwe bi rêxistin kiriye, xwediyê berhemê zêde û nirxê zêde ye. Bêguman ji bo vê jî di tevahiya dîrokê de artêşên mezin, burokrasî, sîleh, amûrên rewakirinê hewce kirine. Her weha zanist, utopya, felsefe, huner, exlaq û dîn bi ser xwe ve çêkiriye. Metafizîkeke bêmane rolên civakî yên tevahiya van kategoriyan bi jiyanê re berevajî û çeloxwarî kiriye. Tevî ku tayê maddî û îdeolojîk ê civaka şareza gelekî tevlîhev û çeloxwariye jî ya esas rengê pêkhatina wê ye. Ev jî hebûna wê ya maddî ye ku her diçe zêde dibe. Em behsa tinebûna çanda îdeolojîk nakin. Du xisletên bingehîn ên hebûna wê hene: mayîna di planê duyemîn de û çeloxwartî.

Ji bo serwextbûna li van xusûsan divê em wan hinekî din rave bikin. Çawa ku tê zanîn her pêkhatin û fonksiyon têgînên 'zanista manedanê' ne. Her pêkhatinek fonksiyonek xwe, her fonksiyonek jî pêkhatinek xwe heye. Di rewşên kaosê de pêkhate û fonksiyon dikevin krîzê. Bi belavbûn û jihevdeketinê re rûbirû ne. Hin pêkhatinên demborî û tevlîhev jî û hin fonksiyonên nakok di vê navberê de dikevin dewreyê. Ev xusûsên ez behsa wan dikim xwedî xisletên gerdûnî ne. Mînak av ji $H_2O$ pêk tê. Li kîjan quncika gerdûnê dibe bila bibe $H_2O$ pêk ve hatibin wê wextê pêkhatin temam bûye. Rewşa kêrhatî yan jî fonksiyonel xisleta heta dawî zelal û herikbar 'av' e. Bi cemidîn û dûkelbûna wê re di pêkhatina wê ya esasî de xirabûn an jî bêkêrbûn çêdibe ango fonksiyona wê bi sînor dibe. Mirov ji texte û madenê maseyekê çêke, ev karekî pêkanînê ye. Bi kêrhatina maseyê fonksiyona wê ye. Parçeyên heman mase û texteyî nebin mase bi kêr nayên û fonksiyona wan namîne. Eger tine nebin jî fonksiyon an jî rewşa wan ya kêrhatî namîne. Maseyên gelekî xwaro maro jî mumkîn in. Di rewşên wisa de hem ji aliyê pêkhatinê û hem jî ji aliyê kêrhatinê ve xirabûn xwe ferz dike.

Di gerdûnê de her tiştê çêbûye hem xwedî xisleta pêkhatinê û hem jî ya kêrhatinê ye. Eger em bi giştî îfade bikin û em maddeyê weke pêkhatinekê şîrove bikin, ji bo em vê pêkhatinê li ser piyan bigirin wê yekser enerjî were hişê me. Enerjî ji bo maddeyê kêrhatin û fonksiyonalîte ye. Di beriya madde-enerjiyê de zanistê ispat kiriye ku ya esas enerjî ye. Pêkhateyên maddî bê enerjî nabin, lê enerjî bê pêkhatinên maddeyê dikare hebe. Ji aliyê pêkhatinê ve madde dikare were tinekirin, lê enerjî nayê tinekirin. Lê bi qasî ku em dizanin; ji bo enerjî kêrhatina xwe pêş bixe hewcedariya bi pêkhatinên maddî ferz dike. Zindîtî bi xwe jî bi rewş û pêkhatinên maddî yên pêşketî û diyar têkildar e. Zindîtiyeke berdêla wî ya maddî tine yan jî bê pêkatineke maddî hema bêjin nîne. Hebe jî em pê nizanin. Eger em bi giştî bibêjin; berdêla pêkhatinên maddî yên herî pêşketî kêrhatin û fonsiyoneke herî pêşketî ye.

Di civakê de berdêla pêkhatina maddî û kêrhatina wê, çanda maddî û îdeolojî ye. Em vê şîroveyê bi civakbûnê wisa dikin; civaka şareza li hemberî pêşketina zêde ya pêkhatina maddî, nikarîbû kêrhatina xwe pêş bixîne, berevajî paşve xistiye, di encamê de jî pêkhatin jî xira kirine. Sedema vê ya sereke jî ev e; girêdayî çanda îdeolojîk û pêkhatina bingehîn a civakbûnê mumkîn dike nemaye û ew zêde tengav kirine. Mirov vê rewşê dikare bişibîne av û petrolê. Wexta mirov av û petrolê tevlîhev bike avê bê kêr bibe. Petrol jî weke avê diherike. Lê ew bi awayekî din bi kêr tê. Eger pêşketina çanda maddî û ya îdeolojîk bi hev re û lihevkirî bimeşin, em nikarin behsa zirareke wê ya li ser civakê bikin. Wê wextê em ê bibêjin; ya normal divê bibe ev e. Lê eger çanda maddî mezin bibe û di destê komeke teng a mirovan de bikeve serhev, ji sedî sed wê gelemperiya civakê ji aliyê pêkhatin û kêrhatinê xira bibe û hem jî ev yek ê di çarçoveyeke teng a maneyê de mezinbûna çanda maddî û helandina çanda îdeolojîk îfade bike.

Em dikarin bi mînakekê fikra xwe hînê baştir bînin ziman. Pîramîdên Misrê avahî û pêkhatinên mezin ên maddî ne. Lê di berdêla wê de fonksiyona wê; bi mîlyonan mirovî jiyana xwe ya bi

mane, azadiya xwe ango çanda xwe ya îdeolojîk ji dest daye. Jixwe şaristanî tiştekî wisa ye. Avahiyên mezin lê dike. Mumkîn e ku bi perestgeh, bajar, birc, pir, zevî, kewar û heta berheman meznahiya xwe nîşan dabe. Civakên bi vî rengî bi şarisaniyan mumkîn dibin. Lê wexta em li heman civakan li çanda îdeolojîk û kêrhatina pêkhatinên maddî dinêrin, ya em lê rast tên yan wendakirina nirx û buhayan e, yan jî berevajîkirina wan e. Hindikayiyek ji gelemperiya civakê qut bûye ew bi awayekî bêrehm xistiye bin nîrê zorê û mêtingeriyê, yan ew ji çanda wê ya îdeolojîk qut kiriye yan jî berevajî kiriye pêşkêşî wê kiriye û ew ji nirxên rastî yên çanda îdeolojîk mehrûm kiriye.

Çanda îdeolojîk û çanda maddî ya hindikayî xwe pê xwedî dike, rê li ber civakeke duserî ya nexweşokî vedike. Yên di nav maddeyê de xeniqîne jî ji hawîrdorê û îdeolojiyeke azad bi temamî qutbûne. Rewşa ez jêre ‘pirsgirêka civakî’ dibêjim jî encama van bûyerên diyalektîk e. Civaka şareza bi temamî ji ber vê sedemê ji civakê qut dibe. Weke tê zenkirin, sedema qutbûna ji civakê kalîtetî yan jî kalîte nîne, ontolojîk e. Ango hebûna civaka şareza qutbûna ji civakê ferz dike. Hawîrdor û ekolojî çi weke berê di çarçoveya yekparebûna xweza-civakê de, çi jî bi îfadeyeke zanistî yekbûna civak-xwezayê were fêhmkirin, ji bo civaka divê, hewce ye pîvanên bingehîn ên şaristaniyê pêk tînin, ango ji çîn-bajar û dewleta pêwîst tê dîtin bibihurin. Ez behsa çalakiya tinekirineke çor nakim. Divê çanda îdeolojîk û maddî ya civaka nû di nava xwe de bi wezin be û li hev bike. Çanda îdeolojîk û maddî ya civakê di nava xwe de bi wezin û li hevkirî, wê weke xwezaya azadbûyî (bi gotina Murray Bookchin[75] ‘xwezaya sêyemîn’) ya dizane bi xwezayê re bibe yek

[75]Murray Bookchin: Di 14’ê Çileya 1921’ê de li Newyork City ji dayik bû. Yek ji wan kesan e ku di tevgera şoreşa Rûs de çalak cih girtiye. Heta lihevhatina Stalîn û Hîtler a di Îlona 1939’an de bi kominîstan re tevgeriya. Di vê demê de ji ber meyldariyên xwe yên Troçkîst-anarşîst hat îxrackirin. Piştî mirina Troçkî, bi sedema ku bawer kir Troçkîst di bin bandora otorîteriya Bolşevîkiyê de ne, hêviya xwe ji wan qut kir. Bi demê re bû sosyalîstekî azadîxwaz. Di nava tevgerên ekolîst ên Emerîkî de cih girt. Di sala 1983’an de bû profesorê teoriya civaknasiyê.

pêk bê, di heman demê de wê bi xwe re nakokiya civak-xwezayê ya bê wezin a civaka şaristaniyê bibihurîne.

Em wexta ku di çarçoveya perspektîfa van têgînên giştî de dema avakirina pêşî ya civaka şareza şîrove bikin, hema hema di tevahiya wan hemûyan de pêjneke mezin a çanda maddî xuya dike. Pîramîdên mezin ên Misrê, zîggûratên Sumeran, Bajarên Binerdê yên Çînê, perestgehên Hindiyan, li Emerîka Latînî gelek bajar û perestgehên bi heman rengî hebûna çanda maddî radixe ber çavan. Maneya di hundirê wan de jî ango çanda îdeolojîk jî cesedên mûmyakirî, heykelên xwedayan û meşa qral bi artêşa xwe re ya li dinya aliyê din e. Mane qerisiye yan jî pirr dijwar hatiye berevajîkirin. Di rewşên bi vî rengî de 'ez' a di psîkolojiya mirov de derdixin pêş û tiştan manedar dikin. Lê eşkere ye ku maneya esas di veguherîna civakbûnê de ye. Wexta ku civak tine be yan jî veneguhere pêkhatinên bi vî rengî nayên hişê mirov. Ji ber zêhniyetê ye ku qral weke xwedê tê dîtin. Lê hatiye berevajîkirin û zêhniyetek e, ku zêhniyeta îdeolojîk a bingehîn a civak pê heye, hildiweşîne. Zêhniyeta civakî ya rastî zêhniyeteke welê ye ku di berdêla hilweşîna çanda îdeolojîk de, dînên yekxwedayî bi hêrseke mezin û weke sedema hebûna xwe li dij derketin. Di warê çanda maddî de daneheva mezin a vê civaka li bajêr bi cih bûyî, xwe weke dewleta çînî bi rêxistin kirî, em weke zêhniyeta berevajîkirî, metafizîka xirab, li derveyî xwezayê, xwe di ser xwezayê re dîtin û xwe weke afirênerekî bi tevahî li derveyî xwezayê nîşandan, şîrove dikin ku ev bi tevahî çanda îdeolojîk talî dikin û berevajî dikin.

Em nikarin diyar bikin ku ev qonax bê reaksiyon, bê coş, mucîzewî û bê êş hatiye pêşwazîkirin. Vegotina mîtolojîk îfadekirina rastiya veşartî mayî ye. Çi mîtolojî, çi jî belgeyên dînî yên pîroz şêweyekî çîrokên berxwedanê ne. Mirov berxwedana destpêkê weke serhildana çanda îdeolojîk şîrove bike, tespîteke manedar e. Berxwedan gelekî berfireh e. Berî her tiştî berxwedana mezin a jinê, tevî ku di zindana malê û serweriya mêr de tê girtin, di fîgura Înannayê de zelal e. Bajar çawa hatin avakirin do-

ra wan bi bedenan hate girtin û ev yek jî bi temamî serhildaneke çandî ya îdeolojîk a etnîsîteyê sembolîze dike. Wexta ku têgihiştina xwedayê afirîner û mirovê evd hûrûkûr were analîzkirin wê têkoşîna mezin a çînî were dîtin. Xwedayê afirîner li şûna xweza-xweda ya nava wê hatiye valakirin, hatiye danîn. Çîna rêveber a ti têkiliya xwe bi afirandinê re tine û jê qut bûye, bi berevajîkirineke temam a îdeolojîk xwe weke xwedayekî afirîner ê bi maske îlan dike, li hemberî vê, afirînerên rastî, endamên civaka xwedî pîroztî û xwedatiyê jî piçûk dixe û wan weke kesên ji gûyê xwe afirandine bi wesif dike, bi vî awayî şerekî mezin ê çînî bi zimanekî mîtolojîk îfade dike.

Piçûkxistina çanda îdeolojîk di van vegotinan de veşartiye. Vegotinên mîtolojîk ên avakirina pêşî ya şaristaniyan, nemaze hostatiya wan a çêkirina xwedayan, mirov dikare weke şêweyê îdeolojîk ê têkoşîna çînî bibîne. Jixwe zimanekî din ê wê demê yê vegotinê nîne. Hevrikiyên bajaran, şewitandin û hilweşandinên wan têkoşîneke dijwar a civakî îfade dike. Vegotinên destanan, pergalê penteonan, mîmariyên bajaran, avakirina qebr û quban newala di nava çînan de û mesafeya zêde dikeve nava wan û gundan eşkere nîşan dide. Çîrokên Nemrût û Firewnan qelşa kûr a di nava civakê de bi belge dikin. Di klam û stranên eşîran de şopên zor û zehmetiyên li hemberî êrîşên şaristaniyê xuya dikin.

Ji dema destpêkê ya avabûna civaka şareza yek ji berxwedanên bi rêkûpêk û bi serûber heta roja me ya îro hatiye jî rêûresma berxwedanê ya pêxemberan e. Çîroka wan bi Adem û Hawayê destpê dike, ango bi mirovê pêşî dest bi vegotinê dikin û mohra bi tevahî xisletên çanda îdeolojîk lê hene. Eger mirov Adem û Hawayê li hemberî civaka neolîtîk weke zêhniyeta şaristaniya dibe xweda rast fêhm bike, em ê nîşanên hûr ên pêşî yên şerê efendî-koleyan bibînin. Diyalogên Adem bi xwedê re û têkiliyên wî bi Hawayê re, em dikarin weke cihêbûna kole-efendî û sembola jin-dayika dikeve dereceya duyemîn şîrove bikin. Derketina Hz. Nûh mîna kesekî li ber efendiyan rabûye û dixwaze civaka neolîtîk li keştiyê bar bike û bibe cihekî bilind ê çiya-

yî û destê şaristaniyê negihîjê û ji nû ve ava bike, bi bîra mirovan dixe. Jixwe çîrok behsa civaka Sumeran û civaka neolîtîk a ji bo li ser piyan bimîne li ber xwe dide, dike. Rêûresma van herdu pêxemberan serê wan diçe heta destpêka avabûna civaka şareza û bi vê yekê ji destpêkê ve hebûna berxwedanê û herî kêm bi qasî domdariya şaristaniyê domdariya wan jî nîşan dide. Dîroka xanedaniyan çawa dîroka çîna jor e, dîroka pêxemberan jî zêdetir dîroka qebîle, qehremanî û çandên li ber xwe dane ye.

Divê mirov pûtperestiya civaka şareza, totem û sembolên mîna wan ên qebîleyan ji hev bike. Xwedayên di panteona civaka şareza de anîne cem hev mîna kopyayên fîgurên rêveberên demê ne. Jixwe bi tevahî di şiklên mirov de ne. Ji wê jî wêdetir rêveberên mirov bi xwe ne. Ha ji ber vê yekê, êrîşbirina pêxemberan a ser van fîguran û êrîşbirina wan a ser rêveberan di esasê xwe de heman tişt e. Dijberiya pûtperestiyê, dijberiya dewletparêziyê ye. Li dijî tevahiya sembol û têgînên civaka bi sazî bûye wê sembolîze dikin dijberî ye, berxwedan e. Şerê di navbera rahiban û qraliyetên siyasî de xwedî xisletên cihê ne. rahib ji civaka avakirine ji qralan para xwe dixwazin. Têkoşîn di navbera kesên li tebeqeya jor de pêk tê. Têkoşîneke nava dewletê ye. Ji ber ku afirînerên çanda îdeolojîk in, yekser nebe jî bandor li pêxemberan kirine. Ya rastî, rahib mirovê dîn ê dewletê ye. Civaka sivîl zêde wî eleqedar nake. Têkiliyeke berevajî ya pêxembertiyê îfade dike. Berdevkê civaka li derveyî dewletê ye.

Rêûresma dixwazin bi pêxember Brahîm bidin destpêkirin û bi Mûsa bi sazî bûye, xweseriya wê ew e ku cesaret kiriye bi temamî ji civaka Misr û Sumerê xwe qut bike û bibe xwedî îrade ji bo civaka xwe ava bike. Em bi temamî bi şoreşeke çandî ya îdeolojîk re rûbirû ne. Nemrût û Firewn navlêkirinên sembolîk ên rêveberên dewleta du civakan in. Xisletên wan ên bi sazî bûne hene. Serdestiya mutleq îfade dikin. Brahîm û Mûsa eşkere dikin ku ew vê serdestiyê bi çanda xwe ya îdeolojîk ango berxwedana xwe ya zêhnî qebûl nakin. Ev berxwedan ji bo wê demê serhildaneke gelekî mezin û giranbuha ye. Eger îro slogana

‘Dinyayeke din jî heye’ girîng e, di wê demê de ew jî îlan dikin ku li derveyî serdestiya fermî ya Firewn û Nemrût dinyayeke din heye. Ji bo vê jî bi cemaetên xwe re gelekî mijûl dibin, dilebikin. Beriya her tiştî tevgereke hêviyê ne. Di bingehê hêza Îsraîla îro de para vê çîrokê kêm nîne, bi kêmanî ji aliyê îdeolojîk ve xwe bi vê têr dike. Tevahiya çîrok û utopyayên di rêûresma Brahîmî de sîstemên qebîleyan, jiyana wan a ku şaristaniyê pêşî lê girtiye û ya ku bi hesreta wê ne, tînin ziman. Ketine bin bandora herdu şaristaniyan. Lê divê mirov baş şîrove bike ku di rastiyê de ew red kirine. Armanca wan weke yên din avakirina şaristaniyekê nîne. Wexta bi rahibên qralên Îsraîlê re timî şer kirine cihê vê rastiyê gelekî girîng e. Xwelihevrakişandineke bi vî rengî hînê jî di nava dewleta Îsraîl û civaka wê de bi dijwarî dewam dike. Ji aliyê dîrokî ve şahidên Hîtît, Mîtanî, Asûr, Med-Pers û axir ên Greko-Romenan in. Di bîr û hafiza wan de çortan û dewijimê van şaristaniyan ketiye serhevdu.

Dîrok salên 1600-1200 B.Z. di warê çanda maddî de weke demeke bibiriqe dihûne. Têkiliyên di navbera Hîtît, Misr û Mîtaniyan de mînakên zindî û pêşî yên dîplomasiya navneteweyî pêşkêş dikin. Di vê pêvajoyê de qewmê Brahîmî ji wan qewman e ku herî nêzî van têkiliyan e, û dikare jê fêhm bike. Nabe ku mirov Brahîm û Mûsa li derveyî vê çûnûhatinê bibîne, naxwe em ê nikaribin wan bi temamî fêhm bikin. Bersiva wan dayî bersiva çanda îdeolojîk e.

Di nava vê rêûresmê de Îsa û Muhammed du reformatorên mezin in. Cihê wan ê di mezinkirina çanda îdeolojîk de em bihêlin paşê.

Babîl û Asûr di bilindbûna çanda maddî de du xelekên girîng in. Bazirganî û bajarên mezin dibûn di dema van du qraliyetan de qonaxên mezin bihurandin. Babîl di dema xwe de Parîsa demê ye. Asûriyan pêşî qralên bazirgan, paşê jî împaratorî ava kirin. Di vî warî de nûnerên xedar bûn. Li Rojhilata Naverast di warê maddî de nûneriya herî baş a rêûresma rêveberiyê ye. Di warê berevajîkirina çanda îdeolojîk û hiştina wê li plana duye-

mîn de xwedî rol e. Çanda Zerdeştî ya rêûresma Med-Persan xwe spartibûnê ji nû ve rola sereke da çanda îdeolojîk û ji bo vê yekê têkoşîneke mezin meşand. Zerdeşt-Bûda-Sokrates sê kes in ku di demên gelekî nêzî hev de jiyane. Hem fîlozofên mezin ên exlaq, hem jî zanyarên welê bûn li dijî çanda maddî meznahiya çanda îdeolojîk di kesayeta xwe de temsîl kirine. Wijdanê şaristaniyê xistî, wan hişyar kir û bûn dengê wî. Tevî ku di dema wan de çanda maddî diket dema xwe ya gihiştî û serdest bû jî wan bi awayekî bi heybet nîşan da ku hem dinyayeke din jî mumkîn e, û hem jî ew şopgerên wê ne.

Di serî de Skîtî, êrîş û berxwedanên dawî li wan nedihat ên çanda hawîrdorê, îspat dikirin ku çanda îdeolojîk wisa bi hêsayî bi dawî nabe, naqede. Ji çanda Semîtîk Amorît, ji çanda Aryen Hûrî, ji çanda Bakurê Kafkasya Skîtî, nûneriya wan a li hemberî şaristaniyê nîşan da ku xelekên berxwedanê bi qasî xelekên şaristaniyê bê navber in, û bi hêz in. Got ji bo Romayiyan çi be, Amorît ji bo Ereban, Hûrî ji bo Medan û Skîtî jî ji bo Împaratoriyên Rojhilata Naverast heman pozîsyonê îfade dikin. Di berxwedanên civakî yên Rojhilata Naverast de jixwe gelek dînên mîna Xirîstiyantiyê li Rojhilata Naverast derketin kêm nebûn.

**c-** Civaka şareza ya Greko-Romen dîroka şaristaniyê ya dema navîn û dema gihiştî temsîl dike. Mirov dikare jêre bêje serdema klasîk jî. Karîbûne potansiyela xwe ya herî ronak û çalak pêşde bibin. Li gorî demê karîbûn serdema herî bi heybet a çanda maddî biafirînin. Ev şaristaniya ku karîbû senteza şaristaniyên beriya xwe bi awayekî serketî bike, di heman demê de gotinên dawî yên qonaxa xwe tîne ziman. Lê dîsa jî hînê negihiştiye wê meznahiya çanda maddî ku mirov karibe wê ji alî heybetê bi Romayê re qiyas bike. Endustriyalîzma kapîtalîst a weke şoreşekê tê nîşandan, şaristanî nîne, nexweşiyeke şaristaniyê ye.

Encama çanda îdeolojîk a serdema destpêkê ya dema Atînayê diyar dike. Felsefe bi aliyekî xwe encama vê rastiyê ye. Panteonên zindîtiya xwe, yanî qîmeta xwe ya çanda îdeolojîk wenda kir mîna qebristana xwedayan in. Weke di gelek tiştan

de hatiye dîtin, wexta gelek li serî ye, li tepelikê ye, rasthatina li vê rewşê tê fêhmkirin. Ji ber ku piştî gihiştina tepelik û lûtkeyê çûna serberjêr destpê dike.

Ji sedî sed koledarî bi temamî sîstemeke çanda maddî ye. Piçûkxistina mirov yek ji xisletên bingehîn ê vê sîstemê ye. Evqas piçûkxistineke mezin di dinya ti zindiyan de nayê dîtin. Ji ber balkêşî û heybeta çanda maddî, wijdan jî têk diçe. Hînê jî mirov li hemberî abîdeyên dêw ên vê çandê û avahiyên wê, hem xwe nagire vedicinîqe û hem jî ji aliyekî din ve jî mirov heyranî wan dibe. Wer xuyaye mirov êdî evqasî dikare bibe xwedê, lê kengî xwedatiya mirov, mirovan bixe hedefa xwe dibe felaket. Ji ber ku ji bilî xwedê yên din evd in. Di qelşa civakî de, ango di têkoşînê de tê têkoşîn û nakokî evqasî mezin nebûbû. Di çanda klasîk a berê ya Yewnan de bûyera 'kurikên qûnek an jî qûnde' rast were analîzkirin, mirovê karibe piçûkxistinê baş fêhm bike û jê gelek tiştan hîn bibe. Tayê di navbera vê bûyerê û koledariya jinê de ne tenê pêşkêşkirina wan a ji aliyê cinsî ve ye. Ji ber ku heman diyardeya civakî parve dikin tayê di navbera wan de gelekî balkêş e.

Em wexta ji nêz ve li koletiya jinê binêrin, wê zêdetir aliyê wê yê ji mirovatiyê dûr dixîne balê bikişîne. Girtina jinê li malê ne tenê girtineke mekanî ye, û heta girtîgeh jî nîne. Rewşa wê rewşeke destavêtinê ya dijwar e. Herçiqas bixwazin bi nîşan, bi merasîmên bûkaniyê ser rastiya vê meseleyê bigirin jî rojeke wê bi tenê jî ji bo kesa xwe dizane têkçûna rûmet û anora mirov e. Jin ji qîmeta xwe ya hezar salan a hilberandin, perwerde, rêveberî û azadiyê welê bi rêkûpêk û rêbazên şîddetê jê hatiye kirin, ji vê jî wêdetir bi îdeolojî û vegotinên eşqê wer hatiye hincirandin, encam ji teslîmiyetê jî wêdetir e. Nasnameya xwe ya 'jintiyê' ji dest dide, dikeve rewşeke din ku jêre 'pîrektî' tê gotin. Li cem mêrekî ji rêzê, li cem şivanekî serê çiyê 'jin' bi tenê dikare bibe 'pîrek'. Pîrektî jî heq dide ku li ser wê her cure tesaruf bibe. Di nava vê tesarufê de kuştin jî heye, kengî bixwaze dikare bike. Ew ne tenê milk e. Ew milkeke ge-

lekî taybet e. Rê dide ku xwediyê wê li ser wê bibe împaratorekî piçûk, hema xwedî tenê zanibe bi kar bîne.

Yek ji şaxên bingehîn ê şaristanî amade kir ev rastî bû. Yek ji sedemên bingehîn, hişt ku çanda maddî sînor nas neke, têkiliya xwe bi vê rastiyê re hebû. Ezmûna li ser jinê bi awayekî serketî hat ceribandin xwestin li ser tevahiya civakê biceribînin. Bandora xeternak a duyemîn jî ev bû. Civak diviyabû ji bo efendiyên xwe weke pîrekan bi kêr hatibûna. Em ê hewl bidin rave bikin ku pîrektiya civakê bi sîstema kapîtalîst temam bûye. Lê hîmê vê çalakiyê di qonaxa pêşî ya şaristaniyê de hatiye danîn û bi çanda Greko-Romen xwestin weke mînakekî serketî yê civakê nîşan bidin. Lê kengî mêr bibûya pîrek mirov dikarîbû behsa pîrekbûna civakê bikira. Greko-Romen civakeke welê bûn, ev yek his kiribûn û tedbîrên xwe girtibûn. Yek ji wan xusûsan e ku baş tê zanîn, rewşa koleyan gelekî ji pîrektiyê xirabtir e. Lê pirsgirêk ew bû ku mêrê nebûbû pîrek bibûya kole. Em behsa têkiliyên ensest an jî têkiliyên ji rê derketî nakin. Em behsa nêrmêtiyê jî nakin. Hin aliyên mijarê yên derûnî û heta hin diyardeyên biyolojîk divê ji mijara behsa wê dikim cihê bêne nirxandin. Di civaka klasîk a Yewnan de mode ew bû ku her kurekî ciwan ê azad, divê ji sedî sed xwediyekî wî, partnerekî wî yê mêr hebe. Ciwanê kurik heta bibe xwedî tecrûbe û ezmûn divê partnerekî wî yê evîndariyê hebe. Weke min berê jî behskiribû ku Sokrates jî gotiye; di vê bûyerê de ya girîng ew nîne ku kurik pirr were bikaranîn a girîng ew e ku kurik wî ruhî bijî. Zêhniyet eşkere ye: civaka kole têkiliya xwe bi prensîba anor û azadiyê re nîne, lewma diviyabû ev xislet ji civakê bihatana kirin. Ji ber ku gef li civakê dixwarin. Rast bû jî. Li deverekê anor û azadiya mirov hebe, koletî nikare li wir bijî. Sîstem li vê serwext bûbû û diviyabû çi hewce ye bikirana.

Bêguman çanda Greko-Romen ev mîsyona xwe temam nekir. Di nava wê de bi dibistanên felsefî yên azad Xiristiyantiya pêşket, ji derve jî êrîşên etnîsîteyê yên dawî li wan nedihatin û serhildanên wan, civak bi rewşên din re rûbirû kir. Gelek îşaret he-

bûn ku nîşan didan çanda maddî her tişt nîne û hêza wê ewqas nîne serî bi her tiştî re derxîne. Lê kapîtalîzmê wê hîç hewce nedîta civakê bike 'kurikê qûnde' û karibe wê bike pîrek.

Berxwedana mezin a hêzên qebîleyan û Xirîstiyanan di berdêla êşên bêdawî û qehremaniyan de di rastiyê de ji bo wê bû ku dawiyê li civaka maneya wê ji bo mirovatiyê tinebûn bû, bîne. Lihevhatinên piştre qîmeta berxwedana çanda îdeolojîk kêm nake û hedefa wan piştguh nake. Ev tevgerên em behsa wan dikin ji bo çanda maddî ti meznahiya xwe nînin û divê mirov van weke pêngavên paşê yên bilindbûna çanda îdeolojîk bibîne û şîrove bike. Mînakeke bi heman rengî wê di têkilî û şerên Sasanî-Îslam û koçberên Tûraniyan de were dîtin. Em nikarin bi termonolojiyeke sivik a zext û mêtingeriyê, bilindbûn û hilweşînên mezin ên civakan rave bikin. Ya diqewime mezintir û berfirehtir e. Kapîtalîzm çima ji hev nayê derxistin û ji hev nakeve, ji ber ku têra xwe bi firehî civaka şareza nayê analîzkirin. Analîzên der barê kapîtalîzmê de dişibin beşê aysberg[76] ê li derveyî avê. Hecmê esasî civaka şareza ye. Ew jî di bin avê de ye.

**d-** Gelo Xiristiyantî û Îslam şaristanî ne, yan jî nirx in, ango exlaq e. Ev yek ya nîqaşê ye. Ev pirsa ku hînê girîngiyeke xwe ya mezin heye, ji texmînan wêdetir jî bersiva wê hêsan nîne. Yên di vê dabaşê de bi xwe serê wan tevlîhev jî teolog û bawermendên Xiristiyantî û Îslamê ne. Li ku û heta kengî sîstema bawerî û exlaqê bûn, têkiliyên wan bi civaka şareza û civaka li derve dihat hiştin re çi bûn, di kîjan çarçoveyê de şaristanî bûn an jî dijberê wê bûn, ev ji xusûsên sereke ne ku hînê nehatine zelalkirin.

Ev herdu sîstemên girîng ên bawerî û exlaqê ku ji nava şert û mercên împaratoriyên Sasanî û Greko-Romen derketin, li dijî çanda maddî ya sîstema koledariyê ku gelekî şax berdabû û nirxên wê yên îdeolojîk gelekî riziyayî bûn, pêngaveke mezin a çanda îdeolojîk in. Eger wan avakirina civakeke şareza diviya, weke ku di avakirina şaristaniyên klasîk hemûyan de pêk tê wan

[76]Aysberg: (Iceberg) Çiyayê ji qaşayê ku piraniya wî di nava avê de ye, û hinek serê wî ji derve ye.

ê avakirina çîn û bajaran esas bigirta. Di hedefên wan de çîn û bajar hebûn. Lê wan ji bo bajar û çînan bigihînin nirxên xwe yên exlaq û baweriyê kiribûn hedefê xwe, naxwe ne hedefa wan bû ku bibin civaka şareza. Bi giranî di hedefên wan de desthilatdarî, ango bi destxistina çanda maddî tine, berevajî, dibînin ku hebûnên çanda maddî yên mezinbûne, ji qîmeta xwe ketine û bi çanda îdeolojîk re di nava bêtewazuniyeke mezin de ne, ji bo vê jî divê hegemonya çandeke îdeolojîk pêk bînin.

Ji lewra binavkirina serdemên Xirîstiyantî û Îslamê weke sîstemên şaristaniyê wê şîroveyên kêm û çewt bi xwe re bîne.

Divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku hilweşîna Romayê ji rêzê nîne yan jî mirov nikare hilweşîna wê weke yek ji ya şaristaniyan bibîne. Di şexsê Romayê de rêûresma herî kêm çar hezar salî ya civaka şareza hilweşiyaye. Bi gotineke rasttir hatiye hilweşandin. Ji ber ku mijara me nîne em bi firehî behsa sedemên hundirîn û derve yên hilweşînê bikin, em ê bi kurtî qal bikin. Xusûsa em bi pey ketine ew e ka bi hilweşîna giştî re çi têkiliya nirxên civaka şareza heye. Mirov bi hêsanî dikare bibêje ku ji bilî Çînê, Roma tevahiya şaristaniyên destpêkê û klasîk temsîl dike. Ne tenê ji aliyê saziya koletiyê ve, tevahiya çanda maddî û manevî gihiştibû wê astê. Di salên 100î B.Z. de xwe gihandibû qonaxeke bi vî rengî. Pêwîst e, ez xusûseke din bi girîngî destnîşan bikim ku ew jî ev e: mirov bûyerên civakî bi rewşên wan ên mêtingerî û zextên rojane analîz bike, ev sedemeke bingehîn e ku rê nade mirov karibe bûyeran bi berfirehî bibîne û bigire dest. Berevajîkirina herî mezin a pozîtîvîzmê di vê mijarê de ye. Belkî jî aliyê fikra Ewrûpayê yê herî divê mirov xwe jê bike ev gavavêtina wê ya pozîtîvîst e. Eger em civakan di kûrahiya çanda îdeolojîk û maddî de, bi tevahiya nakokî û dijberiyên wê, bi wezn û bêtewazuniyên wê negirin dest, em nikarin şîroveyeke manedar bikin û nikarin ji bo jiyaneke azad paradîgmayan çêkin.

Wexta em bi vî çavê têgînan li meseleyê binêrin, em ê bibînin ku tevî Romayê çanda wê ya maddî ya gelekî mezin bûye ku ti

têkiliya xwe bi jiyaneke manedar re nemaye, tevî çanda îdeolojîk hemû hilweşiyane. Jixwe weke mîmariya bajêr jî di serî de Misr ji mîmariyên beriya xwe yên çar hezar salî hemûyan şahînşahek e. Dîsa Panteona Romayê, ji zîggûratên beriya çar hezar salan ên Sumeran ji qatê dawî û yên dawî nava zîggûratê, rewşa herî bi heybet e. Ji bo min zehmet nîne ku ez van xusûsan tespît bikim. Çandên îdeolojîk û maddî yên ji vî alî ve hilweşiyane herî kêm çar hezar salî ne. Wexta hûn li sedemên hilweşîna wan û nasnameya yên ew hilweşandine binêrin hûn ê bibînin ku em ê karibin heman analîzan ji bo wan bikin. Ji êrîşên destpêkê yên Amorîtan heta yên Hûriyan û êrîşên dawî yên Gotan hemû yekpare ne. Dîroka êrîş û berxwedanên van jî herî kêm çar hezar salî ne. Berxwedana bi pêxember Nûh dest pê kir û heta Hz. Muhammed dewam kir mîna xelekên zincîrekê xwedî dîrokeke dirêj in. Ne tenê ji aliyê demê ve, ji aliyê mekan ve jî xwedî maneyên mezin in. Çolên Erebistanê û keviyên Toros-Zagrosan, çolên Asya Navîn û daristanên kûr ên Ewrûpayê, di çêbûna çanda maddî û manewî ya qebîleyan de şopên kûr dihêlin. Çîroka her pêxemberî nîşan dide ku cemaeta dewrûbera wî bi çiqas zehmetiyan çêbûye. Sosyolojiya navend Ewrûpa naxwaze van mijaran bigire rojeva xwe. Ji ber vê, mirov bibêje avahiyên zanînê yên navenda xwe Ewrûpa, wê ne şaş be. Mirov şîroveyeke manedar a dîroka şaristaniyê neke û dîrokeke rast a Romayê ava neke, nikare Romayê û çavkaniyên çanda maddî û îdeolojîk a Ewrûpayê bi nav bike.

Dîrok du sed salên beriya hilweşîna Romayê jî weke sedsalên tarî û aloziyê bi nav dike. Ji lewra hilweşîn rewşeke rojane ya demê nîne.

Li Rojhilat cêwiyê Romayê yan jî ya dişibiyê împaratoriya Sasanî ye û em dikarin heman şîroveyan ji bo wê jî bikin. Çîroka wê ya li rojhilat dewleta rahibên Sumeran e. Bi tenê hêmana Zerdeştiyê ya di nava wê de bi sînor be jî karekterê wê yê exlaqî xurt kiriye. Lê vê jî çawa nikarîbû avakirina civaka şareza ya pirranî bi çanda maddî ya racayên super xerîbên ma-

neyê asteng bike, dîsa Sokrates çawa nikarîbû rizîna exlaqî ya di bingehê çanda Atînayê de rawestîne, Zerdeşt jî nikarîbû pêşî li mezinbûna dêw a çanda maddî ya Pers û Sasaniyan bigire. Dîrok nîşan dide ku demên dawî yên împaratoriya Îranê ya Sasanî çi ferqa xwe ji Romayê nîne. Êrîşên Tûraniyan ji bakur-rojhilat, ji ber mezheb û baweriyên di hundir de dikeliyan êdî hema dawiya wê dihat. Kengî tevgera Manî ya gavavêtineke bi hêz a çanda îdeolojîk e, di salên 250î P.Z. de hat tesfiyekirin, ji teamindina xwe ya ciwantiyê jî mehrûm bû. Eger çend şerên Îslamê nebûna, rahibên Nastûriyan jî weke rahibên Katolîk[77] ên li Rojava fetha (mîna împaratorên maddî yên demekê, êdî ew jî bûbûn împaratorên çanda manewî) Îranê û paytexta wê ji aliya çanda îdeolojîk ve hindik mabû temam bikirana. Fetha Îslamî pêşî li vê rewşê girt.

Piştî ku me maneya hilweşîna du şaristaniyên mezin ên koledar bi vî awayî bi nav kir, em niha jî bên ser du tevgerên navdar ên xwe weke alternatîfên îdeolojîk bi nav dikin; Îslamiyet û Xiristiyantiyê. Em li şertên wan ên derketinê û çawa têne binavkirin binêrin.

Romayê wexta civaka xwe ya fermî ava kir, pêre gelek derdorên berfireh ên marjînal jî derxistin holê. Ev komên koçber ên qewman nebûn. Çi kokeke wan a etnîkî jî tinebû. Ev komên nû yên ji mirovên ji rêzê pêk dihatin Romayiyan ji wan re 'proleter' digot. Ev kom xwedî îdeolojî nedihatin hesibandin. Di valatiyê de digevizîn. Mîna şiklekî koleyên bêkar bûn. Kîjan îdeolojiyê dest biavêta wan dikarîbû di nava wan de ji xwe re cih bibîne. Di dema împaratoriya Romayê de ev kes li naverastê ew çend pirrbûn dikeliyan. Di dîrokê de yekem car tebeqeyeke civakî pêk dianîn. Hêdî hêdî terîqetên di nava wan de cih bibînin çêdibûn. Mîna Esseniyên beriya Îsa.

[77]Katolîk: Ev gotin Yewnanî ye û ji Kathholou'yê tê. Bi maneya 'giştî' ye. Gotinek e ku dêrê bi kar aniye. Dêreke mezin a gerdûnî îfade dike. Li çi deverê dibe bila bibe ji bo kesên ji rê derketî bi maneya bikeve 'xeta sereke' tê bi karanîn. Dêra li Romayê ya navenda dêran bû, li ser hîmê rexne û têgihiştinên hatin gotin, ji bo xwe ji mezhebên din bike xwe weke Dêra Katolîkê bi nav kiriye.

Gelo mirovekî bi navê Îsa hebû, yan jî fîgurekî rewşê ferz kirî bû? Ev pirs hînê jî tê guftûgokirin. Ev pirs ji aliyê mijara me ve girîng nîne. Di salên derketina berçav an jî teorîk a Îsa de, Roma di şexsê împaratorê pêşî Augustus de gihiştibû qonaxa herî jor. Di berdêla fetha Rojhilatê Derya Spî de Qraliyeta Cihû ya Piçûk jî di encama berxwedanên mezin ên berê de hatibû fetihkirin. Bi walîtiya giştî dihat rêvebirin. Hevkarî meylek bû ku tebeqeyên jor têde hosta bûn. Li gorî hevkartiya Cihûyan hînê ji dema Nemrût û Firewnan xwedî tecrûbe û ezmûn bû, wê di hevkartiya bi Romayê re jî zehmetî nekişanda. Li hemberî vê jî dîsa meyleke bi hêz a azadiyê ji Mûsa û Brahîm ve her tim hebû. Îsa dewama vê rêûresmê bû. Quds timî weke keçeke her tim amade ye, tacê bide serê xwe tê teswîrkirin. Em vê yekê ji wan vegotinên ku Îsa weke talibê vê keçê bi nav dikin, fêhm dikin. Tevgera wî ya dawiyê û bi çarmîxkirina Îsa bi xwe bi encambûna wê, mirov dikare bi vê armancê şîrove bike. Di destpêkê de ne tevgereke rêxistinî ya bi serûber, ne jî manîfestoyeke îdeolojîk heye. Komeke piçûk heye û bi tayên gelekî sist bi hev ve girêdayî ne ku ev kesên pêşî jî weke Hewariyan têne binavkirin. Mirov nikare bibêje ku ji aliyê hiyarerşîk, etnîk û fermiyetê ve cihekî digirin. Cezakirina bi çarmîxê li herêmê gelek caran hatiye dîtin. Vedîtineke xeternak a Romayê ye: mîna avêtina mirovan a ber şêran. Tê zanîn ku koma ji vê yekê tirsiyaye bi hundirê Sûrî ve reviyaye. Brahîm jî ji tirsa Nemrût berevajî vê komê reviyaye devera wê Quds paşê lê were avakirin. Di wê demê de çûnûhatinên berevajî yên weke van normal in. Lê piştî qirnekî pêşnûmeyên pêşî yên Încîlê têne çêkirin. Mînak Încîla Marcion a îro li naverastê tineye, yek ji wan pêşnûmeyan e.

Li ser şopa împaratoriya Romayê di sedsalên 2. û 3. de ‘ezîz’ên pêşî derdikevin holê. Sedsala 4. jî bi temamî sedsaleke Xirîstiyantiyê ye. Piştî ku împarator Konstantîn Xiristiyantî weke dînê fermî îlan kir, hem hejmara ‘ezîz’an û hem jî hejmara koma bawermendan gelekî zêde bû. Di vê demê de mezhebên pêşî cihê bûn û Xirîstiyantiya fermî (Xirîstiyantiya dewletê) ke-

te rojevê. Weke tê zanîn di Xirîstiyantiyê de ‘aqîdeya teslîsê’ serdest e. Ev jî bi fîgurên ‘bav, dê û xwedayê kur’ tê şîrovekirin. Tevî ku mijara me guftûgoyeke li ser teolojiyê nîne jî tê zanîn ku şaxên vê baweriyê xwe dirêjî gelekî demên berê dike. Sumerî civaka pêş bûn ku ev bawerî xistin zîggûratan. Xwedawenda-dayik ‘Înanna’, xwedayê-bav ‘En’ û xwedayê-kur ‘Enkî’ sê xweda ne di panteona pêşî de cih digirin. Ji lewra weke gelek caran tê gotin; Xirîstiyantî di bin bandora paganîzmê de maye, mijarek e, mirov nikare piştguh bike. Lê ya herî balkêş jî ew e ku Îsa bi xwe ji rêûresma Ibraniyan tê yan jî wisa tê qebûlkirin. Rêûresma Brahîmî bi paganîzmê re di nava nakokiyeke dijwar de ye. Lê di nava ekola li ser navê Îsa de mîna ku van herdu rêûresman li hev kiriye. Bi ya min şîroveya rast jî ev e.

Ev xusûsa ku serê mirovan telîhev kiriye, paşê rê li ber mezhebên nû, parçebûn û şerên mezin vedike. Sedema esasî ya şer jî ev e: divê Îsa ji cewherê xweda yan jî ji cewherê mirov were hesibandin. Wexta em vê cihêbûnê şîrove bikin, em ê bibînin ku kesên dixwazin Îsa ji cewherê xweda bibînin an jî dibînin, ew kes in ku Xirîstiyantiya fermî qebûl kirine. Konstantîn bi xwe jî vê şîroveyê ango xwedayetiya Îsa qebûl dike. Weke tê zanîn xwedayetiya dewletê xwedayetiya fermîbûyî temsîl dike. Hîmê wê jî rahibên Sumeran danîn. Bi Sumeran re cara pêşî dîn weke du civakên bingehîn cihê dibin. Xwedatiya mirov jî ji çanda civaka neolîtîk maye yan jî bermahiyên girîng ên wê çandê di nava xwe de dihewîne. Xisletên paganîzmê jî yên bi vî rengî hene. Li aliyê din, yên dibêjin; Îsa xwedî karektereke mirov e, ew kom in ku li derveyî dewletê ne yan jî ekoleke dînî ye. Ev di Îslamê de dişibe cihêbûna mezhebê fermî yê Sunnî (dînê dewletê) û mezhebê Elewiyan (dînê civaka li derveyî dewletê).

Di Xirîstiyantiyê de di sedsala çaremîn de du veguherînên mezin çêdibin. Yekemîn, Xirsîstiyantî vediguhere dînê dewletê. Bi vê re di heman demê de dibe dînê şaristaniyê. Çanda maddî ya Romayê di nava krîzeke mezin de ye û bi vê dixwazin krîza rewabûnê bibihurînin. Ya din jî Xirîstiyantî girseyî

dibe. Mîna sedsalên destpêkê dînekî komên teng ên ezîz û ezîzeyan nîne, bûye dînê fermî an jî ne fermî yên girseyên mezin ên gel. Weke navê gelên bûn Xirîstiyan hema yekser Ermenî, Asûrî, Helen û Latînî têne bîra mirov.

Bi vî awayî gav tê avêtin nava wê 'demê' ya jêre tê gotin serdema navîn: ango li aliyekî Romaya orjîn a hilweşiyayî û li şûna wê Romaya Konstantîn a xwe dispêre meşrûiyeta Xiristiyantiyê; li aliyê din jî weke pêngaveke mezin çanda îdeolojîk a Xirîstiyantiyê ku weke dêwekî mezin dibe. Herdu aktor di 'dema' jêre tê gotin serdema tarî de pêdiviyên bi baweriya 'aqîdeya teslîsê' ya Xirîstiyantiyê bi cih tînin: ango dînê xwedayê fermî û dînê xwedayê ne fermî. Cihêbûna dîrokî di serdema navîn de vediguhere û dewam dike. Şerê di navbera wan de jî gelekî xwînrij diqewime. Şerê berê bi paganîstan re êdî bûye şerê navbera mirovên Îsa weke xwedê dibinîn û yên nabînin. Li gorî analîza dawî, rêûresma têkoşîna berê ya di navbera hêzên şaristaniyê û hêzên çînî û etnîkî de, li gorî şert û mercên nû di bin maskeyên nû de dewam dike.

Li ser vê dabeşbûnê, eger mirov şîroveyeke hînê zelal bike mirov dikare weha bibêje; beşekî bingehê xwe yê kûr heye bi pêngava îdeolojîk a nû bûye xwediyê şaristaniyê, bi çanda maddî re li hev kiriye û bi vî awayî dejenere bûye, beşê din jî ji lihevhatinê reviyaye û li pey hegomonya çanda-îdeolojîk çûye.

Piştî hilweşîna Romayê li derdora demeke bi qasî hezar salî ajot, ango ji salên 500î heta 1500î yên P.Z. ekola xwest serdestiya xwe ya çanda maddî dewam bike û ekola çanda îdeolojîk a nexwest ji serdestiya xwe bigere, xwe li hev rakişandin, şer kirin û li hev kirin. Eger mirov vê dema dîrokê ya bi qasî hezar salî ajotî welê şîrove bike wê hê zêdetir nêzî realîteya dîrokê be. Şîroveyên bi têgînên 'serdema navîn a tarî' yan jî 'serdema feodal' wê hinekî karibe bersiva realîteyê bidin. Karektera bingehîn a vî hezar salî hilweşîna çanda maddî ya Romayê diyar dike. Gelo valatiya çêbû ji alî Xirîstiyantiyê yan jî hêmanên wekî din ên çanda maddî û îdeolojîk ve hati-

ye tijîkirin? Bersivên em bidin vê pirsê wê derfet û îmkanên me yên şîrove û analîzê xurtir bikin.

Li Rojhilat weke hêmanê çanda maddî Bîzans, li Rojava jî, ya rastî li tevahiya Ewrûpayê pêngavên ji bo avakirina bajarokên nû hene. Bi rastî jî mirov dikare dîroka çanda maddî ya Ewrûpayê bi tevgerên van bajaran ve girê bide. Em bajarekî mîna Parîsê koka wî herî kevin di sedsala çaremîn de weke wargeheke Romayê qebûl bikin, em wexta tên salên 1500 P.Z. em nikarin behsa serdestiyeke çanda maddî bikin. Em bajarên derketine holê nikarin bi yên dema Romayê re bidin ber hev û qiyas bikin, her weha em nikarin bi Mezopotamya 3000-2000 B.Z. re jî bînin cem hev û ji bajarên li herdu aliyên Egeyê yên 600-300 sal B.Z. jî nebihurîne. Qesrên hatine avakirin ji qesr û kelhên li sîstema Toros-Zagrosan di salên 2000-1500 B.Z. de hatine avakirine zêde nebihurîne. Xulase em dikarin bibêjin ku Ewrûpa di wê qabîliyetê de nebû bajartiya dema 500-1500î ango 'serdema tarî' bibihurîne û em dikarin destnîşan bikin ku çanda nû ya manewî û hegemonya çanda îdeolojîk a Xirîstiyantiyê hînê xwedî rola sereke ye. Bêguman serdestiya Xiristiyantiyê ji bo dîroka Ewrûpayê gelekî girîng e. Dîroknas ji bo vê demê li şûna ku bibêjin Ewrûpa ji aliyê çanda maddî ve hatiye fetihkirin, şîroveyeke li cih dikin û dibêjin; Ewrûpa bi çanda manewî, ango bi nirxên moral û baweriyê yê Xiristiyantiyê hatiye fetihkirin.

Pirsa esas a girîng ev e, çima di asta çandî ya Romayê ya du hezar sal berê de maye. Ya hînê girîngtir jî ew e, sîstemeke nirxan a moral û baweriyan a mîna Xirîstiyantiyê ku nikare bersiva pêdiviya çanda îdeolojîk bide û nikare Ewrûpaya heyî têr bike, çawa karî bi awayekî serketî Ewrûpayê fetih bike. Yek ji sedemên girîng bakîretiya neolîtîk a Ewrûpayê ye. Tu çi biçînî tu yê karibe wî biçine. Jixwe dîroka hezar salî ev rastî îspat kiriye. Sedema duyemîn mumkîn e koka xwe li derve be: êrîşên gefxwar ên Tirkan hem bi Îslamê û hem bi paganîzmê, û êrîşên gefxwar ên ji başûr ên Ereban di ser Sicîlya û Spanyayê re. Wexta ev

herdu sedem têne cem hev, mirov dikare dema dirêj a 'tarîtiya' serdema navîn a Ewrûpayê baştir fêhm bike. Hewcedarî bi Xirîstiyantiyê heye. Ji ber ku paganîzm bi Romayê re hilweşiyabû. Xirîstiyantiyê kêmasiya maneyê ya bawerî û moralê ya paganîzma Ewrûpayê ji zû ve danîbû holê. Bi vî awayî weke hegomonyakariyê şert ji bo çanda îdeolojîk a Xirîstiyantiyê erênî bûn. Çanda maddî ya Xirîstiyantiyê her tim li cem Romayê tepisokî bû û nikarîbû bi çanda maddî ya rojhilat re kabê xwe biavêta û serî pêre bikişanda. Bi komên ji neolîtîkê derketî Parîseke bi heybet çênedibû. Xirîstiyantî ew sîstem nebû ku ji aliyê çanda îdeolojîk ve tîna Ewrûpayê bişkîne û asta avahiyên wê yên bajaran di ya du sê hezar sal berê de mabû, bi ya min van her du kêmasiyan rê li pêşiya pêngava mezin a maddî ya Ewrûpayê ya di sedsala 16. de vekiriye.

Di navbera pêngava mezin a çanda maddî û hegemonyakariya Xirîstiyantiyê ya çanda îdeolojîk de têkiliyeke xurt heye. Jixwe şerên dînên mezin û mezheban vê rastiyê piştrast dikin. Kapîtalîzma Ewrûpayê weke pêngava çandeke maddî ya tirsnak, qelsiyên Xirîstiyantiya ji hêmanên îdeolojîk ên bi hêz mehrûm bi kar anîne; ya ku şaristaniyên berê hîç nekiriye, newêriyabû bike kirin, metabûyîn (bidestxistina nirxê tebadulê) û terîqeta kar-bazirganiyê yên ku heta hingî timî xwe vedizîn, bi bikaranîna lawazî û valahiyên civakê xwe li ser piyan girtin, kirin hêza fermî ya şaristaniyê û bi vî rengî bi awayekî serketî serdemeke nû ava kir. Di vê çarçoveyê de ji qonaxa navîn a çanda maddî ya Romayê derbasî qonaxa dawî bûye. Ev serdema ku jêre moderníteya kapîtalîst tê gotin, gelo divê em weke krîza şaristaniyê yan şêweyekî kansêrbûyîna wê yan jî qonaxa wê ya dawî ya pîrbûnê şîrove bikin. Em ê di beşa paşê de vê yekê bi firehî bigirin dest û li ser rawest in.

Çîroka Îslamê hîn zêdetir tevlîhev e. Şaristanîbûna wê ya bi lez, hînê di rojên xwe yên pêşî de bi Cihûtî û Xirîstiyantiyê re ketina wê ya nava şer û di nava xwe de jî ketina wê ya nava şerên kûr ên mezheban, ev bi tevahî têra xwe tevlîheviyê nîşan didin.

Du sed salên berî Muhammed weke me berê jî gotibû, mirov dikare weke krîza qonaxa dawî ya şaristaniya koledar jî şîrove bike. Ji vê krîzê Xirîstiyantiyê xwe xurt kir û derket. Karîbû xwe bike rêxistina pêşî ya mezin a beşên civakê yên xizanan himbêz dike. Bi rastî jî di van salan de keşîşxane tijî kirin û wer kir ku bala xizanan jî kişand. Ji bo bibe hêzeke alternatîf bi ser ketibû. Herçend gelek pirsgirêkên wê hebin jî ji ber ku bi Îslamê re ji heman kokê tê, ez ê herduyan bi hev re bigirim dest û analîz bikim. Ez ê alternatîfên muhtemel ên wekî din û derketina Îslamê şîrove bikim û bi vî awayî vî beşî temam bikim.

Ji bo mirov derketina Îslamê şîrove bike, hewce ye ku mirov serî li gelek hêmanan bide. Yekemîn, Îslamiyet dînê dawî yê rêûresma Brahîmî ye. Xwe li gorî vê rêûresmê ava kiriye. Bi vî awayî, hîmên xwe li gorî şêwazê Brahîmî yê bi kêmanî bi qasî du hezar salan datîne. Di çarçoveya vê encamê de mirov dikare ji bo şerê Ereb-Cihûyan weha bibêje: şer di navbera mezhebên heman dînî de ye. Duyemîn, zêhniyeta Mekkeyê ya ji navê derketiye weke serdema cahiliyê bi nav dike. Bi şiklekî rexneya li paganîzma Mekkeyê ye. Sêyemîn, Muhammed bi xwe bi rahibên Nastûriyan re daye û stendiye û bi vî awayî mirov dikare têkiliyê bi Xirîstiyantiyê re deyne. Çaremîn, ji ber ku Muhammed hem xebatkarê Xetîceya bazirgan e, û paşê jî dibe mêrê wê, ev yek têkiliya Îslamê bi bazirganiyê re rave dike. Pêncemîn, qebîletiya kokên xwe diçin hezaran sal berê û timî di rojeva Ereban de ye, bi dijwarî bandora xwe li Îslamê kiriye. Şeşemîn, serdema bi debdebe ya împaratoriyên Bîzans û Sasaniyan dîtiye.

Tevî gelek hêmanên di dereceya duyemîn de mirov dikare li ser van hêmanên sereke bi cildan pirtûkan binivsîne. Em bi vê dixwazin bibêjin ku Îslamiyet bûyereke welê nîne ku weke 'mûcîzeyeke li çolê' qewimiye, berhema şertên xurt ên dîrokî û maddî ye. Bi qasî hêza wê, qelsiya wê jî bi van şertan ve têkildar e. Ne weke Sumera pêşî, ne jî weke Romaya dawî sentezeke şaristaniyan e, aliyê wê yê zêdetir derdikeve pêş ew e ku ew tevgereke bawerî û exlaqê ye. Muhammed bi xwe weke Brahîm, Mûsa û

Îsa şexsiyeteke nediyar nîne. Gelek xusûsên wî têne zanîn. Peyama wî 'Quran' xîtabî qewm, qebîle yan jî çînekê nake, bang li tevahî mirovatiyê dike. Di Quranê de têgîna herî zêde derdikeve pêş 'Ellah' e. Ya rastî divê ev têgîn di xebatên teolojîk de li serê pêşî cih bigire. Muhammed gelekî zêde di bin bandora vê têgînê de ye. Weke 'Rebbê' tevahî aleman, ango efendiyê wan tê bi navkirin. Ev peyv û gotin di Pirtûka Pîroz de gelekî derbas dibe. Peyva Ellah a evçend têgîneke mezin e, di wê kapasîteyê de ye ku dikare xwedatiya xwezayê û xwedatiya civakê bike yek. Ev peyv 99 sifatan di hundirê xwe de dihewîne û ev yek jî bandora yekbûyî ya hêzên civakî û xwezayî îfade dike. Gelek xusûsên wê hene ku mensûbên wê wan weke 'qanûn û fermanên ebedî' qebûl dikin, gelekî şîlo ne. Wesfên bi koka xwe civakî bi qasî ku demborî ne, her rengê xwezayî di wê astê de nîne bibe qanûnek. Jixwe qanûndanerî bi xwe, encamek e ku ji qanûndaneriya dijwar a qebîletiya Cihûyan e. Di civakê de mirov timî dikare behsa 'meylên' giraniyî wan heye bike. Paşê di civaka Îslamî de wê ev têgihiştina qanûndaneriyê rê li ber muhafezekariyeke mezin veke. Belkî ji bo rêgirtina li anarşîzma qebîletiyê qanûndaneriya hişk bi kêra pêşketina civakî hatibe. Lê wexta mirov karektera bi lez a pêşketina civakî li ber çav bigire, wê wextê têgihiştina xeter a li ummetê wê bi xwe were fêhmkirin.

Baweriya bi hêz a Muhammed bi Ellah hêza wî ya metafizîk diyar dike. Hêza Ellah di ser xwe re dibîne û qebûl dike, bi vî awayî, weke ji Sumeran heta Romayê me dît, ew jî xwe xweda îlan nake û bi vê nexweşiyê nakeve. Wexta em şerê li ser xwedatiya Îsa dibînin, helwesta Muhhamed hînê pêşketîtir e. Aliyê wî yê neyênî ew e ku nikarîbûye ji helwesta hişk a Mûsevîtiyê bibihure. Berdêla vê qelsî û şaşiyê di şerê Ereb-Îsraîlê de tê dayîn.

Hêja ye ku mirov guftûgo bike, di civaka Muhammed de ku xwest ava bike, gelo giraniya çanda maddî yan jî çanda îdeolojîk zêde bû. Di Xirîstiyantiyê de hêmanên exlaqî giraniya xwe zêdetir in. Lê li gorî min di Îslamê de tewazûneke baş hatiye danîn. Herçiqas naveroka wê kêm bê dîtin û cihê nîqaşê be

jî mirov dikare tewazûna di navbera çanda îdeolojîk û maddî de weke aliyê xurt ê Îslamê qebûl bike. Jixwe Muhammed bi xwe ev yek bi hedîseke xwe weha aniye ziman: 'Weke ku tu yê sibe bimirî ji axretê re, weke ku tu yê hîç nemirî ji dinyayê re bixebite.' Baş tê zanîn ku Sasanî, Bîzans û Romaya klasîk û heta nîzamên Nemrût û Firewnên berê nexwestine û bi şîddet rexne kirine. Ji vî aliyê xwe ve rexneyeke xurt e, li şaristaniyê dike. Lê çi şertên maddî yên serdema wî û çi jî kapasîteya wî ya îdeolojîk, têrê nakin ku têgihiştina wî ya 'sîte'yê rave bike. Dişibe sosyalîstên di dema me de ku nikarin alternatîfekê bibînin. Lê banga wî ya ji bo exlaqê mezin nîşan dide ku bi temamî haya wî ji nexweşiyên civaka şareza heye. Bi vî aliyê xwe jî reformkarekî mezin û heta şoreşger e. Civaka exlaq serwerê wê nîne, qebûl nake. Bi rêzik û pîvanên pê faîzê asteng dike, pêşî li pêşketina civaka nexweşokî ya kapîtalîst digire. Bi van xusûsên yekser mirov dikare der barê Muhammed de bibêje û şîrove bike ku ew li pêşiya Xirîstiyantî û Cihûtiyê ye. Meyla wî ya li dijî koletiyê tê zanîn. Gelekî bi mehder e, û alîgirê azadkirinê ye. Tevî ku helwesta wî ya ji bo jinê ji azadî û wekheviyê dûr e jî ji koletiya jinê ya hûrûkûr nefret dike. Ji zewacên wî bi pirr jinan û hebûna cariyên wî, em hebûna van herdu meylan fêhm dikin. Di civakê de cudahiya çînî û milkiyetê nas dike, lê weke sosyal-demokratekî tevdigere, bi bacên zêde hewl dide pêşî li yekdestî û serdestiya civakî bigire.

Bi vê xulaseya gelekî kurt, em dikarin bi hêsayî diyar bikin ku Muhammed û Îslam bi hosteyî û ne bi bêtewazunî alîgirên çandeke maddî ne, ne jî bi tenê dixwazin weke çandeke îdeolojîk bimînin. Ev aliyên Muhammed û Îslamê baş nîşan didin ka çima hem li dijî hêzên şaristaniyê, hem jî li dijî pêkhatinên din ên çanda îdeolojîk bi hêz bûye. Belkî jî ji bilî Sumer û Misriyan ti tevgera civakî bi qasî Îslamê nikarîbûye yekîtiya çanda maddî û îdeolojîk bi hev re bi hostatî bimeşîne. Eger em îro hînê behsa bi hêzbûna Îslama siyasî û radîkal dikin, em neçar in, vî rengê wê yê pêkhatinê baş fêhm bikin.

Wê gelekî bi kêr bê ku em careke din veguherîn û pêşketinên çanda maddî û îdeolojîk piştî hilweşîna Roma û Sasaniyan dubare şîrove bikin.

Sîstema koletiyê ya çar hezar salî tevî ku zirareke mezin da wijdanê mirovatiyê ango exlaqê mirovatiyê, cih ji valatiyeke mezin re hişt, û sererastkirinên huqûqî yên Romayê vê dawiyê kirî nikarî vê valatiyê tijî bikin, jixwe ev yek jî ji hilweşîna wê diyar e. Di dinya bîrûbaweriyê de jî valatiyeke eşkere çêbûye. Çar hezar salan hewl dabûn bi wan hin xwedayan bidin bawerkirin, lê êdî derketibû holê ku ew xweda weke wan dizanîbû nînin. Pûtperestiyê jî pîroztiya xwe ya berê wenda kiribû. Tê gotin, demeke welê hatiye ku heykelên herî baş ên Jupîter jî pere nekirine. Avahiyên maddî yên weke dêwan li dawiya xwe mirovatiyeke di cihê xwe de kumişî û hilweşiyayî hiştibûn.

Ji ber hebûna dewamî ya şeran aştî êdî dibe utopya. Mirov bi hêsayî dikare bibêje; dem bi temamî rewşa bi kaos û krîz e. Rêzik û pîvanên berê yên jiyanê qîmeta wan namîne û yên nû jî zêde tinene. Her kes dikeve rewşeke li benda mizgîniya rizgariyê be. Rewşeke welê heye ku têgînên cennet û cehennemê bi mirovan didin hiskirin. Li navendê komên mezin ên koleyên bêkar û bêkar hatibûn hiştin tevî qewmên koçber ên dewrûberê ketibûn nav liv û lebateke zêde. Rewşeke îdeal ji bo ku peyama xilasiyê ya dîrokî deng vede, çêbûye. Êdî dem hatiye ku tevgerên mezin şeveqa wan hilê. Di van şertan de ya bi lezgînî diviyabû, bi zimanê me yê îro, utopya û bernameyeke nû bû. Tevgerên mezin bi bername û utopyayên mezin dibin. Di tevahiya dîroka şaristaniyên berê de hewcedarî bi bername û utopyayên rizgariyê hebû. Jixwe serhatiyên wan ên li derve û hundir dikirin ku tevger her tim xwediyê reçeteyeke rizgariyê ya pratîk a utopyayê bin. Lê belê weke sîstem, vê carê krîza fonksiyonel û avahiyê ya koletiyê gelekî kûr bû. Ne di wê rewşê û wan şertan de bû ku bi sîstemên nû yên koletiyê were rêvebirin.

Di şertên bi vî rengî de tevî wijdanê mirovatiyê zêhniyet jî têra xwe tî ye. Kengî avahiyên maddî jî nikaribin êdî sîstemê

rakin ji bo dînên dinyayê jî şert û merc stewiyane. Ango dem hatiye peyamên rizgariyê bang li tevahiya wijdan û zêhniyeta mirovatiyê bikin. Serdema mirovatiyê gav biavêje navê eger koletiyeke nû nebe wê tiştekî çawa be, ev pirs têra xwe rê li ber meraqê vedike.

Li ser civaka feodal qala gelek tiştan hatiye kirin. Tê gotin piştî sîstema koletiya kevin hatiye. Lê begtiyên feodalîzm xwe dispêre wan, mirov dikare yên weke wan di salên 4000î B.Z. de jî bibîne. Dîsa mirov dikare şatoyên wan ên 2000 sal B.Z. bi bîr bixîne. Koma xizmetkar û gundiyan a li dora wan berê jî li her deverê pêk hatibû. Di rewşên belavbûna împaratoriyan de yan jî hiyarerşiyeke di nava komeke etnîk de bi hêsayî dikarîbû begtiya xwe ava bikira. Piştî Roma û Sasaniyan dewletên piçûk ên hatin avakirin ti cudatiya xwe ji yên berê tinebûn. Împaratorî ji yekîtiya hindik an jî piraniya wan, ji federasyon û konfederasyona wan zêdetir ti tiştekî din nebû. Gund û zêhniyetên wan herî kêm ti cudatiya xwe ji salên 6000î B.Z. yên dema bi sazîbûna neolîtîkê nebûn. Di têkiliyên jin û mêran de tiştekî guherî tinebû. Têkiliyên serf û senyoran ti cudatiya xwe ji yên demên berê yên beg û bendeyan tinebû. Milkiyet dîsa heman milkiyet bû. Di warê amûrên hilberandinê de rewşeke şoreşê îfade bike tinebû. Me têra xwe behsa rêveberiyan û xwedayan kir. Wê wextê zehmet e ku mirov nîzamên maddî yên piştî sedsalên 5. û 6. yên P.Z. weke şaristaniyeke nû bihesibîne. Jixwe avahiyên bajarên Ewrûpayê ji bo şaristaniyeke nû hîç têrê nakin. Împaratoriyên hatin avakirin û her pesnên wan hatin dayîn, ji bermahiyên Romayê wêdetir ti maneyeke wan tinebû.

Mirov dikare heman tiştan ji bo yên li Rojhilat jî bibêje. Ez manedartir dibînim ku mirov ji bo van bibêje; bermahiyên berî kapîtalîzmê ne. Di nav xirbeyekî de kolan an jî xaniyên mane, mirov dikare weke bermahî an jî tiştekî wisa bi nav bike. Ew ji revîzyonekirinê wêdetir nabin tiştek. Lê tevî vê yekê, divê mirov avahiyên maddî yên berî kapîtalîzmê mandel neke. Avahiyên bi wan gav hatiye avêtinî kapîtalîzmê, dibe ku cuda

bin. Nexasim bajarvaniya piştî sedsala 10. P.Z. ya li Ewrûpayê mîna xebera hatina kapîtalîzmê bidin. Ji lewra mirov çiqasî guhê xwe nede têgînên weke ‘feodalîzm’ û ‘serdema tarî’ wê baştir be, ji bo hînbûnê. Şîroveya herî nêzî rastiyê weha ye: divê mirov sîstema xwedayên bi maske û civakeke evd kirî ya bi qasî çar hezar salî di çarçoveya ‘dema dirêj’ de analîz bike, ji hev derxîne. Jihevdeketina Sîstemên neolîtîk hînê jî dewam dike. Ya ez dixwazim bibêjim ew e ku sîstemên temenê wan demdirêj e, temenê wan ê hilweşînê jî dikare sed salan bigire, bikudîne. Tim û tim mirov dikare wan revîze bike. Eger hinekî din were zewirandin û şidandin, mirov dikare ji piştî sedsalên 5. û 6. re bibêjî sîstemên derengmayî.

Ev xusûs bi tevahî ji bo Îslamtî û Xirîstiyantiyê têne çi maneyê? Utopyayên wan ji soz û peyamên cennetê bi serî ve mişt in. Nîzamên hezar salan bextewar in, behsa wan tê kirin. Di her utopyayê de ev beşek e ku behsa wê tê kirin. ‘Soza cennetê’ timî hesreta ‘waheyê’ ya mirovekî li çola ji germa disincire tîne bîra min. Jixwe dijberê wê jiyaneke bûye mîna çolê û çortan e. Pêxember dikarin ji bo paşerojê sozên umîdwar bidin civakên xîtabî wan dikin. Ya weke cennetê utopya wê tê danîn, ji gera li dinyayeke nû wêdetir tiştekî din nîne. Li aliyê din, mehkûmê cezayê darvekirinê lê hatiye birrîn û ji çar aliyan dinya wî hatiye tarîkirin yan jî yên hêviya wan a rizgariyê hîç tineye, dibe ku stargeheke wan a bi zorê hatibe avakirin hebe. Berî were darvekirin, têkiliya Saddam Husên bi nusxayeke Quranê re gelekî balkêş e, û mirov dikare gelek tiştan jê hîn bibe. Ji bo jiyanên di pêvajoya darvekirinê de Quran zêhnekî xurt ê avakirinê ye. Ew rewş e ku piştî ti çare nema, avakirina hêviyê ye. Eger şert û mercên koletiyê baş neyên zanîn, peyamên Pirtûkên Pîroz rast nayên şîrovekirin. Eger em karektera metafizîk a mirov piştguh nekin, cennet, cehennem jî di navê de gelek utopya wê bêne avakirin. Rastiya mirov vê yekê divê. Naxwe bi hêsayî mirov nikare bijî û nikare rê li jiyanên xweştir û baştir veke.

Divê ez li mijarê xusûseke din zêde bikim, ew jî ev e: tirsa ji mirinê bi xwe jî civakî ye. Ew jî yan hatiye çêkirin an jî dane çêkirin. Ji lewra tirsên mirinê yên hatine avakirin, dikarin bi avakirinên nû yên civakî ji holê bêne rakirin û heta belkî ji mirinê jiyanên herî nû û baş bêne derxistin. Mirinên di xwezayê de ti wextê naşibin mirinên di civaka mirov de dibin. Ji ber ku berevajiyê mirinên xwezayî ne, xem û êşa kûr a mirinên civakî heye. Naxwe mirin nebe, jiyan jî nabe. Ji ber vê, jiyana herî bi qîmet, ew jiyan e ku li mirinê serwext bûye. Yan jî bê mirinî ye.

Utopyayên Îslam û Xirîstantiyê ji bo derketina ji koletiyê balkêş bûn. Lê encameke çawa dihat payîn, ev mijar zelal nebû. Mîna ku piştguh bikin digotin jiyaneke mîna cennetê. Eger mirov cemaetên li medreseyan û keşîşxaneyan ji bo civaka nû ya bê avakirin mînak nîşan bide wê karibe hînê zêdetir mirov serwext bike.

Mezheb, medrese, keşîşxane û terîqet hewldanên avakirina civaka nû û bernameyê ne. Herdu dînan jî ev gelekî ceribandin. Hînê jî têne ceribandin. Gera di vî warî de ya du hezar, hezar û pênc sed salî divê me matmayî nehêle. Li aliyê din, şefên dêrê yên Xirîstiyanan û fermandarên fethê yên Îslamê bi hêsayî sîstemeke revîzekirî ya koletiya derengmayî afirandin. Bala xwe bidinê, ev sîstemên koletiya derengmayî qonaxên fethê ne. Sîstemên mayînde û ji bo tevahiya jiyana civakê nînin. Eger ji van re şaristaniyên Îslam û Xirîstiyantiyê were gotin, ev yek ê wesifkirineke hinekî bi zorê be. Derdê utopyayan afirandina şaristaniyan nîne, rizgarkirin û bedewkirina jiyanê ye. Ji lewra, pirsa li ser sîstema exlaq û baweriyê ya herdu doktrînan der barê şaristaniya wan de ji bersiveke hevgirtî dûr e. Di bihurandina sîstemên çar hezar salî de roleke wan a diyarker hebû. Li ser navê wan hin rejîmên koletiyê yên rezîvekirî weke begtî, sîte û heta bi şêweyê împaratoriyê hatin avakirin. Lê ev şaristaniyên Îslam û Xirîstiyantiyê nayên hesibandin. Mirov ji wan re dikare bibêje; şêweyê wan ên ji aliyê îdeolojîk ve hatine berevajîkirin. Ne papaz dikare ji dêrê derkeve li serê îm-

paratoriyê rûnê, ne jî îmam dikare ji mizgeftê derkeve biçe serê dewletê. Jixwe hêmanên ji wan bûn dewlet, timî ew weke ji rê derketî û munherîf bi nav kirin. Her weha timî bang li yên li serê dewletê kirin û ew hişyar kirin da ku pêdiviyên dînî bi cih bînin. Ji ber vê yekê ye ku hînê hebûna xwe dewam dikin. Lê bi awayekî gelekî bêtesîr û bêhêvî.

Max Weber ji şaristaniya kapîtalîst re dibêje: 'Şaristaniya sêhra xwe wendakirî.' Di sîstemeke çanda maddî ya pêşketî de bêguman jiyaneke sêhrî nabe. Jiyanake sêhrî di dinya çanda îdeolojîk de mumkîn e. Çandên weke Îslam, Xirîstiyantî û yên mîna wan, xwedî wê qabîliyeta sêhrî nînin ku bandorê li jiyana kapîtalîst bikin. Bi tenê hêz û qabîliyeta sosyolojiya azadiyê ya ku tevahiya mîrateya çanda îdeolojîk bide pişta xwe, dikare vê yekê bike. Em ê hewl bidin di beşa pêwendîdar de li ser mijarê biponijin. Em ê îspat bikin ku jiyan bi xwe xwedî qîmeteke mezin a sêhrî ye. Slogana nû wê ne 'Yan kapîtalîzm an jî sosyalîzm' be, divê slogana nû weha be; 'Yan kapîtalîzm an jî jiyana azad.'

Em niha hinekî bi hêsayî dikarin bersiva pirsa 'çima şaristaniya kapîtalîzmê' bidin. Dawî li împaratoriyên mezin ên mîna dêwan anîn ku van împaratoriyan pêşî li kapîtalîzmê digirt û tevî vê yekê di warê avahî û armancê de nikarîbûn xwe bikin şaristanî, bi vî awayî bi zanîn an jî nezanîn mumkîn e rê li kapîtalîzmê vekiribin. Wallerstein wexta dibêje; 'împaratorî bi kapîtalîzmê re nakok in' tespîteke bi hêz dike. Max Weber jî kapîtalîzmê û ka çawa Ruhê Protestantiyê[78] rê li ber kapîtalîzmê vekiriye baş rave dike.

Baş e, gelo dibû ku şaristanî bibûya çareserî? Bersiva vê pirsê wê bûbûya tiştekî wisa ku mîna mirov vegeriya neolîtîkê. Ji ber ku nabe bajar ji holê bêne rakirin wê pêşî li bazirganiyê jî nehata girtin. Civaka serwer a mêr jî wê rê nedîta. Herçiqas were rexnekirin jî di wan şertan de dewlet ê ji holê nehata ra-

[78]Protestanî: Mezhebekî Xirîstantiyê ye. Kengî Martîn Luther di sala 1517'an de tezên xwe yên ji 95 xalan bi deriyê Dêra Wutenbergê ve kir, ev tevgera reformê weke mezhebekî Xirîstiyantiyê bi navê Protestaniyê çêbû.

kirin. Jixwe jiyanên keşîşxane, medrese, terîqet û tesewifê encamên vê neçariyê ne. Bandora dejenerekirin û xirakirinê ya kategoriyên navbuhurî didîtin û dixwestin ji wan xilas bibin. Çareyên wan ji marjînalbûnê wêdetir nediçûn. Ji ber van sedeman rê li derketin û hebûna şaristaniyên nû vedikirin.

Di vê navberê de em careke din çav li çîroka qebîleya Îbriyan bigerînin wê ji bo hînbûnê gelekî baş be. Cihû di mijara bazirganî û diravan de pispor bûn. Her weha di warê nivîskariyê de jî xurt bûn. Di demên Roma û Sasaniyan de di şert û mercên wê demê de li tevahiya dinyayê belav bûbûn. Hêza pere û bazirganiyê ya karîbû bikeve her deverê bi dehşet bû. Mîna ruhê şaristaniya maddî bûn. Ya rastî mîna hêza wê ya dawerivandî û nisilandî bûn. Şûna pêxemberên ji rabihurî û paşerojê xeber didan, nivîskaran girtibû. Di serê wan şertên pêş ên amadekarê sîstema nû yan jî kapîtalîzmê de dihatin. Jixwe mohra wan li utopyayan jî kêm nedibû. Di qada dîn û xweda de jî pispor bûn.

Xirîstiyantiyê di serdema çanda xwe ya îdeolojîk de bi tevahî Ewrûpa fetih kiribû. Hinekî jî ketibû Asyayê. Îslam bi lez ji tevahiya Erebistanê heta Bakurê Afrîkayê û Asya Navîn fetha xwe dewam kir. Deverên sîstemên berê hemû hatin fetihkirin û li qadên nû tevî împaratoriyên çandê îdeolojîk bûbû. Lê ya diqewimî, berfirehbûna şaristaniyê nebû. Mirov dikare behsa berfirehbûna dinya manewî bike. Jixwe wexta Xirîstiyantî 'dewleta hezar salan a xwedê' dibêje, mebesta wê jê ev rastî ye.

Bingehê zanistî yên utopyayên Îslamê û yê Xirîstiyantiyê qels e. Aliyê wan ê exlaqî xurt e. Ketine bin bandora felsefeya klasîk a Yewnan. Ji bo ji nû ve geşbûna wê rol lîstine. Weke ku çavkaniya teolojiya wan Arîsto û Eflatûn be. Beşek jê jî ji teolojiya Misr û Sumerê girtine. Ji bo utopyayên azadiyê di pozîsyoneke paşvemayî de ne. Em dubare bibêjin; ji bo dînan a esas exlaq e. Weke tê zanîn teolojî xwedî cihekî sereke nîne. Ji ber ku exlaq girîngiya xwe wenda nake, doktrînên weke Xirîstiyantî û Îslamê girîngiya xwe diparêzin. Em ê behsa cihê wan di Sosyolojiya Azadiyê de bikin.

Utopya her tim bêqusûr nînin. Bi pirranî ji dijberê armancên xwe re xizmetê dikin. Îslamiyet û Xirîstiyantiyê hinekî jî dijberî armancên xwe gelekî ji pêşketina kapîtalîzmê re xizmet kirin. Dîsa jî rastiyek e ku gelekî pêre şer jî dikin. Em ê di beşê kapîtalîzmê de careke din li ser vê mijarê rawestin.

Ez dixwazim li gotinên xwe yên der barê Îslamê de çend gotinên din jî zêde bikim; Îslamê rê li ber arîstokrasiyên qebîleyên serdest û barbar vekiriye ku bi neheqî û bi awayekî bêsînor dever û çandan desteser bikin. Gelekî tê gotin Xirîstiyan paşve xistine. Ev ji bo tevahiya dînan weha ye. Jixwe şerê Îslama bûye dewlet û Xirîstiyantiya bûye dewlet, mirov nikare weke şerê Îslamê û Xirîstiyantiyê nîşan bide. Bi vî rengî nîşandana bûyerê rastiyê îfade nake. Em baş dizanin ku koka van şeran şaristanî ne, û dîn jî weke destik têne bikaranîn.

Weke encam em dikarin bibêjin; bi giştî çandên maddî-çandên îdeolojîk mijarên bi pirsgirêk in. Lê rastiyek in. Divê mirov wan lê bikole. Şerên kole-efendiyan, serf-senyoran di lebitandina dîrokî de xwedî roleke neyekser û bi sînor in. Çerxên dîrokê bi şêweyekî din digerin. Em li vê dikolin. Lêkolînên me hinek çor in, û bi amatorî û şagirtî ne. Lê hem ji bo fêhmkirina dîrokê, hem jî ji bo mirov karibe bersivê bide pirsên roja me ya îro, xebatên em dikin hewce û pêwîst in.

Eger em bi kurtî li ser baskê din ê berxwedanê, qewmên koçber ranewestin, em nikarin bibêjin ku me dabaş bi awayekî yekpare girtiye dest û li ser sekinîne. Di demên xwe yên dawiyê de li dijî şaristniya koletiyê li Bakurê Ewrûpayê Got û Hûnan, di Erebistanê re jî Ereban hem li ber xwe da û hem jî bi taktîkên êrîşan gav li pey gavê avêtin. Êrîş an jî koçberiyên van qewmên civaka bavpîran a berî şaristaniyê ku di wan de hiyarerşiya qebîleyan pêşketiye û weke barbaran têne bi navkirin, berxwedana wan bi şiklekî tevgera çanda îdeolojîk e. Jêhatî û bi coş in, lewra jî xwediyê xwîna teze ne. Di utopyayên wan de hinekî wekhevî heye, hin bermahiyên wan ên ji neolîtîkê mane hene, lê zêdetir dilê xwe dibijînin şaristaniyê.

Bi qasî dînan jî metafizîk pêşde nebirine. Zêdetir ji împaratoriyan re bûne xwîna teze û eskerên bi pereyan. Lê dîsa jî hêzên herî bi liv û lebat ên dîrokê ne.

Eger êrîşên Germen, Tirk, Moxol û Ereban, hînê berê jî yên Hûrî, Amorît û Skîtan nebûna, herhal dîrok ê cihê biherikiyana. Germen û Ereban herdu împaratoriyên Romayê hilweşandin, di hilweşîna Îran û Bîzansan de jî para Tirk û Moxolan heye. Lê ya şefên qebîleyan kir, ew bû ku yan taca împaratoriya nû dan serê xwe, yan jî di nava burokrasî û artêşê de cih girtin. Yên li paşê man yan ji nû ve qebîle ava kirin, yan jî weke deklaseyan[79] di binê civakan de bi awayekî marjînal jiyan. Di hilweşîna sîstemên koledar de rola van herdu hêzên derve û hundir nayê nîqaşkirin. Lê bi heman awayî di pêşkêşkirina alternatîf û avakirina nû de nikarin bi heman rolê nikarin rabin. Hildiweşînin, talan dikin; lê nikarin çêkin û biparêzin.

Min heta vir xebateke mirov karibe jêre lêkolîn bibêje kir û bi vê min hewl da ji modernîteya kapîtalîst re bingehekî bikolim. Min hewl da nîşan bidim ku modernîteya kapîtalîst berhemê kîjan bûyerên dîrokî ye. Yek ji xisletên bingehîn ên zanist-desthilatdariya kapîtalîst ew e ku xwe bêdîrok pêşkêş dike. Wexta sîstemek bi îdîaya 'ez a dawî û mayînde me' rabe, ji bo wê bêmekanbûn û bêdîrokbûn girîng e. Di tinebûna zeman û mekan de analîzên pirralî û bi dehşet dikin. Der barê dîroka mîkro û bûyerên rojane de xwediyê xebatên bêhejmar in. Bi ser de jî zeman û mekan wer dizewirînin û dişidînin, mîna ku dixwazin bandora zeman û mekan tine dikin. Me bi vê xebatê hewl da nîşan bidin ku ji van kesên em behsa wan dikin gelekî cuda, bi hewldanên mezin ên mirovan, bi liv û lebata mirovan tevgereke civakî û rêveçûneke dîrokî heye. Nabe mirov ji dîrokê bireve, herçiqas kapîtalîzm xwe weke dawiya dîrokê bihesibîne jî me bi vê wesîleyê anî ziman ku gelek şaristaniyên din jî di dema xwe de weke wê bi heman îdîayan rabûne. Ji bo

[79]Deklase-declase: Gotinek latînî ye. Ji komên li derveyî civakê mane, marjînal bûne û li keviyan e, tê gotin.

dest bi kapîtalîzmê bikin, em têra xwe bi tevdîr in, amade ne. Weke şaristaniyekê şertên derketina wê û binavkirina wê dubare bibe jî em ê dîsa dewam bikin. Em ê yên ji şaristaniyên berê girtine û yên lê zêdekirine bi hostayî diyar bikin.

Ez vî beşê parêznameya xwe dikarim weke teza sereke weha rave bikim: sîstema şaristaniyê ya dewletdar a bi pêkhatina çîn, bajar û dewletê di zikhev de derket holê heta serdema dawî ya kapîtalîzmê dema fînansê her tim xwe zêde kir û pêş xist, xwe bi giranî dispêre kedxwarî û zexta li ser civaka cotkarî û gund. Bi pêvajoyê re kedkarên bajaran ên zêde bûn jî xistin nava sîstema xwe ya mêtingerî û zordestiyê. Temenê şaristaniya dewletdar pênc hezar sal in, li hemberî wê şaristaniya demokratîk di nav şertên zeman û mekan de hînê berfirehtir e, lê nikarîbûye ji aliyê îdeolojîk, eskerî, polîtîk û ekonomîk ve xwe ji parçebûnê xilas bike. Ji ber vê yekê, şaristaniya dewletdar a pênc hezar salî li hemberî şaristaniya demokratîk karîbû bi hegemonya îdeolojîk hebûna xwe bi awayekî serdest dewam bike. Sîstemên zor û zilmê tenê li ser hîmê hegemonya îdeolojîk dikarin biserkevin. Nakokiya bingehîn ne tenê çînî ye, di asta şaristaniyê de ye. Têkoşîna dîrokî ku herî kêm pênc hezar salan em dikarin wê nivîskî bişopînin, di navbera şaristaniya dewletdar û beşê nebûye dewlet de qewimiye. Beşê dewletdar a esas xwe dispêre çîn, bajar û dewletê ye. Ji bo beşê nebûye dewlet jî em dikarin bibêjin şaristaniya demokratîk ku gewda wê ya esasî ji civaka gund û cotkaran pêk tê û bi demê re kedkarên li bajaran naveroka wê pêkanîne.

Di tevahiya civakê de têkoşîn, nakokî û têkiliyên îdeolojîk, eskerî, polîtîk û ekonomîk di navbera van herdu sîstemên sereke de diqewime.

Ez ê di beşên paşê yên parêznameya xwe de vê teza sereke analîz bikim û li ser bicihanîna wê ya li Rojhilata Naverast û Kurdistanê rawest im.